

**K.T.**  
**ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ**  
**ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ**  
**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û EDEBIYATA KURDÎ**

**Teza Lîsansa Bilind**



**EDEBIYATA ZAROKAN**  
**DI KOVARA NÛBIHARÊ DE**

**(1992-2010)**

**Türkan TOSUN**

**132302103**

**Şêwirmendê Tezê**

**Doç. Dr. Mehmet Zahir ERTEKİN**

**ÇEWLÎG-2017**

T.C.  
BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ  
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ  
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI

Yüksek Lisans Tezi



NÛBİHAR DERGİSİ'NDE  
ÇOCUK EDEBİYATI  
(1992-2010)

Türkan TOSUN

132302103

Tez Danışmanı

Doç. Dr. Mehmet Zahir ERTEKİN

BİNGÖL- 2017

**JI BO RÊVEBIRIYA ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI  
TIRKIYEYÊ**

Ev xebat ji aliyê jûriya me ve di Şaxa Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî  
de wek teza

Serok : .....

(Unvanê Akademîk, Nav-Paşnav)

Endam : .....

(Unvanê Akademîk, Nav-Paşnav)

Endam : .....

(Unvanê Akademîk, Nav-Paşnav)

Endam : .....

(Unvanê Akademîk, Nav-Paşnav)

Endam : .....

(Unvanê Akademîk, Nav-Paşnav)

Ez pesend dikim ku înzayên jorîn ên endamên hîndekariyê yên navborî ne.

Îmza

.....

Unvanê Akademîk, Nav-Paşnav

Birêvebirê Enstîtûyê

(Mor)

## KURTEBÊJE

amd. :	Amadekar
Bnr. :	Binêre
B.n. :	Berhema navborî
ç. :	Çap
çap. :	Çapxane
H.b. :	Heman berhem
H.c. :	Heman cih
H.g. :	Heman gotar
H.j. :	Heman jimar
H.r. :	Heman rûpel
H.w.d.:	Her wekî din
j. :	Jimare
KT :	Komara Tirkiyeyê
r. :	Rûpel
vgz. :	Veguhêz
wer. :	Wergêr
weş. :	Weşanxane



Ez vê xebatê diyariyê dê û bavê xwe yên ezîz û biqîmet dikim ku

her tim ked û piştgirî dan min, nehîştin ez ji koka xwe dûr bikevim û

zimanê xwe yê zikmakî ji bîr bikim.



## KURTE

Di vê tezê de beşa zarokan a di Kovara Nûbiharê de hatiye lêkolîn. Hemû nivîs, wêne û xêzên ku ji bo zarokan hatine amadekirin ji hêla edebiyata zarokan ve hatine analîzkirin. Armanc ew e ku di edebiyata zarokan a kurdî de rola kovarê û xebatên ku di kovarê de ji bo zarokan hatine weşandin bîn nîşandan.

Ev xebat ji xeynî pêşgotin, destpêk û encamê ji du beşan pêk tê. Di destpêkê de armanc û çarçoveya tezê tê ravekirin. Her wiha behsa rêbaza ku hatiye şopandin tê kirin û çavkaniyên ku hatine bikaranîn jî tên nasandin.

Di beşa yekemîn de bi awayekî giştî têgehên zarok, zarokatî û edebiyata zarokan hatine vekolîn. Ji bilî vê, di vê beşê de behsa dîroka edebiyata zarokan a cîhanê, ya Tirkiyeyê û ya kurdî jî hatiye kirin. Kovarên kurdî yên ku tê de ji bo zarokan nivîs hatine weşandin û kovarên zarokan ên kurdî jî di vê beşê de cih digrin.

Di beşa duyemîn de kovara Nûbiharê ya ku mijara vê tîzê ye bi awayekî berfireh hatiye nasandin. Di vê beşê de behsa serdema ku kovarê dest bi weşanê kiriye, dîrok û naveroka kovarê, her wiha rêvebir û nivîskarên kovarê yên ku ked dane jî hatiye kirin. Beşên kovarê yên ku ji bo zarokan hatine amadekirin (Zarokname, Zarokistan û Nûbihara Biçûkan) jî di beşa duyemîn de hatine lêkolînkirin. Nivîs, xêz û wêneyên vê beşê bi awayekî berfireh ji hêla edebiyata zarokan ve hatine nirxandin. Hemû nivîs ji hêla mijar, cure û nivîskaran ve hatin berhevkerin û bi vî awayî li ser wan xebat hatiye kirin.

**Bêjeyên Sereke: Zarok, Zarokatî, Edebiyata Zarokan, Kovarên Zarokan ên Kurdî, Kovara Nûbiharê**

## ÖZET

Bu tezde Nûbihar Dergisi'nde çocuklar için hazırlanan çocuk bölümü incelenmiştir. Bu dergideki tüm yazı, fotoğraf ve çizimler çocuk edebiyatı açısından analiz edilmiştir. Amaç bu derginin Kürt çocuk edebiyatı açısından rolünü ve dergide çocuklar için yer alan bu çalışmalarını ortaya koymaktır.

Bu çalışma önsöz, giriş ve sonuç kısımları hariç, iki bölümden oluşmaktadır. Giriş bölümünde tezin amaç ve çerçevesi ortaya konmuştur. Bunun yanında kullanılan yöntem anlatılmış ve ana kaynaklar kısaca tanıtılmıştır.

Birinci bölümde genel olarak çocuk, çocukluk ve çocuk edebiyatı kavramları tanıtılmış, ayrıca dünya çocuk edebiyatından, Türkiye'de çocuk edebiyatından ve Kürt çocuk edebiyatından bahsedilmiştir. İçinde çocuklara ait bölümlerin yer aldığı Kürt dergilerine ve Kürt çocuk dergilerine de bu bölümde yer verilmiştir.

İkinci bölümde tezin konusu olan Nûbihar Dergisi geniş bir biçimde tanıtılmıştır. Bu bölümde derginin çıktığı dönemdeki siyasi atmosferden, derginin çıkış tarihinden, içeriğinden, yöneticilerinden ve dergiye emek veren yazarlarından bahsedilmiştir. Derginin çocuklar için hazırlanan bölümleri de (Zarokname, Zarokistan û Nûbihara Biçûkan) ikinci bölümde incelenmiştir. Bu bölümlerin içerisinde yer alan yazılar, çizimler ve resimler detaylı bir biçimde, çocuk edebiyatı açısından analiz edilmiştir. Tüm yazılar konu, tür ve yazarları açısından ayrıştırılmış, bu şekilde üzerinde çalışılmıştır.

**Anahtar Kelimeler: Çocuk, Çocukluk, Çocuk Edebiyatı, Kürt Çocuk Dergileri, Nûbihar Dergisi**

## **ABSTRACT**

This thesis analyses the children's sections in magazine Nûbihar. All texts, pictures and illustrations in this section have been examined from the perspective of children's literature in an attempt to explore the pages of magazine that are dedicated to children and their significance for the genre of Kurdish children's literature.

This study comprises of two sections, excluding the preface, introduction and the conclusion. The purpose and the framework of this thesis is explained in the Introduction. This is accompanied by the methodology and the overview of the primary sources.

The first section of the thesis deals with such concepts as children, childhood and children's literature and discusses Kurdish children literature in the context of children's literature in Turkey and in the wider world children's literature. Therefore, this section briefly examines Kurdish magazines with a children's section and children magazines that are entirely dedicated to Kurdish children.

The second section offers a detailed account of the magazine Nûbihar, including the historical circumstances of the period in which it was published, the content of the magazine, its administrative body, and the biographies of its writers, whose hard-work made the publication of this magazine possible. The magazine's sections for children such as Zarokname, Zarokistan and Nûbihara Biçûkan are also analyzed in this section. All texts, pictures and illustrations in these sections have been categorized in terms of their themes, genre and writers and they have been closely examined and analyzed from the perspective of children's literature.

**Key Words: Child, Childhood, Children's Lecture, Kurdish Children' Magazines, Nûbihar Magazine**

## NAVEROK

KURTE .....	I
ÖZET .....	II
ABSTRACT.....	III
NAVEROK .....	IV
PÊŞGOTIN.....	XV
DESPÊK .....	1
1. Armanc û Çarçove.....	1
2. Çavkanî û Rêbaz.....	1

## BEŞA YEKEM

### ZAROK, ZAROKATÎ, EDEBIYATA ZAROKAN

1.1. Zarok.....	4
1. 2. Zarokatî .....	7
1.3. Edebiyata Zarokan .....	10
1.3.1. Armanca Edebiyata Zarokan .....	14
1.3.2. Wesfên Edebiyata Zarokan .....	16
1.3.3. Kurtenêrînek Li Dor Edebiyata Zarokan a Cîhanê .....	18
1.3.3.1. Fransa .....	19
1.3.3.2. Îngiltere.....	20
1.3.3.3 Almanya.....	21
1. 3.3.4. Welatên Îskandînavyayê .....	21
1.3.3.5. Amerîka .....	22
1.3.3.6. Îtalya .....	23
1.3.3.7. Rûsya.....	23

1.3.3.8. Tirkîye.....	24
1.4. Rewşa Edebiyata Zarokan a Kurdî .....	26
1.4.1. Nûbihara Biçûkan (1683).....	27
1.4.2. Gulzar .....	28
1.4.3. Luxetnameyî Ehmedî (1790).....	28
1.4.4. Eqîdeya Mewlewî (1806-1882).....	30
1.4.5. Mîrsadu'l-Etfal (Şahrahê Kûdekan) (1912).....	30
1.5. Edebiyata Zarokan a Kurdî Li Cihên Ku Kurd Lê Dijîn.....	35
1.5.1. Sovyet.....	35
1.5.2. Swêd .....	38
1.5.3. Tirkîye.....	40
1.5.4. Îran.....	41
1.5.5. Iraq.....	42
1.6. Destpêka Kovarên Zarokan Li Cîhanê.....	43
1.7. Di Kovarên Kurdî De Nivîsên Ji Bo Zarokan Hatine Weşandin .....	49
1.7.1. Jîn.....	49
1.7.2. Zarî Kurmancî .....	50
1.7.3. Hawar.....	50
1.7.4. Gelawêj .....	51
1.7.5. Ronahî.....	52
1.7.6. Karakoçan .....	53
1.7.7. Roja Nû.....	54
1.7.8. Sirwe.....	55
1.7.9. Nûbihar.....	55

1.7.10. Nûpelda.....	55
1.8. Kovarên Zarokan ên Kurdî.....	56
1.8.1. Kovarên Zarokan ên Kurdî Yên Ku Li Tirkiyeyê Hatine Weşandin..	57
.....	57
1.8.1.1. Dergûş .....	58
1.8.1.2. Şemamok .....	59
1.8.1.3. Dergûş .....	59
1.8.1.4. Agirê Tûtê.....	60
1.8.1.5. Zarokên Rojê.....	60
1.8.1.6. Perperok .....	61
1.8.1.7. Bûka Baranê.....	62
1.8.2. Kovarên Zarokan ên Kurdî Yên Ku Li Ewropayê Hatine Weşandin .	62
.....	62
1.8.2.1. Kulîlk .....	63
1.8.2.2. Hêvî .....	63
1.8.2.3. Hêlîn .....	64
1.8.2.4. Koçer .....	65
1.8.2.5. Heval .....	66
1.8.2.6. Heval û Hêviya Me .....	66
1.8.2.7. Kurdîlekan .....	66
1.8.2.8. Kepir .....	66
1.8.3. Kovarên Zarokan ên Kurdî Yên Ku Li Başûr Hatine Weşandin ....	67
1.8.3.1. Estêre (1972).....	67
1.8.3.2. Estêre (1975).....	67
1.8.3.4. Pepûle.....	68

1.8.3.5. Peresêlke .....	68
1.8.3.6. Cigergoşekan .....	68
1.8.3.7. Heng .....	68
1.8.3.8. Hêlaney Mindalan.....	69
1.8.3.9. Cerîwe .....	69
1.1.8.3.10. Mindalî Serdem.....	69
8.3.11. Simore .....	70
1.8.3.12. Mindalanî Bawe Gurgur .....	70
1.8.3.13. Mişke .....	70
1.8.3.14. Gizingî Biçûkan.....	70
1.8.3.15. Gullekan .....	70
1.8.3.16. Pêşengî Mindalan.....	71
1.8.3.17. Colanê .....	71
1.8.3.18. Rûdawî Mindalan .....	71
1.8.3.19. Jînwar .....	71
1.8.3.20. Sivore .....	71
1.8.3.21. Asoy Mindalan .....	72
1.8.3.22. Pêlistank .....	72
1.8.3.23. Kepir .....	73
1.8.3.24. Nêrgiz.....	73
1.8.3.25. Awat û Hêvî.....	74
1.8.3.26. Edebî Mindalan.....	74
1.9. Kovarên Zarokan ên Kurdî Yên Ku Li Îranê Hatine Weşandin .....	74
1.9.1. Gir û Galî Mindalanî Kurd.....	74
1.9.2. Girr û Gall.....	75



1.9.3. Dinyayê Mindalan.....	75
1.9.4. Amanc Bo Zaroka.....	75
1.9.5. Nêrgiz .....	75

## BEŞA DUYEM

### 2.1. DANASÎNA KOVARA NÛBIHARÊ

2.1.1. Rewşa Siyasî Ya Serdema Ku Nûbiharê Dest Bi Weşanê Kir .....	77
2.1.2. Dîroka Kovara Nûbiharê .....	79
2.1.3. Naveroka Kovarê .....	83
2.1.4. Zimanê Kovarê.....	87
2.1.5. Bergên Kovarê .....	87
2.1.6. Çend Reklam û Îlanên Ku Di Nûbiharê De Hatine Weşandin .....	88
2.1.7. Çend Sersaxiyên Ku Di Kovarê De Hatine Weşandin .....	90
2.1.8. Nameyên Xwendevanan ên Nûbiharê.....	93
2.1.9. Xebatên Kovarê Yê Kurdî .....	94
2.1.10. Armanca Kovarê.....	96
2.1.11. Rêvebir û Nivîskarên Kovarê .....	99
2.1.11.1. Kurtejiyana Nivîskarên Ku Beşa Zarokan Amade Kirine .....	101
2.1.11.1.2. Rojbîn Özkan .....	101
2.1.11.1.3. Sabah Kara.....	102
2.1.11.1.4. Xelîl Amed (î) .....	103
2.1.12. Girîngiya Ziman û Zimanê Zikmakî Di Kovarê De .....	103
2.1.13. Bihayê Kovarê û Abonetî.....	107

## 2.2. EDEBIYATA ZAROKAN DI KOVARA NÛBIHARÊ DE

2.2.1. NAVEROKA ZAROKNAMEYA KOVARA NÛBIHARÊ.....	113
2.2.1.1. Jiyana Pêxember û Gotinên Wî.....	113
2.2.1.1.1. Du Qise Ji Jiyana Pêyamber ê Ekrem .....	113
2.2.1.1.2. Peyamber ê Ekrem û Du Helqe Civat.....	113
2.2.1.1.3. Mirovê Ricaker .....	114
2.2.1.2. Rûpelek Ji Exlaqê Pêxember .....	114
2.2.1.3. Pêxember û Lepên Şixulker .....	115
2.2.2. Navdarên Kurd .....	117
2.2.2.1. Seîdê Kurdî.....	117
2.2.2.2. Evdilmefîk Firat .....	118
2.2.2.3. Ehmedê Xanî .....	120
2.2.2.4. Melayê Cizîrî.....	120
2.2.3. Exlaq .....	121
2.2.3.1. Rûpelek Ji Dîroka Îslamê.....	122
2.2.4. Perwerdeya Dînî.....	123
2.2.4.1. Pûtên Bêxêr û Bêkêr .....	124
2.2.4.2. Meha Remezanê .....	124
2.2.4.3. Nûh Pêxember û Çiyayê Cûdî .....	125
2.2.5. Gotinên Pêşyan .....	126
2.2.5.1. Şêr şêr e, çi jin e, çi mêr e.....	129
2.2.5.2. “Keda Helal Dibe Mû Naqete, Keda Heram Bibe Werîs Jî Diqete”.	

2.2.6. Gotinên Navdaran .....	131
2.2.6.1. Ew kesê ku tişteki ji bo xwe bixwaze, lê ji bo birayê xwe nexwaze, baweriya wî nîn e .....	131
2.2.6.2. Ez bê nan dikarim bijîm, lê ez nikarim bê azadî bijîm .....	132
2.2.6.3. Xebat bikin roj û şev, şûr û qelem digel hev .....	132
2.2.6.4. Gotineke Xweş.....	133
2.2.7. Cihên Dîrokî.....	133
2.2.7.1. Pira Malabadî .....	134
2.2.7.2. Medreseya Sor.....	134
2.2.8. Ceribandin.....	135
2.2.9. Ji Hêla Cûreyên Edebî Ve Naveroka Zaroknameyê .....	136
2.2.9.1. Çîrok .....	136
2.2.9.2. Taybetmendiya Çîrokên Zarokan.....	137
2.2.9.3. Cûreyên Çîrokan .....	138
2.2.9.3.1. Çîrokên Gelêrî.....	138
2.2.9.3.2. Çîrokên Edebî .....	139
2.2.10.1. Ko Zivistan Çû, Bihar Tê.....	140
2.2.10.2. Qendîla Piçûk.....	141
2.2.10.3. Viz Viz Ji We Hingiv Ji Min.....	142
2.2.10.4. Noka Genî.....	143
2.2.10.5. Mirî Çawa Tê Şuştin? .....	144
2.2.10.6. Çîroka Newrozê .....	146
2.2.10.7. Pîrê û Rovî.....	147
2.2.10.8. Çîroka Kalo Heyvo .....	148

2.2.11. Kurteçîrok .....	150
2.2.11.1. Ka Em Bavên Ber Aqila .....	150
2.2.11.2. Çîz -Mîz Nizanim .....	152
2.2.11.3. Çavê Neyartiyê Kor e .....	152
2.2.11.4. Şeltik Şûltik .....	153
2.2.12. Helbest .....	154
2.2. 12.1. Ji Biçûkan Re .....	156
2.2.12.2. Kerek Hebû Zarokno .....	157
2.2.12.3. Riziyaye Zarokno.....	159
2.2.12.4. Ronî Heye Zarokno.....	159
2.2.12.5. Maro.....	160
2.2.12.6. Dilek Hebû Zarokno .....	162
2.2.12.7. Gulek Hebû Zarokno.....	163
2.2.13. Pêkenok.....	164
2.2.13.1. Pêkeniyek ji Xocê Meşhûr.....	165
2.2.13.2. Mêvanê Çavpirçî.....	166
2.2.13.3. Ker û Tirşî .....	167
2.2.13.4. Revîna Xewê .....	168
2.2.13.5. Secdekirina Xanê .....	168
2.2.13.6. Agir û Şeytan.....	169
2.2.13.7. Ewê Biemiliya Birçîbûnê.....	169
2.2.13.8. Emê Weka Xwe Bikin.....	170
2.2.13.9. Ji Te Re Çi? .....	171
2.2.13.10. Neûzubîllah.....	172

2.2.13.11. Rêya Axur .....	172
2.2.13.12. “Ji Xwe Ezê Peyabama” .....	173
2.2.13.13. Zimanê Xerîb .....	173
2.2.13.14. Ez Jî Nizanim .....	174
2.2.13.15. Derdê Xoce .....	175
2.2.13.16. Te Çend Qat Jimartiyî?.....	175
2.2.13.17. Nimêjên Zêde .....	176
2.2.13.18. Derewîn .....	176
2.2.13.19. Tu Ji Bîr Neke .....	177
2.2.14. Fabl .....	180
14.1. Barana Şadî .....	180
14.2. Pîtros .....	182
14.3. Çîroka Ristî .....	182
14.4. Çîçirik û Morî.....	184
14.5. Pêşbaziya Kerguh û Kosî .....	186
14.6. Mêraniya Gêrik.....	186
14.7. Şêr û Kerguh .....	187
14.8. Şêr û mişk .....	188
14.9. Çîroka Dîko û Kîso .....	189
14.10. Kûsî û Şêr .....	190
14.11. Îcar Ev Rast e .....	190
2.2.15. Ji Hêla Kêfanînê (Mîzah) Ve Naveroka Zaroknameyê.....	192
2.2.15.1. Karîkatur .....	192
2.2.16. Nasandina Berheman .....	193

2.2.17. Nameyên Zarokan .....	195
2.2.17.1. Name: Nûdem Elçî.....	195
2.2.17.2. Nameya Tombîşê Ji Zehrayê re.....	196
2.2.18. Nasandina Zarokan .....	197
2.2.18.1. Pelda û Zehra .....	198
2.2.19. Nasandina Heywanan.....	200
2.2.20. Bîranîn .....	201
2.2.20. 1. Mirîşka Kurtê.....	201
2.2.20.2. Mol Axa.....	202
2.2.21. Meselok .....	204
2.2.21.1. Bêjinê Bila Karikê Bişîne .....	204
2.2.22. Lîstik .....	205
2.2.22.1. Lîstika Qanqolê.....	206
2.2.23. Mamik.....	207
2.2.24. Leheng.....	208
2.2.24.1. Rengîn û Xemgîn.....	210
2.2.24.2. Rengîn û Xemgîn.....	212
2.2.24.3. Rengîn û Xemgîn.....	213
2.2.24.4. Rengîn û Xemgîn.....	213
2.2.24.5. Rengîn û Xemgîn.....	214
2.2.24.6. Rengîn û Xemgîn.....	215
2.2.24.7. Rengîn û Xemgîn.....	216
2.2.24.8. Rengîn û Xemgîn.....	217
2.2.24.9. Rengîn û Xemgîn.....	218
2.2.24.10. Rengîn û Xemgîn .....	219

<b>2.2.24.11. Rengîn û Xemgîn .....</b>	<b>221</b>
<b>ENCAM.....</b>	<b>224</b>
<b>ÇAVKANÎ.....</b>	<b>230</b>



## PÊŞGOTIN

Zarok toximê gelan in. Civak bi hebûna zarokan ve li ser piya disekinin û digîhîjin dahatûyê. Helbet di navbera zarok, ziman, perwerde û edebiyatê de jî têkiliyeke girîng heye. Lê mixabin xebatên li ser zarok û edebiyata zarokan di dîrokê de gelek dereng dest pê kiriye. Lewra mezinan bi sedsalan hewce nedîtine ku ji bo zarokan edebiyateke xweser û taybet ava bikin. Zêdetîr tiştên devkî wek çîrok, lorik, fabl, metelok û h.w.d. ji bo wan hatine gotin, an jî di rojname û kovarên mezinan de çend rûpel ji bo zarokan hatine amadekirin bes hew. Lê piştî Serdema Navîn dema tesîra Ronasansê çêdibe û Ewropa hinekî pêşva diçe, nêrîna ku zarokan wek şexsekî qebûlnekirin jî diguhere û êdî ji bo zarokan edebiyateke taybet tê avakirin.

Li gor cihanê di edebiyata kurdî de ji bo zarokan xebat kêr hatine kirin. Helbet çend sedemên vê yêr sereke hene. Ewil mirov dikare bibêje ku ji ber tunebûna dewleteke kurdan a birêkûpêk, ji ber sedemên siyasî wek qedexekirina ziman, ji ber aboriyê û ji ber sedema li gor zarokan ji mezinan re zêdetir berhem nivîsandin û h.w.d. edebiyateke xweser a zarokan ava nebûye.

Di zimanê kurdî de jî wek cihanê şûna berhemên nivîskî edebiyata zarokan zêdetir bidevkî pêş ketiye. Dema em edebiyata nivîskî a kurdan dinihêrin, bi hêsanî tê dîtin ku li gor welatên din berhemên zarokan pir kêr in. Ji van gelek jî di nav rûpelên rojname an kovaran de bi çend rûpelan ve hatine weşandin. Bi tena serê xwe weşanên wek kovar, pirtûk, CD, malper û h.w.d. gelek kêr in. Yêr ku hatine amadekirin de jî gelemperî şûna zimanekî zelal û hêsan, zimanê ji bo mezinan hatiye bikaranîn. Hin nivîskar û rewşenbîrên kurd xwestine ku vê kêmasiyê ji holê rakin û ji bo zarokan ked dane. Kovara Nûbiharê jî yek ji wan weşanan e ku di destpêkê heta heyamekê (sala 2010an yanê hejmara 112an) ji bo zarokên kurdan çend rûpel amade kiriye.

Me di vê xebatê de behsa beşa Zaroknameyê ya ku di Kovara Nûbiharê de hatiye weşandin, kir. Hejmarên Nûbiharê yêr ku di navbera salên 1992 û 2010an de hatine weşandin, yek bi yek hatin lêkolînkirin. Hewl hat dayîn ku di edebiyata zarokan a kurdî de rola kovarê bê tespîtkirin.



Di vê xebatê de du beşên sereke hatin diyarkirin. Di beşa yekem de têgehên zarok, zarokatî û edebiyata zarokan hatin nasandin, agahiyên teorîk hatin dayîn. Bi awayekî berfireh me behsa destpêka edebiyata zarokan a li cihanê, Tirkîyeyê û kurdan kir. Pişt re em li ser kovarên ku tê de ji bo zarokan tişt hatine weşandin û li ser kovarên zarokan ên kurdî sekînin ku ev mijar baş bê zelalkirin.

Ji ber ku mijara tezê beşa zarokan a kovara Nûbiharê ye, di beşa duyemîn de me bi berfirehî der barê salên 90î, rewşa siyasî ya Tirkîyeyê û destpêka weşana Kovara Nûbiharê de agahî dan. Dû re me kovar da nasîn û me behsa dîrok, naverok, rêvebir û nivîskarên kovarê kir. Di vê beşê de dîsa me bi hûrgilî beşên kovarê yên ku ji bo zarokan hatine amadekirin (Zarokname, Zarokistan û Nûbihara Biçûkan) analîz kir. Di vê analîzê de me nivîs, xêz û wêneyên kovarê yên vê beşê ji hêla edebiyata zarokan ve nirxand. Hemû tişt ji hêla mijar, cure, şikl, û ziman ve hatin analîzkirin û bi tabloyan ve hatin nîşandan.

Ji ber ku heta niha di edebiyata kurdan de li ser edebiyata zarokan xebatên girîng û zanistî zêde nehatine kirin, di amadekirina vê tîzê de ez ji hêla çavkaniyan ve rastî zehmetiyên hatim. Lê alîkariya hin kesan barê min sivik kir. Di serî de ez deyndarê şewirmendê xwe Mamoste Mehmet Zahir Ertekîn im ku wî di nava hemû teşqele û wextê xwe yê teng de rê nîşanî min da, bi pêşniyaz, agahî û şîroveyan xwe ve alîkariya min kir. Mala wî ava û ez spasdarê wî me. Paşê ez spasiya edîtor û rêvebirê Kovara Nûbiharê Süleyman Çevik dikim ku wî ji hêla agahî dayîne ve her tim pirsên min bersivandin û ji min re bû alîkar. Her çiqas kovar pir kevn nebe jî, peydakirina çend hejmar û cildan ji bo min bû pirsgerêk. Ez dixwazim spasiya yek ji kedkar û nivîskarê kovarê Alî Karadenîz bikim ku wî bi comerdî cildên Nûbiharê yên li cem min kêmbûn ji arşîva xwe ya taybet derxist da min ku ez li ser wan bixebitim.

Ji bilî Nûbiharê, peydakirina kovarên zarokan ên kurdî û hin çavkaniyên din jî gelek zehmet bûn. Mueyed Teyîb, Murad Ciwan, Zinarê Xamo, Metin Yüksel, Hêmin Omer Ahmad, Sibel Atlı, Sîdar Jîr, Kenan Subaşî, Mazin Baqal, Berfin İde Demiral, Goran Candan, Mem Bawer, Kurdî-Der Amed, Îbrahîm Atmaca, Ahmet Aydın, û Mevlüt Aykoç kovar, pirtûk, gotar û çavkaniyên din yên ku di destê wan de hebûn dan min. Ez sipasdarê hemûyan im ku barê min sivik kirin.

Ji ber ku kurteya tezê wergerande îngilîzî ez spasiya mamoste Deniz Ekici dikim. Dixwazim spasiya Murad Celalî jî bikim, lewra ji hêla rê û rêbaza teznivîsandinê de alîkariya min kir. Ji bo tablo û grafîkan jî ez spasiya Ridvan Xelîl dikim ku barê min sivik kir. Herî dawîn ez spasiya malbata xwe, hemû dost û hevalên xwe yê ku ji bo vê xebatê keda wan çêbûye û min navê wan ji bîr kirine dikim, mala gişkan ava be. Hêvî dikim ku ev xebat ji bo edebiyata zarokan a kurdî bibe gaveke girîng û çavkaniyek.

**Türkan TOSUN**

**Bîngol-2017**

## DESTPÊK

### 1. Armanç û Çarçove

Di vê tezê de li ser edebiyata zarokan a di Kovara Nûbiharê de xebat hatiye kirin. Bi vê xebatê ve armanç ew e ku di kovarê de ji bo zarokan çî hatiye amadekirin bê tespîtkirin û ev xebat di qada edebiyata zarokan a kurdî de bibe gavek. Lewra di vê qadê de bi têra xwe xebat nehatine kirin û hêvî ew e ku ev pêl berfireh bibe û nîfşên nû li ser vê mijarê zêdetir bixebitin.

Ev tez ji du beşan pêk tê. Di beşa yekem de têgehên zarok, zarokatî, edebiyata zarokan hatin terîfkirin. Lewra ev têgeh bi hev re eleqedar in û bêyî terîfa van mirov nikare behsa edebiyata zarokan a kurdî bike. Ji ber ku ev têgeh bingeha edebiyata zarokan in, herî zêde behsa zarok û zarokatiyê hatiye kirin. Di vê beşê de taybetmendiyên edebiyata zarokan jî hatin nirxandin. Beriya ku behsa edebiyata zarokan a kurdî bê kirin der barê edebiyata zarokan a li cîhanê û Tirkiyeyê de agahî hat dayîn. Ji bilî van behsa kovarên zarokan ên li cîhanê, Tirkiyeyê û yên kurdî jî hatin kirin.

Di beşa duyem de bi awayekî berfireh Kovara Nûbiharê hat nasandin. Behsa dîrok, naverok, rêvebir û nivîskarên kovarê hat kirin. Ji ber ku piştî demekê Nûbiharê ji bilî kovargeriyê dest bi weşangeriyê, lidarxistina sempozyûm û konferansan û komelgeriyê jî kiriye, bi kurtasî li ser van xebatên Nûbiharê jî hat sekinandin.

Hemû nivîs, xêz û wêneyên edebiyata zarokan ên ku di kovara Nûbiharê de hatine weşandin jî di vê beşê de cih digrin. Di vê beşê de hemû nivîs (çîrok, fabl, helbest, gotinên pêşiyar û h.w.d.) û wêneyên ku di beşa “Zarokname”, “Zarokistan” û “Nûbihara Biçûkan” de hatine weşandin yek bi yek hatin tespîtkirin. Li ser van materyalan şîrove hatin kirin. Hemû cure û mijarên nivîsan wek tablo yek bi yek hatin nîşandan. Di dawiyê de ji van nivîs û wêneyan qismek wek pêvek hatin weşandin.

### 2. Çavkanî û Rêbaz

Ev teza ku xêncî pêşgotin, destpêk û encamê ji du beşan pêk tê li ser teorî, pênase, tehlîl û analîzê hatiye avakirin. Di der heqê edebiyata zarokan a kurdî de xebatên akademîk pir kêr in, ev kêmasî di vê xebatê de jî wek astengiyek derkete

holê. Lê dîsa jî dema ku ev xebat hat amadekirin hin çavkaniyên kurdî bûn bingeha vê têzê. Ji bilî çavkaniyên kurmancî û soranî, bi zimanê tirkî û îngilizî jî çavkanî hatin bikaranîn.

Di beşa yekemîn a ku tê de tegeh hatin nasandin û mijarên teorîk hatin behskirin çavkaniyên sereke xebatên li ser zarok û edebiyata zarokan bûn. Ji van xebatan ên ku min herî zêde bi zimanê tirkî jê sûd wergirtin pirtûka Dilek Tüfekçi Can ya bi navê *Çocuk Edebiyatı: Kuramsal Yaklaşım*, pirtûka Alemdar Yalçın û Gıyasettin Aytaş a bi navê *Çocuk Edebiyatı*, pirtûka Necdet Neydim a bi navê *İnceleme-Araştırma-Eleştiri-Çocuk Edebiyatı*, pirtûka Sedat Sever a bi navê *Çocuk ve Edebiyat*, pirtûka A. Ferhan Oğuzkan a bi navê *Yerli ve Yabancı Yazarlardan Örneklerle Çocuk Edebiyatı*. Ji bilî van pirtûkan ji bo pênaseyan ferhenga tirkî ya bi navê *Türkçe Sözlük* û ferhanga îngilizî ya bi navê *Oxford Wordpower Dictionary For Learners of English* jî wek çavkanî kêrî min hatin.

Dîsa di beşa yekemîn de dema behsa edebiyata zarokan a kurdî hat kirin wek çavkaniyên kurdî çend hejmarên Kovara Hawarê, gotara Reza Şivan *Mêjûy Edebî Mindalanî Kurd*” a bi soranî û gotara Kenan Subaşı a bi navê *Kürtçe Çocuk Basını ve Medyası* jî ji kêrî min hatin. Ji bilî pirtûk, kovar û ferhengan hin tezên akademîk ên li zanîngehên Tirkiyê û dervayî welêt hatine nivîsandin jî ji min re bûn alîkar ku ez vê beşê amade bikim.

Ji bo beşa duyem a ku rasterast behsa dîrok, taybetmendî, naverok û weşana Kovara Nûbiharê dike jî hin çavkanî her tim di bin destê min de bûn. Çavkaniya sereke helbet hemû hejmarên Nûbiharê yên ku heta îro hatine weşandin bûn. Ji bilî hejmarên Nûbiharê, dema behsa serdema ku kovar hatiye weşandin hat kirin, pirtûka Cuma Çiçek a bi navê *Zimanek Çima Tê Qedexekirin? Polîtîkayên Zimanî û Rewşa Kurdî li Tirkiyeyê Ji Înkare Ber Bi Nasîne* û qanûnên ku di rojnameya fermî a Tirkiyeyê de (*Resmî Gazete*) hatine weşandin kêrî min hatin.

Di beşa duyem de qisma duyemîn a ku navê teza me ye û di Kovara Nûbiharê de behsa edebiyata zarokan dike jî ji senifandin û analîzê pêk tê. Ji bo vê qismê çavkaniya sereke a ku min xebitand Kovara Nûbiharê bi xwe ye. Hejmarên Nûbiharê yên di navbera 1 û 112an ji bo senifandin û analîzê kêrî min hatin. Ji bilî hejmarên

Nûbiharê teza Ali Gurbetođlu a doktorayê ya bi navê *II. Meşrutiyet Döneminde Yayınlanan Çocuk Dergilerinin Eğitim Açısından İncelenmesi (1908-1918)* a tirkî, dîsa pirtûka Alemdar Yalçın û Gıyasettin Aytaş a bi navê *Çocuk Edebiyatı* jî alîkariya min kir ku ez vê beşê binîvîsim.



## BEŞA YEKEM

### ZAROK, ZAROKATÎ, EDEBIYATA ZAROKAN

#### 1.1. Zarok

Zarok di civakekê de kesî/a gelek girîng e. Lewra ew toximê gelan, civakan, nijadan û dahatûya welatan in. Bi saya zarokan miletek hebûn û berdewamiya xwe diparêze. Di zewacekê de jî zarok şahiya malbatan û fêkiyên malan in<sup>1</sup>. Di zimanê kurdî de ji bo ku qîmeta zarokan bê nîşandan gotineke pêşiyar heye ku dibêje “Zarok xemla malan in”.<sup>2</sup> Mala ku tê de zarok hebin şên û dewlemend e, tê gotin ku “Mala zarok lê de, şeytan naçe tê de.”<sup>3</sup> Bi saya zarokên baş hatine perwerdekirin dahatûya miletan baş dibe û civak pêş ve diçin. Di hin civakan de her çiqas zarok têra xwe neyên hezkirin û piştgiriya wan neyê kirin jî, gelemperî civak qîmeteke mezin didin zarokan.

Nexwe zarok evqas biqîmet e û tê hezkirin gelo zarok kî ye? Ji kê re dibêjin zarok? Bi rastî ji bo vê têgehê pênaseyeke hevpar tune. Lewra ev têgeh di qada derûnnasî, civaknasî, perwerde, hiqûq û yê din de li gor nêrîn û armanca ji hev cudatir tê terîfkirin. Pisporek, zanist, derûnnas, pedagoq, civaknas û kesên din li gor erdnîgariyê, civakê, dîn, edet û demê vê tegehê ji hev cudatir didin terîf dikin.

Dema em ji bo peyva zarokê li ferhenga tirkî dinihêrin ev têgeh wiha tê terîfkirin: “a. Qîz an jî kurê ku temenê wan biçûk; b. Ji hêla nijadê ve ewladê kur, an jî qîz; c. Kur, an jî qîza ku di heyama geşadanê ya di navbera pitikî û balixbûnê/xamabûnê de.”<sup>4</sup> Li gor ferhenga Cambridgê jî zarok kesî ciwan ê ku hê mezin nebûye re tê gotin.<sup>5</sup>

Dilek Tufekçi Çan dema behsa têgeha zarokê dike dibêje ku di der barê zarok û zarokatîyê de gelek nêrîn û fikrên cuda hene. Çan destnîşan dike ku her çiqas li ser van têgehan terîfeke standart tunebe jî, ew dixwaze vê têgehê wiha bide nasîn:

<sup>1</sup> Abdulkadir Bingöl, *Gotinên Peşiyar û Biwêj Deyimler ve Atasözleri*, Weşanên Na, Çapa Nû, İzmir, Gulan 2014, r. 338

<sup>2</sup> Mehmet Öncü, *Gotinên Peşiyar*, Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, Adar, 2009, r. 691

<sup>3</sup> Hawar, *Proverbs*, Weşanên Nûdem, Cild 2, Sal. 10, j. 46, 10 Tîrmeh 1942, Stockholm, 1998, r. 1042

<sup>4</sup> *Türkçe Sözlük*, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara, 2011, r. 556

<sup>5</sup> <http://dictionary.cambridge.org/dictionary/english/magazine> 16.02.2016/17.48

“Zarok ew kes e ku ji du saliya xwe (temambûna derguşiyê) heta 15 saliya xwe (dema kamilbûnê) ji hêla fizîkî, derûnî, civakî ve di navbera van herdu heyaman de mezin dibe û di civakê de hewl dide ku bibe şexsek.”<sup>6</sup>

Çan her çiqas heta 15 salî şexsan wek zarok qebûl bike jî, hin pênasayên din dibêjin 15 sal hindik e û ji kesên ku 15 salan mezintir re jî dibêjin zarok. Mînak li gor Peymana Mafên Zarokan a Navneteweyî ya Neteweyên Yekbûyî (NY) her çiqas kesek zû kamil bibe jî, heta ku 18 salên xwe tije neke ew wek zarok tê hesabandin û ji wî kesî re dibêjin zarok.<sup>7</sup>

Alemdar Yalçın û Gıyasettin Aytaş ên ku li ser mijara zarok û edebiyata zarokan xebat kirine jî dibêjin ku têgeha zarokê ji hela gelek kesan ve wiha hatiye terîfkirin: “a) Ji derguşa însanan ên ku ji du saliya xwe, heta kamilbûna xwe dijîn re dibêjin zarok ; b) kur yan jî qîza ku hê balix an xama nebûye.”<sup>8</sup>

Peyva zarokê di ferhenga îngilizî Oxfordê de jî wiha tê terîfkirin: “Keçik an jî kurikê ciwan yê/ya ku hê mezin nebûye.”<sup>9</sup>

Wek ku tê dîtin ji bo têgeha zarokê pênasayên ji hev cudatir hene. Ne tenê ji bo têgeha zarokê, ji bo peyva zarokê jî cudahiyek heye. Di hin civakan de ji bo zarokan bi tenê peyvek tê bikaranîn, lê di hin civakan de jî gelek peyv an jî navên ji hev cudatir ji bo zarokan tên gotin. Di zimanê kurdî de ji bo zarokan hema bibêje ji dehî zêdetir gotinên cuda hene. Ji wan hinek bi kurdî ne, hinek jî ji zimanên din derbasî kurdî bûne. Ramazan Pertev balê dikşîne li ser vê mijarê û wiha dibêje: “Di zimanê kurdî de bo salên heta dozdeh û sêzdeh navên wekî zarok, zaro, zarî, gede, gedek, sêlek, sêwlek, doman, qeçek, sebî, mindal, eyal, tifal, biçûk, piçûk, weled û h.w.d. têne bikaranîn.”<sup>10</sup>

<sup>6</sup> Dilek Tüfekçi Can, *Çocuk Edebiyatı: Kuramsal Yaklaşım*, Eğitim Yayınevi, Konya, Haziran 2014, r. 1

<sup>7</sup> “Birleşmiş Milletler Çocuk haklarına Dair Sözleşme” r. 15, Bnr. [http://www.kdkcocuk.gov.tr/contents/files/YasalDuzenlemeler/BM\\_cocuk\\_Haklari\\_Sozlesmesi-Turkiye\\_Ilerleme\\_Raporu\\_\(2.\\_ve\\_3.\\_Donem\).pdf](http://www.kdkcocuk.gov.tr/contents/files/YasalDuzenlemeler/BM_cocuk_Haklari_Sozlesmesi-Turkiye_Ilerleme_Raporu_(2._ve_3._Donem).pdf) 17.12.2015 / 15:49

<sup>8</sup> Alemdar Yalçın- Gıyasettin Aytaş, *Çocuk Edebiyatı*, Akçağ Yayınları, Ankara, 2014, r. 13

<sup>9</sup> *Oxford Wordpower Dictionary For Learners of English*, Oxford University Press, Edited by Miranda Steel, 2000, New York, r. 111

<sup>10</sup> Ramazan Pertev, *Zarok û Çîrok Destpêka Pedagojiya Kurdî*, Doz, Stenbol, 2009, r. 21.

Di gotinên pêşiyên ên kurdî de jî ji bo zarokan gelek tişt hatine gotin. Mesela malbat her çiqas feqîr û belengaz bin jî dema bi zarokên xwe re şa dibin ev rewşa wan a nebaş jî bîra wan diçe. Lewra bi zarokan re lîstin û bi wan re mijûlbûn malbatê kêfxweş dike. Ev kêfxweşî û bextewarî jî bêşik li ser jiyana wan tesîreke erênî dike.

Gotineke pêşiyên a kurdî dibêje “Zarok di nav dê û bavan de sixta zêrîn e.”<sup>11</sup> Dîsa gotineke pêşiyên a din jî dibêje ku “Zarok nava jin û mêr e.”<sup>12</sup> Yanê ev gotin nîşan didin ku zarok di navbera dê û bavan de rehek in û wan bi hev ve girê didin. Ji xwe malbat jî bi van şax û têkiliyan ve dibin malbat û bingeha civakan.

Mitesewwifê navdar Mewlana Celaleddînê Rumî jî der barê zarokan de çend gotin gotine; “Zarok raza (sir) bavê xwe ye...Zarok bi lîstikê ve biaqil dibe, dilîze, dilîze û dibe xwedî aqilekî.”<sup>13</sup>

Wek ku tê dîtîn li gor kesan terîfa têgeha zarokê diguhere, lê ez jî wek pênaseya Dilek Tufekçi Çanê difikirim. Ji wan kesên ku temenê wan di navbera du û panzdeh salan de ne re mirov dikare bibêje zarok û heyama zarokatiyê jî di jiyana însanan de heyameke gelekî girîng e, heta dawiya emrê însanan tesîrê li ser kesayetiya mirov dike.

Ji ber ku him terîfa têgeha zarokê û him jî navê peyva zarokê ewqas cuda ne, mirov dikare bibêje ku terîfeke standart ji bo têgeha “zarok”ê tuneye. Lê tiştê hevpar ew e ku hemû jî li ser heyama “destpêk û xilasbûna zarokatiyê” disekin. Hemû jî hewl didin bibêjin ku destpêk û heyamake xilasbûnê ya zarokatiyê heye. Zarok jî ew kesa/ê ku di navbera vê demê de dijî re tê gotin.

Ev hemû agahî nîşan didin ku zarok kesên pir girîng in, wek toximekî ne. Heke ev toxim, baş bîr reşandin û baş lê bê mêzekirin, ew wek dareke fêkiyê mezin dibin û şaxên xwe fireh dikin. Fêkiyên wê jî ji bo cihanê dibin sedema bextewariyê.

Divê zarok ji bilî xwedîkirina fizîkî, ji hêla derûniyê ve jî bîr têrkirin. Yanê mezin divê wan hêz bikin û çawa ku rêzê ji hevdu re nîşan didin, divê ji zarokan re jî rêzê nîşan bidin. Dema zarok di karekê de serkeftî dibin divê bîr pîrozkirin, têk biçin

---

<sup>11</sup> Öncü, *Gotinên Peşiyên*, r. 691

<sup>12</sup> H. r.

<sup>13</sup> Şaban Karaköse, *Konularına Göre Derlenmiş Mevlana'dan Düşündürülen Sözler*, Yakamoz Yayıncılık, Temmuz 2007, İstanbul, r. 113



jî divê neyên şermezarkirin. Dîsa divê guh li gotinên wan bê dayîn, fikr û ramanên wan biçûk neyên dîtin. Ev tişt ne zêde û ne jî kêr, divê wek mîzanê bi têra xwe bîn kirin ku dema ew mezin dibin bila bibin kesên ji xwebawer. Divê tu caran neyê jibîrkirin ku civak ji ferdan pêk tînin û heke ferdên civakan baş nebin, civak têk diçin.

## 1. 2. Zarokatî

Piştî terîfa têgeha zarokê hewce dike ku behsa têgeha zarokatiyê jî bê kirin. Zarokatî di jiyana mirovan de heyamek û pêvajoyek e. Ev heyam di navbera pitikî û xamabûnê (kamilbûn) de derbas dibe. Di vê heyamê de zarok bi xwe û der û dora xwe dihesin, haya wan ji jiyana çêdibe. Tiştên ku hîn dibin û perwerdeya ku hildidin ve êdî di civakê de cihê xwe digrin û ji bo dahatûyê xwe amade dikin.

Kesayetiya mirovan di vê pêvajoyê de hêdî hêdî geş dibe û hin tiştên wek ziman, exlaq, terbiye û edebê jî di vê heyamê de xwe didin der. Li gor norolog û psîkanalîstê navdar Sigmund Freud, tiştên ku di heyama zarokatiyê de diqewimin, paşê di jiyana mirovan de tesîreke girîng li ser hest û kesayetiya dikin.<sup>14</sup> Heke mirov zarokatiyek baş, têr û tije bijîn tesîreke baş, lê heke zarokatiye nebaş bijîn jî, tesîreke nebaş li ser kesayetiya mirov çêdibe. Heta wisa ku gelek tiştên ku di zarokatiyê de diqewimin tu caran nayên jibîrkirin.

Gelo zarokatî çi ye? Ji bo têgeha zarokatiyê nêrîn û pênaseyên cuda hene. Beriya ku behsa van terîfên cuda bîn kirin, divê bê destnîşan kirin ku bi gelemperî di terîfan de xala hevpar ew e ku destpêka vê heyamê ji sifirê (0) yanê jidayikbûnê dest pê dike.

*Ferhenga tirkî* ji bo “zarokatiyê” wiha dibêje: “a. Rewşa zarokbûnê; b. Heyama jiyana mirovan a di navbera pitikî û kamilbûnê; c. tevgera zarokî.”<sup>15</sup>

Li gor Fona Alîkariya Acil a Zarokan a Navneteweyî ya Neteweyên Yekbûyî (UNICEF) jî zarokatî (childhood) heyameke pir girîng e. Bi tenê ne heyama ji dayikbûnê, heta heyama kamilbûnê ye. Divê zarok di vê heyamê de di dibistanê de

<sup>14</sup> Olivier Houdé, *Çocuk Psikolojisi*, Dost Kitabevi, Mayıs 2006 Ankara, r. 10

<sup>15</sup> *Türkçe Sözlük*, r. 557

perwerdeyê bibînin, li wir bileyîzin, bèn hezkirin û malbatên wan jî piştgiriya wan bike ku ew bixwebawer di civakê de cihê xwe bigrin.<sup>16</sup>

Çan balê dikşîne li ser girîngiya heyama zarokatiyê û dibêje ku ev heyam piştî pitikiyê dest pê dike û heta 12 an jî 13 salî dewam dike. Paşê zarokatiyê wiha terîf dike: “Zarokatî pêvajoyek e ku şexsek ji hêla agahî, hest, ziman, civakî û çandî ve di wê pêvajoyê de mezin dibe.”<sup>17</sup>

*Ansîklopediya Britannicayê* li gor pênaseyên din destpêka zarokatiyê cuda dide destpêkirin û zarokatiyê (childhood) wiha terîf dike: “Zarokatî di temenê mirovan de ew heyam e ku di navbera pitikî û kamîlbûnê de derbas dibe, ji 1 an jî 2 salî dest pê dike û heta 12 an jî 13 salî dewam dike.”<sup>18</sup>

Dîrokzanê frensî Philippe Ariès ji ber ku heta sedsala 13emîn wêneyên zarokan di berheman de qet nehatine xêzkirin, dibêje ku di heyama navîn de zarok hebûn, lê fikra zarokatiyê tunebû. Ariès destnîşan dike ku ancax di sedsala 13emîn de zarokatî hatiye kifşkirin û paşê ev pêşveçûn di sedsala 15emîn û 16emîn de zêdetir xurt bûye.<sup>19</sup>

Necdet Neydim jî ji bo zarokatiyê dibêje ku ev têgeh bi heyama ronesansê ve dest pê dike û wiha behsa vê heyamê dike:

“...Di heyama navîn de zarok û mezinan heman listik dileyîstin, bi heman pêlîstokan ve şa dibûn û heman çîrok guhdar dikirin. Lê bi heyama pişesazîbûn (sanayî) û ronahîbûnê ve di navbera zarok û mezinan de ferqek çebû. Bi îcada matbaayê û pêşveçûna xwendinê ve zarok ketin nav heyameke cuda. Matbaa bû sedem ku mezinahî girîng bibe. Ji bo zarok jî bikevin alema mezinan û çanda xwendinê hîn bibin, hewcedarî bi demekê hebû. Waye ji vê demê re jî gotin zarokatî.”<sup>20</sup>

Wek ku tê dîtin ji bo têngaha zarokatiyê jî terîfeke hevpar tune. Tişta hevpar ew e ku zarokatî ji pitikiyê dest pê dike û bi kamîlbûnê ve diqede. Lê, temenê kamîlbûn

<sup>16</sup> <https://www.unicef.org/sowc05/english/childhooddefined.html> 19.12.2015 /13:05

<sup>17</sup> Tüfekçi Can, *Çocuk Edebiyatı: Kuramsal Yaklaşım*, r. 2

<sup>18</sup> <https://www.britannica.com/search?query=childhood> 19.12.2015 /21: 23

<sup>19</sup> Philippe Ariès, *Centuries of Childhood-A Social History of Family Life*, Çev. Robert Baldick, New York: Alfred A. Knopf, 1962, r. 33-47 Vgz. Kemal İnal, *Çocuk ve Demokrasi*, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2014, r. 79

<sup>20</sup> Necdet Neydim, *İnceleme-Araştırma-Eleştiri-Çocuk Edebiyatı*, Bu Yayınevi, İstanbul, 2003, r. 74-75

û balixbûnê jî li gor welatan, civakan, erdnîgariyê, demê, zayendê, hewayê, dîn, edet û gelek tiştên din diguhere.

Ji van hemû agahiyan mirov fêhm dike ku zarokatî heyameke pir girîng e û gelek tişt di vê heyamê de pêk tên. Pedagog Haluk Yavuzerê ku li ser psîkolojiyê û zarokan gelek xebat kiriye jî balê dikêşîne li ser heyama zarokatiyê û dibêje ku bingeha kesayetiya mirovan di vê heyamê de tê avêtin. Yavuzer dibêje heke zarokak di vê heyamê de di nav rewşeke hezkirinê, eleqe û pêbawerî hebe de mezin bibe, ixtimaleke xurt dema ew zarok mezin bibe, ewê bibe mirovekî serkeftî.<sup>21</sup>

Ji ber ku heyama zarokatiyê pir girîng e, malbat û civak her tim dixwazin zarokan li gor xwe perwerde bikin, fikr û ramanan bi wan bidin zanîn û tesîrê li ser wan bikin. Helbet ev daxwaz normal e, lê divê sînoreke vê jî hebe. Divê mezin bizanibin ku her çiqas ew zarokan li gor dilê xwe mezin bikin jî, nikarin ji sedî sed bibin xwediyê zarokan. Yanê mezin nikarin hemû tiştên ku difikirin û dixwazin bi wan bidin qebûlkirin. Lewra zarok jî xwedî şexsiyetekî ne û divê rêz li wan bê nîşandan. Em ê bi helbesteke nivîskarê lubnanî Xelîl Cibran (1883-1931) ya der barê zarokan de vê beşê biqedînin.

“Zarokên we, ne zarokên we ne.

Ew ew qîz û kur in ku jiyan wan ji bo xwe dixwaze.

Ew ne ji we ne, tenê bi saya we hatine dinyayê.

Her çiqas bi we re bin jî, ne yên we ne.

Hûn dikarin wan hez bikin, lê hûn nikarin fikrên xwe bidin wan.

Lewra ew xwedî fikrên xwe ne.

Hûn dikarin bedena wan bisitirînin, lê rihê wan na.

Çimkî rih li wê pêşerojê dijîn ku hûn nikarin di xewnên xwe de jî biçinê.

Hûn dikarin bişibin wan, lê hûn nikarin wan bikin wek xwe.

Lewra jiyan paşve naçe û di cihê xwe de nasekine, diherike.

Hûn kevan in, zarokên we jî tîrên zindî ne ku hûn diavêjin pêşerojê.

---

<sup>21</sup> Haluk Yavuzer, *Çocuk Psikolojisi*, Remzi Yayınevi, 18. Basım, İstanbul, 1999, r.11

Tîravêj hedefa li ser rêya bêsinoriyê dibîne û bi wê hêza xwe ya mezin ve kevanê xwar dike û hewl dide ku tîr here dûrê.

Li ber tîravêj bişanazî serê xwe bitewînin, lewra qasî ku ew tîra diçe dûr hez dike, ew wê kevana pêhej jî hez dike.”<sup>22</sup>

### 1.3. Edebiyata Zarokan

Li ser rûyê erdê dema însanan xwestine ku tiştêkî bibêjin, devkî an jî nivîskî fikr û hestên xwe anîne zimên. Ji van tiştan hinek ji ber ku li gor hunerekî hatine gotin an jî nivîsandin ew wek edebiyat hatine qebûl kirin. Bêşik her gotin û nivîs ne edebiyat e. Edebiyat hunerek e ku mirov hemû bihîstin, kirin û fikrên xwe bi awayekî dewlemend û bitesîr di hemû heyaman de bi vê hunerê ve tînin zimên.”<sup>23</sup> Mustafa Ayyıldız destnîşan dike ku peyva edebiyatê di zimanê frensî de wek “literatûre” tê bikaranîn û vê têgehê wiha têrîf dike; “Edebiyat hestan, fikran, xiyalan, tesewwiran, û çavdêriyan bi awayekî estetîk û hezzê derxistina holê ye û wan bi şewazeke xweş û bitesîr vegotin e.”<sup>24</sup>

Piştî pênaseya peyva edebiyatê mirov dikare bibêje ku edebiyata zarokan jî di nav edebiyatê de beşeke girîng e. Yalçın û Aytaş têgeha edebiyata zarokan wiha pênase dikin: “Ji hemû tiştên devkî an jî nivîskî, yên ku xîtabê mezinbûnê, geşedanê, xeyalan, hestan, fikr, qabiliyet û zewqa zarokan dikin, him wan perwerde dikin û him jî wan kêfxweş dikin re dibêjin edebiyata zarokan.”<sup>25</sup>

Li gor Sedat Sever jî edebiyata zarokan, bi gelemperî navê wan berhemana e ku ji heyama zarokatiya ewil bigre, heyama kamilbûnê jî di nav de, di vê beşa jiyanê de zimanê zarokan pêş ve dibe. Ev berhem li gor asta têgeha zarokan bi ziman û tiştên dîtbarî yên hunerî ve alema fikr û hestên zarokan dewlemend dikin, asta wan a ecibandinê bilind dikin, a ji van berhemana re dibêjin edebiyata zarokan.”<sup>26</sup>

A. Ferhan Oguzkan destnîşan dike ku hemû berhemên devkî an nivîskî, yên ji bo hest û fikrên zarokan bi tesîr û rind hatine nivîsandin edebiyata zarokan tînin

<sup>22</sup> Halil Cibran, *Ermîş*, Kaknüs Yayınları, İstanbul, 2008, r. 33

<sup>23</sup> Cahit Kavcar, *Edebiyat ve Eğitim*, Engin Yayınevi, Ankara, 1999, r. 4

<sup>24</sup> Mustafa Ayyıldız - Hamdi Birgören, *Edebiyat Bilgi ve Teorileri*, Akçağ Yayınları, Ankara, 2005, r. 43

<sup>25</sup> Yalçın- Aytaş, *Çocuk Edebiyatı*, r. 17

<sup>26</sup> Sedat Sever, *Çocuk ve Edebiyat*, Tudem Yayınları, Ankara, 2015, r.17

hesibandin û vê têgehê wiha pênase dike: “Edebiyata zarokan navê berhemên giştî yên ku xwedî wesfên hunereke bilind in û ji hêla nivîskarên hoste ve bi taybetî ji bo zarokan hatine nivîsandin.”<sup>27</sup>

Edebiyata zarokan û xebatên li ser vê di dîrokê de gelekî dereng dest pê kirine. Der barê vê de her tim nîqaş hatine kirin. Ji ber ku alema zarokan wek alemeke cuda nehatiye qebûlkin. Zarok di *Serdama Navîn* de wek minyaturên mezinan dihatin hesibandin, wek kesên ku wê sibê du sibe di demeke nêz de mezin bibin, an jî wek kesên ji ber gunehê dayik û bavên hatine dinyayê dihatin qebûlkin.<sup>28</sup>

Di civaka yewnan, alman, îngiliz û fransiyan de ji ber ku zarokatî heyameke cuda û taybet nehatiye qebûlkin, ji bo binavkirina wan jî peyvên cuda nehatine avakirin û bikaranîn.<sup>29</sup> Bi sedsalan hewce nehatiye dîtin ku ji bo zarokan edebiyateke xweser û cuda bê avakirin. Zêdetir tiştên devkî wek çîrok, lorik, fabl, metelok û h.w.d. ji bo wan hatine gotin. Dema ji bo mezinan rojname, kovar, pirtûk an jî berhemên din dihatin nivîsandin, di nav wan de çend rûpel ji bo zarokan dihatin amedekirin. Gelemperî di van rûpelan de ji bo zarokan çîrok, fabl, metelok û tiştên wek van dihatin nivîsandin. Lê pê de, pê de ev wek nêrîneke xelet hat qebûlkin û ji bo zarokan jî edebiyateke taybet hat avakirin.

Piştî ku kifşên erdnîgariyê çêbûn, Ewropa dewlemend bû, kapîtalîzmê dest pê kir, mirovan ji gundan koçî bajaran kir, ronesans û reformê dest pê kir, felsefeya ronahîbûnê li ser civakê zêde bû<sup>30</sup> zarok ji kar û xebatê êdî çûn dibistanan û perwerde dîtin, êdî fikra zarokatiyê jî dest pê kir. Paşê ji bo wan hêdî hêdî berhem hatin amedekirin. Ji ber ku civak guherî, matbaa pêşve çû û jiyana civakî hinekî rehetir bû, qîmeta zarokan jî di civakê de her ku çû, zêde bû.

Necdet Neydim ji bo destpêka edebiyata zarokan û xebatên li ser vê mijarê dibêje ku heta sedsala 18emîn zarokan di edebiyatê de zêde cih nedigirtin, lê piştî vê sedsalê di qada edebiyatê de ew bûn kirde û wiha devam dike:

---

<sup>27</sup> A. Ferhan Oğuzkan, *Yerli ve Yabancı Yazarlardan Örneklerle Çocuk Edebiyatı*, Anı Yayıncılık, Ankara 2013, r. 3

<sup>28</sup> Kemal İnal, *Çocuk ve Demokrasi*, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2014, r. 75

<sup>29</sup> Füsün Alver, “Neil Postman’ın Çocukluğun Yok Oluş Sürecinde İletişim Teknolojisi Eleştirisinin Eleştirisi” *Ankara Üniversitesi İletişim Araştırmaları Dergisi*, j.2, 2004, r. 131

<sup>30</sup> İnal, *Çocuk ve Demokrasi*, r. 30

“Zaroka ku La Fontaine jî ew biçûk didît, êdî girîng dibe. Bi vî awayî temelên edebiyata ji bo zarokan jî tê avêtin. Ya rast di bingeha vê de nêrîneke dîdaktîk heye. Ji bo perwerdekirina zarokê êdî edebiyat jî wek amur tê bikaranîn. Dema em klasîkên ku nêrîna ronahiyê (ronesan) nîşan didin binêhêrin bi eşkere ev armanc tê dîtin.”<sup>31</sup>

Dema behsa edebiyata zarokan tê kirin, du tişt balê dikşînin. Ya ewil berhemên ku li rojavayê navdar in û li cihanê ji hêla gelek kesan ve tên zanîn, ji bo ku zarok jî sûdê ji wan werbigrin û bixwînin ji nû ve hatine nivîsandin. Yanê ji xwe tiştên ku hebûne ji bo zarokan car din bi zimanekî hêsantir hatine amadekirin. Ya duduyan jî, berhemên bi taybetî ji bo zarokan hatine nivîsandin derdikevin pêş. Yanî nivîskar û helbestvan bi armanca ji bo zarokan berheman bidin tişt nivîsandin e. Ev bi rastî jî piştî salên dûr û dirêj derdikeve holê.

Havise Çakmak Güleç û Hulusi Geçgel destnîşan dikin ku heta sedsala 16emîn ji bo zarokan tu pirtûkek nehatiye nivîsandin û wiha dibêjin:

“Heta sedsala 16emîn mirov rastî pirtûkeke ji bo zarokan hatiye nivîsandin nayê. Heta vê sedsalê zarok hewcedariya xwe ya edebiyatê bi berhemên edebiyata gel, an jî bi pirtûkên ku ji bo mezinan hatine nivîsandin ve pêk tînin. Berhema Johann Amos Comenius a bi navê “Orbis Pictus (Bi Dîmenan ve Dinya) ya ku di sala 1637an de hatiye weşandin wek pirtûka zarokan a biwêne ya ewil dikare bê qebûlîkirin.”<sup>32</sup>

Edebiyata zarokan cara ewil li Îngiltereyê hatiye rojevê. Dema behsa edebiyata zarokan tê kirin keşîş û kesên li der û dora dêrê û pişt re jî hin hîndekaran bertek nîşanî vê nêrînê dane. Lê paşê hêdî hêdî ev bertek kêmbûne û edebiyata zarokan heta roja me hatiye. Recep Nas dema behsa destpêka edebiyata zarokan dike wiha dibêje:

“Yên ku bertek nîşan didan, bertekê nîşanî xebatên xwendinê yên ji bilî dersan didan. Digotin ku çîrokên heywanan ên çêkirî, pirtûkên ku bi fantaziyan ve hatine tijekirin ji bo zarokan nebaş in. Ji ber van bertekan, pirtûkên zarokan ên ku ji hêla hunerê ve kêmbûn dihatin çapkirin. Di van pirtûkên zarokan de behsa efsaneyên çaxên berê, çîrokên serdema navîn û çîrokên periyên dihat kirin. Ji bo edebiyata zarokan bertekê jî ji edebiyatzanan hat. Li gor edebiyatzanan berhemeke edebiyatê ya ku li gor têgeha

<sup>31</sup> Neydim, *İnceleme-Araştırma-Eleştiri-Çocuk Edebiyatı*, r. 147-148

<sup>32</sup> Havise Çakmak Güleç- Hulusi Geçgel, *Çocuk Edebiyatı, Okul Öncesinde Edebiyat ve Kitap*, Kriter Yayınevi, İstanbul, Şubat 2012, r. 1

zarokan bê sînorkirin nabe. Lewra hin peyvên diyarkirî û sînorkirî di van berheman de tîn bikaranîn, ev jî bibe nebe ancax di bin edebiyatê de wê bibe vegotinek. Ev jî wê bibe perwerde.”<sup>33</sup>

Di sedsala 17emîn de mezin hêdî hêdî li ser vê mijarê disekinîn û ferq dikin ku divê ji bo zarokan jî tiştên taybet bînin nivîsandin û amadekirin. Lewra tê fêmkirin ku bi saya van berheman û xebatan zarok baştir perwerde dibin, hişê wan bêtir dixebite, xiyalên wan firehtir dibin. Ji bilî agahî û perwerde dayînê, bi saya edebiyatê zarok dema xwe bikêf û şahî derbas dikin. Yanê zarokên ku di Serdama Navîn de ji bo ku wan wek “zarok” binav bikin mezinan peyvek jî ji bo wan kifş nekiribûn<sup>34</sup> êdî biqîmet dibin. Mirov dikare bibêje ku bi qasî di nav heyameke 300 salî de edebiyata zarokan pêş ve çûye û bi saya teknoloji, înternet û komputerê hê jî pêş ve diçe.

Yalçın û Aytaş der barê pêşveçûna edebiyata zarokan de balê dikşînin li ser heyama piştî Şerê Cihanê ya Duyem û wiha dibêjin:

“Zêdebûna weşanan, çapkirin û belavkirina pirtûkên zarokan ên navneteweyî, pêşangehên pirtûkên zarokan ên ku li cihanê di welatên cuda de tîn lidarxistin, fuar û kongre nîşaneyên herî girîng ên vê mijarê ne. Cihê “Lijneya Pirtûkên ji bo Biçûkan a Navneteweyî” (International Board of Books for Young People: IBBY) jî girîng e. Lijneyê civîna xwe ya ewil di sala 1953an de kir. Wek konseyeke pirtûkên zarokan xebitî û li ku dera dinyayê dibe, bila bibe bal kişande li ser pirtûkên zarokan ên serkeftî.”<sup>35</sup>

Bi kurtasî dema em hemû pênaseyên edebiyata zarokan û nêrînen vê mijarê dinihêrin, edebiyata zarokan jî wek edebiyata mezinan dixwaze hest û fikran bi zimanekî xweş û bitesîr bîne ziman û van tiştan zarokan bide xwendin. Tiştên ku edebiyata zarokan ji edebiyata din cuda dike ew e ku hedef zarok in û qada wê bi zarokan ve hatiye sînorkirin. Tiştên din a girîng jî ewe ku edebiyata zarokan piştî salên dûr û dirêj dest pê kiriye.

---

<sup>33</sup> Recep Nas, *Örneklerle Çocuk Edebiyatı*, Ezgi Kitapevi, Bursa, 2014, r.33 vgz. Mustafa Ruhi Şirin, *Çocuk Edebiyatına Eleştirel Bir Bakış, Çocuk Edebiyatı Yıllığı*, Gökyüzü Yayınları, İstanbul, 1987, r. 47-48

<sup>34</sup> Tacettin Şimşek, *Kuramdan Uygulamaya Çocuk Edebiyatı El Kitabı*, Grafiker Yayınları, Haziran 2014, Ankara, r. 14

<sup>35</sup> Yalçın- Aytaş, *Çocuk Edebiyatı*, r. 14

### 1.3.1. Armanca Edebiyata Zarokan

Mirov dikare armancên sereke yê n edebiyata zarokan di çend xalan de destnîşan bike. Beriya her tiştî armanc ew e ku zarok kêfxweş bibin, bi saya edebiyatê dema wan baş derbas bibe. Lewra berhemên baş û biqalîte tesîreke erênî li ser wan dikin û dinyaya zarokan a hest û xiyalan dewlemendtir dibe.

Ji bilî vê mirov dikare bibêje ku edebiyata zarokan agahiyê dide zarokan, tiştan hîn wan dike, bi saya van agahiyên û perwerdeyê asoya wan fireh dibe. Zarokên ku asoya wan fireh dibin jî bi çavekî din li dinyayê û mirovan dinihêrin, tiştên nû kifş dikin.

Dema tu ji mezinan bipirsî ku wan di zarokatiya xwe de kîjan pirtûk, kovar û rojname xwendine jê gelekê wan wê zarokatiya xwe bînin ber çavên xwe û bêşik wê navê çend pirtûk, kovar an jî helbestên ku tesîr li ser wan kiriye bibêjin. Ev jî nîşan dide ku di heyama zarokatiyê de berhemên baş yê n ku hatine xwendin tesîrê li ser mirovan dike û ew zû bi zû nayên jibîrkirin.

Mübeccel Gönen tîne ziman ku edebiyat li gor zarokan pir girîng e û wiha behsa berhemeke biqalîte dike:

“Berhemeke edebiyatê ya baş bi çavên cuda li dinyayê nihêrandinê fêrî zarokan dike. Dibe sedem ku zarok di xiyalên xwe de herin zeman û mekanên cuda û jiyana wan dewlemendtir bibe. Tesîrê li ser hestên zarokan dike ku ew jiyanên ku di wê berhemê de hatiye avakirin, bijîn. Pireyek di navbera jiyana wan û jiyana kesên din de ava bibe. Zarok di van jiyanên ku di xiyalên xwe de ava dikin de hin çaran rastî serpêhatiyên, hin çaran rastî kelecana û hin çaran jî rastî tiştên zor û zehmet tîne. Ev rewşên cuda jî dibin sedem ku zarok li hember tiştên bizahmet serkeftî bibin, bi rêyên cuda ve hewl bidin ku pirsgerêkan çareser bikin, bi rêya empatiyê ve jiyanên din fêrî bikin, alîkariyê û hevkarîyê bikin.”<sup>36</sup>

Yek ji armanca edebiyata zarokan jî ew e ku xwendinê bi zarokan bide hezkirin ku dema mezin bûn, di navbera wan û xwendinê de pireyêke xurt ava bibe. Kesên ku di zarokatiya xwe de bi pirtûk, kovar an jî berhemên din re eleqedar dibin, gelemperî baş diaxivin, di nivîsê de ziman baş bi kar tînin, hest û fikrên xwe rehetir tînin

<sup>36</sup> Mübeccel Gönen, *Çocuk Edebiyatı*, Eğitici Kitap, Ankara 2013. r. 7



ziman. Lewra bingehke wan ji bo hevokan, peyvan û nivîsê heye û ew li ser vê bingehê mezin bûne. Ji ber vê jî ew ji dinyayê, hawîrdor, çand û hunerê agahdar in û qîmetê didin jiyanê û mirovan.

Wek ku me anî ziman armancên edebiyata zarokan gelek in û her nivîskar, helbestvan an jî romannûsek armancekî yan jî çend armancan bi hev re didin li pêş xwe û wisa ji bo zarokan tiştan dinivîsin. Tacettin Şimşek jî armanca edebiyata zarokan wiha rêz dike;

1. Pêşvebirina hesta xwebawerbûnê,
2. Pêkanîna hewl û daxwaza serkeftinê,
3. Avakirina hişmendiyê hesas a li hember mirovan û hawîrdor,
4. Têrkirina hewcedariya sosyalbûnê,
5. Zêdekirina daxwaza lîstik, şabûn û hînbûnê,
6. Balkişandina der barê bûyer û têgehên balkêş û tiştên cuda
7. Terkkirina hewcedariya hestên wek estetîk û rindbûnê yên derûnî,
8. Pêşvebirina zimanê zarokan,
9. Pêşvebirina hêza xiyalan û qabiliyeta fikrên afirîner,
10. Rênîşandana mijarên balkêş ên ji bo zarokên ku temenê wan cuda,
11. Avakirina bingeha pêşvebirinê ya hest û têgihîştina zarokan
12. Alîkariya pêşvebirinê ya geşedana zîhnî ya zarokê,
13. Alîkariya geşedanê ya ji bo kesayetiyê,
14. Hewldayina pirtûkê ji zarokê bide hezkirin û ji bo ku bide zanîn ku pirtûk ji bo kêfê, fêrbûnê û agahîdayînê alaveke pir girîng e,
15. Di pêş dibistanê de pêşvebirina qabiliyeta guhdarîkirin û tiştên ku hatiye guhdarkirinê fêmkirin, pêşvebirina wêne û xwendinê, di çaxê dibistanê de jî pêşvebirina qabiliyeta fêmkirinê a der barê fêmkirina wêne û xwendinê de,
16. Naskirina berhemên edebî û estetîk yên ku hesta estetîkê di zarokê de derdixe holê,
17. Têkîlavakirina zarokan û berheman ên wek helbest, çîrok, roman, fabl, romanên bixêz, pirtûkên zanistî û biyografî,

18. Haypêxistina zarokê ya der barê çand û agahiyên civaka ku tê de hatiye dinyayê û mezin bûye,

19. Agahdarkirin û sûdwergirtina der barê tecrubeyên mezinan ên zîhnî û hestî,

20. Avakirina daxwaza nivîs û vegotinê ya der barê tiştên tî fikrandin û hestkirin.<sup>37</sup>

### 1.3.2. Wesfên Edebiyata Zarokan

Zarok ji ber temenê xwe û derûniya xwe nikarin her tiştî bixwînin û guhdar bikin. Ji ber vê jî dema ji bo wan tiştek bê nivîsandin wek çîrok, fabl, helbest, mamik û h.w.d. an jî berhemek bê amadekirin divê ev tişt xwedî hin taybetmendiyên bin. Ji bo van taybetmendiyên helbet mirov dikare gelek tiştan binivîse, lê çend tiştên sereke û hevpar hene ku gelek kes li ser van wesfan wek hevdu difikirin. Mehmet Tok van taybetmendiyên wiha rêz dike;

“Di edebiyata zarokan de ewil ya ku divê bê zanîn têgeha ‘zarok’ê ye. Divê geşedana zarokan a temenê wan, ya bi zimanî, zîhnî, fizîkî û derûnî bê zanîn. Nivîskarê edebiyata zarokan beriya pîrsa ‘Divê ez çi binivîsim?’ divê bersiva pîrsa ‘divê ez çawa binivîsim?’ bide.

1. Eleqe û pêdiviya zarokan yê cuda divê bîna tespîtkirin û li gor vê berhem bîna dayîn.

2. Divê hezkirina jiyane, sirûştê, mirovahiyê, neteweyê, welat û malbatê ji bo zarokan bê dayîn.

3. Berhemên ku ji bo zarokan tîna nivîsandin divê ne bi tenê wesfên perwerdeyê û exlaqê ve tije bin. Ev peyama divê di nav cureyên edebî de bi rêyeke veşartî ya ne rasterast ji zarokan re bîna dayîn.

4. Berhemên ku hatine nivîsandin divê xwedî nirxê edebî bin û zarok hesta estetîkê û zewqê bijîn.

5. Di berhemên ku hatine nivîsandin de keşîfkirina jiyane û bi jiyana rojane re eleqe danîn ji bo geşedana zarokan girîng e.

6. Pêşveçûnên teknolojîk him wek mijar û him jî di hûndirê berhemê de divê xwe bide nîşandan.

7. Di cureyên edebî de mînakên serkeftî divê ji zarokan re bê pêşkeşkirin ku zarok zewqa edebî tîna bikin.

---

<sup>37</sup> Tacettin Şimşek, *Çocuk Edebiyatı*, Suna Yayınları, Konya, 2007, r. 31

8. Taybetiyên perwerdekirinê yê edebiyata zarokan divê bên lêkolînkirin û asoyên nû li ber wan bê vekirin.”<sup>38</sup>

Ev agahiyên ku hatin dayîn nîşan dide ku edebiyata zarokan ji bo geşedan û perwerdeya zarokan pir girîng e. Divê zarok têkiliyeke xurt bi edebiyatê ve ava bikin ku ew dahatûya wan ronî bike. Her çiqas tê gotin ku zarok bê edebiyat û bê xwendin nabin û divê nebin jî, hinek dibêjin ‘di nav demê de zarok dibe ku dev ji edebiyatê berdin’. A. Ferhan Oğuzkan, van îdiayan qebûl nake. Oğuzkan, dibêje ku li gor hin kesan pêşveçûnên endustrî û teknolojiyê dibe ku eleqeya zarokan a bi pirtûkan re kêmbike, lê ev bi giştî ne rast e. Lewra ji bo zarokeke/a ku mezin dibe û geşedana wê/wî devam dike ji bilî hewcedariyên siruştî, hewcedariyên derûnî jî hene. Ji ber vê jî ev îdia ne rast in.<sup>39</sup>

Oğuzkan dibêje ku Lenand Jacop bi şeş madeyan ve tîne ziman ku hewcedariya zarokan bi berhemên edebî hene û van madeyan wiha rêz dike;

1. Edebiyat tiştê e ku mirovan kêfxweş dike û wextê mirovan xweş derbas dike.
2. Edebiyat rihê mirovan zindî dike, hêza jiyînê zêdetir dike.
3. Edebiyat dibe alîkar ku mirov jiyanê keşif bike.
4. Edebiyat çavkaniyeke rêberiyê ye.
5. Edebiyat nêrîna mirov berfireh dike.
6. Meneya edebiyatê zimanekî xweş e.<sup>40</sup>

Dibe ku înternet an jî televizyon nahêle zarok wek berê zêde bi edebiyatê re eleqedar bibin û edebiyatê hez bikin. Lê wek ku Oğuzkan jî dibêje ji ber xulqiyeta însanan û hewcedariyên derûnî ne mumkun e ku zarok hema bi temamî dev ji edebiyatê berdin. Bi kurtasî mirov dikare bibêje ku barekî giran dikeve li ser milê malbatan, mamosteyan û mezinan ku edebiyatê bi zarokan bidin hezkirin, têkiliyeke xurt a bi edebiyatê û zarokan ava bikin û wan baş perwerde bikin.

7

<sup>38</sup> Mehmet Tok ,*Çocuk Edebiyatı ve Mevlana'nın Mesnevisi*, Kriter Yayınevi, İstanbul, 2012, r.

<sup>39</sup> Oğuzkan , *Yerli ve Yabancı Yazarlardan Örneklerle Çocuk Edebiyatı*, r. 5

<sup>40</sup> H.b., r. 6-7

### 1.3.3. Kurtenêrînek Li Dor Edebiyata Zarokan a Cîhanê

Edebiyata zarokan a devkî li hemû cihanê kêman jî zêde bi lorik, çîrok, tiştanok û tiştên wek van ên bidevkî ve hebûye, lê heta sedsala 17emîn ji bo zarokan tu tişt nehatiye nivîsandin. Nivîsandina pirtûkên zarokan piştî nêrîna ‘zaroka modern’ û ‘dibistanê’ dest pê dike.<sup>41</sup> Yanê dema ku êdî di civakê de zarok ne wek mezinan, bi rastî jî wek zarokan tînin hesabandin, li kargehan û malê ew ji bo kar nayên xebitandin û di dibistanan de dest bi perweyê dikin, peyva zarokatiyê û edebiyata zarokan jî derdikeve pêş. Piştî vê nêrînê ya ku bi ronensans û pêşveçûna matbaayê ve dest pê dike ji bo zarokan berhem tînin amadekirin. Edebiyata zarokan a nivîskî zêdetir di destpêka sedsala 17emîn de<sup>42</sup> li gelek welatan, bi taybetî jî li Ewropayê û Amerîkayê dest pê kiriye. Paşê her çûye geştir bûye û bi taybetî jî piştî Şerê Cihanê ya Duyemîn de gelek pêş de çûye.

Berhemên mezinan bi mijar, ziman û vegotina xwe ve ne li gor zarokan in. Lewra xiyal, hest û fikrên zarokan jî yê mezinan cudatir in. Lê ji ber ku bi sedsalan li cihanê ji bo zarokan tu tişt nehatiye nivîsandin, dema mezinan hewl dane ku zarokan perwerde bikin, wan fêrî tiştan bikin, an jî wan kêfxweş bikin ewil berhemên ku ji bo mezinan hatine nivîsandin bi zarokan dane xwendin. Wek mînak berhemên dînî, pirtûkên dîdaktîk, tiştên ku ji bo mezinan hatine nivîsandin bi zarokan dane jiberkirin. An jî dema zarok hînî xwendinê bûne, ji ber ku di destê wan de berhemên ku bi taybetî ji bo zarokan hatine nivîsandin tunebûne, hema kîjan berhem, rojname, kovar an jî tiştên nivîskî li ber wan ketiye zarokan dane destê xwe û ew xwendine.

Di serdema navînde zarok ji bo kar û bar jî hêla mezinan ve li kargehan, zeviyan û malê dihatin xebitandin. Li gor nêrîna xiristiyaniyê ew gunehkar dihatin hesabandin û tesîra dêrê li ser perwedeya zarokan zêde bû.<sup>43</sup> Zarok çaxê ku fêrî latînî dibûn, çîrokên ku di kitêba pîroz de cih digirtin hîn dibûn.<sup>44</sup> Dema mirov li Rojhilatê dinihêre, zarok kesên gunehkar ên ku divê bînin wawtîzkirin nayên hesabandin. Berevajî vê li gor dîne Îslamê ew emanet in, divê baş bînin xwedîkirin û

<sup>41</sup> Mustafa Ruhi Şirin, *Çocuk Edebiyatı Kültürü ‘Okuma Alışkanlığı ve Medya Sarmalı’*, Kök Yayıncılık, Ankara, 2007, r. 63

<sup>42</sup> Tüfekçi Çan, *Çocuk Edebiyatı: Kuramsal Yaklaşım*, r.6

<sup>43</sup> İnal, *Çocuk ve Demokrasi*, r. 28

<sup>44</sup> Yalçın- Aytaç, *b.n.*, r. 19

perwerdekirin. Ji hêla perwerdeyê ve heman tişt li Rojhilatê jî heye, ewil Qur'ana Pîroz, jiyana pêxemberan û metnên dînî fêrî wan hatiye kirin. Di civaka kurdan de jî dîsa heman tişt çêbûye. Li gundên ku dibistan tunebin Mela û şêxan hewl dane ku Qur'anê hînî zarokan bikin.<sup>45</sup>

Belavbûna matbaayê û çapxaneyan çawa ku tesîrek erênî li ser berhemên mezinan kiribe, heman tesîr li ser berhemên zarokan jî çêbûye. Piştî pêşveçûna çapxaneyan di edebiyata zarokan de derengmayîn hêdî hêdî ji holê radibe. Bi taybetî li Ewropayê û Amerîkayê ji bo ku edebiyata zarokan bê avakirin û berhemên dayîn hişmendiyek çêdibe û ev hişmendî paşê li hemû cihanê belav dibe. Dema ku em welatên Ewropayê û xebatên wan ên ji bo zarokan dinihêrin em dibînin ku zêdetir çîrokên gelerî hatine berhevkirin. Paşê ev çîrok ji nû ve li gor asta zarokan ji nû ve hatine amadekirin. Ya din jî hin nivîskaran xusûsî ji bo zarokan tişt nivîsandine.

### 1.3.3.1. Fransa

Li Fransayê li gor agahiyên berdest, edebiyata zarokan di sedsala 17emîn de dest pê dike. Helbestvan û nivîskarê frensî Charles Perrault (1628-1703) çîrokên gelerî yê di nav gel de hatine gotin berhev kirine û ew bi awayekî kin ji nû ve nivîsandine. Berhema Perrault ya bi navê “Contes de ma mère l'Oye” (Çîrokên Dayika Qaz) di sala 1697an de hatiye nivîsandin. Di vê berhemê de çîrokên gelêrî yê wek “Cendrillon” (Sîndrella), “Le Petit Chaperon rouge” (Keça Kumsor), “La Belle au bois dormant” (Rindika di Xew de), “Le Maître chat ou le Chat botté” (Pisîka Bigîzme) û h.w.d. hene.<sup>46</sup>

Nivîskar û Keşîş François Fenelon (1651-1715) ji bo ku zarokên serkirdeyan bî perwerdekirin, aqil û zanabûna wan derkeve pêş, bi navê “Les Aventures Telemaque” (Telemak) berhemek nivîsandiye. Ev jî di edebiyata zarokan a frensî de wek berhemek girîng tê qebûl kirin. Dîsa li Fransayê kesekî din yê bi navê La Fontaine (1621-1695) fablên çîrokbêjê yewnan Ezop bi navê “Fables d'Esop” (Fablên Ezopê) wergerandiye frensî. Ji bilî wergera frensî ya çîrokên Ezopê, La Fontaine bi xwe jî çîrokên heywanan (fabl) nivîsandine. Her çiqas hin kes dibêjin ev

<sup>45</sup> Thomas Bois, *The Kurds*, Translated from the French by Professor M.W.M. Welland, Khayat Book & Publishing Company S.A.L, Beirut, 1966, r.58

<sup>46</sup> Yalçın-Aytaş, *Çocuk Edebiyatı*, r. 22

fabl ji bo mezinan in jî, dema mirov li Fransayê behsa edebiyata zarokan dike divê mirov navê La Fontaine û fablên wî jî bike.

Nivîskarekî din ê ku divê behsa wî bê kirin jî Jules Verne (1828-1905) ye. Verne bi hêza xiyalên xwe ve zarokan dibe hîvê, di binê behrê de wan dibe û tîne û wan li hemû dinyayê digêrîne. Hin pirtûkên wî yê navdar ev in; “Voyage au centre de la Terre” (Seyahata Ber Bi Navenda Dinyayê), “De la Terre à la Lune” (Seyahata Ber Bi Hîvê Ve), “Les Enfants Du Capitaine Grant” (Zarokên Kaptan Grant), “Vinght mille lieues sousles mers” (Di Bin Behrê De Bîst Hezar Fersah), “Le tour du monde en quatre-vingts jours” (Di Heyştê Rojan De Gera Alemê).<sup>47</sup>

### 1.3.3.2. Îngiltere

Li Îngiltereyê ewil li hember edebiyata zarokan helwesteke neyênî çêdibe. Di sedsala 17emîn de zarokan herî zêde çîrokên Ezopê xwendine. Piştî vê heyamê nivîsên gerê (seyahat) yê ku meraqa zarokan xurt dikin, di nav berhemên ku bala zarokan dikşînin de cihê xwe digrin.<sup>48</sup> Di sedsala 18emîn de li Îngiltereyê ji bo ku edebiyatek xurt ji bo zarokan bê avakirin, dest bi nivîsandina pirtûkan tê kirin. Navê nivîskar John Newbery (1713-1767) mirov dikare wek navekî sereke bide. Lewra wî ji bo zarokan gelek stran û zûgotinok nivîsandine û pirtûkeke bi navê “Mother Goose’s Melody” (Strana Dayika Qaz) çap kiriye. Dîsa pirtûka bi navê “Goody Two Shoes” (Goodya Bi Cotpêlav) jî pirtûkeke wî ya din e.<sup>49</sup>

Li Îngiltereyê berhema Daniel Defoe ya bi navê “Robinson Crusoe” (Robînsan Crusoe) ya ku di 1719an de nivîsandiye, berhema Jonathan Swift ya bi navê “Gulliver’s Travel” (Seyahatên Gullîver) ya ku di 1726an de nivîsandiye, pirtûka Charles Dickens ya bi navê “David Coperfield” (Davîd Coperfield) ya ku di 1850an de nivîsandiye, berhema Lewis Carrol a bi navê “Alice’s Adventures In Wonderland” (Alîs li Diyarên Nedîtî) ya ku di 1865an de nivîsandiye ji bo zarokan bûne berhemên girîng.

<sup>47</sup> Şimşek, *Çocuk Edebiyatı*, r. 197

<sup>48</sup> Yalçın-Aytaş, *Çocuk Edebiyatı*, r. 20, vgz. İnci Enginün, “*Çocuk Edebiyatına Toplu Bakış*”, *Çocuk Edebiyatı Yıllığı*, Gökyüzü Yayınları, İstanbul, 1987, r. 37-46

<sup>49</sup> H.b, r. 197-198

### 1.3.3.3 Almanya

Du birayên alman Jacob Grim (1785-1863) û Wilhelm Grim (1786-1859) li Almanyayê gund bi gund geriyane û gelek çîrok berhev kirine. Herdu birayan pişt re ev çîrok ji nû ve nivîsandine. Ev çîrokên wan hê jî li hemû cihanê di nav zarokan de çîrokên bi nav û deng in; “Rapunzel” (Rapunzel), “Hänsel und Grethel” (Hansel û Grethel), “Rotkäppchen und der Wolf” (Keçika Kumsor), “Dornröschen” (Rindika Razayî) û h.w.d.<sup>50</sup>

Dîsa nivîskar Cristophe Von Schmid (1768-1854) jî ji bo zarokan pirtûkên ku behsa nîrxên xiristiyaniyê dike, dîroka Încîlê, pirtûka bi navê “Das Blumenkörnchen” (Selika Kulîlkan) û hin çîrokên din nivîsandine. Ji ber ku çîrokên wî pir navdar bûne, paşê li gelek zimanan hatiye wergerandin.<sup>51</sup>

### 1. 3.3.4. Welatên Îskandînavyayê

Dema mirov li welatên Îskandînavyayê dinihêre tê dîtîn ku di qada edebiyata zarokan de berhem nivîsandin piranî di salên 1800î de dest pê kirine. Piştî vê hêdî hêdî ji bo zarokan xebat hatine kirin.

Li Swêdê berhema nivîskara jin Selma Lagerlöf (1858-1940) a bi navê “Nils Holgerssons underbara resa genom Sverige” (Serpêhatiyên Nûwaze yên Nils Holgerssons), di qada edebiyata zarokan de berhemek bi nav û deng e û ew paşê ji bo zarokan wek filma karton jî hatiye çêkirin û di televîzyonan de hatiye weşandin. Nivîskareke din a jin Laura Matilda Bernhardina Fitinghoffê (1848-1908) jî bi navê “Barnen ifrån Frostmofjället” (Zarokên Zozanan) romanek ji bo zarokan nivîsandiye.

Li Danîmarkayê çîrokên Hans Cristian Andersen (1805-1875) yên wek “Kejserens nye Klæder” (Qralê Tazî), “Den Lille Pige med Svovlstikkerne” (Keçika Kibrîtfiroş), “Den grimme ælling” (Cûcika Nerind a Werdekan) di edebiyata zarokan de xwedî cihekî taybet in.

Li Norwêcê di qada edebiyata zarokan de nivîskarên pir navdar derneketine. Ji sala 1830an pê ve ji bo zarokan berhem hatine nivîsandin. Ji van kesan yên herî

<sup>50</sup> [https://tr.wikipedia.org/wiki/Grimm\\_Karde%C5%9Fler](https://tr.wikipedia.org/wiki/Grimm_Karde%C5%9Fler) 09.03.2016/ 14.30

<sup>51</sup> [https://en.wikipedia.org/wiki/Christoph\\_von\\_Schmid](https://en.wikipedia.org/wiki/Christoph_von_Schmid) 11.03.2016/14.05

girişin en berhem dane Peter Christen Asbjornsen (1812-1882) û Jorgen Moe (1813-1885) ne. Herduyan jî çîrokên geleri berhev kirine û ev çîrok bi navê “Norske Folkeeventyr” (Çîrokên Gelêrî yê Norwêcê) hatine weşandin.<sup>52</sup> Çîroka Peter Christen Asbjornsen a bi navê “Østenfor sol og vestenfor måne” (Rojhilatê Tavê û Rojavayê Hivê) jî navdar e.

### 1.3.3.5. Amerîka

Li Amerîkayê piştî ku şerê navxweyî (1861-1865) qediya ji ber tesîra dînî di edebiyata zarokan de heyameke rawestiyayî çêbû. Lê ji ber ku li Ewropayê guherîn û pêşveçûn çêbûn, li Amerîkayê vê bêdengiyê zêde nekişand. Piştî demeke kin li wir jî xebatan dest pê kir.

Aytaş û Yalçın der barê edebiyata zarokan a Amerîkayê de wiha dibêjin: “Di dawiya sedsala 19emîn û serê sedsala 20emîn de di qada edebiyata zarokan de li Amerîkayê gaveke mezin hat avêtin. Bi vê gavê ve berhemên di edebiyata zarokan de wek klasik tîn qebûl kirin di hemû cihanê de belav bûn.”<sup>53</sup>

Di edebiyata zarokan a Amerîkayê de nivîskarên jin balê dikşînin. Nivîskara jin Louisa May Alcott (1832-188) bi navê “Little Women- Meg, Jo, Beth and Amy” (Jinên Biçûk) di sala 1868an de romanek nivîsandiye. Masha Kabakow Rudwan dibêje ev pirtûk wek ji bo keçikan hatiye nivîsandin tê qebûl kirin, lê di pêşerojê de ev nêrîn dibe ku ji holê rabe û kur jî bi kêf vê pirtûkê bixwînin.<sup>54</sup> Ev roman pişt re ji ber ku zêde bi nav û deng dibe di nav demê de wek film, opera, muzîkal û lîstika şanoyê jî hatiye amadekirin.

Dîsa nivîskarên jin Lucy Sprague Mitchell (1878-1967) pirtûkeke bi navê “The Here and Now Story Book” (Li Vir û Niha Pirtûkeke Çîrokan), Frances Hodgson Burnett (1849-1924) pirtûkeke bi navê Little Lord Fauntleroy (Lordê Biçûk Fauntleroy), Eleanor Emily Hodgman Porter (1868-1920) romaneke bi navê “Pollyanna” ji bo zarokan nivîsandine. Nivîskar Mark Twain jî di sala 1876an de

<sup>52</sup> <http://eflatuncocuk.blogspot.com.tr/p/5-dunya-cocuk-edebiyat-tarihi.html> 09.03.2016/ 21.30

<sup>53</sup> Aytaş- Yalçın, *Çocuk Edebiyatı*, r. 21

<sup>54</sup> Masha Kabakow Rudman, *Children's Literature An Issues Approach*, Longman, NY, 1995, r.185



romanek bi navê “The Adventures of Tom Sawyer” (Serpêhatiyên Tom Sawyer) nivîsandiye.

### 1.3.3.6. Îtalya

Li Îtalyayê jî nivîskarên ku ji bo zarokan behrem dane û berhemên wan li cihanê bi gelek zimanan hatine wergerandin hene. Bo numune Edmondo De Amicis (1846-1908) pirtûkekek bi navê “Cuore” (Dilê Zarok) nivîsandiye û behsa zarokekî ku di pola 3emîn de xwendekar e û serpêhatiyên wî yê li dibistanê dike. Dîsa nivîskarê îtalyanî Carlo Lorenzini (1826-1890) jî bi navê “Le avventure di Pinocchio” (Pînokyo) pirtûkek nivîsandiye. Pînokyo ji ber ku pir binav û deng bûye, paşê li cihanê wek karton û film jî hatiye amadekirin. Di van salên dawîn de wergera Pînokyo ya bi kurdî jî hatiye kirin.<sup>55</sup>

### 1.3.3.7. Rûsya

Li Rûsyayê jî hin nivîskaran ji bo zarokan helbest, çîrok û fabl nivîsandine. Mînak Aleksandr Puşkin di sala 1833an de bi navê “Сказка О Рыбаке И Рыбке” (Masîgir û Masiyê Zêrîn) helbestek ji bo zarokan nivîsandiye û ev helbest yekem car di sala 1835an de di kovara “Bîbloteka”yê de hatiye weşandin.<sup>56</sup> Casimê Celîl ev helbest wergerandiye kurdî û Ordîxan Celîl jî ev helbest di sala 1955an de di radyoyê de kurdî xwendiyê.<sup>57</sup>

Nivîskar Lev Tolstoy (1828-1910) jî ji bo zarokan hin çîrok û fablên wek “утка и месяц” (Werdek û Hîv), “слон и лисы” (Fîl û Rovî), “Лев Щенок С” (Şêr û Tuleyê Kuçikan) nivîsandiye. Nivîskar, wergêr û rojnamevanê rûs Ivan Andreyevich Krilov (1769-1844) ji ber ku ji dusedî zêdetir fabl nivîsandine û navdar bûye, ev fabl bi 50 zimanan hatine wergerandin.<sup>58</sup> Ew wek “La Fontainê Rûs” tê binavkirin.

<sup>55</sup>[http://www.ntv.com.tr/turkiye/pinokyo-ilk-kez-kurtcede,1wtfuIjZJE-\\_JZXkGHY0zw](http://www.ntv.com.tr/turkiye/pinokyo-ilk-kez-kurtcede,1wtfuIjZJE-_JZXkGHY0zw) 28.05.2016/ 19.04

<sup>56</sup> [https://en.wikipedia.org/wiki/The\\_Tale\\_of\\_the\\_Fisherman\\_and\\_the\\_Fish](https://en.wikipedia.org/wiki/The_Tale_of_the_Fisherman_and_the_Fish) 09.03.2016/ 22.59

<sup>57</sup> Metin Yüksel, *Kolana Weşangîra, Xaniyê 3, Apartamênta Hijmara 6, Êrivan, Kurdolojî û Malbata Celîlan, Hevpeyvîn Bi Celîlê Celîl û Cemîla Celîl Ra*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2013, r. 83

<sup>58</sup> <http://russia-ic.com/people/general/k/580> 10.03.2016/11.49

### 1.3.3.8. Türkiye

Çawa ku li gelek welatan edebiyata zarokan êdî wek edebiyateke cuda tê qebûlkirin û taybetî ji bo zarokan hêdî hêdî berhem tên nivîsandin, li Tirkiyê jî ji bo wan hin xebat tên kirin. Ali Gurbetoğlu dibêje ku xebatên li ser dîrok û edebiyata zarokan di heyama Tanzîmatê de dest pê dîke û pişt re heyamên meşrutiyet û komarê jî bo perwerde û xebatên li ser zarokan dibin heyamên girîng.<sup>59</sup>

Nivîskar û helbestvanên tirk ewil ji zimanên din çîrok, fabl û helbest wergerandine. Yalçın û Aytaş dibêjin ku beriya heyama Tanzîmatê pirtûkên şîretan didin zarokan zêdetir hatine nivîsandin û wek numune pirtûka Helbestvan Nabî ya bi navê “Hayriyye” (Xêriye), pirtûka Sümbülzade Vehbî ya bi navê “Lütfiyye” (Lutfiye) nîşan didin.<sup>60</sup>

Hin kesên ku ji bo zarokan pirtûk wergerandine ev in; Yusuf Kamil Paşa pirtûka nivîskarê frensî Fenelon ya bi navê “Telemak”, Ziya Paşa pirtûka J.J. Rousseau ya bi navê “Emile”, Vakanüs Lütfü pirtûka Daniel Defoe ya bi navê “Robinson Cruose”, Mahmut Nedim pirtûka Jonathan Swift a bi navê “Serpêhatiyên Gullîver”, Mehmet Emin pirtûka Jules Verne ya bi navê “Ber Bi Navenda Dinyayê Seyahat û Bi Balonê Pênc Hefte” wergeradine tirkî.

Recaizade Ekrem pirtûkek bi navê “Tefekkür” (Fikirandin) û Muallîm Nacî jî pirtûka “Ömer’in Çocukluğu” (Zarokatiya Omer) ji bo zarokan nivîsandine.<sup>61</sup> A. Ferhan Oğuzkan destnîşan dîke ku edebiyata zarokan ancax piştî Şerê Cihanê ya Duyemîn bi rêk û pêk dest pê dîke.<sup>62</sup>

Selçuk Çıkla behsa Şinasi dîke û dibêje wî di sala 1859an de fablên La Fontaine wergerandine û di pirtûka xwe ya bi navê “Tercüme-i Manzume” de ew weşandine. Ji bo helbestvanên tirk ên ku ji bo zarokan berhem nivîsandine jî Çıkla van kesan û berhemên wan wiha rêz dîke; Ali Ulvi Elöve “Çocuklarımıza Neşîdeler” (Ji Zarokên Me Re Neşîde-1912), İbrahim Alâettin Gövsa “Çocuk Şiirleri”

<sup>59</sup> Ali Gurbetoğlu, *II. Meşrutiyet Döneminde Yayınlanan Çocuk Dergilerinin Eğitim Açısından İncelenmesi* (1908-1918) Yayınlanmamış Doktora Tezi, Ankara, Ekim 2006, r.9

<sup>60</sup> Yalçın-Aytaş, *Çocuk Edebiyatı*, r. 24

<sup>61</sup> H.b. r 24-25

<sup>62</sup> Oğuzkan, *Yerli ve Yabancı Yazarlardan Örneklerle Çocuk Edebiyatı*, r.11

(Helbestên Zarokan-1913), Tevfik Fikret “Şermin”(Şermîn-1914), Ali Ekrem Bolayır “Çocuk Şiirleri” (Helbestên Zarokan-1917) û Şiir Demeti (Baqê Helbestan-1923), Köprülüzade Mehmet Fuat “Mektep Şiirleri” (Helbestên Mektebê-1922), Ziya Gökalp “Kızıl Elma” (Sêva Sor-1915), Yeni Hayat (Jiyana Nû-1918) û Altın Işık (Roniya Zêr-1923).<sup>63</sup>

Li jorê me behsa destpêka edebiyata zarokan û gelek nivîskaran ên ku li Ewropa, Amerîka û welatên din hewl dane ji bo zarokan berheman binîvîsin kir. Ji van berheman hinek her çiqas rasterast ji bo zarokan nehatibin nivîsandin jî, zarokan di nav demê de ew berhem xwendine û wan hez kirine.

Necdet Neydim dibêje ku ew nivîskarên ku dibêjin ji bo zarokan nivîsandine di rastiye de ji bo zarokan nenivîsandine û vê rewşê wiha dinirxîne:

“Dema hewcedariya edebiyata zarokan çêdibe ji bo ku valahiya vê qadê bê tijekirin hin berhemên edebiyata mezinan li gor zarokan ji nû ve tî adaptêkin. Di serî de Robinson Crusoe, û Seyahatên Gulliver tî. Ji bilî van, zimanê çîrok û fablan ji bo zarokan hatine sivikkirin. Çîrokên Ezopê, çîrokên Andersen, çîrokên Grimm ji bo Rojavayê wek mînak dikarin bî nîşandan. Ezop wek kesekî ku ji zarokan nefret dike tî nasîn. Andersen jî qetiyen çîrokên xwe ji bo zarokan nenivîsandiye. Ew ji malbateke dî tî û ev dîntî çend nîş ji berê ve dest pê dike. Andersen dema ku tî bajêr ji bo ku li der û dora kesên navdar û bîsl xwe bîdilîne û ji hêla wan ve bê hezkirin, ji wan re çîrokan dinivîse. Andersen hewl daye ku ji xwe re bî vî awayî hevalan bibîne. Heke em behsa birayên Grimm bikin, wan jî çîrok berhev kirine, lê ev çîrok li gor exlaqê xiristîyanan ji nû ve nivîsandine. Çîrokên ku em dixwînin ne yê resen in. Li rojhilatê û rojavayê hemû çîrok berhemên çanda feodal in, bîr û hişê civaka çanda feodal temam dîkin.”<sup>64</sup>

Her çiqas Neydim rexne bike jî, ew kesên ku behsa wan hatin kirin di dîrokê de kesên bî nav û deng in. Gelek fabl, helbest an jî çîrok nivîsandine. Ev berhem û xebatên wan bî gelek zîmanan hatine wergerandin û hemû zarokên cihanê kê an jî zêde bî van fabl û çîrokan mezin bûne û hê jî bî wan mezin dibin.

<sup>63</sup> Selçuk Çıkla, “Tanzimattan Günümüze Çocuk Edebiyatı Ve Bazı Öneriler”, *Hece Dergisi Çocuk Edebiyatı Özel Sayısı*, j. 104-105, Ankara, Ağustos- Eylül 2015, r. 94-95

<sup>64</sup> Neydim, *İnceleme-Araştırma- Eleştiri-Çocuk Edebiyatı*, r. 31-32

#### 1.4. Rewşa Edebiyata Zarokan a Kurdî

Zargotina kurdî ji destpêkê heta niha pir dewlemend e. Ji bo zarokan çîrok, lorik, zûgotinok, tiştanok û gelek tiştên wiha her tim hatine gotin û zarokan jî bi têra xwe ji mezinên xwe sûd wergirtine. Lê ji hêla nivîskî ve yanî pirtûk, kovar, rojname û berhemana ve zêde xebat nehatine kirin. Zimanê kurdî her tim qedexeyê bûye, zor û zextî tu caran li ser kurdan kêmbûye. Ji ber van sedemên siyasî, civakî û aborî kurdan li gor gelên din nikaribûye edebiyateke nivîskî ya zarokan a bi rêk û pêk ava bikin. Lê dîsa jî alim, nivîskar û helbestvanên kurd vala nesekinîne, hin berhem dane. Wek Ehmedê Xanî, Îsmailê Bazîdî, Şêx Marûfê Nodeyî û h.w.d..

Zarokên kurd di medreseyan de him ji hêla ilmên pozîtîf û him jî hêla ilmên dînî ve hatine perwerdekirin. Di medreseyan de hin ferhengên ku ji bo biçûkan hatine nivîsandin (Nûbihara Biçûkan, Gulzar, Luxetnameyê Ehmedî), mewlûda kurdî û hin beşên ji dîwanên kurdan bi zarokan hatine xwendin. Fehim Işık jî der barê perwerdeya medreseyan de wiha dibêje:

“Wek medreseyên qewmên din di hemû medreseyên kurdî de jî hînkariya bi Qur'anê û bi elifbaya erebî dest pê dike. Piştî Qur'anê, Mewlûda Melayê Batê, Nûbar û Eqîda Imanê ya Ehmedê Xanî, Tesfîra Kurmancî û Zurûfê ku bi kurdî hatine nivîsandin dibin kitêbên sereke ên xwendina medreseyan...”<sup>65</sup>

Zarokên kurd bi saya van berhemana him kurdî perwerde dîtine û him jî, erebî û farisî hîn bûne.

Bi gelemperî edebiyata zarokan a cihanê di sedsala 17emîn de dest pê dike. Ji wir pê ve her diçe geştir dibe. Heke mirov edebiyata zarokan a kurdî û ya cihanê bide ber hev, wê bê dîtina ku li gor cihanê edebiyata zarokan a kurdî gelek qels maye, bi têra xwe li pêş neketiye. Rêvebirên Weşanxaneyê Rûpelê jî di pêşgotina pirtûka Zinarê Xamo ya “Hebû Tunebû Antolojiya Çîrokên Zarokan” de bal kişandine li ser vê kêmasiyê û wiha gotine:

“Ger em Nûbara Ehmedê Xanî (1651-1707) û di salên 1900-1920 alfebeyê Xelîl Xeyalî, Cedwela Lêkerên Kurdî ya Ebdurrehîm Rehmî û nivîs û çîrokên zarokan ku di

---

<sup>65</sup> Fehim Işık, “Di Medreseyên Kurd de Jiyan û Hînkariya”, *Kovara Bîr*, j. 3, Payîz, Diyarbekir, 2005, r. 161

kovar û rojnameyên wê demê de (Rojî Kurd, 1913) derketine nehesibînin, ji bo zarokan tiştêkî nivîskî nehatiye amadekirin.”<sup>66</sup>

Li gor agahiyên berdest, kesê ku ewil di edebiyata kurdî de ji bo zarokan berhemek nivîsandiye Ehmedê Xanî ye. Navê berhema wî jî Nûbihara Biçûkan e û Xanî bi vê ferhengê ve hewl daye ku zimanê erebî hînî zarokên kurd bike. Her çiqas ev ferhenga Ehmedê Xanî û piştî wê hin ferhengên cuda jî ji hêla nivîskarên din ve hatibin nivîsandin jî, mirov dikare bibêje ku ji bo zarokên kurdan demeke dirêj berhem nehatine nivîsandin.

Berhemên ewil ên ku ji bo zarokan hatine nivîsandin gelemperî ferheng in. Nivîskaran xwestine bi van ferhengan ve zimanekî biyanî (farisî-erebî) û agahiyên dîni hînî zarokên kurd bikin. *Nûbihara Biçûkan* a Ehmedê Xanî, *Gulzar* a Îsmailê Bazîdî, *Luxetnameyî Ehmedî* ya Şêx Marûfê Nodeyî, *Mîrsadu'l-Etfal (Şahrahê Kûdekan)* a Şêx Mihemed Kerbelayî, *Eqîde* ya Mewlewî wek berhemên ewil ên ji bo zarokan hatine nivîsandin tên qebûlkin.

#### **1.4.1. Nûbihara Biçûkan (1683)**

Berhema Ehmedê Xanî ya bi navê *Nûbihara Biçûkan* di edebiyata zarokan a kurdî de berhema ewil e. Ev berhem di heman demê de yekem ferhenga menzûm a duzimanî ya kurdî tê qebûlkin. Xanî vê ferhenga erebî û kurdî di sala 1683yan de nivîsandi ye û xwestiye ku zimanê erebî hînî zarokên kurdan bike. Kadri Yıldırım der barê vê berheme de wiha agahiyê dide: “Nivîskar vê ferhenga ku bi pêşgotineke kurt, ji 13 qiteyan, 220 malik û qasî 1000 peyvên erebî û hemwateyên wan ên kurdî pêk tê di 33 saliya xwe de nivîsandiye.”<sup>67</sup>

Ehmedê Xanî di destpêka *Nûbihara Biçûkan* de tîne ziman ku wî ev berhem ji bo zarokên kurdan nivîsandiye;

---

<sup>66</sup> Zinarê Xamo, *Hebû Tûnebû Antolojiya Çîrokên Zarokan*, Weşanxaneya Rûpelê, Stenbol, 2014, r. 4

<sup>67</sup> Kadri Yıldırım, *Nûbihara Biçûkan Arapça-Kürtçe-Arapça Sözlük*, Avesta Yayınları, İstanbul, 2008, r. 40, vgz. Jan Dost, *ed-Durru's- Semîn Fi Şerhî Mem û Zîn*, 1 sb., Erbil, 2006, r.79

“Vêk êxistin Ehmedê Xanî

Navê Nûbehara Biçûkan danî

Ne ji bo sahibrewacan

Belkî ji bo biçûkê Kurmancan”<sup>68</sup>

Xanî xwestiye ku dema zarokên kurdan ev berhem xwendin, bila ji wî re diayan bikin û fatihayê bixwînin.<sup>69</sup> Ev ferhenga girîng bi salan di medreseyan kurdan de piştî hînkirina Qur’ana pîroz ji bo perwerdekirina zarokan hatiye bikaranîn.

### 1.4.2. Gulzar

Li gorî agahiyên ku li ber dest in, di dîroka edebiyata kurdî de ferhenga menzûm a duyem jî Gulzar e. Gulzar di sedsala 18emîn de ji aliyê şagirtê Ehmedê Xanî, Îsmâîlê Bazîdî (1655-1710) ve hatiye nivîsandin û di medreseyan de wek pirtûkek hatiye xwendin. Ramazan Pertev dema behsa vê ferhengê dike wiha dibêje:

“Der barê Gulzarê de mixabin agahiyên tekûz û berfireh li ber destê me nînin. Li gorî agahiyên ku li ber dest in, taybetiyên Gulzarê bi vî awayî ne:

- 1) Ferhengeke kurdî-erebî-farisî ya bi sêzimanî ye
- 2) Di medreseyan kurdî de wek pirtûkeke dersê hatiye xwendin
- 3) Bi giranî devoka Hekarî û Bazîdê bi kar aniye.

Hin mînak ji bêjeyên vê ferhengê ev in: Axaftin, axiftin, êwergêh, êwerîn, pizdan, guhan, bijwîn, bêdadî, bêwecî, pişk, cirrenix, çekme, xanîmal, daberistin, dirav, mezaxtin, suba, solbend, qlopanik, qîvar, lêb, lêbandin, lêbok. Qanatê Kurdo, Marûf Xeznedar, Reşîd Findî, Kemal Burkay, Kadîrî Yıldırım û çend lêkolînerên din, herçend behsa wê dikin jî der bareyê naveroka wê de em zêde tişt nizanin. Yanî derbarê menzûmbûn an nivîzûmbûna wê de jî agahiyeke piştrastkirî nîn e.”<sup>70</sup>

### 1.4.3. Luxetnameyî Ehmedî (1790)

Marûfî Nodeyî (1753-1837) yê ku wek alim û zanayekî kurd tê nasîn di sala 1790an de bi navê *Luxetnameyî Ehmedî* ferhengeke erebî û kurdî (zaravayê soranî)

<sup>68</sup> Yıldırım, h.b, r. 122

<sup>69</sup> H.b. r. 40

<sup>70</sup> Ramazan Pertev, *Mîrsad’ul- Etfal (Şahrane Kûdekan) Ferhenga Menzûm a Kurdî (Vekolîn-Tekst)*, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mêrdîn, 2012, r. 24-27

nivîsandiye. Ev ferheng qasî sedsal piştî *Nûbihara Biçûkan* a Ehmedê Xanî hatiye nivîsandin. Luxetnameyî Ehmedî di medreseyan ku bi zimanê soranî perwerde lê hatiye dayîn de wek berhemeke girîng cihê xwe girtiye. Kadri Yıldırım dema behsa vê berhemê dike wiha dibêje:

“Çapa duyem a Luxetnameyî Ehmedî ya ku di destê me de ye û tarîxa wê Senendec 1379 e, 51 rûpel in. Evdirrehîm Mehmûdî wêneyên vê behremê xêz kirine. Di berhêmê de qasî 1500 peyvên erebî û meneyên wan ên kurdî hene. Berhema nivîskar destpêkek û ji du beşan pêk tê. Destpêk bi besmeleyê dest pê dike û ji 13 malikan pêk tê. 4 malik bi temamî erebî, 9 malik jî temamî bifarisî ne.”<sup>71</sup>

Celîlê Celîl jî di hevpeyvîneke xwe de behsa destnivîsa *Luxetnameyî Ehmedî* dike û dibêje ku ew wek rêbaza *Nûbihara Biçûkan* bi rîtma helbestkî hatiye nivîsandin, tê da 2 û 3 hezar peyvên soranî bi wergera wan a erebî ve hene û wiha dibêje:

“Destnivîsek jî heye, ku min hazir kiriye. Navê wî Ahmedî ye. Marûfî Nodê nivîsiye, wekî Nûbiharê ye. Ferhenga Kurdî-Erebî ye, lê bi zarava soranî ye. Eynî sitîla Ehmedê Xanî ye, xuya ye bandûra Ehmedê Xanî ser hebûye. Dawiya sedsala 18an û destpêka 19an bûye. Ev destnivîs meşhûr e. Li Îraqê nav kurdên soranîaxêv gelek caran hatiye weşandin û li medresên nava xelqê soranîaxêv mele wek pirtûka dersê bi kar anîne. Lê min du destnivîsên jî vê berhemê peyde kirine, ku temena wana 200 sal heye. Yek min li pirtûkxana Berlînê, yek jî li Pirtûkxana Wienê dîtine. Bala min li ser wê bûye, ew ferheng bikim almanî jî û bidim xuyakirin, di navbera van dusid salan da tê da guhastin cî girtine yan na.”<sup>72</sup>

Nodeyî ji bo kurê xwe Ehmed ev ferheng nivîsandiye û sedema nivîsandina vê berhemê wiha eşkere dike;

“Der î n rîsale be kurdî zeban

Kunem zîban-î ereb ra beyan

Ta kî ferzendem Ehmed bê te’eb

Şewed danay-î luxat-î Ereb”<sup>73</sup>

---

<sup>71</sup> Yıldırım, r. 96

<sup>72</sup> Yüksel, *Kolana Weşangîra, Xaniyê 3, Apartamênta Hijmara 6, Êrîvan, Kurdolojî û Malbata Celîlan, Hevpeyvîn Bi Celîlê Celîl û Cemîla Celîl Ra*, r. 125

<sup>73</sup> Yıldırım, r. 97

#### 1.4.4. Eqîdeya Mewlewî (1806-1882)

*Eqîdeya Mewlewî* (1806-1882) jî yek ji berhema ku bo zarokan hatiye nivîsandine. Rêwaz Ehmed dema behsa *Eqîdeya Mewlewî* dike der barê vê berhemê de wiha agahiyê dide: “Eqîdeya Mewlewî (1806-1882) yek ji berheman e ku bo zarokan hatine nivîsandin. Ev berhem ji bo mindal û zarokên hucreyan yanê feqêyan bû, di navenda sedsala 18emîn de hatiye nivîsandin.”<sup>74</sup>

#### 1.4.5. Mîrsadu'l-Etfal (Şahrahê Kûdekan) (1912)

Berhema *Mîrsadu'l-Etfal (Şahrahê Kûdekan)* ji hêla Şêx Mihemed Kerbelayî ve kurdî û farisî di sala 1912an de li gundê Aqtepeya girêdayî Diyarbekirê hatiye nivîsandin. Di *Mîrsadu'l-Etfalê* de vegotina destpêkê bi temamî kurdî ye. Beşa dawî piranî bi hevokên kurdî û hinek jî bi farisî ne. Her du beş jî ne ji qismê ferhengê ne.

Ramazan Pertev dema ku der barê ve ferhengê de agahiyê dide, dibêje ku nusxeya kurdî-erebî ya ku bi destê Şêx Mihemed Kerbelayî hatiye nivîsandin, gihîştîye îro û li cem biraziyê wî Şêx Şafî tê parastin û wiha dibêje:

“Destxet bi temamî 42 rûpel e. Mîrsad bêjeyeke erebî ye û wateya wê “cihê çavdêriyê” ye. Etfal jî bêjeyeke erebî ye û pirjimara tîflê yanî zarokê ye. Her du bi hev re tîn wateya “cihê çavnêriya zarokan” an jî “nêrîngeha zarokan... Kerbelayî, di destpêka berhemê de, piştî besmele, hemd û selewatan bi awayekî eşkere nav û sedema amadekirina berhemê diyar dike. Kerbelayî, dûre behsa girîngî û taybetiya zimanê farisî dike. Li gorî wî zarokên ku bi zimanê farisî zanibin dê di warê zanistî û edebiyatê de gelek serkevtî bin. Di dawîya destpêkê de hêvî dike ku kesên ku dema li ser vê ferhengê dersê dixebitin, bila jê re dia bikin û wî ji gunehan xelas bikin.”<sup>75</sup>

Kerbelayî di vê berhemê de dibêje ku wî ev ferheng ji bo hemû zarokên kurdan, lê bi taybetî ji bo birayê xwe Muhemmed Eskerî û biraziyê xwe Neqşibendî nivîsandîye;

“Me pev xist û di nav hev kirne telfif

Ji bo eclê ku da bit sehl û texfif

---

<sup>74</sup> Rêwaz Ehmed, *Seretayek Der Barey Serhildanî Edebî Mindalanî Kurd*, Çapxaneya Wezaretê Perwerdeyê, Çapî Yekem, Hewlêr, 2005, r.8

<sup>75</sup> Pertev, *Mîrsad'ul-Etfal (Şahrahê Kûdekan)*, r. 24-27



Li ser etfal û ewladê di kurdan

Lîsanê farsî û meqsedê wan

Bi Mîrsadu'l Tifal min kirye nîşan

Ji mewla min rica ye nef'ê îşan

Xisûsa ez miyanê wan du şehbaz

Hesîbanê nesîbanê serefraz

Muhammed Eskerî yû Neqşibendî

Ew in 'îlet ji vê tertîb û bendî

Yekî nefîsê bira ye pur temîz e

Biraderzade ye dîger 'ezîz e.'<sup>76</sup>

Piştî van ferhangan mirov dikare bibêje pêşveçûnên cihanê tesîrê li ser kurdan jî kiriye û ji bilî nivîskarên van ferhangan, hin helbestvan û nivîskarên kurd yên wek Pîremêrd, Faîq Bêkes, Casimê Celîl, Hejar Mukriyanî, Goran, Qanî, Miftî Pêncuwînî, Cegerxwîn, Kamuran Mukrî, Heciyê Cindî, Necmettin Mela, Yunus Rauf Dildar, Osman Sebrî, Nurî Şêx Salih, Dilzar, Seydayê Tîrêj, Qedrîcan, Namî, Kamiran Bedirxan, Celadet Bedirxan jî ji bo zarokan çîrok, fabl û helbest nivîsandine.

Nivîskar, helbestvan û parêzerê kurd Kamuran Elî Bedirxan (1895-1978) ji bo zarokan bi navê "*Elfabeya Min*" pirtûkeke alfabeyê û bi navê "*Destpêka Xwendinê*" pirtûkeke ku xwendin û nivîsandinê hînî zarokan dike nivîsandiye. Ji bilî van berheman çend helbest jî nivîsandine. Ji wan helbestan ya bi navê "Dibistan" mirov dikare wek mînak nîşan bide.

---

<sup>76</sup> H.b., r. 32

“Dibistan pir xweşik e

Bi hogir û hevalan

Bi nivîs û mamoste

Bi çîroka newalan

Em hemû jê hezdikin

Ji bo zanîn kanî ye

Tê de kenîn leyîstok

Dibistan xweş xani ye<sup>77</sup>

Helbestvanê navdar ê kurd Cegerxwîn (1903-1984) jî ji bo zarokan helbest nivîsandine û ev helbest ji hêla zarokan ve hatine jiberkirin. Sînemxan Bedirxana qîza Celadet Bedirxan di hevpeyvîneke xwe de dibêje ku wê û birayê xwe helbestên Cegerxwîn ji ber dikirin û dema ku Cegerxwîn dihate mala wan, bavê wê bangî wan dikir û digot li ber Cegerxwîn helbestên wî yê ku jiber kirine ji wî re bixwîn.<sup>78</sup> Bo nimûne, helbesteke Cegerxwîn ya bi navê “Ji Biçûkan re” di hejmara 34 û 35emîn a Kovara Nûbiharê de hatiye weşandin.

“Şêr û piling tev de çûn,

Rastî serîk penîr bûn.

Vî jê xwar û wî jê xwar,

Herdu rabûn bûne cot....”<sup>79</sup>

Dîsa berhema Cegerxwîn a bi navê “*Cîm û GulPerî*” (1947)<sup>80</sup> ya ku ji bo keç û xortan wek diyarî hatiye nivîsandin û bi hevoka “çîroka min ji we re xweş” ve qediya ye jî, ji bo edebiyata zarokan a kurdî dikare wek nimuneyek bê nîşandan. Koma

<sup>77</sup><http://img.eba.gov.tr/418/7d2/206/c20/adc/134/1a8/8cf/006/931/c2b/e1c/1ac/538/001/4187d2206c20adc1341a88cf006931c2be1c1ac538001.pdf> 13.03.2016/18.16

<sup>78</sup> Di 2011an de ji bo belgefilma TRT 6ê (bi navê xwe yê nû TRT Kurdî) ya bi navê “Navdarên Me” li Hewlêrê min bi Sînemxan Bedirxanê re hevpeyvînek li ser bavê wê Celadet Bedirxan kir. Sînemxan Bedirxanê ev agahî di wê hevpeyvîne de da min.

<sup>79</sup> Cegerxwîn, Ji Biçûkan Re, *Nûbihar*, j. 34-35, Tîrmeh-Tebax 1995, r. 46

<sup>80</sup> Metin Yüksel, *Dengbêj, Mullah, Intelligentsia: The Survival And Revival Of The Kurdish-Kurmanji Language In The Middle East, 1925-1960*, Unpublished Ph.D diss. Chicago: University of Chicago, 2011, r. 212

Karên Çandî ya Enstituya Kurdî ya Parîsê destnîşan dike ku Cegerxwîn vê pirtûkê di sala 1948an de çap kiriye, lê ji ber ku ev pirtûk êdî dest nakeve, wan di sala 1978an de li Berlînê ji nû ve çap kirine.<sup>81</sup>

Nivîskar û helbestvanê navdar Osman Sebrî jî (1905-1993) ji bo zarokan gelek helbest û fabl nivîsandine. Fablên Osman Sebrî hinek di kovara Ronahiyê de hatine weşandin. Wek mînak di hejmara 5emîn de “Çîroka Dîk û Rovî”, di hejmara 6emîn de “Şêr û Kêvroşk”, di hejmara 7emîn de “Daweta Kêzê”, di hejmara 8emîn de “Mih û Şêr û Gur” di hejmara 9emîn de “Ker û Heft Gur”, di hejmara 12emîn de “Gurê Pîr”, di hejmara 13emîn de “Kerê Dengbêj” hatine weşandin.<sup>82</sup> Helbesteke Osman Sebrî ya bi navê “Zozan” jî dîsa di hejmara 20emîn a kovara Ronahiyê de hatiye weşandin.<sup>83</sup> Çend helbestên Osman Sebrî yên ji bo zarokan jî di kovara Hawarê de hatine weşandin, wek “Dibistan”, “Bihar”, “Tevdîra Mişkan”. Bo nimune, di hejmara 49an a kovara Hawarê de bi serenava “Şihirên Zarokan” du helbest û fablek li dû hevdu nivîsandiye. Helbesteke wî ya bi navê “Bihar” wiha ye;

Gava dinê dibe bihar,  
dibişkivin devî û dar.

Zozan têne guhartin zû,  
mîna cilên bûkên di nû.

Nêrgiz, sosin, kulîlk û gul,  
direvînin xeman ji dil.

Dinya dibe wek gola şîn,  
çîçek didin sed rengî bîn.

---

<sup>81</sup> Cegerxwîn, *Cîm û Gulperî*, Institut Kurd de Parîs, Berlîn, Çileya Pêşîn, 1 978

<sup>82</sup> Kadri Yıldırım- Ramazan Pertev- Mustafa Aslan, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, İstanbul, 2013, r. 81-82

<sup>83</sup> Yüksel, *Dengbêj, Mullah, Intelligentsia: The Survival And Revival Of The Kurdish-Kurmanji Language In The Middle East, 1925-1960*, r.198

Xasma sibana berbangê zû,  
tev radibin ew teyr û tû.  
Vêk ra dikin şahî û saz,  
hişyar dibin hulîlk û baz.

Bilbil dibe dengbêjê wan,  
dikît qîrîn ji dil û can.  
Pîroz dikin rojên di hev,  
hîn xweştir e biharê şev<sup>84</sup>

Di Dîwana Osman Sebrî ya ku ji hêla Weşanxaneya Periyê ve hatiye çapkirin de beşeke bi navê “Dengê Zarokan” heye ku di wir de helbestên wî yên ji bo zarokan hatine komkirin. Navê hin helbestên wî yên li wir ev in; “Cejna Pîroziya Welato”, “Pîrozi”, “Keça Min Hîvron”, “Lewend”, “Şêrê Min” û h.w.d..<sup>85</sup>

Ji bilî Osman Sebrî, hin nivîskar û helbestvanên din jî di kovara Hawarê de ji bo zarokan helbest, çîrok û fêbl nivîsandine. Wek mînak, Mihemed Emîn Botî fableke bi navê “Çûk û Fîl” di kovara Hawarê de nivîsandiye.<sup>86</sup>

Celadet Bedirxan jî ji bilî beşa “Stûna Zarowan” a ku di Hawarê de ji bo zarokan amade kiriye<sup>87</sup>, ji bo kurê xwe Cemşîd û qîza xwe Sînemxanê bi serenava “Reşbelek-2” nivîseke ku behsa koçeriyê û zozanan dike nivîsandiye.<sup>88</sup> Celadet Bedirxan di kovara Ronahiyê de jî beşa Reşbelekê dewam kiriye. Wek mînak di hejmara 19emîn a Ronahiyê de bi serenava “Reşbelek-4 Ji Eta Cemşîd Re” behsa axaftina xwe ya bi qîza xwe Sînemxan Bedirxanê dike. Hema di bin wê nivîsê de jî

---

<sup>84</sup> Osman Sebrî, “Şihirên Zarokan”, *Hawar*, Weşanên Nûdem, Cild 2, j. 49, Stockholm, 1998, r. 1065

<sup>85</sup> *Dîwana Osman Sebrî*, Weşanên Perî, Stenbol, Çirya Paşîn 2004, r. 174-182

<sup>86</sup> Mihemed Emîn Botî, “Çûk û Fîl”, *Hawar*, Weşanên Nûdem, Cild 2., j. 24, Stockholm, 1998, r. 636

<sup>87</sup> Di bin serenava “Beşên Zaroknameyan Di Kovarên Kurdî De” de wê bi hurgilî behsa “Stûna Zarowan” bê kirin.

<sup>88</sup> Celadet Bedirxan, “Reşbelek 2”, *Hawar*, Weşanên Nûdem, Cild 2., j. 48, Stockholm, 1998, r. 1051-1053

behsa kitêbeke gramerê ya bi navê “*Kitêba Sînemxanê*” ya ku ji bo zarokan amade kiriye dike. Paşê qismêke wê kitêbê di kovara Ronahiyê de weşandiye.<sup>89</sup> Celadet Bedirxan kitêba Bryan Guinness ya bi navê “*Conî û Cimêma*” ya ku ji çîrokên zarokan pêk tê, ji frensî wergerandiye kurdî (1943). Bedirxan di hejmara 20emîn a Ronahiyê de behsa vê kitêbê dike û dibêje xwendevan dikarin ji Kitêbxana Hawarê vê kitêbê peyda bikin.<sup>90</sup>

## 1.5. Edebiyata Zarokan a Kurdî Li Cihên Ku Kurd Lê Dijîn

### 1.5.1. Sovyet

Di nav kurdên Sovyetê de edebiyata zarokan a kurdî di salên 1930an de dest pê kiriye. Nivîskarên wek Erebe Şemo, Heciyê Cindî, Casimê Celîl, Emînê Evdal, Cerdoyê Gêncî ji bo zarokan an ji zimanên din pirtûk wergerandine, an jî bi taybetî ji bo zarokan çîrok, fabl û helbest nivîsandine.

Celîlê Celîl dema behsa edebiyata zarokan a kurdî ya li Sovyetê dike dibêje ku bavê wî Casimê Celîl di salên 1930yî de ji edebiyata ermenan û rûsan gelek pirtûk ji bo zarokan wergerandine û navê wan jî wiha rêz dike;

“H. Tûmanyar “Se û Pişik” (1935)

H. Tûmanyar “kalkê Gabo çewa kurmê hevirmiş xweyî dike” (1935)

H. Tûmanyar “Xweyî û xulam” (1936)

H. Tûmanyar “Nezerê mêrxas (1937)

H. Tûmanyar “Axirya nes” (1937)

Xinko Apêr “Tramve li Rewanê” (1936)

Xinko Apêr “Mişka pişikêra çawa şerkirin” (1937)

H. Hayrapêtyan “Teyr û tu” (1936)

---

<sup>89</sup> Bavê Cemşîd, “*Kitêba Sînemxanê*”, *Ronahî*, Sal: 2, j. 19, Çapxana Tereqiyê, Şam, Çiriya Pêşîn 1943, r. 11-12

<sup>90</sup> Celadet Bedirxan, “*Conî û Cimêma*”, *Ronahî*, Sal: 2, j. 20, Çapxana Tereqiyê, Şam, Çiriya Paşîn 1943, r. 12

Arkadiy Haydar “hikyat derheqê sura seferiyê (Derheqa zar-zarokê û derheqa xebera wî qewîn) (1936)”<sup>91</sup>

Heciyê Cindî (1908-1990) jî nivîskarekî navdar ê Qafqasyayê ye û di salên 1930yî de ji bo zarokên kurd berhem dane. Cindî di hevpeyvînekê de li ser pîrsekî wiha behsa pirtûkên xwe yên ku ji bo zarokan nivîsandine dike:

“...Mî jî sala 1932 'an heta niha gelek pirtûkên dersên zîmanê kurdî amade kirine. Awa dikarim navê çend heban (Iıva) bir bînim; Ala Sor (1932), Jiyina Nûh (1932), Cihana Nûh (1932), Kolkoz vanê Derbdar-Elifba (1933), Pirtûka Zîmine Dersan (1935), Elifba û Bîngêhên Xwendinê (1937), Pirtûka Zîmine Dersan (1937), Elifba (1946), Zîmanê Dê û hînekên mayin...”<sup>92</sup>

Yek ji wan zarokan ê ku pirtûkên Heciyê Cindî xwendiyê jî Eskerê Boyik e. Boyik tîne zîman ku ew ji Elfebeya Heciyê Cindî hînî xwendinê bûne û wiha agahiyê dide:

“Ew havîna timê dihate gundên meyê pala çiyayê Elegezê, ji devê kal-pîra, çîrokbêja, zana zargotin dinivîsîn. Dema ew dihat, caw di nav gel da bela dibû, digotin Heciyê Cindî hatiye. Em zarok, tomî li ser hev dibûn û me jî dûr va lê mêze dikir. Elfeba ku em dibistanê da pê hîn dibûn, wî nivîsî bû.”<sup>93</sup>

Celîlê Celîl behsa pirtûkên zarokan ên rûsî, frensî û zîmanên din ji bo zarokên kurd hatine wergerandin dike. Celîl dibêje ji bo zarokên temenê wan 11 û 15 salî ne, şeş pirtûkên frensî, rûsî û ermenkî hatine wergerandin û wiha behsa van pirtûkan dike:

“Didu ji van dîsa ji nivîsên H. Tûmanyane: 1. “Gîkor”, s. 1932, bi wergera Emînê Evdal û Hecî Cindî û 2. “Berhevkirina Kîlîma”, s. 1936, bi wergera Casimê Celîl. Her çarên dinê, sisê ji Edebiyata Rûsî ne, yek ji Edebyeta Fransî: 3. A.S. Pûşkîn “Mesya zêrîn” s.1937, bi wergera Casimê Celîl; 4. L.N.Tolstoy “Şîrovekirin derheqa heywanada. Bona zara” s. 1935, werger R. Drambyan; 5. L.N.Tolstoy “Plênê Kavkasê”

<sup>91</sup> Celîlê Celîl, “Beşek Ji Dîroka Weşangeriya Kurdên Kafkasyayê”, *Tîroj*, Sal: 8, j. 44, Gûlan-Pûşper Stenbol, 2010, r. 12

<sup>92</sup> Mamosteyê Folklorî Prof. Heciyê Cindî, *Roja Nû*, j. 46, 1983, r. 18

<sup>93</sup> Eskerê Boyik, *Nura Elegezê Çend Dîdem Ji Edebyeta Kurdên Ermenistanê*, Weşangeha Dengê Êzîdiyan, Oldenburg, Nîsan 2004, r. 47

s. 1937, bi wergera Qaçaxê Mirad; 6. Ji firansî, Danyêl Dêfo “Robinson” s. 1936, bi wergera Cerdoyê Gêncî.”<sup>94</sup>

Gelek pirtûkên zarokan ên ku hatine nivîsandin, an jî wergerandin niha di pirtûkxaneya Casimê Celîl de tînin parastin ku hinek ji van ev in;

“Ji Pirtûkxana Casimê Celîl: Kitêbên Zarokan

- Apêr Xinko. Mişka pişikêra çawa şer kirin. Wien: Institut für Kurdologie, 2012

- Dêfo, Danyêl, Robînzon Krûzo. Wien: Institut für Kurdologie, 2012

- Evdal, Emînê. Bihar. Wien: Institut für Kurdologie, 2012

- Hayrapêtyan, H. Teyr û Tû. Wien: Institut für Kurdologie, 2012

- Pûşkîn, A, S. Çîroka ser Masiğîr û Masiyê Zêrîn. Wien: Institut für Kurdologie, 2012 (Bi CDya ku Ordîxan Celîl sala 1947an xwendiyê)

- Sîras. Memê û Eysê. Wien: Institut für Kurdologie, 2012

- Tûmanyar, H. Se û Pişik. Wien: Institut für Kurdologie, 2012

- Tûmanyar, H. Xweyî û Xulam. Wien: Institut für Kurdologie, 2012

- Tûmanyar, H. Nezerê Mêrxas. Wien: Institut für Kurdologie, 2012

- Tûmanyar, H. Axîrya Nes. Wien: Institut für Kurdologie, 2012

- Tûmanyar, H. Gîkor. Wien: Institut für Kurdologie, 2012”<sup>95</sup>

Nivîskarê navdar Erebe Şemo yê ku romana ewil a kurdî “Şivanê Kurmanca” nivîsandiyê jî ji bo zarokan çîrok nivîsandine. Eskerê Boyik der barê wî de wiha agahiyê dide: “Erebê Şemo xêncî van roman û nivîsaran usa jî seva zarokan çîrok nivîsîne, bi miqale, gotaran, bîrnînan rojneme û kovarên komarên Ermenistanê û Rûsyayê da pêşda hatiye. Bi sênaryoya wî filmeke dokûmêntar bi navê Kurdên Ermenistanê hatiye kişandin.”<sup>96</sup>

Celîlê Celîl herçiqas der heqê nivîskarên din de agahiyan bide jî, wî bi xwe jî gelek xebat li ser kurdî kirine. Celîl jî yek ji wan kesane ku ji bo zarokan hin tişt nivîsandiyê. Mînak çîrokeke wî ya bi navê “Yekbûna Malê” di kovara zarokan a

<sup>94</sup> Celîl, “Beşek Ji Dîroka Weşangeriya Kurdên Kafkasyayê”, *Tîroj*, r. 13

<sup>95</sup> Yüksel, *Kolana Weşangîra, Xaniyê 3, Apartamênta Hijmara 6, Êrîvan, Kurdolojî û Malbata Celîlan, Hevpeyvîn Bi Celîlê Celîl û Cemîla Celîl Ra*, r. 137

<sup>96</sup> Boyik, r. 42

“Hêlînê” de hatiye çapkirin.<sup>97</sup> Dîsa straneke wî ya bi navê “Strana Qîzka Tiral” jî di “Hêlîn”ê de hatiye weşandin.<sup>98</sup>

Ordîxanê Celîl yê ku birayê Celîlê Celîl e jî wek bavê xwe Casimê Celîl û birayê xwe ji bo zarokên kurd pirtûkên dersan amade kiriye. Di nav wan pirtûkan de hin helbest û h.w.d. hatine weşandin. Di kovara zarokan a “Hêvî”yê de helbesteke Ordîxanê Celîl ya bi navê “Payîz” hatiye weşandin. Di bin helbestê de hatiye gotin ku ev helbest ji “pirtûka Zimanê Kurdî a dersxana 4’ a- Ordîxanê Celîl” hatiye wergirtin.<sup>99</sup>

Tosinê Reşîd dema behsa edebiyata kurdî ya li Sovyetê dike dibêje ku ji sala 1929an bigre heta 1937an li Ermenistanê bi zimanê kurdî qasî 70 pirtûk hatine çapkirin û ji wan 20 pirtûk ji bo dibistanan hatine amadekirin. Reşîd behsa çend navan dike û dibêje ku wan kesan bi taybetî ji bo zarokan nivîsandine: “Di pirtûkên nivîskarên kurd de gelek berhemên ji bo zarokan jî hebûn, lê pirtûkên Kerlênê Çaçanî (“Şêr û kew”1961) û Mîkaêlê Reşîd (“Pişîka min” 1965) û Simoê Şemo (“Hikyat derheqa balçêmkêda” 1971), bi taybetî ji bo zarokan bûn.”<sup>100</sup>

Eskerê Boyik dîsa yek ji wan kurdên Ermenistanê ye ku ji bo zarokan tişt nivîsandine. Pirtûka wî ya bi navê “Govenda Herfan” (2002) ji helbestên zarokan pêk tê.

### 1.5.2. Swêd

Li Swêdê kesên wek Zinarê Xamo, Murad Ciwan, Mahmûd Lewendî, Mahmut Baksî, Kemal Burkay, Haluk Öztürk, Firat Cewerî, Mehmet Emîn Bozaslan ên ku li Tirkiyeyê koçî Swêdê kirine û li wir cih bûne ji bo zarokan helbest, fabl, çîrok û pirtûk nivîsandine. Van rewşenbîran ji bilî berhem nivîsandine, werger kirine, kovar derxistine û pirtûkên ku di dibistanan de zimanê kurdî hînî zarokan dikin, amade

<sup>97</sup> Celîlê Celîl, “Yekbûna Malê”, *Hêlîn*, j. 9, Swêd, 1983, r. 4-6

<sup>98</sup> Celîlê Celîl, “Strana Qîzka Tiral”, *Hêlîn*, j.13, Swêd, 1985, r. 6

<sup>99</sup> Ordîxanê Celîl, “Payîz”, *Hêvî*, Swêd, j. 8, Îlon 1981, r. 4

<sup>100</sup> <http://kovarabir.com/tosine-resid-wejeya-kurdi-li-yekitiya-sovyete/> 29.12.2016/ 15.07



kirine. Kovarên zarokan ên kurdî “Hêlîn”, “Hêvî”, Kulîlk”, “Hêviya Me” û “Koçer” ji hêla van rewşenbîran ve hatine weşandin.<sup>101</sup>

Mehmet Emîn Bozarslanê ku di nav kurdan de bi nav û deng e û gelek xebatên wî li ser kurdî hene di sala 1966an de ji bo zarokan alfabekek amade kiriye.<sup>102</sup> Pirtûkên wî yên bi navê “Kêz Xatûn” û “Mîr Zoro” jî di nav pirtûkên zarokan de tên nîşandin.<sup>103</sup>

Nivîskarê kurd Mahmud Baksî ji bo zarokan pirtûkên bi navê “*Zarokên Îhsan*” (1978) û “*Keça Kurd Zozan*” (1979) nivîsandiye. Baksî di hevpeyvîneke xwe de sedema nivîsandina pirtûkên zarokan wiha eşkere dike: “Du sedem hebûn. Yek jê pirtûkên zarokan li Swêdê dihatin xwendin, ya diduyan jî min xwest, ez jiyana zarokên kurdan bi swêdiyan bidime nasin. Sisê jî, ji bo ku zarokên kurdan di dibistanên swêdiyan de stûxwar nemînin, ew jî bibin xwedî pirtûk...”<sup>104</sup>

Nivîskar û helbestvan Kemal Burkay jî di sala 1988an de bi navê “*Aliko û Baz*” pirtûkeke zarokan nivîsandiye. Ev pirtûk ji hêla weşanên Roja Nû ve hatiye çapkirin. Paşê wergera wê ya almanî û swêdî jî hatiye kirin.

Helbesteke Firat Cewerî a bi navê “*Zarokên Me*” di kovara zarokan a Hêviyê de hatiye weşandin.<sup>105</sup> Weşanxaneya Nûdemê ya ku berpirsyarê wî Firat Ceweriye jî gelek pirtûkên zarokan ên ku ji zimanên din hatine wergerandin, çap kiriye. Çend pirtûkên Astrîd Lîndgen, Hennîng Mankel û Per Nîlson ên ku wergera wan a kurdî hatine kirin, ji hêla weşanxaneya Nûdemê ve hatine çapkirin. Ji bilî Nûdemê, Weşanxaneya Apecê jî li Swêdê ji bo zarokan gelek pirtûk çap kirine û di sala 2016an de jî li Diyarbekirê şaxeke xwe vekiriye.

Çend rewşenbîrên kurd Amed Tigrîs, Mahmud Lewendî, Hesenê Metê, Seyîdxan Anter û Ali Çiftçi hatine li cem hev û di sala 2004an de bi navê

---

<sup>101</sup> Di behsa kovarên zarokan ên kurdî de em bi hûrgilî li ser van kovarên ku navê wan derbas dibin, sekinîn.

<sup>102</sup> Jack David Eller, *From Culture to Ethnicity to Conflict An Anthropological Perspective On International Ethnic Conflict*, The University Of Michigan Press, United States of America, 1999, r.174

<sup>103</sup> <http://www.saradistribution.com/childrenbooks.htm> 10.01.2017/ 17.54

<sup>104</sup> Firat Cewerî, *Kultur Huner û Edebiyat*, Weşanên Nûdem, Stockholm, 1997, r. 217

<sup>105</sup> Firat Cewerî, “*Zarokên Me*”, *Hêvî*, Weşanên Armanc, j. 4, Swêd, Gulan 1981, r. 16

“Ansîklopediya Zarokan” ansîklopediyek weşandine.<sup>106</sup> Ev ansîklopedî ji aliyê Weşanxaneyê Apecê ve hatiye çapkirin.

Di salên dawîn de jî (2014) antolojiyêke çîrokan a bi navê “Hebû Tûnebû Antolojiya Çîrokên Zarokan” ya Zinarê Xamo ji hêla Weşanxaneyê Rûpelê ve hatiye weşandin.

### 1.5.3. Tirkîye

Kesên ku me navê wan di beşên Sovyet û Swêdê de behs kirin gelek ji xwe rewşenbîrên kurdan ên ku li Tirkîyeyê hatine dinyayê ne. Ev kes paşê ji ber sedemên siyasî, aborî û taybet koçî dervayî welêt dikan. Ji ber vê emê navê wan û berhemên wan dubare nekin.

Lê di bin serenava Tirkîyeyê de divê bê gotin ku di salên dawîn de du weşanxaneyên ku bi taybetî ji bo zarokan berheman diweşînin, hatine avakirin. Ev weşanxane pirtûkên boyaxkirinê, pirtûkên rêzimanê, çîrokan, ferhengan û hin materyalên din ên wek van ji bo zarokan amade dikan. Ji wan yek Weşanxaneyê Hîvayê ye ku di sala 2014an de li Diyarbekirê hatiye avakirin. Xwediyê wê Mem Bawer e û ew bi xwe jî ji bo zarokan berheman dinîvîse. Weşanxaneyê din jî Weşanxaneyê Morîzarokê ye ku ew jî di sala 2015an de hatiye avakirin.

Herdu weşanxane nivîskarên ciwan di serî de bi kadroyêke berfireh ve kedê didin ku ji bo zarokên kurd berheman çap bikin. Xwediyê Weşanxaneyê Hîvayê Mem Bawer di hevpeyvîneke xwe de navê van nivîskaran wiha rêz dike:

“Bêrî Bihar, Îsmâil Dîndar, Yaqob Tilermenî, Mîran Janbar, Berfîn Ayşe Ögüt, Mahmûd Nêşîte, Mûrad Dildar, Şukran Çaçan, Hasîp Yanlıç, Ferîdûn Bîrgul, Seyhan Karakoç, Berfîn Îde Demîral, Yasemîn Elban, Amed Tîgrîs, Mahmûd Lewendî, Kerem Tekoglu, Janya Acar, Amed Gernas, Jîr Dilovan, Yunis Bahram, Yehya Elewîferd, Konê Reş, Aynur Özbay, Benûşe Elewîferd, Rustem Felat, Roza Metîna, Hîva Yüce ve Mem Bawer.”<sup>107</sup>

<sup>106</sup>[https://ku.wikipedia.org/wiki/Ans%C3%AEklopediya\\_zarokan\\_\(pirt%C3%BBk\)](https://ku.wikipedia.org/wiki/Ans%C3%AEklopediya_zarokan_(pirt%C3%BBk))  
02.01.2017/ 18.17

<sup>107</sup><http://bianet.org/cocuk/toplum/172500-mem-bawer-kurt-folkloruyla-gelisen-cocuk-edebiyati-bin-yillardir-var> 02.01.2017 /19.12

Li Tirkiyeyê ji bilî nivîskar û weşanxaneyan hin kovarên zarokan ên kurdî jî hatine weşandin. Wek; “Dergûş”, “Agirê Tûtê”, “Şemamok”, “Zarokên Rojê”, “Perperok”, “Bûka Baranê”.<sup>108</sup>

Ji bilî van, wênesaz Rıza Topalê ku bi eslê xwe ji Dersimê ye û koçî Almanyayê kiriye jî ji bo zarokan helbest û fabl nivîsandine. Topal di hevpeyvînekê de wiha behsa vê dike: “Min bi xwe jî nêzîkî 200 helbest û 20 fabil, çîrokên zarokan yê dirêj nivîsandine. Ji bilî van jî min zêdeyî 3500 helbest nivîsandine. Hemû jî bi kurdî, bi zaravayê kurmançî ne. Ji van helbestên min hinek polîtîk, çîrokders, fikrî, ilmî, felsefî û di her cûreyî de hene.”<sup>109</sup>

#### 1.5.4. Îran

Li Îranê jî ji bo zarokan hin tişt hatine nivîsandin lê der barê wan de em negihîştine agahiyên berfireh. Rıza Şivan di gotara xwe ya mijara wê edebiyata zarokane de dibêje tiştê balkêş ew e ku li Îranê zêdetir jinan li ser zarokan nivîsandine. Şivan dema behsa nivîskarên ji bo zarokan berhem dane dike navê wan wiha rêz dike; Sîmîn Çayçî, Elî Rıza Mihemedyan, Kelsum Osman Pour, Gulale Sitawend, Seher Mîhrebanî, Evdilrehman Fehîmî, Şîlan Geylanî, Suxra Kerîmî, Selah Nîsarî, Afîfe Mehmûdzade, Leyla Sallhî, Ehmed Behramî û h.w.d.<sup>110</sup>

Heke mijar bi kurtasî bê zelalkirin, mirov dikare bibêje ku li gor dîroka edebiyata zarokan berhemên ku ji bo zarokan hatine nivîsandin gelemperî di cihanê de jî, di edebiyata kurdî de jî li gor yê mezinan kêmtir in. Gelek caran nivîskaran yan tiştên gelerî berhev kirine, yan jî zimanên din werger kirine. Lê ev nêrîn pişt re guheriyê û ji bo zarokan zêdetir berhem hatine nivîsandin.

---

<sup>108</sup> Di mijara kovarên zarokan ên kurdî yê ku li Tirkiyeyê hatine weşandin de me der barê wan kovaran de agahiyên berfireh dan.

<sup>109</sup> Cewerî, *Kultur Huner û Edebiyat*, r. 359

<sup>110</sup> <http://www.gulan-media.com/sorani/articles.php?eid=61&id=1328> 13.03.2016/ 20.35

### 1.5.5. Iraq

Li Başûr jî hin nivîskar û helbestvanên kurd hewl dane ku ji bo zarokan xebatan bikin. Her çiqas ji van gelek ne wek pirtûk û berhem hatibin çapkirin jî, wek çîrok, fabl û helbest di kovar û rojnameyan de hatine nivîsandin.

Li gor agahiya Rezaw Reşîd Sebrî, yekem çîroka zarokan a wek pirtûk hatiye çapkirin, çîroka "*Kelekok*"e ku nivîskarê wê Îsa Elî ye. Ev pirtûka ku bi devoka kurmancî hatiye nivîsandin di sala 1927an de li çapxaneya Zarî Kurmancî li Rewandizê hatiye çapkirin. *Kelekok* ji aliyê naverokê ve çîrokeke komediyê ye. Sebrî wiha behsa edebiyata zarokan a li Başûr dixe:

“Duyemîn çîroka zarokan ku di qada edebiyata kurdî de hatiye nivîsandin jî çîroka Xoşî û Tirşî ye. Ev pirtûk di navbera salên 1926 û 1927an de ji aliyê Husên Huznî Mukriyanî ve li Rewandizê di çapxaneya Zarî Kurmancî de hatiye çapkirin. Xoşî û Tirşî çîrokeke folklorî ye û li ser zimana heywanan guftugoyek e. Çîrok di navbera gur û bizin û merr ê re derbas dibe.

Di salên siyî de jî Şakir Fetah çîroka Kamil Geylanî "*Xanuweyî Tazeya*" a ku bi erebî hatiye nivîsandin, wergerande zimanê kurdî. Şakir Fetah di sala 1945an de bi navê "*Çîrok Bo Mindalan*" pirtûkek li Bexdayê çap kir. Ev pirtûk ji 8 çîrokan pêk tê ku piraniya wan li ser zimanê heywanan (fabl) hatine nivîsandin.

Di salên çilî de jî li gelek çîrok hatine nivîsandin, lê tev çîrok di nav kovar û rojnameyan de hatine weşandin. Wek kovarên Gelawêj û Dengî Gêfî Taze. Bi şiklê pirtûk bi tenê pirtûkeke Şakir Fetah a bi navê "*Hawrêy Minall*" ya ku tê de çîroke bi navê "*Şagirdî Serkewtû*" heye di sala 1948 hatiye çap kirin.<sup>111</sup>

Rezaw Reşîd Sebrî dema behsa Şakir Fetah (1914-1988) û berhemên wî dixe dibêje navê pirtûka wî "*Çîrok Bo Mindalan*" e û ev pirtûk ji 8 çîrokan pêk tê, lê Reza Şivan di nivîseke xwe ya ku ji 4 beşan pêk tê de behsa edebiyata zarokan a li Başûr dixe, dema behsa Şakir Fetah dixe jî wiha agahiyê dide:

“Di sala 1935an de wî 8 çîrokên erebî wergerandine kurdî û di sala 1948an de jî wî ev çîrok bi navê "*Hewrêyê Minal*" wek pirtûk weşandiye. Projeyeke wî ya ku 100 kitêbên

---

<sup>111</sup> Rezaw Reşîd Sebrî, *Çîrokî Mindalan Li Edebî Kurdî De* (1991-2005), Çapxaneya Hacı Haşim, Hewlêr, 2010, r. 48-51

zarokan ên ku wê ji zimanên din wergeranda kurdî hebû. Ji wan çend heb çap kir, lê rejima baas suikast kir ew kuşt û nehîst ku ew projeya wî pêk bê.”<sup>112</sup>

Helbet edebiyata zarokan a li Başûr bi tenê ji van kesan pêk nayê. Bi taybetî piştî salên 1940î her ku diçe edebiyata zarokan a kurdî dewlementtir dibe û helbestvan û nivîskarên din jî ji bo zarokan hewl didin berhemana binivîsin. Reza Şivan ji wan navê hin kesan wiha rêz dike;

“Evdilwahîd Nûrî di sala 1940î de bi navê “Pîrozî Mindal” pirtûkeke zarokan li çapxaneyê Jîn çap kir. Bi kurdiyêke ciwan ji bo zarokan nivîsandiyê. Piştî sala 1991an çend nivîskarên kurd ji bo zarokan pirtûk nivîsandine û edebiyata zarokan a kurdî geştir bûye. Ji wan nivîskaran hinek Ferîdun Elî Emîn, Elî Evdilla Şewnîm, Omer Evdilrehîm, Letîf Helmet, Daykî Solav, Ceza Elî Emîn, Ata Qezaz, Mihemed Ferîq Hesên, Tahir Salih Seîd, Rustem Bacelan, Şukir Mistefa, Reza Şivan, Hoşyar Huseyîn, Mihemed Reşîd Fetah, Nûrî Seîd Qadir, Rîwas Ehmed, Fehmî Kakeyî, Osman Derwêş Şukur, Kerîm Şareza, Yasîn Qadir Berzencî, Elî Mendelawî, Mihemed Salih Klêseyî, Rizgar Kerîm Seîd, Burhan Qeredaxî, Kawey Ehmed Mîrza, Îbrahîm Ehmed Baldar, Simko Nakam, Kazim Koyî, Ezîz Mela Reş, Sadullah Şêxanî, Giriftar Kakeyî, Kakey Felah, Latîf Helmet, Kurdistan Mukriyanî, Sebrî Botanî.”<sup>113</sup>

Helbestvanê navdar Ebdullah Peşêw jî ji bo zarokan helbest nivîsandine ku wek mînak helbesta wî ya bi navê “Duwanze Wane Bo Minalan” di sala 1981an de di kovara zarokan a “Hêvî”yê de hatiye weşandin.<sup>114</sup>

## 1.6. Destpêka Kovarên Zarokan Li Cîhanê

Peyva çapemeniyê ewil rojnameyan fîne bîra mirovan, lewra beriya kovaran û weşanên din ên medyayê ewil rojnameyan dest bi weşanê kiriye. Lê her çiqas rojname bîra mirovan jî, di dîroka çapemeniyê de cihê kovaran jî taybet e. Di kovaran de bûyerên girîng ên wê serdemê tîne çapkirin. Ji bilî vê kovar bi mijarên ku diweşînin ve kêma an jî zêde behsa fikr, nêrîn, pîrsgirêk û agahiyên wê serdemê dikin. Ji ber van taybetmendîyan kovar pîr girîng in. Li gor rojnameyan kovar sînorên xwe xêz dikin û cure cure tîne weşandin. Weke mînak kovarên jinan, ên mêran, zarokan, pîşeyên cuda, yê zanistê, edebiyatê, dîrokê, werziş, henek, seyhat, turîzm, wesayît

<sup>112</sup> <http://www.gulan-media.com/sorani/articles.php?eid=61&id=1328> 13.03.2016/ 17.40

<sup>113</sup> <http://www.gulan-media.com/sorani/articles.php?eid=61&id=1328> 13.03.2016 / 18.36

<sup>114</sup> Ebdullah Peşêw, “Duwanze Wane Bo Minalan”, *Hêvî*, j. 7, Swêd, Tebax 1981, r. 13-15

û h.w.d.. Ev cur be curbûn û rengînûn nîşan dide ku cihê kovaran taybet e û ew weşanên biqîmet in.

Li gor ferhenga Cambridgê kovar; “Cureyekî pirtûkê ya zirav û xwedî rûpelên mezin e ku tê de nivîs û wêne hene, yan her hefteyê û yan jî mehê carekê tê çapkirin.”<sup>115</sup>

Alev Sınar Çılgın dema behsa girîngiya kovaran dike dibêje ku di kovarê de armanc ew e ku agahiyên mayînde û yê ku tiştan fêrî mirovan dike bîn weşandin. Çılgın taybetmendiya kovaran wiha tîne ziman:

“Kovar di edebiyata zarokan de xwedî cihêkî taybet e. Lewra wek cureyên edebiyatê yê ku me berê behs kiribûn yek alî nînin. Hemû cureyan bi xwe de dihevin. Ji bilî zugotinok, pêderxistin, çîrok, hîkayet, qisimeke roman û tiyatroyê, cih didin tefrîka, biyografî, nivîsên bîranîn û gerê, fikra, sohbet, ceribandin, maqale, karîkatur, wêne û xaçepirsan jî.”<sup>116</sup>

Mustafa Ruhi Şirin jî dema behsa kovarên zarokan dike balê dikêşe li ser fikrên Jean-Noel Kapferer û dibêje ku li gor Jean-Noel Kapferer di navbera zarok û kovara wê/wî de têkiliyeke taybet heye. Dema mirov lê dinihêre mirov dibîne ku têkiliya zarokê û ya bi televizyonê qasî ya kovarê erênî nîne. Kapferer dibêje ku zarok li gor televizyonê, zêdetir nêzikî pirtûk û kovaran dibe û vê fikra Kapferer wiha tîne ziman; “...zarok di televîzyonê de nikare paşvehildanan (ing. feedback) bi dest bixe, herikandina dîmenan nikare li gor xwe amade bike. Şertên temaşekirinê yan li gor daxwaza kesên malbatê, yan jî li gor pêdiviyên bernameyan ji derve ve wî/wê mecbur dike.”<sup>117</sup>

Wek ku me behs kir di kovaran de ji ber ku him wêne û him jî cureyên din ên edebiyata zarokan hene, kovar her tim bala zarokan dikêşin. Zarok bi saya kovaran tiştên nû hîn dibin û keşif dikin, bi xeyalan ve diçin alemeke din û tîn. Ev jî dibin sedem ku zarok di dahatûyê de bibin xwendekarên baş ên edebiyatê.

<sup>115</sup> <http://dictionary.cambridge.org/dictionary/english/magazine> 16.02.2016/18.39

<sup>116</sup> Alev Sınar Çılgın, *Çocuk Edebiyatı*, Morpa Kültür Yayınları, İstanbul, 2007, r. 205

<sup>117</sup> Şirin, *Çocuk Edebiyatı Kültürü “Okuma Alışkanlığı ve Medya Sarmalı”*, r. 186 Alıntı Jean-Noel Kapferer, *Çocuk ve Reklam*, Çev. Şermin Önder, İstanbul, Afa Yayınları, 1991, r. 47

Di cihanê de kovaran di sedsala 17emîn de dest bi weşanê kirine. Li rojavayê kovarên ewil ên ku hatine weşandin kovarên zanistî bûn ne kovarên zarokan. Kovara ewil di sala 1665an de li Fransayê bi navê “*Journal de Scavant*” (Kovara Zanayan) hatiye weşandin. Piştî vê kovarê di sala 1682an de li Leipziga bajarê Almanyayê bi navê “*Acta Eruditorum*” (Kovara Fêrbûnê) kovereke latînî ya ku tê de maqaleyên matematik û fenê hene, hatiye çapkirin. Di sala 1688an de jî kovareke almanî ya bi navê “*Monatsunterredungen des Thomasius*” (Civînên-Hevpeyvînên Mehane yê Thomasiûsê) hatiye çapkirin. Armanca van kovarên ewil fêrkirin û di navbera zanyaran ên ku li bajarên din dijîn de pêwendiyek ava kirin e. Paşê kovarên polîtîk, dîrokî û yê ilmî jî hatine çapkirin.<sup>118</sup>

Piştî ku çapemenî pêş ve diçe û kovarên cur be cur tîne weşandin, ji van yek jî dibê kovarên zarokan. Di çapemeniyê de kovarên zarokan qasî sed sal piştî kovarên mezinan tîne çapkirin. Ev kovar li Ewropayê ewil zêdetir ji bo armanca fêrkirinê û perwerdedayîne tîne weşandin. Lê pişt re ji bo kêf û mîzahê jî ji bo zarokan kovar tîne çapkirin.

Der barê yekem kovara zarokan a cihanê de hin nanokî hene. Li gor hin kesan kovara “*Leipziger Wochenblatt für Kinder*” (Ji bo Zarokan Leipziger Hefteyî) ya ku di sala 1722an de li Leipziga bajarê Almanyayê hatiye weşandin, di kovargerîya zarokan de kovara ewil e. Hüseyin Şimşek destnîşan dike ku di vê kovarê de çîrok, fabl, mijarên siruştê, name û hin tiştên din hebûye. Dîsa di heman salê de (1722) kovareke almanî ya bi navê “*Nidergaschisches Wochenblatt für Kinder*” (Ji bo Zarokan Nidergaschisches Hefteyî) kovareke zarokan a duyemîn hatiye weşandin û gelek xwendekarên vê kovarê jî çêbûne. Di vê kovarê de jî hema hema wek kovara “*Leipziger Wochenblatt für Kinder*” heman mijar hatine hilbijartin û li ser van mijaran nivîs hatine nivîsandin.<sup>119</sup>

Li gor Tacettin Şimşek jî yekem kovara zarokan a cihanê “*Lilliputian Magazine*” (Kovara Biçûkan- Bejnurtan) e û Şimşek wiha dibêje:

<sup>118</sup> Hüseyin Şimşek, “XIX Yüzyıl Çocuk Dergiciliği ve Eğitsel İşlevleri Üzerine” *Milli Eğitim Dergisi*, 151 sayı, Temmuz-Ağustos-Eylül 2001, r. 2-3

<sup>119</sup> Şimşek, *Milli Eğitim Dergisi*, r. 3

“Yekem kovara zarokan a cihanê ya ku ketiye nav qeydan weşana demkî “Lilliputian Magasine” e û ji hêla John Newbery ve di sala 1751an de hatiye derxistin. Kovar bi îdiaya ‘divê xanim û begên civan bixwînin’ derketiye holê û ebatên wê 10x5 santêm e. Peyva Lilliputianê ya ku di kovarê de derbas dibe navê welatê cûceyan (bejnkurt) a ku Gulliver lê geriyabû ye. Kovara ku bi dîmenan ve hatiye xemilandin de meselok, hîkaye, tiştanok û helbest dihatin weşandin. Kovara ku salekî derket, di 3ê tîrmeha 1752an de hejmara xwe ya dawîn weşandiye.”<sup>120</sup>

Piştî van hin kovarên din jî hatine çapkirin. Hüseyin Şimşek dema behsa kovarên zarokan ên ku li Îngiltereyê hatine weşandin dike wiha dibêje:

“Li Îngiltereyê kovara bi navê “Juvenile Magazine” (Kovara Zarokan) di sala 1788an de hatiye weşandin. Pişt re di sala 1799an de kovara zarokan a bi navê “The Childers Magazine” (Kovara Zarokan) dest bi weşanê kiriye. Herdu kovar jî her çiqas bi nav û deng bin jî, weşana wan zêde dewam nekiriye û piştî demeke kin dev ji weşanê berdane. Ji bilî van li Îngiltereyê bi navê “Children’s Friends”, (Hevalê Zarokan) “Infant’s Magazine”, (Kovara Derguşan) “The Charm”(Dilkêş-Cazîbe) (1852-1854) û “The Boy’s Own Magazine” (1855-1874) (Kovara Zarokan a Bi Xwe) kovarên zarokan hatine weşandin. Kovara bi navê “The Child’s Companion” (1824) (Hevalê-Rêhavlê Zarokan) kovara ku di sedsala 19emîn de kovara ewil a zarokane ku hatiye weşandin. Taybetmendiya wê ya din jî ev e ku kovara herî temendirêj e. Lewra qasî sed salan hatiye weşandin.”<sup>121</sup>

Li Amerîkayê kovara zarokan a ewil “*The Juvenile Miscellany*” (Berhevoka Zarokan) e û di sala 1826an de li Bostonê hatiye weşandin. Ji ber ku di hin nivîsan de dihat gotin ku divê koletî ji holê rabe, piştî 8 salan dev ji weşana xwe berda.<sup>122</sup>

Di navbera salên 1789 û 1873an de li Amerîkayê qasî 400 kovar û weşanên periyodîk hatine weşandin. Ji wan gelek ji salekî kêmtir, hinek jî hejmarek an jî du hejmaran hatine weşandin. Hin sal ji salên din çêtir bûne wek sala 1841an. Lewra di sala 1841an de 14 kovar hatine weşandin. Lê di hin salan de jî ev hejmar kêmbû ye, wek sala 1857an. Di vê salê de jî 11 kovar derketine û di sala 1858an de dawiya weşana xwe anîne. Li Amerîkayê kovarên ku di navbera vê demê de hatine derxistin

<sup>120</sup> Şimşek, *Çocuk Edebiyatı*, r. 208

<sup>121</sup> H.b., r. 3

<sup>122</sup> Mustafa Ruhi Şirin, *99 Soruda Çocuk Edebiyatı*, Çocuk Vakfı Yayınları, Ç. 3emîn, İstanbul, 2000, r. 242



herî zêde li bajarên New York, Boston, Phîladelphiyê hatine weşandin. Kêm kovar li derveyî van bajaran wek Ohîo, Maîne, Georgîa û Mîchîgane hatine çapkirin. Dema şerê navxweyî derfeta zarokên li eyaletên başûr dijiyan nema ku kovarên bakur bişopînin, lê wan dikaribû kovarên xwe yên ku li Arkansas, Îndîana û Calîfornîyê dihatin weşandin bişopînin. Ev kovar ji bo çanda Amerîkayê ya ewil kovarên perwerdeyê, yên edebiyatê û gelek ji wan jî yên dînî bûn. Ji bo zarokên katolîk, protestan, cihû, yên girêdayî mezheba mormonê, yên ku zimanê wan ê dayikê polînezyayî an jî almanî ne jî kovar derdiketin. Ji bilî van, kovarên dijî koletiyê, yên dijî alkolê jî dihatin weşandin.<sup>123</sup>

Mustafa Ruhi şirin ji bo kovarên zarokan ên ku li Amerîkayê hatine çapkirin wiha agahiyê dide;

“Li vî welatî kovarên zarokan piştî navîna sedsala 19emîn ji hêla şikl û naverokê ve gelekî pêşve çûne. Di kovara “Riverside Magazine” (Kovara Devê Çem) ya ku 1867an de hatiye weşandin de yekem car çîrokên Andersan hatine wergerandin. Dîsa kovara “Our Young Folks” (Gelê Me yê Ciwan) ya ku di heman tarîxê de hatiye weşandin de kadroyeke nivîskar û wênexêzan a bixurt ve hewl hatiye dayîn ku edebiyata zarokan a Amerîkayê pêşve here. Piştî vê, kovara “Francis Hodgson Burnette” (1849-1924), kovara “St. Nicholas Magazine” (Kovara Ezîz Nîcholas) ya ku bi nivîsên nivîskarên navdar ên wek Mark Twain û Jack London (1876-1916) ve hatine xemilandin û kovara “Harper’s Young People” (Ciwanên Harpersê) hatine weşandin.”<sup>124</sup>

Li Fransayê di kovarên zarokan ên ewil “*Le Musée des Familles*” e (Muzeya Malbatan) ku di sala 1833an de hatiye weşandin. “*Magazine d’Education et de Recréation*” (Kovar Perwerde û Bêhnvedan) jî di sala 1864an de hatiye weşandin. Kovarê hewl daye ku nirxên exlaqê hînî zarokan û dê û bavên wan bike.<sup>125</sup>

Kovargeriya zarokan a Tirkiyeyê li gor Ewropa û Amerîkayê dereng dest pê kiriye. Kovara ewil a zarokan “*Mümeyyiz*” e. Kovara Mümeyyizê di heyama Tanzîmatê (1869) de wek pêveka rojnameya Mümeyyizê hatiye weşandin. Ev kovara ku heta sala 1870an 49 hejmar hatiye weşandin di heyama Tanzîmatê de kovara herî

<sup>123</sup> <http://www.merrycoz.org/bib/intro.xhtml> 02.01.2016/13.45

<sup>124</sup> H.b., r. 242

<sup>125</sup> <http://www.arastirmax.com/system/files/dergiler/69633/makaleler/12/arastirmax-turk-cocuk-dergilerinde-tarih-1918-1931.pdf> 13.03.2016/12.35

temendirêj tê zanîn. Hejmara 17emîn wek hejmara taybet hatiye weşandin, heke mirov wê jî bijmire dibe 50 hejmaran.<sup>126</sup>

Ji bilî Mûmeyyîzê di sala 1873an de kovara “*Hazine-i Etfâl*” hatiye weşandin.<sup>127</sup> Di sala 1875an de sê kovarên bi navê “*Sadakat*” (Dilsozî), “*Etfâl*” (Zarok) û “*Ayîne*” (Neynik) ji bo zarokan hatine weşandin. Kovara “*Arkadaş*” (Heval) di sala 1876an de, kovarên bi navê “*Tercüman-i Hakikat*”, (Tercumanê Rastiyê), “*Aile*” (Malbat) û “*Bahçe*” (Baxçe) jî di sala 1880an de gihîştine deste zarokan. “*Çocuklara Arkadaş*” (Ji Zarokan Re Heval) û “*Çocuklara Kıraat*” (Ji Zarokan Re Xendin) jî di sala 1881an de hatine weşandin. “*Vasitâi Terakkî*” (Wasitaya Pêşveçûnê) di sala 1882an de, “*Etfâl*” (Zarok) di sala 1886an de, “*Çocuklara Mahsus Gazete*” (Rojnameya Ji Bo Zarokan) jî di sala 1896an de hatiye weşandin.<sup>128</sup>

Hin kovarên zarokan ên ku di sala 1913an de hatine weşandin jî ev in; “*Çocuk Yurdu*”, (Welatê Zarokan) “*Türk Yavrusu*” (Derguşa Tirk), “*Çocuk Duygusu*” (Hesta Zarokan), “*Çocuk Bahçesi*” (Baxçê Zarokan), “*Mektebli*” (Mektebvani). Di sala 1923an de jî “*Musavver Çocuk Postası*” (Nameya Zarokan a Biwêne) û “*Yeni Yol*” (Rêya Nû) hatine weşandin. “*Haftalık Resimli Gazete*” (Rojnameya Biwêne ya Hefteyî) di sala 1924an de, “*Gençlik*” (Ciwani) di sala 1928an de, “*Şen Çocuk*” (Zaroka Şên) di sala 1932an de, “*Yavrutürk*” (Zaroka Tirk) di sala 1936an de, “*Oklahoma*” (Oklahoma) di sala 1935an de, “*Binbir Roman*” (Hezar û Yek Roman) di sala 1939an de, “*Ateş*” (Agir) di sala 1936an de, “*Cumhuriyet Çocuğu*” (Zarokê Komarê) di sala 1938an de, “*Çocuk Gazetesi*” (Rojnameya Zarokan) di sala 1938an de, “*Çocuk Haftası*” (Hefteya Zarokan) di sala 1943an de hatine weşandin.<sup>129</sup>

---

<sup>126</sup> Yavuz Bayram, “Türk Edebiyatının İlk Çocuk Dergisi: Mûmeyyîz (1869-1870)”, *Hece Dergisi Çocuk Edebiyatı Özel Sayısı*, r.104-105, Ankara, Ağustos- Eylül 2015, r. 484-500

<sup>127</sup> Cüneyd Okay, “Eski Harfli Çocuk Dergileri”, *Türkiye Araştırmaları Literatür Dergisi*, cild 4, j. 7, İstanbul, 2006, r. 511

<sup>128</sup> Çıkla, *Hece Dergisi*, r. 97

<sup>129</sup> <http://fabilog.com/osmanli-dan-gunumuze-cocuk-dergileri/> 30.05.2016/21.00

## 1.7. Di Kovarên Kurdî De Nivîsên Ji Bo Zarokan Hatine Weşandin

Heta salên 1980yî ji bo zarokan zêde kovar nehatine derxistin. Di çend kovaran de rûpelek an jî du rûpel ji bo zarokan hatine veqetandin, bes hew. Nivîsên van rûpelan jî çiqas li gor asta zarokan in, ev mijareke din e. Piştî salên 1980yî li Başûr, li Ewropayê (bi taybetî jî li welatê Swêdê) ji bo zarokan kedeke mezin hatiye dayîn, ji bo wan pirtûk û kovar hatine weşandin. Di vê beşê de em ê bi tene behsa çend kovarên kurdî yên ku tê de ji bo zarokan hin nivîs hatine weşandin bikin.<sup>130</sup>

### 1.7.1. Jîn

Kovara Jînê di 7ê mijdara sala 1918an de piştî Şerê Cihanê ya Yekemîn li Stenbolê ji hêla Hemze Begê Muksê û Memduh Selîm Beg ve hat çapkirin. Zimanê kovarê tirkî û kurdî ye. Di kovarê de bi zaravayê soranî jî nivîs hatine nivîsandin. Ji hejmara ewil heta hejmara 20an Hemze Begê Muksê berpirsariya kovarê hildide ser milê xwe. Lê piştî hejmara 20an Memduh Selîm Beg dibe berpirsaryarê kovarê. Der barê vê de Müslüm Yücel wiha dibêje: “Li gor hinekan ji ber hikûmetê, li gor hinekan jî ji ber lihevnekirina kesên Cemiyeta “Kurd Te’avûn Ve Terakkî” (Alîkarî û Pêşveçûna Kurdan) kovar hat girtin. Kovar 25 hejmar hatiye çapkirin, di 2yê cotmeha 1919an de hatiye girtin.”<sup>131</sup> Piştî hejmara 26emîn wek rojnameyeke hefteyî tê weşandin.<sup>132</sup>

Gelek nivîskar û helbestvanan di kovara Jînê de nivîsandine. Xelîl Xeyalî, Pîremêrd (Silêman Tewfîq), Evdirehman Rehmî, Silêman Botî, Mîrzayê Cizirî û çend kesên din nivîskarê kovarê bûne. Ji ber ku helbestên gelek xweş ên helbestvanên kurd hatine weşandin kovar ji hêla helbesta kurdî ve gelek dewlemend e.<sup>133</sup>

<sup>130</sup> Kovarên ku gihîştin destên me an jî me der barê wan de agahî bi dest xistin, hatin nivîsandin.

<sup>131</sup> Müslüm Yücel, *Kürt Basın Tarihi -Tekzip*, Aram Yayınları, İstanbul, Nisan 1998, r. 60

<sup>132</sup> Mesud Serfiraz, *Kurd, Kitêb, Çapxane Weşangeriya Kitêbên Kurdî di Dewra Osmaniyan de (1844-1923)*, Weşanên Peywend, Stenbol, 2015, r. 68

<sup>133</sup> Yücel, *Kürt Basın Tarihi-Tekzip*, r. 60

Di kovarê de mijarên wek hişyarkirina kurdan, komele, dîn, welatparêzî, ziman û edebiyata kurdî, yekîfî û hevrapûn, perwerde, dîrok, efsane, rêgezên Wilson, ji Îngiltereyê daxwaz û hêvî, nifûs û koçkirin hatine nivîsandin.<sup>134</sup>

Qasî ku tê zanîn di hejmarên kovarê yê 8emîn, 22yemîn, 23yemîn û 25emîn de ji bo zarokan 4 helbest hatine weşandin. Kadri Yıldırım, Ramazan Pertev û Mustafa Aslan der barê vê de wiha agahiyê didin:

“Di kovarê de ji bo zarokên kurdan bi navê “Yekdeng”, “Serê Sibê”, “Le Ber Rohî Kurde Biçûkan” û “Ji Bo Nesla Têt” çar helbest hatine nivîsandin. “Yekdeng” û “Serê Sibê” helbestên Hîlmîyê Siwerekî ne. “Le Ber Rohî Kurde Biçûkan” helbesta Lahûtî Xanî Kermanshahî ye. “Ji Bo Nesla Têt” helbesta Evdirehîm Rehmî Hekariyan e. Ev berhem di nav edebiyata zarokan de di nav nimûneyên pêşîn de ne.”<sup>135</sup>

### 1.7.2. Zarî Kurmancî

Kovara Zarê Kurmancî di navbera salên 1926 û 1932an de li Rewandîzê hatiye weşandin. Kovarê girîngî daye zarokan û ji ber vê di hin hejmarên xwe de gotar û çîrokên taybet ji bo zarokan belav kiriye. Mînak di hejmara 10emîn de çîrokeke bi navê “Deh Meyweyî Dar û Beranî Têdegel”, di hejmara 19emîn de jî guftogoyek bi navê “Mindalî Emro Piyawiy Sibeyniye Lazime Amade Bikirê” hatine weşandin. Ev guftugo di navbera bav û kurekî de derbas dibe.<sup>136</sup>

### 1.7.3. Hawar

Kovara Hawarê ya ku di nav kurdan de bi nav û deng e, di 15ê gulana 1932an de li Şama paytextê Sûriyeyê dest bi weşanê kir. Ji malbata Bedirxaniyan Celadet û Kamiran Bedirxan ji sala 1932an heta 15ê tebaxa 1943an Hawarê derxistin. Kovar bi kurdî 57 hejmar hatiye weşandin. Di hin hejmarê kovarê de nivîsên frensî jî hene.

Di çend hejmarên ewil ên Hawarê de ji bo zarokan bi serenava “Stûna Zarowan” beşek hatiye amadekirin. Di vê beşê de gelemperî helbestek tenê hatiye

<sup>134</sup> Habîp Dursun, *Jîn Dergisi'nde Kürt Milliyetçiliği*, Atılım Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Siyaset Bilimi ve Kamu Yönetimi Ana Bilim Dalı, Yayınlanmamış Tez, Ankara, 2013, r. 30

<sup>135</sup> Kadri Yıldırım- Ramazan Pertev- Mustafa Aslan, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, r. 64

<sup>136</sup> Sebrî, *Çîrokî Mindalan Li Edebî Kurdî De* (1991-2005), r. 40

weşandin. Di hejmara ewil a Hawarê de helbesteke bi navê “Buhar” a ku ji çar çarînan pêk tê hatiye nivîsandin. Navê helbestvan di kovarê de xuya nake.<sup>137</sup>

Di hejmara duyemîn a Hawarê de jî dîsa ji bo zarokan helbestek di bin beşa “Stûna Zarowan” de hatiye weşandin. Navê helbestê “Tola Welêt” e û ew di 7ê tîrmeha 1931an de hatiye nivîsandin. Di bin vê helbestê de jî ji bilî tarîxa ku hatiye nivîsandin navê kesê ku helbest nivîsandiye nehatiye diyarkirin.<sup>138</sup> Lê îxtimalek mezin e ku helbest û nivîsên di bin beşa “Stûna Zarowan” de hatine nivîsandin wek gelek nivîsên kovara Hawarê ji hêla Celadet Bedirxan ve hatibin nivîsandin.

“Stûna Zarowan” di hejmara sêyemîn a Hawarê ya ku di 15ê hezîrana 1932an de hatiye weşandin de dewam dike. Di vê hejmarê de Celadet Elî Bedirxan bi serenava “Şeva We Xweş” helbestek ji bo zarokan nivîsandiye.<sup>139</sup>

Di hejmara 5emîn a kovara Hawarê de jî ji bo zarokan tişt hatine nivîsandin. Hereqol Azîzan (navê Celadet Bedirxan ê mustear e) helbesteke bi navê “Alê Qurdan” û loriyeke bi navê “Delaliya Zarowan” a ku Emîn Elî Bedirxan dema zarokên wî biçûk bûne ji wan re gotiye, nivîsandiye.<sup>140</sup>

Ji bo zarokan di hejmara 30 emîn a kovara Hawarê de navekî mustear Derketîkî Dersimî bi serenava “Kurd Yek in”<sup>141</sup> nivîsek, Nûredîn Êsif jî bi serenava “Ji Xortan re”<sup>142</sup> nivîsek nivîsandine.

#### 1.7.4. Gelawêj

Kovara Gelawêjê di navbera salên 1939 û 1949an de li Silêmaniyê hatiye çapkirin. Li gor agahiya Rezaw Reşîd Sebrî di kovarê de ji edebiyata zarokan çîrok, helbest û gotarên cur bi cur hatine weşandin. Bi taybetî di hejmarên dawîn yanê di sala xwe ya 9emîn de beşeke taybet a zarokan ya bi navê “Beşî Mindalan” hatiye amadekirin. Sebrî der barê beşa zarokan a di Gelawêjê de wiha dibêje:

<sup>137</sup> “Buhar” *Hawar*, j.1, 15 Gulan 1932, r. 4

<sup>138</sup> “Tola Welêt”, *Hawar*, j.2, 1 Hezîran 1932, r. 2

<sup>139</sup> Celadet Elî Bedirxan, “Şeva We Xweş”, *Hawar*, j. 3, 15 Hezîran 1932, r. 2

<sup>140</sup> Hereqol Azîzan, “Delaliya Zarowan”, *Hawar*, j. 5, 20 Tîrmeh 1932, r. 4

<sup>141</sup> Derketîkî Dersimî, “Kurd Yek in” *Hawar*, j. 30, 1 Tîrmeh 1941, r. 13

<sup>142</sup> Nûredîn Êsif, “Ji Xortan Re”, *Hawar*, j. 30, 1 Tîrmeh 1941, r. 14

“Di vê beşê de çîrok û nivîsên ji bo zarokan hatine weşandin. Di hin nivîsan de navê nivîskaran hatiye nivîsandin, di hinekan de nav tune ne, di hinekan de jî nav wek “R” hatiye nivîsandin û wisa ji bo zarokan nivîs hatine weşandin.

Mînak di sala 9emîn (1948) a kovarê di hejmara 11emîn de çîrokeke bi navê “Dala Sureke” hatiye weşandin. Gelemperî çîrokên Elaeddîn Seccadî di kovarê de hatine weşandin. Paşê ev çîrok û nivîsên Seccadî di pirtûkeke bi navê “Hemîşe Behar” de hatine berhevkerin û di sala 1960an de wek pirtûk hatine çapkirin.”<sup>143</sup>

### 1.7.5. Ronahî

Kovara Ronahiyê ji hêla Celadet Bedirxan ve di nîsana 1942an de li Şamê hatiye derxistin. Nivîskar û helbestvanên wek Osman Sebrî, Hesên Hîşyar, Qedrîcan yên ku kovara Hawarê de helbest, çîrok, pexşan dinivîsandin di Ronahiyê de jî nivîsandine. Taybetmendiya Ronahiyê ya ku 28 hejmar hat derxistin ew bû ku di kovarê de wêne jî dihatin weşandin. Di kovarê de fablên Celadet Bedirxan û Osman Sebrî hatine weşandin ku fabl ji bo edebiyata zarokan pir girîng in. Kadri Yıldırım, Ramazan Pertev û Mustafa Aslan di pirtûka xwe ya bi navê “Folklorê Kurdî” de wiha besha vê mijarê dîkin:

“Di kovara Ronahiyê de ji jimareya 5an pê de em rastî nivîsên folklorî tî. Celadet Bedirxan bi fablên kurmancî, Osman Sebrî bi fablên manzûm kovar hûnandine. Ji aliyê folklorê kurdî ve çend nivîsên girîng û balkêş hene. Fablên manzûm ên Osman Sebrî hem ji aliyê edebiyata gelerî û hem jî aliyê edebiyata zarokan ve gelekî girîng in.”<sup>144</sup>

Dîsa di heman pirtûkê de behsa çend fablên ku ji hêla Osman Sebrî ve ji bo zarokan hatine nivîsandin tê kirin û ew wiha dibêjin;

“Di hejmara 5emîn de fableke bi navê “Çîroka Dîk û Rovî”, di hejmara 6emîn de fableke bi navê “Şêr û Kêvroşk”, di hejmara 7emîn de fableke bi navê “Daweta Kêzê”, hejmara 8emîn de fableke bi navê “Mih û Şêr û Gur” di hejmara 9emîn de fableke bi navê “Ker û Heft Gur” yên ku kurmancî hatine nivîsandin hene. Dîsa di hejmara 12emîn de Osman Sebrî bi navê “Gurê Pîr”, di hejmara 13emîn de fableke bi navê

<sup>143</sup> Sebrî, *Çîrokî Mindalan Di Edebî Kurdî De* (1991-2005), r. 41-42

<sup>144</sup> Kadri Yıldırım- Ramazan Pertev- Mustafa Aslan, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, r.

“Kerê Dengbêj” yên helbestkî nivîsandiye. Di çend hejmarên din de jî fabl hatine weşandin.”<sup>145</sup>

Celadet Bedirxan bi navê “Bavê Cemşîd” di hejmara 19emîn a Ronahiyê de behsa pirtûkeke zarokan a bi navê “Kitêba Sînemxanê” dike û dibêje ku “Ev kitêb bi awayekî sade û sivik qala gramerê dike.” Bedirxan paşê ji pêşgotina wê kitêbê qismekê di bin serenava “Dîbaçe” di kovarê de weşandiye.<sup>146</sup> Dîsa di heman hejmarê de Bişarê Segman ji nivîskarekî Danîmarkî Hans Christian Andersen çîrokek wergerandiye kurdî. Segman çîroka Andersan a bi navê “Keçika Kibrîtfiroş” bi kurdî nivîsandiye. Di bin çîrokê de jî wek tarîxa nivîsandinê lê îlona 1943an-Dihok hatiye nivîsandin.<sup>147</sup>

### 1.7.6. Karakoçan

Kovara Karakoçanê ji hêla “Karakoçan Kùltür Eđitim ve Yardımlaşma Derneđi” (Komeleya Alîkarî, Çand û Perwerdeyê ya Karakoçanê) ve di nîsana 1969an de li Stenbolê di çapxaneyê Yörükê de hatiye weşandin. Xwediyê kovarê Sabrî Ünlü, midûrê kovarê Ahmet Zeki Okçuođlu û lijneya tertîpê jî Sabrî Ünlü, Ahmet Zeki Okçuođlu û Osman Aydın in. Kesên ku di kovarê de nivîsên wan derketine M. Emin Bozarşlan, Osman Aydın, Ferit Öngören û T. Haydargîl in. Ji bilî nivîsên wan, helbesta Ahmed Arif a bi navê “Adiloş Bebenin Ninnisi” (Lorika Derguşa Adiloşê) jî di kovarê de hatiye weşandin. Di kovarê de bi tirkî û kurdî nivîs hatine nivîsandin.

Di vê kovarê de nivîseke T. Haydargîl ya der barê lîstikên zarokan ên kurdî de nivîsek hatiye weşandin. Navê nivîsa Haydargîl di kovarê de wek “Doğuda Çocuk Oyunları ve Tekerlemeler” (Li Rojhelatê Lîstikên Zarokan û Zûgotinok) derbas dibe. Haydargîl di 4 rûpelên kovarê de behsa lîstikên zarokan û zûgotinokan dike. Di nivîsa xwe de çend mînakên zûgotinokan jî bi kurdî dide xwendevanan.

Haydargîl behsa lîstikeke zarokên kurdan dike û dibêje ku ev lîstik di navbera gur, berx û şivan de derbas dibe. Zarokekî ku dibe gur berxekî direvîne û şivan vê

<sup>145</sup> H.b., r. 81-82

<sup>146</sup> Bavê Cemşîd, “Kitêba Sînemxanê”, *Ronahî*, Sal: 2, j. 19, Çiriya Pêşîn 1943, r. 11-12

<sup>147</sup> Bişarê Segman, “Keçika Kibrîtfiroş”, *Ronahî*, Sal: 2, j. 19, Çiriya Pêşîn 1943, r. 18-19

berxê ji destê gur xilas dike. Di dawiya lîstikê de hemû zarok wek berxan dikin kalekal, diçin şivan maç dikin û lîstik wiha xilas dibe.<sup>148</sup>

### 1.7.7. Roja Nû

Roja Nû di mijdara 1978an da wek weşana Komeleya Karkerên Kurdistanê yê li Swêdê (Komkar-Swêd) dest bi weşanê kir. Di destpêkê de bi kurdî û tirkî, mehê carekê derdiket. Naveroka wê behsa kar û barê komeleyê, deng û nûçeyên welat û cîhanê dike. Di kovarê de nivîsên li ser ziman û çanda kurdî jî hatine weşandin. Cegerxwîn, Qanatê Kurdo, Têmûrê Xelîl, Tosinê Reşîd û gelek rewşenbîrên din alîkariya Roja Nû kirine. Di sala 1983an da Roja Nû forma xwe guherandiye û bûye kovareke edebî û çandî. Heta sala 1987an li Swêdê û paşê jî li Kolnê di çapxana arizî ya KOMKARê da hatiye çapkirin.

Di kovarê de kesên wek Salîh înce, Henefî Celeblî, Haluk Öztürk, Rohat Alakom, A. Gernas (Dilsoz, A. Bawer), M. Elî (B. Dersîm), Selîm Can û Evîndar Farqînî, Kemal Burkay, Prof. Zera Êsiv, Şekroyê Xudo, Ahmed Cengîz Çamlîbel (Vazgal Bazîdî), Têmûrê Xelîl, Mecît Şêxo, Gundî (Sadiq Brîm), Newroz, Ehmed Şerîfî, Cankurd, Nûra Cewarî, Munzur Çem, Husên Hebeş, A. Balî, B. Zinar, Sîpan, Salih Omerî, Beşîr Botanî, Marîna Ezîz, Sidqî Hirorî, Ehmed Tewfîq, Hemîd Kilicaslan, Serdar Roşan, Silêman Alî, Bûbê Eser, Fexredîn Tahîr, Cemşîd Heyderî nivîsîne.<sup>149</sup>

Di kovara Roja Nû de bi serenava “Quncikê Zarokan” beşek hatiye amadekirin. Wek mînak di hejmara 58an de alfabeya latinî-kurdî û erebî-kurdî hatiye weşandin. Ji bo vê alfabeyê wek numune peyv jî hatine nivîsandin. Ji bilî alfabeyê çîrokeke bi navê “Vizê û Evdal” ya ku ji hêla Simo hatiye nivîsandin di rûpelên kovarê de cih digre.<sup>150</sup>

<sup>148</sup> T. Haydargil, “Doğuda Çocuk Oyunları ve Tekerlemeler”, *Karakoçan Dergisi*, Nisan 1969, Yörük Matbaası, r. 18-21

<sup>149</sup> [https://ku.wikipedia.org/wiki/Roja\\_N%C3%BB\\_\(kovar\)](https://ku.wikipedia.org/wiki/Roja_N%C3%BB_(kovar)) 03.06.2016/ 19.41

<sup>150</sup> Simo, “Vizê û Evdal”, *Roja Nû*, j. 58, 1987, r. 26-28



Di hejmarê 61an de X. Lezgîn ji tirkî çîrokeke Tolstoy a bi navê “Çivîk” wergerandiye kurdî.<sup>151</sup> Di heman hejmarê de xaçepirseke jî bi wêneyan ve ji bo zarokan hatiye amadekirin.

Di hejmarê 62an de jî dîsa X. Lezgîn çîrokeke Tolstoy ji tirkî wergerandiye kurdî. Çîroka bi navê “Çêlika Pisêkê” di nav rûpelên Roja Nû de hatiye weşandin.<sup>152</sup>

### **1.7.8. Sirwe**

Kovara Sirweyê di bihara sala 1985an de li bajarê Urmîyeyê dest bi weşana xwe kiriye. Heta hejmarê 5emîn Hêmin Mukriyanî sernivîsarê kovarê ye. Lê piştî hejmarê 5an Ehmed Qazî dibe sernivîsarê kovarê. Sirwe kovareke ferhengî, edebî û komeletiyê ye ku du zimanî (kurdî û farisî) bi mehane hatiye weşandin. Kovarê di nav rûpelên xwe de beşek taybet ji bo zarokan amade kiriye. Kovarê li Rojhilatê roleke berbiçav li ser xizmeta ferhengeriyê, çandê û ferkirina zimanî kurdî kiriye. Hemû bajarên Rojhilatê hatiye belavkirin.<sup>153</sup>

### **1.7.9. Nûbihar**

Kovara Nûbiharê di sala 1992an de li Stenbolê hatiye çapkirin û ji wê salê pê ve, hê jî weşana xwe didomîne. Kovar xwerû bi kurdî weşanê dike. Ji ber ku teza me li ser Nûbiharê ye emê di beşa duyemîn de der barê Nûbiharê de agahiyên berfêreh bidin. Di beşa sêyemîn de jî emê bi hûrgilî besha nivîsên zarokan ên ku di kovarê de hatine weşandin bikin.

### **1.7.10. Nûpelda**

Kovara Nûpeldayê di sala 2009an de li Wanê dest bi weşana xwe kiriye. Ev kovara çandî û hunerî sê mehan carekê tê weşandin û dirûşmeya wê jî “Bendêra Çand û Hunerê” ye. Xwedî û berpirsyarê nivîsaran Ercan Yıldırım, edîtorê kovarê jî M. Zahir Ertekin e. Lijneya weşanê ji Ebdulhadi Botî, Seyfettin Aykaç, Zafer Acar û Ebdulcebbar Kavak pêk tê. Di Nûpeldayê de nivîsên wêjeyî, çandî, dînî û dîrokî tên

<sup>151</sup> X. Lezgîn, “Çivîk”, *Roja Nû*, j. 61, Îlon 1987, r. 28-29

<sup>152</sup> X. Lezgîn, “Çêlika Pisêkê”, *Roja Nû*, j. 62, Sibat 1988, r. 28-29

<sup>153</sup> [https://ckb.wikipedia.org/wiki/%D8%B3%D8%B1%D9%88%DB%95\\_\(%DA%A9%DB%86%D9%88%D8%A7%D8%B1\)](https://ckb.wikipedia.org/wiki/%D8%B3%D8%B1%D9%88%DB%95_(%DA%A9%DB%86%D9%88%D8%A7%D8%B1)) 03.03.201/ 20.45

weşandin. Navê hîn nivîskar û helbestvanên kovarê de wiha ye; M. Zahir Ertekin, Seyfettin Aykaç, Ahmet Demir, Yakup Aykaç, M. Emin Demir, Nezir Gümüş, Aqil Muhacir, Selam Ertekin, Fahri Ayhan, Alamettin Ertekin, Rojbîn Özkan, Ömer Ümit.

Di çend hejmarên Nûpeldayê de jî ji bo zarokan beşek bi navê “Zarokname” hatiye amadekirin û ji bo wan tişt hatine nivîsandin. Wek mînak di hejmara 6emîn a Nûpeldayê ya ku di sala 2011an de hatiye weşandin de çar rûpel ji bo zarokan hatiye veqetandin. Aynur Bozkurtê ji frensî çîroka Hans Chrîstîan Andersan a bi navê “Werdeka Biçûk î Nexweşik” wergerandiye kurdî.<sup>154</sup> Di heman hejmarê de Rojbîn Özkanê jî du nivîs weşandiye. Yek ji wan a ku bi serenava “Pêxemberê Zarokhez-1” e behsa pêxember û hezkirina wî ya zarokan dike. Di nivîsa ku serenava wê “Keskesor” e de jî Özkan ji zarokan re behsa keskesor çawa çêdibe dike.<sup>155</sup>

Di hejmara 9emîn a Nûpeldayê de dîsa li bin beşa Zaroknameyê çend nivîs hatine weşandin. Yek jî nivîsa Meryemeyn Erayê ye ku wê ji farisî çîrokeke bi serenava “Rizo û Hespê Reş” wergerandiye kurdî.<sup>156</sup> Abdulkerim Çay bi serenava “Zaroktiya Me” nivîseke bîranînê ya behsa zaroktiya xwe dike nivîsandiye.<sup>157</sup> Bedredîn Basûxûy jî dîsa di heman hejmarê de ji farisî bi serenava “Xweştirîn Mekanê Dinyayê” nivîseke ku behsa serpehatiya darekê dike, wergerandiye kurdî.<sup>158</sup> Ji bilî van nivîsan Azîze Yıldızê fableke bi serenava “Dûpişk û Mar”<sup>159</sup> nivîsandiye. Bedredîn Basûxûy dîsa ji farisî fableke bi serenava “Sulha Heywanan” wergerandiye kurdî.<sup>160</sup> Herî dawîn di heman hejmarê de Zafer Berdestî sê kurteçîrok ên bi serenavên “Fêl Fêlên Perê Ne Sim Simên Kerê Ne”, “Şûmo” û “Sê Reng Sêv” berhev kirine û ew di Nûpeldayê de hatine weşandin.<sup>161</sup>

### 1.8. Kovarên Zarokan ên Kurdî

Li Cihanê kovarên ewil ên zarokan li Ewropayê û Amerîkayê di sedsala 18emîn de hatine weşandin, lê di çapemeniya kurdî de kovara zarokan a ewil “Girr û

<sup>154</sup> Aynur Bozkurt, “Werdeka Biçûk î Nexweşik”, Nûpelda, j. 6, 2011, r. 69-70

<sup>155</sup> Rojbîn Özkan “Pêxemberê Zarokhez-1”, “Keskesor”, Nûpelda, j. 6, 2011, r. 71, 72

<sup>156</sup> Meryemeyn Eray, “Rizo û Hespê Reş”, Nûpelda, j.9, 2012, r. 89-90

<sup>157</sup> Abdulkerim Çay, “Zaroktiya Me”, Nûpelda, h.j, 2012, r.91-92

<sup>158</sup> Bedredîn Basûxûy, “Xweştirîn Mekanê Dinyayê”, h.j, 2012, r.93

<sup>159</sup> Azîze Yıldız, “Dûpişk û Mar” h.j, 2012, r.94

<sup>160</sup> Bedredîn Basûxûy, “Sulha Heywanan”, h.j, 2012, r.95

<sup>161</sup> Zafer Berdestî, “Fêl Fêlên Perê Ne Sim Simên Kerê Ne” ; “Şûmo” ; “Sê Reng Sêv” h.j, 2012, r.96

Galî Mindalanî Kurd” e ku, ew jî di 21ê nîsana 1946an de hatiye weşandin.<sup>162</sup> Wexta tarîxa weşandina kovarên zarokan ên li Ewropayê û yekem kovara zarokan a kurdî “Girr û Galî Mindalanî Kurd” bê qiyaskirin, wê bê dîtin ku di navbera wan de demeke dirêj ya qasî 224 salan heye. Tiştê girîng a din jî ew e ku kovarên zarokan ên li Ewropa û Amerîkayê hatine weşandin pir temên dirêj in. Heta wisa ku ji wan hinek qasî sedsalî (The Child’s Companion 1824-1924) hatine weşandin. Lê kovara “Girr û Galî Mindalanî Kurd” bi tenê 3 hejmar hatiye weşandin. Ev jî nîşan dide ku zarokên kurd li gor zarokên cihanê ji hêla kovarên zarokan ve bêşans in.

Kovarên zarokan ji ber ku demkî ne di navbera wan û zarokan de pêwendiyek çêdibe. Zarok bimeraq benda hejmara din disekin û hejmarên kovarê yên nû bikêf dixwînin. Gelek feydeyên kovaran hene, mînak agahiyên nû dide û zarokan perwerde dike, xwendin û nivîsandina wan pêşva dibe, hestên zarokan dewlemend dike û asoya wan fireh dike.

Yalçın û Aytaş dibêjin ku dema kovarên zarokan tên amadekirin divê pir hesap bê tevgerin û wiha behsa girîngiya kovarên zarokan dikin:

“Kovar bi taybetmendiya xwe ya rojanebûnê (aktuel) ve di perwerdekirina zarokan de pir girîng in. Him xwendinê hînî zarokan dikin, him dibin sedem ku zarok demên xwe yên vala belahewa derbas nekin û him jî qabiliyetên wan û daxwazên wan ên ku nehatine kifşkirin derdixin holê. Kovar zarokan teşwîq dikin ku ew bixwînin, binivîsin û wêneyan xêz bikin.”<sup>163</sup>

Dema gelemperî behsa kovarên zarokan bê kirin, mirov dikare bibêje ku kovar an di heftê carekî, an panzdeh rojan carekî, an jî di mehê de carekî tên weşandin. Em ê niha behsa kovarên zarokan ên kurdî yên ku me der barê wan de agahî bi dest xistine, bikin.

### **1.8.1. Kovarên Zarokan ên Kurdî Yên Ku Li Tirkîyeyê Hatine Weşandin**

Li Tirkîyeyê ji ber ku ji bilî tirkî bi zimanên din weşan qedexê bû, gelek kovar û rojname li derveyê sînorên Tirkîyeyê hatine çapkirin. Kesên ku ev weşan çap kirine bidizî ev kovar an jî rojname gîhandine Tirkîyeyê ku ew bigîhîjin destê mirovan. Lê piştî sala 1991emîn ji ber ku ev qedexê bi qanûna hejmara 2932emîn ve ji holê rabû,

<sup>162</sup> <http://www.gulan-media.com/sorani/articles.php?eid=61&id=1328> 13.03.2016/ 14.47

<sup>163</sup> Yalçın-Aytaş, *Çocuk Edebiyatı*, r. 234

êdî kurdî jî weşanê dest pê kir. Piştî vê ji bo zarokên kurd jî hin kovar hatin weşandin ku em ê niha der barê wan de agahiyan bidin.

### 1.8.1.1. Dergûş

Kovara Dergûşê di sala 2003an de ji hêla weşanên Warê ve di rêzeya pirtûkên zarokan de hatiye weşandin. Xwediyê Kovarê û Midûrê Berpirsyar Turgut Ersoy, edîtorê kovarê Cahit Yıldırım e. Lijneya weşanê jî ji S. Verroj, Cahit Yıldırım û Remezan Pertew pêk tê. Dergûş wek pêvekeke kovara Warê derketiye û piştî hejmarekê êdî dev ji weşanê hatiye berdan.

Kovar li Matbaaya Berdanê hatiye çapkirin û cihê rêvebirinê jî Çağaloğlu, Stenbol e. Rûpela ewil a kovarê rengîn e û li ser berga ewil bi tîpên xweşik û rengîn ve navê kovarê hatiye nivîsandin. Wêneyê zarokekê yê ku li erdê xwar bûye kulîlkeke sor di destê xwe de girtiye hatiye xêzkirin. Li ser navê kovarê ya jorê ev hevok hatiye nivîsandin: “Xuyê Şîrî Heta Pîrî”, di bin rûpelê de jî “Zar e, xweş bihar e, dîlan e”.<sup>164</sup> Li ser berga dawîn a kovarê de jî çend pirtûkên ku wêneyên wan hatine kişandin heye. Navê pirtûkên ku wêneyên, wan xuya dikin hinek ev in; “Renganin, çîrok, Ferhengok, Rêzimana Kurdî, Tiştanok û h.w.d..

Di kovarê de alfabeya kurdî bi tîpên reng bi reng hatine nivîsandin. Li cem her tîpekê jî peyvên ku bi van tîpan ve dest pê dikin, hatine nivîsandin. Wek mînak, Aa Adar, Hh Heval, Nn Nan, Qq Qend, Vv Vîn û h.w.d..

Straneke Cemîla Celîl, nivîseke Remezan Pertew a bi navê ‘Malbat û Zarok’, nivîseke E. Yusuf Eyyubî ya bi navê ‘Ser Zarokan Çend Gotin’ nivîsa S. Verroj a zazakî ‘Espije’ di kovarê de hatine nivîsandin. Ji bilî van hin mamik, xaçepirs, rengdayîna wêneyan, nasandina nexweşiya sorikê, quncika nameyan, du wêneyan li hember hev qiyaskirin û ferqa di navbera wan de dîtin û h.w.d. di kovarê de hatine weşandin.

---

<sup>164</sup> Dergûş, j. 1, İstanbul, 2003

### 1.8.1.2. Şemamok

Şemamok di sala 2005an de li Diyarbekirê bi rêvebiriya Şaredariya Sûrê ya Diyarbekirê ve hatiye weşandin. Xwediyê kovarê Serokê Şaredariya Sûrê Abdullah Demirbaş, berpîrsê nivîsan jî Hüseyîn Kaya ye. Edîtorên kovarê Sîdar Jîr, Rizoyê Xerzî û Rêzan Tovjîn in. Şemamok bi wêne, karîkatur û mijarên cur be cur ve bi du zimanan kurdî û tirkî gelek dewlemend hatiye amadekirin.

Di kovarê de helbest, nivîs û wergêrên Amed Tîgrîs, Ferhadê Îçmo, Sîdar Jîr, Îbrahîm Kurmanc, A.Seçkîn, Behlûl Zelal, Heyder Dîljen, Konê Reş, Tengezar Marînî û h.w.d. hatine weşandin. Werger zêdetir ji zimanê almanî, îngilizî û swêdî hatine kirin. Wek kovarên zarokan ên din di Şemamokê de jî fabl, helbest, çîrok, xaçepîrs, mamik, lihevanînok, zugotinok, notayên stranan (muzîk), kurtejiyana kesên navdar (wek Yaşar Kemal, Osman Sebrî, Yılmaz Güney, Qedrî Can, Meryamxan, Ehmed Arif), wêneyên bêboyax yê ku zarok bikaribin bi xwe boyax bikin û h.w.d. bi kurdî û tirkî hatine weşandin. Şemamok heta sala 2010an bi giştî 7 hejmar hatiye weşandin û pişt re dev ji weşanê hatiye berdan.<sup>165</sup>

### 1.8.1.3. Dergûş

Dergûş ji hêla Weşanên Doyê û bi alîkariya Şaredariya Yenîşehirê ya Diyarbekirê ve di sala 2008an de hatiye weşandin. Edîtorê kovarê Sîdar Jîr e. Kesên ku navê wan wek berhevkar û nivîskar di kovarê de derbas dibin, A. Seçkîn, Cemîl Andok, Behlûl Zelal in. Kovar ji hêla wêne û karîkaturan ve, mijarên ku bala zarokan bixşîne ve dewlemend hatiye amadekirin.

Di dergûşê de fabl, çîrok, helbest, hînkirina navê hewyanan û nebatan, xaçepîrs, zugotinok, mamik, gotinên pêşîyan û h.w.d. bi wêneyan ve hatine nivîsandin. Ji bilî van mijarên wek zarok divê çawa diranên xwe firçe bikin, çawa bi kaxizan ve tiştan çêbikin (keştî û tiştên wisa) beşek jî hatiye veqetandin. Kovar bi tenê hejmarek hatiye weşandin.<sup>166</sup>

<sup>165</sup> Şemamok, j. 1-2-5, Diyarbekir, 2005

<sup>166</sup> Dergûş, j. 1, Sermawez, Diyarbekir, 2008

#### 1.8.1.4. Agirê Tûtê

Kovara Agirê Tûtê ji hêla şaxa Kurdî-Derê ya Diyarbekirê ve di sala 2011an de hatiye weşandin. Li ser kovarê Adar, Nîsan, Gulan 2011 hatiye nivîsandin û bi tenê hejmarek hatiye weşandin. Navê kovarê pişt re wek “Zarokên Rojê” guheriye û bi wê navê ve weşan hatiye kirin. Di pêşgotina kovarê de wiha behsa navê kovarê tê kirin:

“Agirê Tûtê lîstikeke zarokan e. Armanca vê lîstikê ew e ku zarok hem bileyîzin hem jî hîn bibin. Di vê lîstikê de zarok navên bajar û sewalan, zûgotinokan û alfabeyê hîn dibin. Em hêvî dikin ku hûnê bi vê kovarê hem çand û hunera xwe hîn bibin hem jî xwe pêş ve bibin. Zarokino ji bo ku rewşa kurdî baştir û agirê wi gurtir bibe divê hûn jî bixebitin û bibin yek ji çirûska vî agirî. Belê ev hejmara yekemîn ya Agirê Tûtê ye, hêviya me ew e ku kovar li gorî dil û mêjiyê we be, em hêvî dikin ku hûn xwedîtîyê li kovara xwe bikin û ev kovar şax bide û bibe dareke mezin.”<sup>167</sup>

Her çi qas rêvebirên kovarê di pêşgotina kovarê de bibêjin ku ‘ev kovar şax bide û bibe dareke mezin’ jî, piştî vê hejmarê kovarê edî nayê weşandin. Nivîskarê kovarê Siya Sîtav, Nesrîn Navdar û Rûken Xwezan in.

Mijarên ku van kesan di kovarê de ji bo zarokan nivîsandine jî ev in; alfebeya kurdî, nasandina Celadet Bedirxan, helbesta demsala biharê, gotinên pêşiyar, gotinên navdaran, biwêj, çewtiyên axaftinê, pirsên mantiqê, taybetmendiyan aжалan, xaçepirs, karîkatur, çîrok, fabl, lîstika agirê tûtê, nasandina bajarê Amedê, pêkenok û h.w.d.. Mînak di kovarê de alfebeya kurdî him bi tîpên mezin û him jî bi tîpên biçûk hatine nivîsandin. Ji bo fêrkirina alfabeyê jî wêneyên tiştan hatine bikaranîn. Wek, Aa Agir, Bb Beq, Cc Cotkar, Çç Çav û h.w.d.. Kovar pir rengîn e û ji hêla xêz û wêneyan ve jî gelek balkêş e.

#### 1.8.1.5. Zarokên Rojê

Kovara Zarokên Rojê ji hêla şaxa Diyarbekirê ya Kurdî-Derê ve di sala 2011an de hatiye weşandin. Ji ber ku hejmara ewil bi navê “Agirê Tûtê” hatiye weşandin, li ser hejmara ewil a kovarê hejmara 2yemîn hatiye nivîsandin û di rûpela duyemîn de jî hatiye gotin ku ev kovar dewama Agirê Tûtê ye. Ji ber ku sê mehan carekê hatiye

<sup>167</sup> *Agirê Tûtê*, j. 1, Adar, Nîsan, Diyarbakır, Gulan 2011

amadekirin, ji bo tarîxa weşandinê Pûşper-Tîrmeh-Gelawêj 2011 ji bo hejmara wê ya ewil hatiye eşkerekirin.

Di hejmara duyemîn de ji bo xwedî û berpirsyara giştî ya kovarê navê Sivan Serap Berkê, edîtorê kovarê jî Siya Sitav û Rûken Xwezan hatiye nivîsandin. Lê di hejmara sêyemîn û çaremîn de navê Rûken Sarılı edîtor xuya dike. Di hejmara pêncemîn de jî xwediyê wê wek Panayir Çelik û edîtor jî wek Nesrîn Çavdar hatiye guherandin.

Di kovarê de ji bilî kurmancî, bi zazakî jî nivîs hatine weşandin. Kovar ji hêla wêne û xêzan ve jî gelek dewlemend û rengîn e. Naveroka hejmarên Zarokên Rojê tije ye. Di kovarê de gelek çîrok, helbest, fabl, karîkatur, tiştanok, zûgotinok, nasandina navdarên kurd (Zerîfe Xanim, Dildar, Meyemxan, Aram Tîgran, Ehmedê Xanî), nasandina heywanan (dînozor, kevok, kûçik, kerguh, şêr, hesp, perperok û h.w.d.), nasandina sebzeyan (hinar, kundir, hurmî, kuvark, mandalîn), lîstik (hopanî, bûk û kose, kerê mala bavê te kî ajot?), nasandina cih û bajaran (Pasûr, Cizîra Botan, Êlih û Heskîf) wêneyên ji bo boyaxkirinê, gotinên pêşiyar, biwêjên kurdî, xaçepirs û pêkenok hatine nivîsandin.

Kesên wek Rûken Xwezan, Nesrîn Navdar, Eşref Keydanî, Hêvî Dîdem, Siya Sîtav di kovarê de nivîsîne. Rûşen Sarılı û Gülçin Şanlı jî wêne û xêzên kovarê amade kirine. Zarokên Rojê sê mehan carekê 4 hejmar hatiye weşandin.<sup>168</sup>

#### **1.8.1.6. Perperok**

Perperok bi berpirsariya Mevlut Aykoç ve di meha berfanbarê ya 2012an de ji hêla weşanên Arê ve li Stenbolê hatiye weşandin. Amadekarên kovarê Cüneyt Kulaz, Hasan Aslan, İdris Benek, Fêrgîn Melîk Aykoç, Xunav Altun, Mahmut Aydın û Mevlüt Aykoç in. Ji bilî van navê Perwîz Cihanî jî di çend rûpelan de derbas dibe. Kovar sê mehan carekê bi tenê du hejmar hatine çapkirin û herdu hejmar jî ji 32 rûpelan pêk tê. Li ser bergên ewil ên kovarê de perperokên rengîn hatine xêzkirin.

Di Perperokê de beşên li ser zimên (tîpên kurdî, alfabeya kurdî), agahiyên rojane (hevnasîn, danên rojê, demsal, pêşwazîkirin), tiştanok, dîrok (nivîskar

---

<sup>168</sup> *Zarokên Rojê*, j. 2-3-4-5, Diyarbekir, 2011-2013

Ksenefon-Anabasîs, pîrozkirina newrozê), dersên matematîkê (hejmar) nasandina heywanan (kêzik, şêr, rovî, bizin, mişk, kurm, dûpişk mar), helbest (Perwîz Cîhanî, Osman Sebrî), nasandina navdarên kurd (Cegerxwîn, Osman Sebrî), çîrok, xaçepirs, wêneboyaxkirin hatine weşandin. Kovar ji hêla wêne û xêzan ve gelek rengîn e.<sup>169</sup>

#### **1.8.1.7. Bûka Baranê**

Buka Baranê di bihara 2013an de li Stenbolê dest bi weşana xwe kiriye. Kovar ji hêla komeleya Komel-Kurdê ve di 3 mehan carekê bi kurmancî û dimilkî tê weşandin. Berpîsrê nivîsaran Nûriye Çakar, edîtora kovarê Sewîm Qoserî û rûpelsazê kovarê jî Ridwan Xelîl e. Hin kesên ku nivîsên wan di Bûka Baranê de hatine weşandin ev in; Kenanê Nado, Nejla Sado, Nûriye Çakar, Ayşegül Çelebî, Ridwan Xelîl, Yehya ElewîFerd, Nevîn Reşan Güngör, Perwîz Cîhanî, Sewîm Qoserî û Omer Dilsoz.

Kovar ji hêla naveroke ve dewlemend e. Di kovarê de çîrok, tiştanok, zûgotinok, mamik, heyranok, helbest, nasandina bajaran (Mêrdîn), nasandina navdarên kurd (Meryemxan, Şakiro), wêneboyaxkirin, hejmar û matematîk, lorîk, nasandina zarokan, xaçepirs, perwerdeya dînî (nasandina pêxemberan, destnimêj), şano, mijarên neteweyî (alaya kurdan), boyaxkirina wêneyan, û h.w.d. gelek mijar hene.

Bûka Baranê bi nivîs û xêzên rengîn ve hewl dide ku kurdî hînî zarokan bike. Armanca kovarê zarokan him perwerde bike û him jî bi naveroka xwe ve wan kêfxweş bike. Ji bilî nivîsan xêz û wêneyên kovarê jî pir dewlemend in. Ji bo ku bala zarokan bikêşîne gelek rengîn û baş hatine xêzkirin. Kovar hê jî weşana xwe didomîne.<sup>170</sup>

#### **1.8.2. Kovarên Zarokan ên Kurdî Yên Ku Li Ewropayê Hatine Weşandin**

Hin kovarên zarokan ên kurdî li Ewropayê hatine weşandin. Hejmara kovarên ku li Ewropayê hatine derxistin li gor Tirkîyeyê zêde ne û gelek berê hatine weşandin. Li Tirkîyeyê piştî salên 2000î kovar ji bo zarokan hatine çapkirin, lê li Ewropayê zûtir yanê salên 1980î de kovar gihîştine destê zarokan.

<sup>169</sup> *Perperok*, j. 1, Stenbol, Berfanbar 2012- j. 2, Stenbol, Adar 2013

<sup>170</sup> *Buka Baranê*, j. 3, Stenbol, Zivistan 2013- j. 4, Stenbol, Bihar 2014



Kurdên ku ji Tirkiyeyê, başûr û cihên din çûne Ewropayê çawa ku ji bo edebiyat û çanda kurdan vala runeniştine, di qada edebiyata zarokan de jî wisa tevgeriyane. Heman hewl û sebat ji bo amadekirina kovarên zarokan jî nîşan dane û çend kovarên rengîn ji bo zarokan derxistine.

### **1.8.2.1. Kulîlk**

Kovara Kulîlkê di sala 1980an de ji hêla Komeleya Çanda Karkerên Kurdistan (Mala Kultura Kurdî/Jîna Nû) ve li Stockholma bajarê Swêdê hatiye weşandin. Li ser kovarê “Zarokno zimanê xwe bixwînin û binîvîsin!” hatiye nivîsandin û gelemperî di navbera 30 û 40 rûpelan de hatiye derxistin. Mijarên ku hatine hilbijartin û wêneyên ku hatine xêzkirin ve hewl hatiye dayîn ku zarok kurdî hîn bibin û haya wan ji çanda wan hebe.

Nivîskarên wek Zinarê Xamo, Reşo Zilan, Mehmûd Lewendî, Bavê Hêvî, Zinar Soran, Hesên Qende, Şikoyê Hesên, Malwêran, Mihemed Dehsîwar, Konê Reş, Torîne Osman, Birîndar, Fîrat Cewerî di Kulîlkê de nivîsandine. Di bin serenava Kulîlkê de “Kovara Zarokên Kurd Yê Şagirt” hatiye nivîsandin. Vê kovarê heta sala 1997an, yanî 17 salan weşana xwe domandiye û bi giştî 51 hejmar hatiye çapkirin.

Kovar hêla naverokê ve dewlemend e. Mînak notayên stranên, muzîk, matematîk, nasandina heywanan, helbestên navdar ên kurd, çîrok, pêkenok, xaçepîrs, mamîk, tiştanok û h.w.d. gelek mijar di dikovarê de cih digre.<sup>171</sup>

### **1.8.2.2. Hêvî**

Kovara kurdî ya zarokan Hêvî di 1ê sibata 1981an de, li Stockholma bajarê Swêdê hatiye weşandin. Hêvî mehê carekê ji hêla weşanên Armancê ve hatiye derxistin. Ji bo navê Hêviyê di hejmarê ewil de wiha hatiye gotin:

“Hevalên delal!

Va ye, hejmarê yekem ya kovara we derket. Me navê kovarê danî “Hêvî”. Lewra, kovar bo we ye. Ango, bo hêviyên welat; zarokên kurda ye. “Hêvî” jî niha pê de ji mehê

---

<sup>171</sup> *Kulîlk*, j.10- 13- 39-51, Stockholm, 1983-1997

carekê wê bî we re be. Hêviya me jî dîl û can ew e ku fêda wê biğhê we û bibe hevaleyê jî we re.”<sup>172</sup>

Kovar di navbera 18 û 20 rûpelan de hatiye amadekirin û ji sedî 99 kurmancî be jî car caran nivîsên zazakî jî tê de hatine weşandin. Li ser berga ewil li kêleka navê Hêviyê wêneyên du zarokan ên ku zayendên wan cuda (keç û kur) hatine amadekirin.

Di Hêviyê de nivîskarên wek Murad Ciwan, Amed Tigris, Hesên Mizgîn, Zinarê Xamo, Mahmud Lewendî û h.w.d.. helbest, çîrok, fabl û tiştên din nivîsandine. Kovara Hêviyê di 9ê cotmeha 1981an de piştî 9 hejmaran dev ji weşanê berdaye. Di kovarê de mijarên neteweyî wek newrozê, hînkirina rojên hefteyê û navê mehan, matematîk, jî bilî van helbest (Nazîm Hikmet, Fîrat Cewerî, Abdullah Pêşew, Ordîxanê Celîl), çîrok, tiştanok, lîstîk, fabl, nasandina alavan û h.w.d. hatine weşandin.<sup>173</sup>

### 1.8.2.3. Hêlîn

Kovara zarokan Hêlîn di sala 1982an de li Stockholmê bajarê Swêdê ji hêla weşanên Armancê ve hatiye weşandin. Hemû nivîs, mizanpaj, redaksiyon û amadekariya kovarê ji hêla Zinaro Xamo, Mahmud Lewendî, Hesên Mizgîn ve hatiye kirin. Wêne û karîkaturên kovarê jî ji hêla kesekî bi navê Mamoste ve hatiye xêzkirin. Zinarê Xamo, Hesên Mizgîn, Murad Ciwan, Mahmud Lewendî û hin kurdên din di kovarê de ji bo zarokan tişt nivîsandine û ked dane.<sup>174</sup> Nivîsên Tosinê Reşîd, Celîlê Celîl û hin kurdên din jî carinan hatine weşandin. Kovar ji hêla nivîs û wêneyan ve gelek dewlemend e.

Bergên kovarê yê ewil û dawî rengîn, yê hundir spî û reş in. Li ser kovarê navê kovarê “Hêlîn” û li binê jî “Kovara Zarokan a Kurdî” hatiye nivîsandin. Li ser van nivîsan jî hêlîneke çûkan a ku sê çûkên biçûk tê de ne û heft û heş çûkên mezin ên ku perê xwe vekirine xuya dikin. Dema hejmarên Hêlînê tê lêkolînkirin, li ser

<sup>172</sup> *Hevî*, j. 1, Stockholm, Sibat 1981, r. 2

<sup>173</sup> *Hevî*, j. 1-2-3-4-5-7-8-9, Stockholm, 1981

<sup>174</sup> Ev agahî di adara 2016an de bi rêya mailê ve li ser înternetê ji Zinarê Xamo hat girtin.

bergên kovarê gelepêrî jin, zarok û mêrên kurdan ên ku cil û bergên kurdî li xwe kirine hene.

Di kovara ku gelepêrî ji 15 û 20 rûpelan pêk tê de, ji bilî kurmancî, bi zaravayê soranî jî hin nivîs hatine weşandin. Gelepêrî tiştanok, çîrok, nasandina heywanan (beq, perperok, kûsî), stran, helbest, karikatur (Mizgîn û Lezgîn), fabl (kêzika havînê û mûrî, biratiya kûçik û gûr, Rovî û Qijik), labîrentên bi xêzan ve hatine amadekirin, nasandina tiştan (wesayît, bizmar, çakûç, firçeya diranan), nasandina ezayên mirovan, wêneyên însan û heywanan, wêneyên ji bo boyaxkirinê, nameyên zarokan ên ku ji kovarê re şandine, lîstikên zarokan (pêncok ên ku bi keviran tê lîstin) hene.<sup>175</sup>

Hêlînê piştî çend hejmaran dev jî weşanê berdaye. Ji bo sedema dev ji weşanê berdanê de di destê me de agahî tunene, lê hejmarên ku gihîştin destê me 2,4,9,13 û 16 ne. Li gor van agahiyên tê dîtin ku kovar herî kêr 16 hejmar hatiye weşandin.

#### **1.8.2.4. Koçer**

Kovara Koçerê di sala 1988an de li Swêdê ji hêla buroya Tarayê ve hatiye weşandin. Sernivîsarê kovarê Asmî Rebatî, wênesaz jî Xalid Sitar e. Koçer kovareke demsali ye. Li ser Koçerê hatiye nivîsandin ku ew kovareke edebî ya zarok û xortan e. Kovar bi tîpên erebî lê soranî hatiye amadekirin. Hin nivîskar û wergêrên ku di kovarê de nivîsandine û wergêrên wan hene ev in; Heme, Letîf Helmet, Herêmin, Hêmin, Bextiyar Emîn, Emced Şakelî.

Dema naveroka kovarê bê lêkolînkirin mirov dibîne ku di kovarê de lîstika kişikê, ezayên bedena mirovan (ceger, mîde, rovî) heywanên cur be cur hatine nasandin. Wek kovarên din ên zarokan di Koçerê de jî çîrok, şano, helbest, xaçepirs û h.w.d. hatine nivîsandin. Wêneyên navdarên kurd ên wek Qazî Mihemed, Melayê Cizîrî û yên din hatine xêzkirin.

Bi serenava Pêşengeha Zarokan beşek hatiye amadekirin û di wê beşê de wêneyên zarokan hatine weşandin û der barê temenê wan, jiyana wan û xiyalên wan

---

<sup>175</sup> *Hêlîn*, j. 2-4-9-13-16, Stockholm, 1982

de agahî hatine dayîn. Ji bilî vê, beşeke wêneyan hatiye amadekirin ku zarok van wêneyan boyax bikin. Di koçerê de xêz û wêneyên kurdewar jî balê dikşînin.<sup>176</sup>

#### **1.8.2.5. Heval**

Heval di sala 1995an de li Stockholma bajarê Swêdê hatiye weşandin. Ji bilî vê der barê vê kovarê de mixabin em negihîştine tu agahiyan.

#### **1.8.2.6. Heval û Hêviya Me**

Kovara Hêviya Me li Stockholma bajarê Swêdê di sala 1997an de hatiye weşandin. Mamosteyê kurdî Ahmet Cantekîn ji bo xwendekarên xwe vê kovarê weşandiye.<sup>177</sup>

#### **1.8.2.7. Kurdîlekan**

Kurdîlekan di 21ê adara 2007an de li Norwêcê hatiye çapkirin. Sernivîsarê Kurdîlekanê Riza Şivan e û 5 hejmar hatiye weşandin. Ji ber ku wênexêzên kovarê tune, weşana wê hatiye sekinandin.<sup>178</sup>

#### **1.8.2.8. Kepir**

Ev kovar her çiqas di navbera salên 2003 û 2009an de li Dihokê hatibe çapkirin jî, hejmareke wê li Swêdê hatiye weşandin. Weşanxaneya Apecê di sala 2007an de hejmareke Kepirê weşandiye. Ev hejmar ji hêla alfabeyê ve ji Kepira ku li Dihokê tê weşandin cuda ye. Lewra ew bi tîpên lafînî hatiye weşandin. Xwediyê weşanxaneya Apecê Alî Çiftçi der barê kovarê û armanca derxistina Kepirê de wiha dibêje:

“Kepir kovareka zarokan e ku li Dihokê bi zimanê kurmancî, lê tîpên erebî, ji aliyê weşanxana Spîrêzê ve têt weşandin. Ew jimara ku bi tîpên alfaba lafînî derketiye bi hevkarîya herdu weşanxana hatiye weşandin. Armanç ew e ku bo zarokên kurdên bakûr û yên li Ewropayê bikaribin li ser dîrok, folklor, edebiyata kurdî bixwînin. Ev hejmareka nimûne ye. Eger daxwaz û îmkân bûn em ê bi hevkarîya herdu weşanxanan

<sup>176</sup> Koçer, j. 3-8-9, Swêd, 1988

<sup>177</sup> Agahî di adara 2016an de bi rêya mailê ve li ser înternetê ji Zinarê Xamo hat girtin.

<sup>178</sup> Kenan Subaşı, *Kürtçe Çocuk Basını ve Medyası, Madunların Medyası: Tarihten Güncele Türkiye Ana akım Medyasının Dışında Kalanlar Konferansı*, 28-29 Gulan 2015, Ankara, r. 17

biweşînin. Ez bi xwe pêwîstiyeka pir girîng dibînim û hêvî dikim, însanên me li kovareka bo zarokan bêt weşandin xwedî derkevin, daku zarokên me jî hem ji bo kesayetiya xwe xurt bikin, pê serbilind bin û hem jî bikaribin agahiyên nû bi zimanê xwe bixwînin, daku bi pêşkewtiyên di her warî de bi ziman û hisên kurdayetiyê ve mezin bibin.”<sup>179</sup>

Çiftçi her çiqas bibêje armanca wan ew e ku ew vê kovara kurdî bi tîpên latînî biweşînin jî, Kepir li Swêdê bi tenê hejmarek hatiye weşandin.

### **1.8.3. Kovarên Zarokan ên Kurdî Yên Ku Li Başûr Hatine Weşandin**

#### **1.8.3.1. Estêre (1972)**

Kovara Estêreyê di navbera salên 1972 û 1974an de li bajarê Silêmaniyê wek pêveka kovara Rojî Kurdistanê hatiye weşandin. Estêre li Herêma Kurdistanê kovara zarokan a ewil e û 3 hejmar hatiye çapkirin. Sernivîsarê kovarê Salih Yûsifî ye. Du hejmarên kovarê di sala 1972yan de, hejmara wê ya 3yemîn jî di sala 1974an de hatiye weşandin.<sup>180</sup>

#### **1.8.3.2. Estêre (1975)**

Li gor agahiyên berdest wisa xuya dike ku ev kovar bi rêk û pêk neweşiyaye. Lewra di dîroka weşandina hejmaran de navberek heye. Heman navê kovara Estêre bi Rêvebiriya Giştî ya Rewşenbîrên Kurdî li Bexdayê 2 hejmar hatiye çapkirin. Hejmareke wê di gulana 1975an de hatiye weşandin. Sernivîsarê kovarê Îhsan Fuad, rêvebirê nivîsan jî Cemal Xeznedar e. Hejmara duyemîn di hezîrana 1975an de hatiye weşandin. Lê rejîma Basê nehîştîye ku kovar bê belavkirin.<sup>181</sup> Reza Şivan dibêje ji ber ku di pêşgotina kovarê de Kerkûk wek bajarekî Kurdistanê hatiye binavkirin, kovar hatiye girtin.<sup>182</sup>

<sup>179</sup> Ali Çiftçi, “Divê Zarok Di Wextê Xwe De Bi Kitêban Re Bibin Heval!”, *Nûbihar*, j. 104, Bihar 2008, r. 18

<sup>180</sup> Newzad Elî Ehmed, *Yekemîn Govarî Nihênî Bo Mindalanî Kurd*, Çapxaneyê Şehîd Azad Hewramî, Kerkûk, 2008, r. 9

<sup>181</sup> H.b, r. 11

<sup>182</sup> <http://www.gulan-media.com/sorani/articles.php?eid=61&id=1328> 21.03.2016/ 16.24

#### **1.8.3.4. Pepûle**

Kovara Pepûleyê ji hêla Weqfa Parastina Zarokên Kurdistanê ve di sala 1992an de li Silêmaniyeyê hatiye weşandin. Pepûle kovareke mehane ye û hê jî li Silêmaniyeyê tê çapkirin. Heta niha ji 210î zêdetir hejmarên wê hatine weşandin. Xwediyê kovarê Hêro Îbrahîm Ehmed e û sernivîsarê kovarê jî Yasîn Qadir Zirgoêzî ye.

Taybetmendiya Pepûleyê ew e ku ev kovar kovara zarokan a herî temendirêj e û hejmarên wê jî zêde hatine çapkirin. Her hejmar qasî 5000î tê weşandin.<sup>183</sup>

#### **1.8.3.5. Peresêlke**

Peresêlke kovareke zarokane ku di sala 1991an de li Hewlêrê hatiye weşandin. Kovar bi mehane hatiye çapkirin. 9 hejmarên vê kovarê hatine weşandin. Kesên ku wek Mewlud Îbrahîm Hesên û Îdrîs Lawe di kovarê de nivîsandine. Cemal Xeznedar dema navê kovarê kurd rêz dike dibêje Peresêlke di sala 1991an de hatiye weşandin.<sup>184</sup>

#### **1.8.3.6. Cigergoşekan**

Kovara Cigergoşekan di meha tebaxê ya sala 1993an de li Silêmaniyeyê hatiye weşandin. Xwediyê Kovarê Hemid Mihemed Elî û sernivîsarê kovarê jî Ziyad Reşad Qadir e. Ev kovara mehane ya ku ji bo perwerdeya zarokan e, heta niha ji 225 hejmaran zêdetir hatiye weşandin. Kovar hê jî tê weşandin.<sup>185</sup>

Di kovarê de wêne hatine xêzkirin, helbest hatine nivîsandin, ji zarokan pirs hatine pirsîn, heywanên wek kelxor, bayqûş, baz û h.wd. hatine nasandin.<sup>186</sup>

#### **1.8.3.7. Heng**

Heng di sala 1992an de ji hêla Wezareta Rewşenbîrî ya Kurdistanê ve li Hewlêrê hatiye weşandin. Xwediyê vê kovara mehane Wezîrê Perwerdeya Neteweyî

---

<sup>183</sup> Subaşı, h.g, r. 19

<sup>184</sup> <http://www.amude.de/amude/kurdi/ramyari/ramyari6/kovar.html> 04.01.2017/19.30

<sup>185</sup> Subaşı, h.g, r. 19

<sup>186</sup> *Ciger Goşekan*, j. 4

yê Kurdistanê yê Berê Samî Şoreş e.<sup>187</sup> Hejmareke Hengê di newroza sala 1993an hatiye çap kirin.<sup>188</sup>

#### **1.8.3.8. Hêlaney Mindalan**

Kovara Hêlaney Mindalan wek pêveka rojnameya Xebatê mehê carekî li Hewlêrê hatiye weşandin. Xwediyê kovarê Elî Ebdulla, sernivîsarê kovarê jî Selam Ebdulla ye.<sup>189</sup>

Rezaw Reşîd Sebrî der barê vê kovarê de wiha agahiyê dide: “Hêlaney Mindalan heftenameyeka taybet bi zarokan bû, weke paşkoya rojnameya Birayetî ji aliyê dezgay Rojnamewanî Birayetî û Xebat hatiye weşandin. Jimareya 1 li 19î tebaxê sala 2000 hatiye çapkirin.”<sup>190</sup>

#### **1.8.3.9. Cerîwe**

Cerîwe di sala 1998an de li Silêmaniyeyê hatiye weşandin. Xwediyê kovarê Cemal Ebdul, sernivîsarê kovarê jî Tahir Salih Seîd e. Kovara ku mehane derketiye 9 hejmar hatiye weşandin.<sup>191</sup>

#### **1.1.8.3.10. Mindalî Serdem**

Kovara Mindalî Serdem di sala 2006an de ji hêla weşanxaneyê Serdemê li Silêmaniyeyê hatiye weşandin. Ev kovara mehane ji bo zarokên ku temenê wan di navbera 5 û 12an de ne hatiye amedekirin. Heta niha 84 hejmar hatine weşandin.<sup>192</sup>

Xwediyê kovarê Wezîrê Perwerdeya Neteweyî yê Kurdistanê yê Ewil Şêrko Bêkes e. Sernivîsarê kovarê jî Helkewt Ebdulla ye. Şaho Ebdulrehman jî karên kovarê yên hunerî kiriye.<sup>193</sup>

---

<sup>187</sup> Subaşı, *h.g.*, r. 19

<sup>188</sup> Sebrî, *Çîrokî Mindalan Li Edebî Kurdî De*, r.62

<sup>189</sup> Subaşı, *h.g.*, r. 19

<sup>190</sup> Sebrî, *Çîrokî Mindalan Li Edebî Kurdî De*, r.63

<sup>191</sup> Subaşı, *h.g.*, r. 19

<sup>192</sup> H.r

<sup>193</sup> <http://www.kulturname.com/?p=624> 05.01.2017/ 19.51

### **8.3.11. Simore**

Ji yek kovarên zarokan a kurdî Sîmore di sala 2010an de li Silêmaniyeyê hatiye çapkirin. Xwediyê kovarê Rêvebiriya Mala Simoreyê ye. Sernivîsarê kovarê Terîfe Mihemed Ehmed e. Ev kovar sê mehan carekê hatiye çapkirin.<sup>194</sup>

### **1.8.3.12. Mindalanî Bawe Gurgur**

Mindalanî Bawe Gurgur li Kerkûkê ji hêla Saziy Perwerdeyê ya Şefeqê bi mehane tê weşandin. Kovar 7 salan bi vê navê weşanê dike, lê piştî 7 salan navê xwe wek “Hacîle” diguhere û wisa weşana xwe didomîne. Ji hêla kovargerîya kurdî ya zarokan ve wek kovareke serkeftî tê nasîn. Xwediyê kovarê Felakedîn Kakeyî, Sernivîsar jî Yusif Letîf e.<sup>195</sup>

### **1.8.3.13. Mişke**

Kovara Mişke ji hêla werşanxaneyê Arasê ve bi mehane li Hewlêrê hatiye weşandin. Xwediyê kovarê Bedran Ehmed Hebîb e. Sernivîsarê kovarê jî Emîr Hecî Dawud e.<sup>196</sup>

### **1.8.3.14. Gizîngî Biçûkan**

Gizîngî Biçûkan di sala 1985an de ji hêla Yekîtiya Nivîskarên Kurd ve li Kerkûkê hatiye çapkirin. Kovar 3 hejmar derketiye.<sup>197</sup>

### **1.8.3.15. Gullekan**

Kovara Gullekan li Çemçemala navçeya Kerkûkê ji hêla Navenda Organîzasyona Çalakiyên Ciwanan hatiye weşandin.<sup>198</sup>

---

<sup>194</sup> Subaşî, *h.g.*, r. 20

<sup>195</sup> H.r

<sup>196</sup> H.r

<sup>197</sup> Subaşî, *h.g.*, r. 20

<sup>198</sup> H.r



#### **1.8.3.16. Pêşengî Mindalan**

Pêşengî Mindalan wek kovareke zarokan ji hêla Rêxistina Zarokên Pêşeng ên Kurdistanê ve hatiye weşandin. Xwediyê vê kovara ku bi mehane dihat weşandin Tarîq Xurşîd, sernivîsarê kovarê jî Şêrzad Resûl Feqî ye.<sup>199</sup>

#### **1.8.3.17. Colanê**

Colanê di bihara 2013an de li Hewlêrê dest bi weşandinê kir. Kovar sê mehan carekî tê weşandin. Xwediyê kovarê Mihemed Huseyn Bapîr û sernivîsarê kovarê jî Aza Yûsif e.<sup>200</sup>

#### **1.8.3.18. Rûdawî Mindalan**

Kovara Rudawî Mindalan di gulana 2013an de li Hewlêrê dest weşanê kir. Xwediyê kovarê Rûdaw Company e û mehane tê weşandin. Sernivîsarê kovarê Rehêl Reşîd Ezîz e.<sup>201</sup>

#### **1.8.3.19. Jînwar**

Jînwar sê mehan carekê tê weşandin. Xwediyê kovarê Şermîn Hemed Reşîd e. Sernivîsar jî Karwan Reşîd e.<sup>202</sup>

#### **1.8.3.20. Sivore**

Yekem hejmara kovara Sivoreyê di 22yê nîsana 1998an de yanê di salvegera sedsaliya rojnamegeriya kurdî de hatiye weşandin. Ev kovara mehane li Duhokê ji hêla 10 kesan va tê amadekirin û dû re tê çapkirin. Bi elfebeya erebî lê kurmancî heta îro ji 150î zêdetir hejmarên kovarê hatine weşandin. Sernivîsarê kovara Sivoreyê Selam Balayî ye. Balayî di hevpeyvîneke xwe de wiha behsa hejmar û çapa kovarê dike:

---

<sup>199</sup> H.r

<sup>200</sup> H.r

<sup>201</sup> H.r

<sup>202</sup> H.r

“Di destpêkê de, me 500 dane ji her hejmarekê derdixistin. Nuke, ew sê meh bûn, me 5000 dane jê derdixistin. Rewaca wê ya berdeyam e û em hewil didin tîraja wê zêdetir bikin. Bi dîtina min, eger dezgehekê baş yê belavkirinê li Kurdistanê hebûya, da heta 10 000 daneyan jî li seranserî Kurdistanê jê belav bin. Lê, em wê bi tinê li barjêrê Dihokê belav dikin. Zêdebarî wê, em wê li ser hêla internetê jî bi tîpên latînî li gel yê erebî belav dikin û rojane 50 heta 100 kesan serdana malpera Sivoreyê dikin.”<sup>203</sup>

Wek kovarên zarokan ên din Sivore jî bi nivîs, xêz û wêneyên rengîn ve balê dikşîne. Di kovarê de çîrok, danasîna cih û deverên kurdan, helbest, nasandina heywanan, karîkatur û h.w.d. tişt hatine çapkirin. Hin caran bi tîpên latînî kurmancî û îngilizî jî nivîs hatine nivîsandin.<sup>204</sup>

#### **1.8.3.21. Asoy Mindalan**

Kovara Asoy Mindalan wek kovareke mehane ji hêla Wezaretê Perwerdeya Hikûmeta Herêmî hatiye çapkirin. Rêvebirê kovarê Dara Mihemed Elî ye.<sup>205</sup> Kovar bi elfebeya erebî kurmancî hatiye çapkirin. Dema kovar tê lêkolînkirin tê dîtî ku kovar gelek rengîn, têr û tije ye. Ji bo zarokan agahiyên girîng wek diranşûstinê, fêrkirina matematîkê, çîrok, helbest, karîkatur, xêz, wêne, nasandina heywanan, cihên dîrokî, cil û bergên kurdan û h.w.d. di kovarê de cih digrin.<sup>206</sup>

#### **1.8.3.22. Pêlîstank**

Hejmara ewil a kovara Pêlîstank di 19ê adara 2014an de li Hewlêrê 38 rûpel hatiye weşandin. Ev kovara mehane a zarokan ji hêla Pêlîstank TVyê ve bi kurmancî û soranî tê derxistin. Sernivîsarê kovarê Meaf Menaf e. Ji bo soranî rêvebirê nivîsan Rondik Faris, karîkatur û wênesaz Rûşen Farqîn, rêvebirê hunerê jî Ehmed Esedî ye. Ji bo beşa kurmancî jî rêvebirê Pêlîstankê Dersim Oramar e.

Di kovarê de çîrok, fabl, helbest hatine nivîsandin. Ji bilî vê, hevpeyvînên bi zarokan re hatine kirin jî di Pêlîstankê de cih digrin. Hin pirs ji zarokan hatine pirsîn û ji bo bersiva wan emaila kovarê hatiye dayîn ku zarok bersivên xwe ji kovarê re

<sup>203</sup> <http://www.kulturname.com/?p=2600> 04.12.2016/ 12.38

<sup>204</sup> Sivore, j. 168, Duhok, Hezîran, 2013

<sup>205</sup> <http://kurdistanart.blogspot.com.tr/2013/10/dara-muhammad-ali-1950-artist-kurdistan.html> 04.12.2016/ 13.11

<sup>206</sup> *Asoy Mindalan*, j. 7, Temmuz 2007, j. 16, Nîsan 2006

bişînin. Heywanên wek şevşevokê, heştir, kangoru û balîna, navdarên kurd (wek Pîremêrd), cil û bergên kurdan hatine nasandin. Di kovarê de du wêne hatine dayîn û hatiye xwestin ku zarok cudahiyên di navbera du wêneyan de bibînin. Ji bo ku zarok rengan hîn bibin, reng hatine nasandin. Karîkatur û wêneyên kovarê gelek rengîn in û baş hatine xêzkirin.<sup>207</sup>

### 1.8.3.23. Kepir

Kovara Kepirê di sala 2003an de li Duhokê bi tîpên erebî, lê bi kurmancî hatiye weşandin. Xwediyê kovarê Weşanxaneya Spîrêz e û mehê carekî hatiye weşandin. Piştî 75 hejmaran di îlona 2009an de kovarê dev ji weşana xwe berdaye. Sernivîsarê kovarê Mueyed Teyyîb e. Ji bilî wî kesên wek Şikoyê Hesên, Evraz Hisîn, Mihemed Emîn Doskî di kovarê de nivîsîne. Wêneyên kovarê Necmeddîn Bîrî xêz kirine.

Di kovarê de li ser rûpelên rengîn, wêne hatine xêzkirin û nivîsên ne mezin û ne jî biçûk yên ku zarok bikaribin bi rehetî bixwînin hatine nivîsandin. Behsa navdarên kurdan (wek Melayê Cizîrê, MelaMehmûdê Bazîdî) û navdarên cihanê wek (Gandî, Bethoveen) hatiye kirin. Di naveroka kovarê de behsa nîrxên gelê kurd (wek alaya kurdan), heywanan, erdnigariyê, werzişê, tenduristiyê, xwezayê, nebatan û h.w.d. hatiye kirin. Xaçepirs, çîrokên folklorî, pêkenok, helbest, pêşbirkên ku xelatan dide jî di Kepirê de hatine weşandin. Ji bo hînkirina zimanê îngilizî jî beşek hatiye amadekirin ku zarokên kurd îngilizî jî hîn bibin.<sup>208</sup> Hejmarên Kepirê yên 1,43,44 û 45an li ser malpera înternetê ya weşanxaneya Spîrêzê hene.<sup>209</sup>

### 1.8.3.24. Nêrgiz

Kovara Nergizê di sala 2005an de li nehiyeya Tekyeyê ya girêdayî Çemçemala navçeya Kerkûkê hatiye derxistin.<sup>210</sup>

<sup>207</sup> Pêlîstank, j.1, Hewlêr, Adar 2014

<sup>208</sup> Ev agahî ji 75 hejmarên *Kepirê* yên ku di nav 7 cildan de hatine komkirin, hatin berhevkirin, Duhok, 2003

<sup>209</sup> <http://www.spirez.org/kepirlatini.html> 23.02.2015/ 11.03

<sup>210</sup> Subaşî, *h.g.*, r. 21

### **1.8.3.25. Awat û Hêvî**

Awat û Hêvî di sala 1992an de li Silêmaniyê hatiye çapkirin. Kovar bi tîpên erebî, lê kurmançî hatiye weşandin. Di kovarê de xêz û wêneyên rengîn ji bo zarokan hatine xêzkirin. Ji bilî xêz û wêneyan çîrok, helbest, agahiyên dînî wek şeva beratê û şîret, xaçepirs û h.w.d. di kovarê de balê dikşînin.<sup>211</sup>

### **1.8.3.26. Edebî Mindalan**

Kovara Edebî Mindalan di çileyê pêşîn a 1985an de hatiye weşandin. Ev kovaraka ku ji bo perwerdeya zarokan hatiye amadekirin ji 20 rûpelan pêk tê. Hejmara wê ya duyemîn di sala 1990an de yanê pênc sal şûn d ehatiye weşandin.<sup>212</sup>

Ji bilî van kovarên ku me der barê wan de agahî dan hin kovarên din ên zarokan jî li Başûr hatine weşandin. Wek; Karwanî Mindalan (1990), Perîstan (1992, Hêvî (1995), Pelgezêrîne (1999), Govar (1998), Mindalî Kurd (1999), Xende, Dîlana, Kolare, Hacîle Goran, Şilk û Şa, Edebî Mindalan, Xalxalok. Ji ber ku der barê wan de em negihîştine tu agahiyan me bi tenê behsa navê wan kir. Wek ku tê dîtin li gor Tirkiye, Swêd û cihên din ên ku kurd lê dijîn kovarên zarokan herî zêde li Başûr hatine çapkirin. Her çiqas ji wan hinekan dev ji weşanê berdabin jî, yên ku weşana wan didome jî hene.

## **1.9. Kovarên Zarokan ên Kurdî Yên Ku Li Îranê Hatine Weşandin**

### **1.9.1. Gir û Gallî Mindalanî Kurd**

Kovara Gir û Gallî Mindalanî Kurd wek yekemin kovara zarokan a kurdî tê zanîn. Di serdema Komara Kurdistanê de (1946) li bajarê Mehabadê di çapxaneyê Kurdistanê de hatiye çapkirin. Qasî ku tê zanîn 3 hejmarên kovarê hatine weşandin. Reza Şivan dema behsa vê kovarê dike dibêje ku orjînalê hejmarên 2yemîn û 3yemîn

<sup>211</sup> *Awat û Hêvî*, j.9, Zivistan 1999

<sup>212</sup> <http://knwe.org/Direje.aspx?Jimare=45717&Cor=2&Besh=Witar> 05.01.2016

ên Gir û Gallî Mindalanî Kurd li cem Dr. Kemal Mezhar hene. Kopyaya vê kovarê ya 2yemîn û 3yemîn Korî Zanyarî Kurd çap kiriye.<sup>213</sup>

### **1.9.2. Girr û Gall**

Ev kovar di sala 1979an de li bajarê Kirmanşahê ji hêla Muhsin Şahsiwar ve heta du hejmaran hatiye weşandin. Hejmara ewil kurdî, ya duyem jî kurdî û farisî hatiye çapkirin.<sup>214</sup>

### **1.9.3. Dinyayê Mindalan**

Kovara Dinyayê Mindalan ji hêla Weqfa Parastina Zarokên Kurdistana Rojhilatê ve di sala 2002an de li Kurdistana Başûr hatiye çapkirin. Dema li Başûr tê çapkirin jî zarokên li Rojhilatê re tên şandin. Heta niha 155 hejmar hatine weşandin.<sup>215</sup>

### **1.9.4. Amanc Bo Zaroka**

Îsmail Tenya li ser malpera Kurdistanê Newe di gotareke xwe de behsa kovarên zarokan dike. Li gor agahiyên Tenya ev gotar di çileya pêşîn a 1985an de li Tehranê wek pêvaka Rojnameya Amanc hatiye weşandin. Ev kovar ji bo zarokan kovareke rengîn e û ji hêla wêneyan ve jî gelek dewlemend e. Bi zaravayî soranî û aramî hatiye amadekirin.<sup>216</sup>

### **1.9.5. Nêrgiz**

Nêrgizê di sala 2009an de dest bi weşana xwe kiriye û wek kovareke mehane 6 hejmar hatiye çapkirin. Armanca kovarê ew e ku zarokên kurdan ên li Îranê perwerde bike.

Ji bilî van kovaran navê kovarên zarokan Şox û Şeng, Amanc Bo Zarokan, Kenarî û Taw Taw jî di gotara Subaşi de derbas dibin, lê der barê wan de tu agahî tunene.

---

<sup>213</sup> <http://www.gulan-media.com/sorani/articles.php?eid=61&id=1328> 17.01.2016/ 17.45

<sup>214</sup> Subaşi, *H.g.*, r.22

<sup>215</sup> H.r

<sup>216</sup> <http://knwe.org/Direje.aspx?Jimare=45717&Cor=2&Besh=Witar> 05.01.2017/ 21.30

Ji bo dawiya vê beşê jî divê bê gotin ku kurdan her çiqas dereng dest bi weşandina kovarên zarokan kiribin jî gavên girîng avêtine. Dîsa ji ber sedemên cuda piştî demekê dev ji weşandina van kovaran berdane, lê hemû ev kovarên ku me kêman jî zêde behsa wan kirin wê di dîroka edebiyata zarokên kurd de cihê xwe bigrin.



## BEŞA DUYEM

### 2.1. DANASÎNA KOVARA NÛBIHARÊ

#### 2.1.1. Rewşa Siyasî Ya Serdema Ku Nûbiharê Dest Bi Weşanê Kir

Di dîroka her welatî de bûyerên nebaş hene. Li ser re her çiqas gelek sal derbas bibin jî, tu caran nayên jibîrkin û dibin sedema gelek bûyerên xirab. Di dîroka Tirkiyeyê de jî hin bûyerên nebaş hene ku ji van yek jî 12ê îlonê ye. 12 îlona 1980yan wek rûpeleke reş di dîroka Tirkiyeyê de cih digre, lewra di vê tarîxê de leşkeran dest da ser rêvebiriya welêt û derbeyek hat kirin. Dema ev derbe çêbû hema bibêje bi gelemperî li Tirkiyeyê kesê ku nehatibe binçavkirin, ceza nexwaribe, neketibe hepsê an jî îşkence nedîtibe nema. Ji ber vê heyamê welat gelek paş ve çû û welatiyan jî êşên mezin kişandin. İsmail Beşikçi dema behsa rejima 12ê îlonê û rewşa welêt a wan rojan dike wiha dibêje:

“12ê îlona 1980an de derbe hatibû kirin, parlamento hatibû belavkirin, partiyên siyasî hatibûn girtin. Serokwezîr û serokên partiyên siyasî di bin çavdêriyê de bûn. Bi deh hezaran kes di girtîgehan de bûn. Der barê sedhezaran kesî de lêpîrsîn hene. Îdam hene. Qanûnên ku azadiya fikirandinê, azadiya çapemeniyê bisînor dike hene. Qanûnên nû li ser van qanûnan tên zêdekirin. Ji bo ku yên nû li ser bên zêdekirin hewldayîneke xurt heye. Ev tişt bibiryar û bitesîr tên mêşandin. Di nav rewşeke wiha de Lijneya Fakulteya Hiqûqê ya Zanîngeha Stenbolê payeya Doktoraya Hiqûqê dide Serokê Cuntayê Orgeneral Kenan Evren...”<sup>217</sup>

Wek ku Beşikçi jî behs dike, di vê heyamê de bûyerên ku tu caran wê ji hişê welatiyan dernekevin û neyên jibîrkin qewimîn. Helbet ev rewş divê bi hin qanûnan û tevdîran ve bihata saxlemkirin ku welatî nikaribin li hember vê zêde dengê xwe bilind bikin. Ji xwe yên ku dengê xwe bilind dikirin jî divê li gor van qanûnan bihatana cezakirin. Piştî derbeya 12ê îlonê Zagona 1961an ji holê rabû û zagoneke nû hat avakirin. Di vê zagona nû de çawa ku hin qanûn û madeyên berê hatibin parastin, hin qanûn û made jî an li ser vê hatin zêdekirin û an jî hatin guhertin. Mînak di zagona 1924an û di madeya 3yemîn de dihat gotin ku “zimanê dewletê tirkî ye”. Di

<sup>217</sup> İsmail Beşikçi, *Rejimin Niteliği ve Kürtler*, İsmail Beşikçi Vakfı, Mayıs 2013, İstanbul, r.

zagona 1961an de peyva “fermî” li ser vê hat zêdekirin û hat gotin ku “zimanê fermî yê dewletê tirkî ye”. Yanî peyva zimanê tirkî nehat guhertin, bi tenê peyva fermiyetê li ser hat zêdekirin. Ev made di zagona nû de bêtir hat tundkirin. Di 19ê cotmeha 1983an de di qanûna ku hejmara wê 2932 ye de, di madeya 3yemîn de wiha hat gotin;

“MADDE 3- Zimanê zikmakî yên welatîyên tirk tirkî ye

“a) Ji bilî tirkî wek zimanê zikmakî bikaranîna zimanên din û hemû xebatên ji bo belavkirina vê,

b) Di civîn û xwepêşandan de qanûn qedexe neke jî bêyî destûra amirê mulkî yê herî mezin ê mehellî, afîş, pankart, dowîz, lewha û tiştên din yên ku bi zimanekî ji bilî tirkî hatine nivîsandin û di destan de girtin, plaq, bandên dîmenan û dangan, alav û tiştên din ve weşankirin, qedexe ye.”<sup>218</sup>

Bi kurtasî piştî derbeyê bi qanûnan ve qada zimanê kurdî zêdetir hat tengkirin û ev ziman hat qedexekirin. Kesên ku zimanê kurdî diaxivin re jî ceza hatin dayîn. Di van salan û salên 90î de gelek rojnamevan hatin girtin, îşkence dîtin, an jî hatin kuştin. Dîsa gelek rojname û kovar hatin berhevkerin û destûr nehat dayîn ku ew weşanê bikin. Di 25ê çileyê paşîn a 1991an de ev qanûna ku me behsa wê kir û zimanên din qedexe dikir, bi madeya 23emîn ve ji holê hat rakirin.<sup>219</sup>

Her çiqas ev qanûn ji holê rabe jî zor û zextiya li ser zimanê kurdî tu carê bi temamî ji holê ranebû. Lewra di xalên 26 û 28an de dihat gotin ku “Zimanekî ku bi qanûnê ve hatiye qedexekirin ji bo eşkerekirina fikran û di weşanan de nikare bê bikaranîn”. Cuma Çiçek wiha behsa van madeyan dike:

“...Fikrên ku xalên 26 (3) û 28 (2) behs dike ji aliyê rêvebiriya leşkerî bi qanûna hejmar 2932an hate zelalkirin. Di xala yekemîn de tê gotin ku ev qanûn “esas û usulên zimanên ku bikaranîna wan di gotin û belavkirina fikr û ramanan de hatine qedexekirin” dest nîşan dike da ku yekîtiya dewletê ku bi welat û neteweya xwe nayê parçekirin, desthilatiya neteweyî, komar, ewlehiya neteweyî û pergala cemawerî bîn parastin. Di xala diduyan de tê gotin ku “di gotin, weşandin û belavkirina fikr û

<sup>218</sup> *Resmî Gazete*, 22 Ekim 1983, j. 18199, r. 28, Bnr. <http://www.resmigazete.gov.tr/arsiv/18199.pdf>

<sup>219</sup> *Resmî Gazete*, 12 Nisan 1991, j. 20843, r.8, Bnr. [http://www.resmigazete.gov.tr/arsiv/20843\\_1.pdf](http://www.resmigazete.gov.tr/arsiv/20843_1.pdf)



ramanan de bikaranîna zimanên ji bilî yekemîn zimanê fermî ya dewletên ku ji aliyê dewleta tirk hatine naskirin qedexe ye”. Di xala sisêyan de rasterast tê gotin ku “zimanê dayikê yê hemwelatîyên Tirkiyeyê tirkî ye.” Cezayên giran ji bo bînpêkirina vê qanûnê hatiye diyarkirin. Xuya ye ev qanûn rasterast zimanê kurdî hedef digre. Ji ber ku duyemîn zimanê fermî yê Iraqê kurdî ye, di xala duyemîn de bi taybetî hatiye gotin ku rê bi tenê “yekemîn zimanê fermî” yê dewletên ku hatine naskirin re vekirî ye. Ev hikmên ku di makeqanûnê de û di qanûna bi hejmar 2932an de cih digirin bi awayekî tund hatin tetbîqkirin heta salên 1991ê ku mirov dikare wek destpêka reforman nîşan bide.<sup>220</sup>

Piştî hemû van agahiyan mirov dikare bibêje ku li Tirkiyeyê her çiqas azadiyeke sedî sed li ber zimanê kurdî çênebe jî, hin guherîn çêbûn. Di radyo û televîzyonan de weşana kurdî, firotina plaq û kasetên kurdî, strangotina bi kurdî serbest bûn. Piştî van serbestîyan ji bilî tirkî bi zimanên din jî hêdî hêdî weşanan dest pê kir. Kovara Nûbiharê ya ku niha mijara teza me ye jî di heyameke wiha de yanê di sala 1992an de dest bi weşana xwe kir.

Serdama ku Nûbiharê dest bi weşanê kir li Tirkiyeyê di navbera dewletê û PKKê de pevçûnên giran çêdibûn. Li bajarên ku kurd lê dijîyan rewşa derasayî hebû. Rewşa derasayî cara ewil di 19ê tîrmeha 1987an de li 8 bajarên (Bîngol, Diyarbekir, Elezîz, Hekarî, Mêrdîn, Sêrt, Tuncelî û Wan) û pişt re jî Adiyaman, Bidlîs, Mûş, Batman û Şîrnex di nav de bi giştî 13 bajarên kurdan hatibû îlankirin. Dema vê rewşa derasayî bi temamî 46 caran hatiye dirêjkirin. Ji ber ku li welêt rewşek normal tunebû, gelek kes dihatin kuştin û ji van bûyeran re digotin failên kiryarên wan nediyar. Rê dihatin girtin, mirov bi rehetî nikaribû derkevin derve, gund dihatin şewitandin, mirovan îşkence didît, ji bajarên kurdan ber bi rojavayê ve koçên mezin çêdibûn. Bi kurtasî gelek neheqî, zilm û zordarî diqewimîn. Kovarê di nav vê rewşê de gavek avêt û dest bi weşana zimanê kurdî kir.

### **2.1.2. Dîroka Kovara Nûbiharê**

Salên 90î ji bo kurdan her çiqas salên pir dijwar bin jî, ji hêla çapemeniyê ve destpêka heyameke nû ye. Ji ber ku di sala 1991ê de qanûna 2932an ya ku zimanê

---

<sup>220</sup> Cuma Çiçek, *Zimanek Çima Tê Qedexekirin? Politikayên Zimanî û Rewşa Kurdî li Tirkiyeyê Ji Înkare Ber Bi Nasîne*, Weşanên Peywend, Payîz 2013, Stenbol, r. 13-14

kurdî di qada axaftin, weşandin û çapkirina fikr û ramanan de qedexê dikir hat betalkirin. Bi fesihkirina vê madeyê ve qedexeya li ser weşana kurdî jî ji holê rabû. Kovareke bi navê Nûbihar jî di vê heyamê de gavek avêt û bi zimanê kurdî dest bi weşanê kir.

Kovara ku ji bo çand, hûner û edebiyata kurdan bide nişandan, li hember qedexê û asimilasyonê bisekine û xwe bigîhîne gelê kurd di çiriya pêşîn a sala 1992an de hejmara xwe ya ewil li Stenbolê weşand. Li ser hejmara ewil a kovarê peyva Nûbiharê bi rengê sor, nivîsa *Mehnameya Çand û Huner û Edebiyat* jî bi rengê spî hatiye nivîsandin. Bihayê wê jî 8.000 TL hatiye diyarkirin. Di kunyeya kovarê de xwediyê kovarê Mahmut Yarlug, berpirsyarê giştî yê kovarê Sabah Kara, berpirsyarê nivîsaran jî Süleyman Çevik hatiye nivîsandin. Wek ku li ser jî hatiye nivîsandin ev kovareke edebî, çandî û hunerî ye.

Her çiqas kovarê bi mehane dest bi weşana xwe kiribe jî, ji hejmara 87emîn pê ve êdî wek bihar, havîn, payîz û zivistan sê mehan carekê tê weşandin. Kovar dema ku mehane derketiye ji 32 rûpelan pêk hatiye. Lê piştî ku bûye demsalî rûpelên kovarê zêde bûne. Bi piranî her hejmar ji 96 rûpelan pek tê, lê carinan hejmara rûpelên kovarê di navbera 96 û 110an de diçe û tê, yanê diguhere.

Peyva Nûbiharê tê menaya bihara nû. Nû, tiştê ne kevn, tiştê teze, ya ewil e. Bihar jî navê demsalekê ye û bi destpêka wê ve zivistan xilas dibe, xweza ji nû ve zindî dibe. Gelo kovarê ev nav çima ji xwe re hilbijartiye? Li ser malpera nubiharblogê bersiva vê pirsê wiha tê dayîn;

“Nûbihar pira navbera do û îro ye. Do û îro li hev tîne. Nûbihar navê xwe ji Nûbihara Biçûkan ya Ehmedê Xanî digre û xwe dewama wan kesên ku di tarîxê de ji edebiyata Kurdî re xizmet kirine dibîne. Lêbelê Nûbihar îro li dunyayê ye û xîtabî îro dike. Bi bingeha xwe aîdê dema berê ye û ew ê çandê ji xwe re bingehe digre, lê xîtabî îro dike û di navbera herdu deman de wezîfeya pirê dibîne û pêşerojê jî ronî dike.”<sup>221</sup>

Serdar Şengül di nivîsa xwe ya bi navê “İslamcılık, Kürtler ve Kürt Sorunu” (Îslamparêztî, Kurd û Pirgîrêka Kurdan) de dîr û dirêj behsa rewşa siyasî ya li Tirkiyeyê, misilmanan û pirsgîrêka kurd dike û dibêje ku di salên 90î de kovareke

---

<sup>221</sup> <https://nubiharblog.wordpress.com/nubihar/28.03.2016/17.56>

îslamî ya kurdan a ku alimên medreseyan piştgirî didayê dest bi weşanê dike. Kovara ku Şengül behsê dike Nûbihar e û wiha dibêje:

“Di sala 1992an de Nûbihar bi slogana “Kovara Edebî û Îslamî ya Kurd a Ewil” derket û bi taybetî ji hejmarên ewil pê ve bû platforma ku pirsgirêka kurd ji hêla îslamî ve lê tê nîqaşkirin. Kovar birêzdarî behsa hemû alim û serokên kurd dike. Lê cihê Bedûzzeman Seîdê Nursî, bi gotina kurdan ve Mele Seîdê Kurdî di kovarê de taybet e. Koma ku wek Med Zehra tê nasîn û bi taybetî salên 1980an de li dora weqfa Medresetûzehrâyê ya ku Seîdê Nursî dixwest li Kurdistanê bi vê navê zanîngehekek bê avakirin û di destpêkê de li ser meseleya kurd -ya ku ji hêla nurciyên fermî ve nedihat dîtin- kom bûbûn, piştgirî dan vê kovarê. Her çiqas di nav demê de kovar gihîştibe gelek xwendevanan jî, di destpêkê de van kesan ev kovar distend û dixwend.”<sup>222</sup>

Li hember xwendevanên xwe kovar dilsoz tevgeriya ye. Rêvebirên kovarê her tim hewl dane ku bi xwendevanan re piyeyekê ava bikin û ji bo vê jî car caran di kovarê de hin îlanên ji bo civînan hatine weşandin. Piştî van îlanan rêvebiran civîn li dar xistine û xwestine ku xwendevan beşdarî van civînan bibin. Bi vê hewldayîne ve him rêvebiran xwendevanên xwe nas kirine û him jî xwendevanên ku li bajarên cuda dijîn, xwediyê pîşeyên cuda ne û temenên wan cuda ne hatine bal hev û hevdu nas kirine. Mînak di hejmara 24emîn de bi serenava “Dawetname” vexwendnameyek ji bo xwendevanan hatiye amadekirin û wiha hatiye gotin; “Bi munasebeta salvegera weşandina kovara me Nûbihar, di tarîxa 8.10.1994 (saet 14.00) de di debirxaneyê kovara me de dê civînek tertîb bibin. Emê bi dîtina xwendevanên xwe vê civîne de xweşxal bibin.”<sup>223</sup> Gelek rewşenbîrên kurd ên ku ji wan salan pê ve ked dane ziman û çanda kurdî bi saya van civînan û hevdîtinan rewşenbîrên din nas kirine, bûne heval û dost. Yanê kovar bûye sedem ku di navbera kurdên rewşenbîr de têkiliyên germ ava bibin.

Dema hejmarên kovarê bê lêkolînkirin tê dîtin ku hin meh kovar nehatiye weşandin. Pişt re du hejmar bi hev re hatine çapkirin. Wek hejmarên 41/42, 43/44 51/52 û 53/54. Rêvebirên kovarê ji ber sedemên cuda di îlona 1997an de bi hejmara 60emîn ve dev ji weşandina Nûbiharê berdane. Lê vê devjêberdanê dirêj nekişandiye.

<sup>222</sup> Serdar Şengül, “İslamcılık, Kürtler ve Kürt Sorunu”, *Modern Türkiye’de Siyasi Düşünce – İslamcılık*, İletişim Yayınları, Cilt. 6, Ç.2emîn, 2005, İstanbul, r. 532

<sup>223</sup> *Nûbihar*, j. 24, Îlon 1994, r. 22

Rêvebiran di hejmara 60emîn de ji xwendekarên xwe re gotine ku ew ê navbereke çend mehan (6 meh) bidin weşanê û wê di nîsana 1998a de car din dest bi weşana xwe bikin.<sup>224</sup>

Di nîsana 1998an de ji ber ku sedsaliya rojnamegeriya kurdî ye, Nûbiharê soza ku ji xwendevanên xwe re daye bi cih aniye û kovarê car din dest bi weşana xwe kiriye. Di pêşgotina hejmara 61emîn ya ku piştî şeş mehan derketiye de hatiye gotin ku ew ê ji vir pê ve di her hejmarê de wê li ser mijarekî bisekinin.<sup>225</sup> Kovarê di nav 23 salan de cara duyem di sala 2000an de navber daye weşana xwe ku ev jî piştî hejmara 86an (Çileyê Pêşin) e. Rêvebirên kovarê piştî vê hejmarê êdî dev ji weşana mehane berdane û di sala 2002yan de, bi jimara 87an ya zivistanê ve dest bi weşana demsalî (sê mehan carekê) kirine.

Nûbihar her çiqas ji hêla çepkiran, tirkên misilman an jî komên din ve hatibe rexnekirin jî, ji hêla gelek kurdan ve jî pesnê wê hatiye dayîn. Ji ber ku bi îstiqrar û hewleke mezin nîşan daye, xebatên xwe meşandiye û gihîştîye vê rojê hatiye pîrozkirin. Nûbihar wek kovar derketiye, lê bi tenê di qada kovargerîyê de xebat nekiriye. Rêwîtiya wê ya ku di sala 1992an de dest pê kiriye bi avakirina weşanxaneyê, komeleyê, lidarxistina panel û konferansan dewam kiriye. Mînak weşanxaneya bi navê “Nûbihar” zêdetir weşanên kurdî, weşanxaneya bi navê “Kent” jî piranî bi zimanê tirkî weşanê dikan.

Müslüm Yücel dibêje Nûbihar kovara ewil a kurdî ya edebiyat, huner û çandê ya mehane ye, ji bilî kovargerîyê xebatên girîng kirine û ji wan xebatan yekê jî wiha tîne ziman: “...Bêyî ku halê wan ê resen bên xirabkiran bi kurdî weşandina rîsaleyên Bedûzzeman di nav fikra îslamê de ji bo çand û edebiyata kurdî bêşik xebatek girîng e.”<sup>226</sup> Komeleya bi navê “Komeleya Çand û Perwerdeyê ya Nûbiharê” jî di sala 2011an de hatiye avakirin û ev komele civînan, panel û konferansan li dar dixê û dersên kurdî dide.

Nûbiharê di 16ê Gulana 1993an de li Stenbolê bi navê “Kürt Sorunu Nasıl Çözülür?” (Pirsa Kurdî Çawa Çareser Dibe?) sempozyumek li dar xistiye. Gelek

<sup>224</sup> *Nûbihar*, j. 60, Îlon 1997, r. 4

<sup>225</sup> *Nûbihar*, j. 61, Nîsan 1998, r. 1

<sup>226</sup> Yücel, *Kürt Basın Tarihi -Tekzip*, r. 100

rewşenbîr, nivîskar û siyasetmedar beşdarî vê sempozyumê bûne û fikrên xwe gotine. Sernivîsarê kovarê Süleyman Çevik di hejmara 9emîn a ku piştî sempozyumê hatiye weşandin de behsa vê çalakiyê dike û dibêje ku ji bo fêmkirina hevdu tiştên xweş derketine meydana.<sup>227</sup> Dîsa van salên dawîn de Nûbiharê di 21 û 22yê Îlona 2013an de li Diyarbekirê sempozyumeke navneteweyî ya bi navê “Sempozyuma Navneteweyî ya Dîn Ziman û Nasnameyê” jî li dar xistiye. Gelek rewşenbîr, zana, nivîskar û akademisyenên navneteweyî di vê civînê hatine bal hev, fikr û hestên xwe parve kirine.<sup>228</sup> Herî dawîn di sala 2014an de bi navê “Nûbihar Akademî” kovareke kurdî ya akademîk a navneteweyî jî hatiye amadekirin û hê jî weşana xwe didomîne.

Wek kurtasî dema kovara Nûbiharê dest bi weşanê kir kovarên kurdî yê wê wek Rewşen-Jiyana Rewşen, Newroz Ateşî (Agirê Newrozê), Serketin, Tewlo, Zend, Nûdem û h.w.d. jî dest bi weşanê kirin. Tîbûna zimanê kurdî ji hêla van kovar û çend weşanxaneyên kurdî û pirtûkên ku wan weşand ve hinekî şikest. Valahiya salan bi van xebatan ve hinekî tije bû. Piştî sala 1992an hêdî hêdî hejmara kovarên ku bi kurdî weşanê dikin zêde bû. Hê jî kovarên nû yê wê wek Wêje û Rexne, Felsefevan, Bar, Zarema û h.w.d. derdikevin pêş xwendevanên kurd.

### 2.1.3. Naveroka Kovarê

Nûbihar li Tirkiyeyê temendirêjtirîn kovara kurdî ye, bi tîpên latînî kurmançî hatiye weşandin. Hin caran nivîsên zazakî û soranî jî di kovarê de hatine weşandin. Ji ber ku kovar kovareke edebî, çandî û hunerî ye, tê de gelek cure nivîs hatine weşandin. Di Nûbiharê de nivîskar, helbestvan, wergêr gelek kesan çîrok, pexşan, helbest, gotinên pêşiyar, metelok, ceribandin, gotar, nivîsên cur be cur nivîsandin e. Li gor gelek kovarên kurdî di Nûbiharê de tiştek cuda heye ku ew jî di vê kovarê de ji bo zarokan beşek hatiye veqetandin û ji bo wan tişt hatine nivîsandin.<sup>229</sup>

Kovar ji hêla edebiyata kurdî ya klasîk ve gelek dewlemend e. Lewra helbest, beyt û çarînên Melayê Cizirî, Feqiyê Teyran, Mela Huseynê Bateyî, Seyîd Eliyê

<sup>227</sup> Süleyman Çevik, “Yekîtiyeke Çawa?”, *Nûbihar*, j. 9, Hezîran 1993, r. 7

<sup>228</sup> <http://aa.com.tr/kk/cand-%C3%BB-huner/encamnameya-sempozyuma-navnetewey%C3%AE-ya-d%C3%AE-n-ziman-%C3%BB-nasnamey%C3%AA-ya-n%C3%BBbihar%C3%AA-hat-diyarkirin/215931>

18.12.2016/ 10.02

<sup>229</sup> Ji ber ku mijara teza me beşa zarokan e, ev beş wê di beşa sêyemîn de berfireh bê vegotin.

Findikî, Baba Tahirê Uryan, Ehmedê Xanî û h.w.d. di Nûbiharê de hatine weşandin. Wek mînak di hejmara yekem de ji Melayê Cizîrî helbestek bi navê “Newaya Mutrib û Çengî”,<sup>230</sup> di hejmara düyem de helbestek “Ismê te ye mektubî di dîwanê qidem da”<sup>231</sup> hatiye weşandin. Ev dewlemendî di folklor û kelepura kurdî de bûye çavkaniyeke xurt. Rêvebirên kovarê paşê weşanxaneyek bi navê “Nûbihar” ava kirine û berhemên van kesên ku di qada edebiyata klasîk de navdar in weşandine.

Ji bilî nivîsên li ser edebiyata kurdî ya klasîk, di kovarê de gelek werger jî hatine kirin. Ji bilî zimanê tirkî, ji farisî, almanî, îngilizî, erebî, frensî, norwêcî û zimanên din jî helbest, çîrok, gotar û h.w.d. werger hatine kirin. Wek mînak ji Baba Tahirê Uryan, ji Mewlana, ji Yunis Emre, ji Cahit Sıtkı Tarancı, ji Jaques Prévert, ji Mihemed Îqbal, ji Franz Kafka û h.w.d. werger balê dikşînin. Di hejmara 27emîn de Meryamxanê ji tirkî helbesteke Nurullah Genç a bi navê “Xiyal” wergerandiye kurdî.<sup>232</sup> Di hejmara 37an de Hilmi Yeşiltaş ji zimanê norwêcî çîrokeke Knut Hamsun a bi navê “Gustîlk”<sup>233</sup>, di hejmara 38an de Babê Hacer Bêrîvan ji tîpên erebî ji dîwana Seyîd Elî Findikî helbestek a bi serenava “Dîwan/6”<sup>234</sup>, di hejmara 51/52an de M. Seîd Cubeyr ji zimanê frensî helbesteke Jaques Prévert a bi navê “Zaroktî”<sup>235</sup>, di hejmara 53/54an de Muhemmed Garsî ji farisî helbesteke Muhemmed Îqbal ya bi navê “Peyama Îqbal Bi Rojhilat”<sup>236</sup>, di hejmara 75 û 76an ên ku du hejmar bi hev re hatine weşandin de Ahmed Akın û Aliye Akın ji almanî çîrokeke Franz Kafka ya bi navê “Li Pêşîya Qanûnê”<sup>237</sup>, di hejmara 95an de Murad Pola ji farisî bi serenava “Durist Dîtin û Durist Bihîstin” nivîsek<sup>238</sup>, di hejmara 97emîn de Kawa Nemir ji îngilizî bi serenava “Hûtê Xwebîn” pexşaneke Oscar Wilde<sup>239</sup> wergerandine kurdî. Mirov dikare bi dehan wergeran li vir wek mînak nîşan bide.

<sup>230</sup> Melayê Cizîrî, “Newaya Mutrib û Çengî”, *Nûbihar*, j.1, Çiriya Pêşîn 1992, r. 22

<sup>231</sup> Melayê Cizîrî, “Ismê Te Ye Mektubî Di Dîwanê Qidem Da”, *Nûbihar*, j. 2, Çiriya Paşîn 1992, r. 12

<sup>232</sup> Nurullah Genç, “Xiyal”, *Nûbihar*, j. 27, Çileyê Pêşîn 1994, r. 29

<sup>233</sup> HilmiYeşiltaş, “Gustîlk”, *Nûbihar*, j. 37, Çiriya Pêşîn 1995, r. 29

<sup>234</sup> Babê Hacer Bêrîvan, “Dîwan/6”*Nûbihar*, j. 38, Çiriya Paşîn 1995, r. 18

<sup>235</sup> M. Seîd Cubeyr, “Zaroktî”, *Nûbihar*, j. 51-52, Çileyê Pêşîn- Çileyê Paşîn 1996-1997, r. 14

<sup>236</sup> Muhemmed Garsî, “Peyama Îqbal Bi Rojhilat”, *Nûbihar*, j. 53-54, Sibata-Adar 1997, r. 17

<sup>237</sup> Ahmed Akın û Aliye Akın, “Li Pêşîya Qanûnê”, *Nûbihar*, j. 75-76, Hezîran-Tîrmeh 1999, r.12

<sup>238</sup> Murad Pola, “Durist Dîtin û Durist Bihîstin”, *Nûbihar*, j. 95, Bihara 2005, r. 86-87

<sup>239</sup> Kawa Nemir, “Hûtê Xwebîn”, *Nûbihar*, j. 97, Payîz/Zivistan 2005, r. 53-55

Dema Nûbihar tê lêkolînkirin gelek hevpeyvîn jî balê dikşînin. Wek mînak di hejmara 77an de bi hunermendê navdar Şivan Perwer re li ser muzîk, siyaset, jiyana û hunerê, hevpeyvînek hatiye kirin. Ahmet Acet di vê hevpeyvîna ku ji 7 rûpelan pêk tê de du wêneyên Şivan Perwer û yek jî wêneyê albûma wî ya “Hêviya Te” bi kar aniyê. Di wêneyekî de Şivan Perwer Kovara Nûbiharê di destê xwe de girtiye û tebesum kiriye û fikr û nêrînên xwe yê der barê kovarê de jî di vê hevpeyvînê de aniyê ziman.<sup>240</sup>

Hevpeyvîneke dûr û dirêj ya ku ji 16 rûpelan pêk tê jî Alî Karadenîz bi rewşenbîrên kurd re çêkiriye. Di hevpeyvîna ku serenava wê “Ziman û Pirsgirêka ‘Em û Êndin’” de Alî Karadenîz pirsên der barê zimanê kurdî ji Reşo Zilan, Sabah Kara, Arif Zêrevan, Ebdullah Varli, Haydar Diljen û Zana Farqînî pirsîne. Di vê hevpeyvîna bihûrgilî de rewşenbîr û zimanzanên kurd li ser pirsgirêka ziman, gramera kurdî û xebatên ji bo ziman tîn kirin sekinîne.<sup>241</sup>

Di hejmara 102emîn a Nûbiharê de de Dilşad Mutî bi hunermend Ciwan Haco re bi serenava “Ciwan Haco: Tarza Min Bi Tesadufî Derket Holê” hevpeyvînek balkêş kiriye.<sup>242</sup>

Di hejmara 124emîn a kovarê de jî du hevpeyvîn balê dikşînin. Yek Adil Yıldırımçakar û ya din jî Türkan Tosunê bi du nivîskarên kurd re kirine. Adil Yıldırımçakar bi nivîskar Eyup Kıran re li ser romana wî ya “Derwêşê Evdî” û eşîrên kurdan hevpeyvîneke bi navê “Eyup Kıran: Bi Kurtayî Dîroka Kurdan Dîroka Eşîran e” kiriye.<sup>243</sup> Türkan Tosunê jî bi nivîskar Jan Dost re li ser jiyana, nivîskarî û berhemên wî hevpeyvîneke dirêj a bi serenava “Jan Dost: 3 Gav û 3 Darek Şêrîna Li ber Dilê min e, Ew Delaliya Min e” kiriye.<sup>244</sup>

---

<sup>240</sup> Ahmet Acet, “Şivan Perwer: Mûzîka Kurdî ji Mûzîka Her Milletî Dewlementtir e”, *Nûbihar*, j. 77, Tebax 1999, r. 10-16

<sup>241</sup> Alî Karadenîz, “Ziman û Pirsgirêka ‘Em û Êndin’”, *Nûbihar*, j. 86, Çileyê Pêşîn 2000, r. 3-18

<sup>242</sup> Dilşad Mutî, “Ciwan Haco: Tarza Min Bi Tesadufî Derket Holê...”, *Nûbihar*, j. 102, Bihar 2007, r. 39

<sup>243</sup> Adil Yıldırımçakar, “Eyup Kıran: Bi Kurtayî Dîroka Kurdan Dîroka Eşîran e”, *Nûbihar*, j. 124, Havîn 2013, r. 62-64

<sup>244</sup> Türkan Tosun, “Jan Dost: 3 Gav û 3 Darek Şêrîna Li Ber Dilê Min e, Ew Delaliya Min e”, *Nûbihar*, j. 124, Havîn 2013, r. 34-38

Her cure nivîs di Nûbiharê de hatine weşandin, lê ya ku bala mirovan dikşîne di hejmarên ewil de zêdetir nivîsên îslamî, yên li ser jiyana Hz. pêxember û sehabeyan, beşên ji Qur'ana pîroz, beşên Rîsaleya Nûrê, mijarên li ser Seîdê Kurdî, gotinên pêşiyên, helbestên klasîk, hedîsên pêxember in. Lê ev sekn û tevger ne wisa baweriyêke hişk e, bingeha xwe ji nirxên gelê kurd digre. Dibe ku ji ber vê sedemê kovar ji hêla gel ve hatiye hezkirin û bi îsal re dibe 25 sal ku weşana xwe didomîne.

Di Nûbiharê de nivîsên li ser folklorê kurdî ya gelêrî, yên wek stran, gotinên pêşiyên, heyranok, biwêj, payîzok, çîrok, lawik, lawje, destan, meselok, pêkenok, şîret, serpêhatî û çîrvanok jî gelek hatine weşandin. Ji vê hêlê ve kovar gelek dewlemend e.

Nivîsên der barê Seîdê Kurdî de jî di Nûbiharê de balê dikşînin. Di kovarê de behsa jiyana û berhemên Seîdê Kurdî hatine kirin û ji wan berhemên hin beş hatine nivîsandin. Mînak di hejmara 78an de Bedrettîn Bedirxan bi zazakî nivîseke bi serenava “Şîretê Bedîuzzeman Mela Seîdê Kurdî” nivîsek nivîsandiye.<sup>245</sup> Silhedîn Şivan ji tirkî nivîseke bi navê “Heyama Zordestiyê û Têkoşîna Seîdê Kurdî” di hejmara 82an a Nûbiharê de wergerandiye kurmancî. Di nivîsê de behsa serpêhatiya Seîdê Kurdî ya li timarxaneyê bi doxtor re hatiye kirin.<sup>246</sup> Di hejmara 83an de Newzat Eminoğlu bi serenava “Peyva Huvdehem” ji Seîdê Kurdî nivîsek ji tirkî wergerandiye kurdî.<sup>247</sup> Dîsa Suat Orak di hejmara 97emîn de bi serenava “Derheqê Duayê de” ji Bedîuzzeman Seîd Nursî wergerek kiriye.<sup>248</sup> Osman Tunç di hejmara 98an de bi serenava “Li Gor Seîdê Nursî ji Aliyê Dînî û Qewmî ‘Êdîn’” nivîseke ji 6 rûpelan pêktê nivîsandiye.<sup>249</sup> Di hejmara 100emîn de Nevzat Eminoğlu bi serenava “Doxtorê Însan, Pisporê Zeman: Seîdê Nûrsî” nivîseke behsa Bedîuzzeman Seîdê Kurdî û rîsaleyan dike, nivîsandiye.<sup>250</sup>

<sup>245</sup> Bedrettîn Bedirxan, “Şîretê Bedîuzzeman Mela Seîdê Kurdî” *Nûbihar*, j. 78, Îlon 1999, r. 29

<sup>246</sup> Silhedîn Şivan, “Heyama Zordestiyê û Têkoşîna Seîdê Kurdî”, *Nûbihar*, j. 82, Çileyê Paşîn 2000, r. 12

<sup>247</sup> Newzat Eminoğlu, “Peyva Huvdehem”, *Nûbihar*, j. 83, Sibata-Nîsan 2000, r. 22-23

<sup>248</sup> Suat Orak, “Derheqê Duayê de”, *Nûbihar*, j. 97, Payîz/Zivistan 2005, r. 81-83

<sup>249</sup> Osman Tunç, “Li Gor Seîdê Nursî ji Aliyê Dînî û Qewmî ‘Êdîn’”, *Nûbihar*, j. 98, Bihar 2006, r. 9-14

<sup>250</sup> Nevzat Eminoğlu, “Doxtorê Însan, Pisporê Zeman: Seîdê Nûrsî”, *Nûbihar*, j. 100, Zivistan 2006, r. 93



Nivîsên der barê Seîdê Kurdî de her çiqas wek salên ewil zêde neyên weşandin jî, heta salên dawîn jî hatine weşandin. Ji ber ku ji kulliyata risaleyên nûr ên Seîdê Kurdî çend pirtûkên wek “Rîsala Biratîyê”, “Peyivên Piçûk” û “Peyiva Bîst û Sêyemîn” ji hêla weşanxaneya Nûbiharê ve hatine çapkirin, êdî di salên dawîn de wek berê der barê wî de zêde nivîs nehatine weşandin.

#### **2.1.4. Zimanê Kovarê**

Zimanê Nûbiharê xwerû kurdî ye. Hema bibêje kovar ji sedî 99 bi zaravayê kurmancî hatiye derxistin. Lê car caran nivîsên zazakî (dimilkî) û soranî jî hatine nivîsandin. Ji ber ku zaravayê dimilî kêm tê axaftin û ber bi windabûnê ve diçe, Nûbiharê xwestiye balê bikêşîne li ser vê mijarê. Ji ber vê jî rêvebirên kovarê hejmara 118emîn bi dimilkî weşandine. Di kovarê de Süleyman Çevik bi serenava “Na Rey Nûbihar Bi Dimilî Veng Dano!” sedema vê tevgerê eşkere kiriye û ji bo ku balê bikêşîne li ser dimilî wiha gotiye:

“...Şima jî do biwanê ku na hûmara Nûbiharî purkîn bi zaravayê dimilî ya. Heta nika kurdê kurmancî vera dimilî zaf bêeleqe mendê. Dimilî jî jew zaravaya kurdî ya û bi milyon kesî bi na zarava qîsey kenê. Kurmancî şîne ziwananê bînan musenê gereke vêriya verine hewl bidê xo ku ziwane dimilî bimusê û nê ziwane ku tehlukeyê vinîbîyayîşî rê rî bî rî mendo bimuse...”<sup>251</sup>

Ji bilî Süleyman Çevik, di hejmara 118emîn a ku bi dimilkî hatiye amadekirin de Roşan Lezgîn, Wisif Zozanî, Seyîdxan Kurij, A.S. Mîrzanî, Serdar Melekaniy, Mehemed Aykol, Bedriye Topaç, N. Celalî, Ferhad Vindêrij, Ahmet Say, U. F. Çetînkapan, Newzad Valerî, Newzad Dodaniy, Ahmed Kasimoglu, Murad Canşad, Murad Celalî bi dimilkî helbest, gotar, çîrok û h.w.d. nivîsandine.

#### **2.1.5. Bergên Kovarê**

Wek ku tê zanîn kovar bi tenê ji nivîsan pêk nayên. Ji bilî nivîsan wêne, berg û karîkaturên kovaran jî balkêş in. Bergên Nûbiharê yên ewil û dawîn jî gelek caran bi mijar û wêneyên balkêş û watedar ve hatine amadekirin. Bi taybetî di cejnên dînî yên wek eyda remezanê û qurbanê de, di cejna neteweyî ya Newrozê de, di rojên dîrokî yên wek salvegera komkujiya Helebçeyê de hin bergên taybet hatine amadekirin.

<sup>251</sup> Süleyman Çevik, “Na Rey Nûbihar Bi Dimilî Veng Dano!”, *Nûbihar*, j. 118, 2012, r. 4

Ji bilî van dîsa li ser pirsgirêka kurdan de jî hin bergên taybet ên ku peyamên girîng di xwe de di hewînîna hatine amadekirin. Ev berg bi wêne û serenavên girîng ve hatine xemilandin û kovar wisa pêşkeşî xwendevanan hatiye kirin. Wek mînak; Hejmara Yekemîn, Çiriya Pêşîn, 1992, Edalet (Ne zalim be ne mazlum), Hejmara Duyemîn, Çiriya Paşîn, 1992, Zanabûn (Nezanî bindestiye, zanîn rizgariye), Hejmara Sêyemîn, Berçile, 1992, Bibêje “na”, Hejmara Çaremîn, Çileya Paşîn, 1993, Pirsgirêka Kurdan, Hejmara Şeşemîn, Adar, 1993, Cejna Remezanê û Cejna Newrozê, Hejmara Heftemîn, Nîsan 1993, Tevkujiya Helebçeyê, Hejmara Heystemîn, Gulan 1993, Girîngiya Ziman (Dar li ser kokên xwe hêşîn dibin mirov li ser zimanê xwe), Hejmara Nehemîn Hezîran 1993, Yekîtî (Yekîtî Fedakariyê Dixwaze), Hejmara Dehemîn, Tîrmeh 1993, Azadî (Yê ku Azadiyê Nede Dîgeran, Ne Layiqê Azadiyê ye), Hejmara Şêstûyekemîn 1998, Sedsaliya Rojnamegeriya Kurdî. Mijarên ku li ser berga ewil behsa wan hatine kirin di nav rûpelên kovarê de bi awayekî dirêj û bi hûrgilî hatine nivîsandin.

Kovar ji hêla edebiyat û çanda kurdî ve kovareke dewlemend e û ji ber vê dewlemendiyê û piştgiriya xwendevanên xwe ev 25 sal in hê jî weşana xwe didomîne. Li ser malpera Nubiharblogê de kovar der barê xwe de wiha agahiyê dide;

“Nûbihar li Tirkiyê kovara herî temendirêj ya bi Kurdî ye. Nûbihar ji dema ava bûye vir de heta niha bi niyeta ku ji çand û zimanê kurdî re xizmetê bike, li hember qedexeyê û asimilasyonê bi sekneke însanî û Îslamî xebitiye û hê jî dixebite. Nûbiharê di vê xebata xwe ya dûvdirêj de, ji zimanê Kurdî re xizmet kiriye û bûye bingeha çanda îslamî û klasîkên Kurdî...Wekî têtê zanîn kovar wezîfeya mektebê/medresê jî dibînin. Nûbihar jî ji bo gelek kesan bûye mekteb/medrese. Gelek meriv dibêjin ku, em tev di vê dibistana Nûbiharê de bi pêş ketine û em xwendin û nivîsandina Kurdî bi Nûbiharê hîn bûne...”<sup>252</sup>

#### **2.1.6. Çend Reklam û Îlanên Ku Di Nûbiharê De Hatine Weşandin**

Di Nûbiharê de hin caran reklam û îlanên sazî, komele, radyo, malper û kovaran jî hatine weşandin. Di nav kurdan de Pirtûkxaneya Medyayê (Medya Kitapevi) ya li Taksîma Stenbolê bi nav û deng e. Kurdekî ku li Stenbolê dijî û neçûye wir, pirtûk nestandîye an jî bi xwediyê wê Selahattin Bulut re neaxiviye hema

<sup>252</sup> <https://nubiharblog.wordpress.com/nubihar/31.03.2016/20.10>

hema pir kê m e. Di hejmarê 71an de reklama pirtûkxaneyê Medyayê hatiye kirin.<sup>253</sup> Dema pirtûkxaneyê Medyayê cihê xwe diguherîne û bar dîke diçe cihekî nû bi serenava “Pirtûxana Medya di ciyê xwe yê nû de” îlanek tê dayîn û navnîşana wê ya nû tê weşandin.<sup>254</sup>

Ji bo mînakê din jî mirov dikare reklama “Kovara Helwestê” nîşan bide. Ev kovara ku li Swêdê tê derxistin jî di Nûbiharê de tê behskirin û reklama wê tê kirin.<sup>255</sup>

Di hejmarên 73 û 74 ên ku du meh bi hev re hatine weşandin de bang li xwendekarên zanîngehê hatiye kirin ku “Weqfa Lêkolîn û Çanda Kurdî (KURD-KAV)” wê bursê bide xwendekarên zanîngehê. Di banga ku bi serenava “Ji Xwendekarên Zanîngehê” re hatiye weşandin de wiha hatiye gotin:

“Weqfa Lêkolîn û Çanda Kurdî (KÛRD-KAV) di sala 1999-2000an ya amojkariyê de wê burs bide xwendevanên unîversîtê yê nû ku dikarin bi zimanê kurdî bixwînin û binîvîsin. Kesên ku dixwazin vê bursê îstîfade bikin divê heta êvara 15 Tebax 1999an bi daxwaznameyek ku kurtejiyana wan nîşan dide şexsen yan jî bi postê serî li navenda weqfê bidin.

“KÛRT KÛLTÛR VE ARAŞTIRMA VAKFI

Tarkabaşı Bulvarı Çorbacı Sokak No: 13

Tel: (0212) 237 10 61 Fax: (0212) 245 36 40 Taksim-İST.”<sup>256</sup>

Di heman hejmarê de îlaneke pêşbaziya çîrok û helbestan jî balê dikşîne. Navenda Çanda Mezopotamyayê îlanek daye û di naveroka îlanê de dibêje ku pêşbaziya çîrok û helbestan ya sala 1999an wê çêbibe. Di îlanê de navnîşana Navenda Çanda Mezopotamyayê û telefonên navendê hatiye dayîn. Tê gotin ku agahiyên der barê jurî û xelatan wê paşê bînin eşkerekirin.<sup>257</sup>

Di Nûbiharê de îlaneke din a ku balê dikşîne yek jî bi navê “Daxuyani” hatiye weşandin. Di vê îlanê de bang li hemû kurdên li dinyayê hatiye kirin ku him ji ber meha remezanê û him jî ji ber destpêka sala nû ya 2000an Weşanxaneyê kurd a bi

<sup>253</sup> *Nûbihar*, j. 43-44, Nîsan-Gulan 1996, r.16

<sup>254</sup> “Pirtûxana Medya Di Ciyê Xwe Yê Nû De”, *Nûbihar*, j. 75/76, Hezîran/Tîrmeh 1999, r. 6

<sup>255</sup> “Helwest Kovara Kulturî û Lîteraturî”, *Nûbihar*, j. 66-67, Îlon-Çiriya Pêşîn 1998, r. 19

<sup>256</sup> “Ji Xwendekarên Zanîngehê”, *Nûbihar*, j. 73/74, Nîsan/Gulan 1999, r. 28

<sup>257</sup> H.j. r. 31

navê “Pencînar” ya li Swêdê wê pirtûkên cur be cur wek diyarî bi kurdan re belav bike.<sup>258</sup>

Dîsa di Nûbiharê de reklama komeleyeke bi navê “Ziwan-Kom” ya ku di sala 2010an de hatiye avakirin jî hatiye kirin û logoya komeleyê di nav rûpelên kovarê de cihê xwe girtiye.<sup>259</sup>

Radyoyeke herêmî ya bi navê “Radyo Medya” ya ku li Rihayê weşanê dike û frekansa wê 94.8 e jî wek reklam di Nûbiharê de hatiye weşandin.<sup>260</sup>

Hejmara 118emîn a Nûbiharê bi zazakî (dimilkî) hatiye weşandin. Çawa ku di vê hejmarê de hemû nivîs, gotar, helbest serî heta dawiyê zazakî ne, reklam û îlan jî her wisa bi zazakî ne. Yanê di vê hejmarê de reklamên dimilkî balê dikşînin. Wek reklama malpera zazakî.net<sup>261</sup> û reklama weşanxaneya Vateyê.<sup>262</sup>

Di hejmara 96 emîn a Nûbiharê de nasandina malpera “diyarbekirnetê” wiha hatiye kirin; “www.diyarbekir.net

Bir sevda kenti”<sup>263</sup>

Ji bilî van îlan û reklaman, dema hemû hejmarên Nûbiharê wek cild tên komkirin û wisa tên weşandin ku bîna firotan rêvebiran reklama van cildan jî di kovarê de kirine. Hatiye gotin ku bila xwendevanên kovarê van cildan bistînin û daynin arşîva xwe. Mînak di hejmara 70emîn de hatiye gotin ku pênc salên Nûbiharê bûne pênc cild û tên firotan.<sup>264</sup> Dema Nûbihar digihêje sala 2000an yanê hejmara xwe ya 85an dîsa hemû hejmarên kovarê di nav 6 cildan de tên berhevkirin û bi vî awayî tên firotan. Ji bo van 6 cildan jî îlanek hatiye weşandin.<sup>265</sup>

### 2.1.7. Çend Sersaxiyên Ku Di Kovarê De Hatine Weşandin

Kesên ku di nav civaka kurdan de tîna nasîn, ked dane ziman û xebatên kurdî an jî keda wan li ser kovarê hebûne dema wefat kirine, ji bo wan îlanên sersaxiyê di

<sup>258</sup> “Daxuyanî”, *Nûbihar*, j. 79-81, Çiriya Pêşîn- Çileyê Pêşîn 1999, r. 44

<sup>259</sup> “Ziwan- Kom”, *Nûbihar*, j. 118, 2012, r. 2-10

<sup>260</sup> “Radyo Medya”, *Nûbihar*, j. 119, 2012, r. 2

<sup>261</sup> “www.zazakî.net”, *Nûbihar*, j. 118, 2012, r.28

<sup>262</sup> “Kitabanê Kircmankî Yê Weşanxaneyê Vateyî Ra...”, *Nûbihar*, j. 118, 2012, r. 34

<sup>263</sup> www.diyarbekir.net”, *Nûbihar*, j. 96, Havîn 2005, r. 93

<sup>264</sup> “Pênc Salên Nûbiharê Bûne Pênc Cild Ji Me Bixwazin”, *Nûbihar*, j. 70, Çileyê Paşîn 1999, r. 23

<sup>265</sup> “Cildê Şeş Salan Ji Me Bixwazin”, *Nûbihar*, j. 85, Îlon- Çr. Paşîn 2000, r. 26

kovarê de hatine weşandin. Di hejmara 4emîn de kuştina Mela Ubeydullah Dalar û metnê sersaxiya wî wiha hatiye nivîsandin:

“Înna Lîllah We Înna Îleyhî Raciûn

Mela Ubeydullah Dalar Şehîd Kirin

Zaliman li Diyarbekirê Seydayê Hêja Mela Ubeydullah di roja 21.12.1992 de hewşa camiyê de şehîd kirin. Rehmeta Xweda ser şehîdê me û laneta Xweda ser zaliman be. Nûbihar<sup>266</sup>

Dîsa dema Abdullah Varlı wefat dike, der barê wefata wî de jî rêvebirên Nûbiharê di kovarê de metneke sersaxiyê diweşînin û ji wî re rehmê dixwazin.<sup>267</sup>

Serokê Weqfa Zehrayê Îzeddîn Yıldırım dema ku di dawiya sala 1999an de hat revandin û pişt re hat kuştin xebera wî li her derê hat bihîstin. Di Nûbiharê de jî der barê kuştina wî de îlanek wiha hatiye dayîn:

“Înna lîllah We Înna Îleyhî Racî’ûn

Serokê Weqfa Zehra yê ku temama jiyana xwe fedayî Îslam û Qur’anê kiribû, şagirtê Rîsale-î Nûr Seydayê Mela Îzeddîn Yıldırım û şagirtê wî M. Şehit Avcı 28-29/12/1999, di dawiya meha Remezane de hatin revandin, mehekê wenda man û bi awayekî xwînwarane hatin wetilkirin. Xwedê (c.c) rehma xwe li herduyan bike û sebrek cemîl bide malbat û hevalên wan. Nûbihar<sup>268</sup>

Wêneyê herduyan jî di vê îlanê de hatine weşandin. Ji bilî vê di rûpela beriya vê îlanê wesiyyeta İzzettin Yıldırım a bi navê “Wesiyetname Min e” jî di nav rûpelên kovarê de cih digre.<sup>269</sup>

Dema jina M. Emîn Bozaslan (ê ku di nav kurdan de bi nav û deng e) wefat dike, rêvebirên Nûbiharê ji bo wê jî sersaxiyekê diweşînin. Di vê sersaxiyê de jî tê gotin ku Fatma Bozaslana jina nivîskarê kurd M. Emîn Bozaslan wefat kiriye û ji ber wê ew sersaxiyê didin mamosteyê hêja.<sup>270</sup> Li ser vê îlana sersaxiyê helbesteke Fatma Bozaslan a bi navê “Bêzar Bûme Ji Dinê”<sup>271</sup> cih digre. Tiştê balkêş ev e ku Fatma

<sup>266</sup> Nûbihar, j. 4, Çileyê Paşîn 1993, r. 26

<sup>267</sup> Nûbihar, j. 117, 2011, r.2

<sup>268</sup> Nûbihar, j. 82, Çileyê Paşîn 2000, r. 9

<sup>269</sup> “Wesiyetname Min e”, Nûbihar, j. 82, Çileyê Paşîn 2000, r. 8

<sup>270</sup> “Sersaxî”, Nûbihar, j. 84, Gulan-Tebax 2000, r. 4

<sup>271</sup> “Bêzar Bûme ji Dinê”, h.r.

Bozaslan di vê helbesta xwe ya ku 5 sal berê nivîsandiye de silav dide goristanê û dibêje ku ew ji dinyayê bêzar bûye û dixwaze bimre.

Rêvebirên Nûbiharê dîsa ji bo mirina çend navdarên kurd ên ku ji hêla civaka kurd ve tîn hezkirin û qîmeta wan zêde ye xemgîniyên xwe anîne ziman û ji bo wan îlanên sersaxiyê weşandine. Dema Feqî Huseyîn Sağniç wefat dike rêvebirên kovarê ji bo Sağniç di hejmara 88an de îlaneke sersaxiyê weşandine û sersaxî dane malbat û hezkiriyên wî.<sup>272</sup> Dîsa ji bo Ordîxanê Celîl û Mehmed Uzun jî sersaxî hatiye dayîn.<sup>273</sup>

Ji bilî kesên ku di nav kurdan de navdar in, ji bo hin kesên din ên ku ji hêla der û dora Nûbiharê de tîn nasîn de jî îlanên sersaxiyê hatine weşandin. Wek mînak;

“Înaalillahî we înaileyhîracîûn

Berpirsyarê kovara me yê Agirî

Îsa ÖZASLANER

22 Adara 2005an çû ser rehmeta Xwedê.

Xwedê bi rehmeta xwe şa bike.

Em ji malbata birayê xwe re hêciya sebrê dikin.

Nûbihar<sup>274</sup>

Dema eqreba û malbatên nivîskarên Nûbiharê jê hinek mirine, rêvebirên Nûbiharê bi dilsozî ji bo wan metnên sersaxiyê weşandine û sersaxî dane nivîskarên xwe. Mînak dema Ayşe Karaya diya Sabah Kara yê ku rêvebirê berê yê Nûbiharê ye wefat dike<sup>275</sup>, dema Rabîa Xanima diya Xalid Sadinî yê ku ji yek nivîskarê Nûbiharê yê û dema Suryal Xanima diya nivîskar Şemoyê Memo ye wefat dikin, rêvebirên kovarê ji bo wan metneke sersaxiyê di nav rûpelên kovarê de weşandine.<sup>276</sup>

Di sala 2011an de dema li Wanê erdhej çêdibe, hin kes dimrin, birîndar dibin û malên wan hildiweşin jî rêvebirên Nûbiharê di hejmara 116emîn a kovarê de îlanek weşandine û wiha gotine;

<sup>272</sup> “Serxweşî”, *Nûbihar*, j. 88, Bihar 2003, r. 59

<sup>273</sup> *Nûbihar*, j. 103, Payîz 2007, r. 60

<sup>274</sup> *Nûbihar*, j. 95, Bihar 2005, r. 85

<sup>275</sup> *Nûbihar*, j. 100, Zivistan 2006, r. 36

<sup>276</sup> Sersaxî, *Nûbihar*, j. 132, Havîn 2015, r. 95

“Înna lillâh we îinna îleyhî racûn

Di roja 23yê Çiriya Pêşîn de ERDÎŞ, di 9ê Çiriya Paşîn de jî bajarê Wanê rastî felaketea erdhejê hat.

Di vê erdhejê de gelek kes mirin û gelek kes jî birîndar bûn.

Xelk di vê serma û zivistanê de di çadîran de ye.

Em ji yê mirî re ji Xweda rehmetê, ji xizm û malbatên wan û ji hemû gelê WANÊ re sebr û matanetê dixwazin.

Nûbihar<sup>277</sup>

Gelek metnên sersaxiyê yê wek van dikarin ji Nûbiharê bîn nîşandan.

#### **2.1.8. Nameyên Xwendevanan ên Nûbiharê**

Ji bo kovarekê tişteke girîng ew e ku muxatabên wê kovarê erênî an jî neyînî jê re fikr û ramanên xwe, daxwaz û hêviyên xwe bibêjin û nameyan bişînin (feed back). Ev dibe sedem ku rêvebirên wê weşanê bizanibin karê ku dikin ji hêla xwendevanan ve çawa tê dîtin. Ji bo kovara Nûbiharê jî feed back çêbûne, lewra xwendevanên kovarê ji Nûbiharê re peyam û name şandine. Rêvebirên kovarê ji van peyam, name û daxwazan jê hinekan di kovarê de, di bin serenava “Nameyên We” weşandine. Xwendevanên kovarê car caran ji kovarê re name şandine û di van nameyan de pesnê kovarê dane, weşana Nûbiharê û keda rêvebiran pîroz kirine. Hinekan rasterast anîne ziman ku kovar ji bo wan bûye dibistanek û kurdî hînî wan dike. Hinekan jî der barê nivîs û weşanê de hêvî û daxwazên xwe anîne zimên.

Mînak xwendevanekî kovarê yê bi navê Muhammed Azadîxwaz di nivîseke bi navê “Nûbihar weke mamoste û seydakî, dîn û ziman û gelê me li ber çavê me şêrîn dike.” de hest û nerîna xwe ya li ser kovara Nûbiharê tîne ziman.<sup>278</sup> Di hejmarê 5emîn de xwendevanekî kovarê yê bi navê Mahmut Çelîktepe jî nameyek ji Nûbiharê re şandiye û ev name bi serenava “Wê roj, bi ser me de derkeve!” hatiye weşandin.<sup>279</sup> Dîsa di heman hejmarê de xwendevanekî Nûbiharê yê bi navê Sedat Mîrseydan jî di peyama xwe ya ku ji kovarê re şandiye de gotiye ku “Bi rastî, kovara Nûbihar

<sup>277</sup> *Nûbihar*, j.116, 2011, r. 4

<sup>278</sup> Muhammed Azadîxwaz, “Nûbihar Weke Mamoste û Seydakî, Dîn û Ziman û Gelê Me Li Ber Çavê Me Şêrîn Dike” *Nûbihar*, j. 6, Adar 1993, r. 13

<sup>279</sup> Mahmut Çelîktepe, “Wê Roj, Bi Ser Me De Derkeve!”, *Nûbihar*, j. 5, Sibat 1993, r. 8

kêmasiyek mezin tijî kir”. Mîrseydin di nivîsa xwe de spasiya xebatkarên kovarê dike û dibêje ku ew zaza ye û daxwaz dike ku çend rûpelên kovarê bi dimilkî bên amadekirin.<sup>280</sup>

Di hejmara 7emîn de jî çend nameyên xwendevanan hatine weşandin. Ji van yek a ku zêdetir li ser pîrsgirêka kurd disekine û dibêje ku pîrsgirêka kurdan ne bi tenê meseleya kurdên sosyalîst û demokrat e, meseleya hemû kurdan e balê dikşîne.<sup>281</sup>

Nûbihar di sala 2006an de gihîştîye sala xwe ya 14emîn û hejmara 100emîn. Ji ber vê kovarê hejmara xwe ya 100emîn wek hejmareke taybet amade kiriye. Di vê hejmara taybet de gelek rewşenbîr, zana, nivîskar û rûspiyên kurdan hest û fikrên xwe yên li ser Nûbiharê gotine û nivîsandine. Di vê hejmarê de nameyek balê dikşîne ku ew jî nameya nivîskarê kurd Mehmet Uzun e. Mehmet Uzun bi destnîvîsa xwe nameyek ji Nûbiharê re şandiye û xebatên kovarê û rêvebirên Nûbiharê pîroz dike. Rêvebirên kovarê jî ev nameya bi serenava “Nameya Mehmet Uzun Ji Nûbiharê Re” di nav rûpelên kovarê de weşandine.<sup>282</sup> Li ser nameyê jî wêneyekî Mehmet Uzun tê dîtin.

### **2.1.9. Xebatên Kovarê Yên Kurdî**

Di kovarê de salên ewil di rûpêla dawîn de bi serenava “Rêzimana Kurdî” û “Ferhengok” du beşên taybet hatine amadekirin. Di van beşan de bi mînakan ve behsa rêzimana kurdî hatiye kirin û bi alfabetîk peyvên kurdî wek ferheng hatine weşandin. Ev jî nîşan dide ku kovar ne bi tenê ji bo ku nivîsan biweşîne hatiye amadekirin, armanca rêvebirên kovarê pêşveçûna zimanê kurdî ye jî. Rêvebiran ev ji xwe re kirine derd û kul û xwestine ku ev zimanê bi salane qedexe ye ji hêla kurdan ve ne bi tenê ji bo axaftinê, bila ji bo nivîsandinê jî bê bikaranîn.

Dema saleke weşana Nûbiharê tamam dibe, kovar ji bo salvegera yekemîn a kovarê pêşbaziyeke ku mijara wê “Bikaranîna zimanê kurdî di weşanan û hemû

---

<sup>280</sup> Sedat Mîrseydan, “Bi Rastî, Kovara Nûbihar Kêmasiyek Mezin Tijî Kir”, *Nûbihar*, j. 5, Sibat 1993, r. 10

<sup>281</sup> M. Emîn Ozdemir “Doza Kurdan Ne Tenê Doza Sosyalîsta Ye û Ne Tenê Ya Demokrata Ye”, *Nûbihar*, j. 7, Nîsan 1993, r. 29

<sup>282</sup> Mehmet Uzun, “Nameya Mehmet Uzun Ji Nûbiharê re”, *Nûbihar*, j. 100, Zivistan 2006, r. 39



aliyên jiyane de çî tesîrê li ser kurdan dike?" li dar xistiye. Ev agahî di hejmara 9emîn a kovare de hatiye îlankirin.<sup>283</sup> Paşê di hejmarên din ên kovare de encama vê pêşbaziye û xelata ku hatiye dayîn tê eşkerekirin. Kovare hewl daye ku di navbera xwendekar û kovare de her tim pireyek çêbibe û têkiliyên xurt ava bibin.

Dîsa di hejmara 99emîn de ji ber ku kovar digihêje hejmara xwe ya 100emîn bi serenava "Pêşbaziya Hejmara 100" pêşbaziyeke hatiye li darxistin. Pêşbazî ji bo beşa çîrok û helbestê hatiye li dar xistin. Xelatên pêşbaziye yê ji bo herdu beşan wiha hatine eşkerekirin

"Xelat:

Yekemîn: Plaket û 10 Cildên Nûbihar û pirtûkên wê

Duyemîn: Plaket û 10 Cildên Nûbihar

Sêyemîn: Plaket û 10 Cildên Nûbihar"<sup>284</sup>

Encama vê pêşbaziye di hejmara 102emîn de bi serenava "Encama Pêşbaziya Nûbiharê Kifş Bû" hatiye îlankirin. Di vê nivîsê de hatiye gotin ku 35 çîrok û 71 helbest gihîştîye destê jûriyê û kesên ku di qada çîrok û helbestê de serkeftîne ji hêla jûriyê ve hatine hilibijartin. Navê kesên ku qezenc kirine jî yek bi yek hatine îlankirin.<sup>285</sup> Ji bilî vê sê helbest û sê çîrokên ku serkeftî bûne jî di heman hejmarê de hatine weşandin.

Xebateke balkêş a Nûbiharê ya piştî salekî jî ew e ku Nûbiharê li ser pirsgerêka kurdan sempozyumek li dar xistiye. Di 16ê gulana 1993an de li bajarê Stenbolê di navbera saet 10.00 û 20.00an de bi navê "Pirsa Kurdî Çawa Çareser Dibe?- Kûrt Sorunu Nasıl Çözülür?" sempozyumek hatiye lidarxistin. Di Sempozyumê de Tarık Ziya Ekinci, Altan Tan, Hikmet Özdemir, Sabah Kara, Hüsnü Okçuoğlu, Mehmet Metiner, Yılmaz Çamlıbel, Feqî Huseyn Sağınç, Ali Bulaç, Osman Tunç, Atasoy Müftüoğlu, Nilüfer Göle, Felat Dilgeş, İsmail Göldaş, Ercan Kanar û hin rewşenbîrên din axivîne û fikrên xwe anîne zimên.

<sup>283</sup> "Pêşbazî", *Nûbihar*, j. 9, Hezîran 1993, r. 8

<sup>284</sup> "Pêşbaziya Hejmara 100" *Nûbihar*, j. 99, Havîn 2006, r. 21

<sup>285</sup> "Encama Pêşbaziya Nûbiharê Kifş Bû", *Nûbihar*, j.102, Havîn 2007, r. 8

Felat Dilgeş di hejmara 9emîn a Nûbiharê de dût û dirêj behsa vê sempozîyûmê dike.<sup>286</sup> Ev sempozîyuma ku ji hêla kovarê ve hatiye li darxistin jî dîsa nîşan dide ku kovar ji kovarek rêzê nîne. Yanî rêvebiran negotîne “em kovarê biweşînin û bifroşin ev besî me ye”, wan hewl dane ku xebatên din jî ji bo kurdan bîn kirin.

Bi kurtasî ji van hemû agahiyan tê dîtin ku kovara Nûbiharê him di çapemeniya kurdî de û him jî di çanda kurdî de xwedî cihekî girîng e. Çawa ku îro li ser vê kovarê lêkolîn tê kirin, wê di pêşerojê de zêdetir xebat bîn kirin û ew ê di arşîva kurdan de cihê xwe bigre.

### 2.1.10. Armanca Kovarê

Wek ku hat behs kirin kovarê di sala 1992an de bi zimanê kurdî dest bi weşana xwe kiriye. Dema Nûbiharê dest bi weşanê kiriye, him ji hêla wêne û şîkl ve û him jî ji hêla naverokê ve bala kurdan kişandiye. Li ser berga ewil a kovarê li ser zemîneke rengê zer, bi rengê spî “Ne zalim be, ne mazlûm” hatiye nivîsandin. Ev hevoka ku wek dirûşmeyê ye, kêm an jî zêde armanca kovarê dide der. Rêvebiran bi vê kovarê ve xwestine ku li hember zaliman bisekinin, kurd dest bidin hev û kirasê mezlumtiyê li ser xwe biavêjin.

Kovarê di destpêkê de xwestiye ku bala xwendevanan bikişîne û ew meraq bikin ka ev kovar çima tê weşandin. Ji bo vê bi serevana “Di Payîz de Nûbihar!” nivîseke pêşgotinê hatiye nivîsandin û di nivîsê de wiha hatiye gotin:

“Bihar ne mihtacî biharê ye. Xeberê biharê ji payîz û zivistan bipirs!.. Mirovê têt, xwarin naxwaze. Were guh bide dengê birçiyar!... Ma payîz û nûbihar?!... Adet e wextê ku kovarek dertê, karbidestên wê, pîrsekê dikin meşhûr e: “Ev kovar çima dertê?” Lêbelê di heqîqetê de bersiva vê pîrsê bi derhatina kovarê hatiye dan. Lewra derhatina kovarê bi xwe, bersiva vê pîrsê ye. Kovar bi xwe dibêje ku çima dertê. Erê bîr û bawerîya me ev e. Lêbelê tê ber çavên me ku tu ey xwendewarê delal, tu hê jî li benda bersiva wê pîrsê yî. Tu dixwazî bibînî bê emê çi bêjin? Emê dijminîya kî bikin? Emê terefterîya kî bikin? Emê bikin lingê kî bişemite? Emê kîyê ketî rakin li ser lîngan?”<sup>287</sup>

<sup>286</sup> Felat Dilgeş, “Sempozîyoma Nûbihar: “Pîrsa Kurdî Çawa Çareser Dibe”, *Nûbihar*, j. 9, Hezîran 1993, r. 16-18

<sup>287</sup> “Di Payîz De Nûbihar!”, *Nûbihar*, j. 1, İstanbul, Çiriya Pêşin 1992, r. 3

Di heman nivîsê de piştî van pirsan û bal kişandinê kovarê xwestiye bibêje ku ew dixwazin bibin dostê mezlûman û bibin dijminê zaliman. Nûbiharê armanca weşana xwe jî wiha eşkere kiriye:

“...Nexwe malûme ku emê heq û heqîqetê bêjin. Hema emê dijminiyia kî bikin? Dijminê me zalim e û bes! Zalimê ku bi destê xwe ve zilmê dike...Zalimê ku bi zimanê xwe ve zilmê dike...Zalimê ku li ber zilmê dibe îblîsê lal û dibêje “Mara ku bi min venede, bila hezar sal sax be!” Erê, ko brayê me jî be, em dijminê zalim in, zalim dijminê me ye.”<sup>288</sup>

Dîsa di heman nivîsê de berpirsyarên kovarê bi hesteke neteweyî bangî xwendevanên kurd dikin. Ji ber ku kurdên di nav çar welatan de perçe bûne ji bilî perçebûna sînoran, ji hêla nêrîna siyasî ve jî perçe bûne. Nûbihar wan dawetê mihebetê, evîndariyê û dest hevdudayînê dike. Di nivîsa ku behs hat kirin de rêvebirên kovarê armanca kovarê wiha tînin ziman:

“Roj ev roj e, dem ev dem e. ‘Heq hat û batil li ber çûnê ye.’ Em hewe dawetî azadiyê dikin. Em hewe dawetî zanatiyê dikin. Em hewe dawetî heq û heqîqetê dikin. Em hewe dawetî mihebet û evîndariyê dikin. Ma ne eyb û fehêt e ku em dijminiyia ketî û mezlûm û belengaz û musted‘efan bikin?! Ma ne şerm û fehêt e ku destê heq bihêlin û destê neheq bigirin?! Wext ew wext e ku em guh bidin hevûdu. Wext ew wext e ku em dest bidin hevûdu. Wext ew wext e ku em ên belengaz û mazlûmên heqdar bibin yek û di miqabilê zilm û zorê de bisekinin. Wext ew wext e ku em bizanin û bi zanatiyê qebûl bikin ya red!”<sup>289</sup>

Di kovageriya kurdî de gelek kovarên kurdan bi nêrîneke çepgir û li ser îdeolojiya sosyalîst hatine weşandin. Nûbihar bi nêrîna xwe ya îslamî û ji dûrî çepgiriye ve di nav kovageriya kurdî de cihê xwe digre. Ji vê aliyê ve jî balê dikşîne. Lê her çiqas rêvebirên kovarê kesên dîndar û mihefezakar bin jî, kurdên ku xwedî fikrên cuda ne jî di kovarê de nivîsandine. Rewşenbîr û pisporên zimanê kurdî bi salan kovarê wek baneke hevpar a kurdî dîtine û di Nûbiharê de kom bûne.

Gelo kovar gihîştîye armanca xwe ya weşanê an na? Bersiva vê pirsê xwendevanên kovarê dane. Lewra di nav kovarên kurdî de li Tirkîyeyê kovara kurdî

---

<sup>288</sup> H.g, r. 4  
<sup>289</sup> H.r.

ya herî temendirêj kovara Nûbiharê ye. Ji sala 1992an vir ve ew weşana xwe didomîne û di nav 25 salan de heta niha 135î zêdetir hejmar hatine weşandin.

Li ser berga ewil a kovarê “Ne zalim be, ne mazlûm” hatiye nivîsandin. Ji bilî vê nivîsê li ser bergê bi navê Hebîb Sadiqî weneyek hatiye xêzkirin. Di wêneyê de mêrikekî ku cilekî reş li xwe kiriye û yekî din ê ku cilekî spî li xwe kiriye balê dikşînin. Yê ku cilê reş li ser e diyare ku yê din kuştiye, lewra kevirek di destê wî de ew li ser piyan sekinî ye. Mêrikê cilspî jî li erdê dirêjkiriye û li der û dora wan agir, yekî ku şeytan simbolîze dike û teyrek heye. Teyra reş hewl dide, erdê dikole ku mêrikê cil spî wê ji xwe re bike mînak û ew jî erdê bikole ku kesê kuştî di bin axê de veşêre. Ev wêne sembola meseleya Habil û Qabil e ku di Qur’anê de jî derbas dibe.<sup>290</sup> Ev wêneyê li ser berga kovarê û nivîsa “Ne zalim be, ne mazlûm” sembola başî û xirabiyê, dijminatî û dostiyê, zalimtî û mezlûmtiyê bi kurtasî mirovan û jiyane ye.

Dîsa li ser berga ewil wêneya kupên ku xezîne û zêr tê de ne, avahiyên bilind, tank, tiving û şûran hatiye xêzkirin ku ev jî dîsa sembola kapîtalîzmê û şerê ji bo malê dinyayê ye. Wêneyê sêyem ê di binî de jî ji komek mirovan, çêlekeke zer, stêrka şeş goşe, zengilek û h.w.d. pêk tê. Ev wêne jî dîsa mijareke ku di Qur’anê de derbas dibeû behsa gelê Îsraîlê cihûyan û îmtihana wan a serjêkirina çêlekê simbolîze dike.<sup>291</sup>

Berga dawîn a kovarê jî rengîn e û li wir jî ‘Weşanên Nû Yên Nûbiharê’ hatine nîvisandin û danasîna 6 rîsaleyan hatiye kirin. Ji bilî vê navnîşana Nûbiharê û telefona kovarê jî li ser berga dawîn hatiye nivîsandin.

Her çiqas berga kovarê ya ewil, nivîsa ku armanca kovarê eşkere dike, gelek helbest, çîrok û nivîsên siyasî bin jî, armanca kovarê li ser kelepura kurdî, li ser çand, edebiyat û hunera kurdî ye. Vê kovara ku bala kurdan kişandiye, di nav demê de ji bilî kovangeriyê xebatên din jî kiriye. Di qada weşangeriyê, komelgeriyê û xebatên kurdî de kedeke mezin daye û hê jî xebatên xwe didomîne.

---

<sup>290</sup> Qur’an, Sûreya Maîdeyê, Ayet 27-32

<sup>291</sup> Qur’an, Sûreya Beqereyê, Ayet 67-73

### 2.1.11. Rêvebir û Nivîskarên Kovarê

Wek ku tê zanîn kovar bi tenê kesek an jî bi du kesan ve nayên rêvebirin, ev karê tîmekî ye û gelek ked tê dayîn ku kovarek bigihêje destê xwendevanan. Navê du û sê kesan her çiqas derkeve li pêş jî, her tim li pişt perdeyê lehengên veşartî henin. Kovara Nûbiharê jî bi berpirsyariya Sabah Kara ve dest bi weşanê kiriye. Di hejmara ewil a kovarê de navê Mahmut Yarlug wek xwediyê kovarê, navê Süleyman Çevik Berpirsyarê Giştî, navê M. Arifoğlu jî wek Midûrê Dezgehê hatiye eşkerekirin.

Piştî hejmara 71an Sabah Kara dev ji berpirsyariya giştî ya kovarê berdaye. Kara di hejmara 72an de bi serenava “Xatirê We” nivîsekê dinîvîse û xatir ji xwendevanan dixwaze û di wê nivîsê de eşkere dike ku wî êdî dev ji berpirsyariya giştî ya kovarê berdaye. Kara wiha dibêje:

“...Heta niha min çî kiriye elbetê dê dîrok vê yekê binirxîne. Ez hêvî dikim kesên ku ji ked û zanîna min îstîfade kirine, dê destê xwe deynin ser wîcdanê xwe û heqê min teslîm bikin. Lê eger vê yekê nekin jî ne xem e. Min bi tenê berpirsyartiya xwe ya li ber dîrokê pêk aniye û eger kar û xebata min “çira kora” be jî, ji min re ne xem e. Kesên ku di hundirê kar de bûn baş dizanin ku me vê xebatê ji ku gihandiyê kû. Wek dawî, ez di serî de ji Silêmanê bira û ji hemû hevalên ku di vê xebata giranbiha de keda wan hebûye re spas dikim. Bêyî wan min nedikarî xebatê bidomînim. Bi xatirê we.”<sup>292</sup>

Dema Sabah Kara dest ji vî karî dişo û êdî wek rêvebir naxebite, Süleyman Çevik wezîfeya berpirsyariyê hildide li ser milê xwe. Ya rast piştî hejmara 36an Sabah Kara diçe Ewropayê û ji dûr ve rêvebirina kovarê zehmet dibe. Her çiqas navê wî heta hejmara 71an li ser kovarê wek rêvebir bê nivîsandin jî, Çevik hemû berpirsyariyê hildide li ser milê xwe û wek berpirsyarê kovarê dixebite. Ji bilî wî kadroyeke ji Ali Karadeniz, Mustafa Goyanî, Selman Dilovan, Mahmut Yarlug û M. Arifoğlu pêk tê her tim kar û barê Nûbiharê dikin û kedeke wan a mezin jî digihêje kovarê.

Dema hejmara 100emîn a Nûbiharê hatiye weşandin, Süleyman Çevik di vê hejmarê de bi serenava “Umrek Me Bi Nûbiharê Re Derbas Kir” nivîsek nivîsandiye. Çevik di nivîsê de behsa destpêka weşana Nûbiharê û yên ku keda wan di Nûbiharê

<sup>292</sup> Sabah Kara, “Bi Xatirê We”, *Nûbihar*, j. 72, Adar 1999, r. 3

de heye (Sabah Kara, Ali Karadeniz, Ayhan Geverî, Selman Dilovan) kiriye. Çevik wiha dibêje:

“Li Fatîhê di wî cihê piçûk de em du-sê kes bûn. Du odeyên me yên piçûk cihê xebata me, cihê pêşwazîkirina mêvanên me û cihê çêkirina feravîn û çaya me bû jî...Ev cih herdu ode pevre encax 30 m2 hebûn. Me li wî cihî di sala 1992yan de dest bi Nûbiharê kir û li wê derê şeş hejmar derxistin. Pêşiyê qomputereke me jî tunebû. Hejmara yekê û ya duduyan me li cem hinek hevalên din yên ku weşangeriyê dikin amade kirin. Paşê me qomputerê jî xwe re kirî...Ew qomputera ku me jî xwe re kiribû hê jî heye, lê edî naşixule... Ez wan egîtên ku bi salane dest û mil dane me û ev xebata pîroz gihandine roja îro tebrîk dikim û bi dil û can jî tevan re silavan dişînim. Ew heval û hogirên ku jî wê rojê heta îro destê xwe kirine bin kevir û zahmetî kişandine û ev meşa gavek din pêş de birine bêguman merivên mezin in! Lewra ewan mîna însanên pîyase jîyaneke rehet û sade nehilbijartin.”<sup>293</sup>

Ji bilî rêvebirên kovarê gelek kesan helbest, çîrok, hevpeyvîn, fabl, mamik, biyografî, çarîn, hevpeyvîn û gelek nivîsên cur be cur di Nûbiharê de nivîsandine. Mirov dikare jî wê lîsteya dûr û dirêj navê hin kesan ên ku zêdetir nivîsên wan di kovarê de hatine weşandin binivîse. Wek; Ali Karadeniz, Abdullah Kıran, Abdullah Varlı, Abdurrahman Adak, Ahmet Aras, Ahmet Gemî, Aqil Muhacir, Ayhan Geverî, Bavê Xecê, Berken Bereh, Bro Omerî, Cankurd, Celîlê Celîl, Cemil Telli, Dilşad Mûtî, Firat Cewerî, Gernas, Gulcan Şirnexî, Hayrullah Acar, Hatîce Mollakendî, Gulîstan Çoban, Hasan Sıdıq Gorîcan, Hesên Polat, Huseyin Çevik, Huseyn Şemrexî, Hozan Oflaz, Jiyan Ehmed, Koyo Berz, Konê Reş, Lokman Polat, Melek Amed, Mehmet Öncü, Mihrîcan Doğan, Mihemed Elî Ewnî, M. Emin Bozarşan, M. Zahir Ertekin, Müfid Yüksel, Murad Celalî, Murad Pola, Nevzat Eminoğlu, Omer Faruk Çetinkaplan, Osman İzol, Osman Tunç, Perwîz Cîhanî, Raîfê Bêçare, Recep Dildar, Recep Yiğitbay, Rehmetullah Karakaya, Rojbîn Özkan, Rojen Barnas, Rohat Alakom, Roşan Lezgîn, Sabah Kara, Salih Kevirbirî, Selman Dilovan, Selîm Temo, Seyda Ronahî, Sıdıq Gorîcan, Süleyman Çevik, Şaban Şenates, Xalid Sadinî, Yılmaz Yalçın, Zahit Ozkan, Zeyneb Amed, Zeynel Abidîn Zinar, Zilkîf Xweşhêvî.

<sup>293</sup> Suleyman Çevik, “Umrek Me Bi Nûbiharê Re Derbas Kir”, *Nûbihar*, j. 100, Zivistan 2006, r. 7-9

Di nav van kesan de hinekan ji xwe re navên mustar hîlbijartine û him bi navên xwe yên rastîn û him jî bi yên mustear ve nivîs nivîsandine. Mînak Sabah Kara, Ali Karadeniz, Xalid Sadini, Murad Celalî û h.w.d.. Bi navê mustear ve nivîsandin di nav kurdan de zêde ye û normal tê dîtîn. Ji kovara Hawarê bigre, heta Nûbiharê û gelek kovar û rojnameyên din de jî ev heye. Heta wisa ku niha di medyaya civakî de jî hin kurd navê xwe yên rastîn bi kar naynîn bi navên mustear dinîvîsin.

Di nav nivîskarên kovarê de tiştê ku zêde balê dikêşîne ew e ku hejmara nivîskarên jin pir kêm e. Heta wisa ku çend salên ewil bi tenê yek û du jinan di Nûbiharê de nivîsandine. Paşê pê de pê de hejmara wan hinekî zêde bûye, lê dîsa jî mirov dikare bibêje ku nivîskarên jin bi têra xwe di kovarê de cih nagrin. Ya duduyan jî her çiqas kesên ku di qada kurdî de xwedî nav û deng in û temenê wan mezin in (Zeynel Abidin Zinar, Mehmet Emîn Bozaslan, Naci Kutlay û h.w. di kovarê de nivîsandibin jî, gelek ciwanên kurd ên ku nû dest bi xebatên kurdî kirine jî di Nûbiharê de nivîsandine. Mînak Ayhan Gevêrî, Murad Celalî, Rojbîn Özkan û h.w.d.. Ev kes wê demê ciwan in, lê dîsa jî di kovarê de nivîsandine.

Ev jî bûye sedem ku ev ciwan di qada kurdî de xwe bigîhînin û di pêşerojê de xebatên baş ji bo zimanê kurdî bikin. Yanê kovarê deriyên xwe ji hemû kurdan re vekirîye, wek dibistanekê xebîtiye û bûye ekolek. Kesên ku di Nûbiharê de nivîsandine di nav demê de xebatên akademîk, lêkolînên ji hev girîngtîr kirine, pirtûk nivîsandine, di çand, huner, folklor û dîroka kurdî de bûne xwedî kedên mezin.

Ji ber ku mijara teza me di Nûbiharê de beşa Zaroknameyê ye divê behsa kesên ku beşa zarokan amade kirine bê kirin. Di beşa Zaroknameyê de navê herî zêde balê dikêşîne Xelîl Amed(î), Sabah Kara û Rojbîn Özkan in. Lewra ev beş ji hêla van kesan ve hatiye amadekirin. Ji ber ku wan zêdetir ked daye divê hinekî behsa kurtejiyana van kesan bê kirin.

#### **2.1.11.1. Kurtejiyana Nivîskarên Ku Beşa Zarokan Amade Kirine**

##### **2.1.11.1.1. Rojbîn Özkan**

Li Rindalyaya gundê Gimgima navçeya Mûşê hatiye dinyayê. Ji sala 2005an pê ve dest bi karê nivîsandinê kiriye. Nivîsên wê heta niha di kovarên wek Nûbihar,

Nûpelda, Pêngav, Peyam, Hefreng, Keskesor û gelek malperan de hatine weşandin. Her wiha ji bo Kovara Nûbiharê amadekariya dosyeya edebiyata zarokan û ya jina kurd kiriye. Pirtûka wê ya bi navê “Zarokên Heskifê” ji hêla weşanxaneyê Nûbiharê ve di sala 2012an de hatiye çapkirin. Ji bilî vê pirtûka wê ya bi navê “Stêrkên Bihîştê” ya ku behsa jiyana Hz. Asiye, Hz. Hacer, Hz. Meryem, Hz. Xetîce, Hz. Fatîme û Hz. Eyşeyê dike jî dîsa ji hêla weşanxaneyê Nûbiharê ve di sala 2014an de hatiye weşandin. Özkanê di kovarê de beşa zarokan “Nûbihara Biçûkan” ji hejmaran 108an heta hejmar 112an amade kiriye.

#### **2.1.11.1.2. Sabah Kara**

Sabah Kara di sala 1960an de li Nisêbîna navçeya Mêrdînê hatiye dinyayê. Dibistana seretayî li Nisêbînê, ya navîn jî li Diyarbekir û Samsunê temam kiriye. Perwerdeya xwe ya Fakulteya Îlahiyatê ya Zanîngeha Enqereyê û Fakulteya Perwerdeyê ya Zanîngeha ODTUyê nivîco hîştîye. Fakulteya Zanîstên Îdarî û İktisadî ya Zanîngeha Gaziyê qedandiye. Yek ji berpirsyarên Kovara Nûbiharê xebat kiriye. Gelek nivîs, werger û helbestên wî di Nûbiharê de hatine weşandin. Ji bilî pirtûkên ku nivîsandine ji zimanê farisî jî çend pirtûk wergerandine tirkî û kurdî. Li Almanyayê dijî.

Berhemên wî; Kara Şiirler (Helbestên Reş), Doğu Ağıtları (Mersiyeyên Rojhilat), Nameyên Bêcewab (Karşılıksız Mektuplar), Çarîn Ji Çem Bi Derya, Nima Yusic'ten Devrim'e Çağdaş İran Şiiri Antolojisi (Antolojiya Helbestên Îranê yê Hemdem).

Wergerên wî: Ji Abdulkerîm Suruş Kimler Savaşım Verebilir (Kî Dikare Têkoşînê Bike), Aydınlık ve Dindarlık (Ronahî û Dîndarî), Dini Düşüncenin Yeniden Kurulması Ve Dr. Ali Şeriatî (Car Din Avakirina Fikra Dînî û Dr Elî Şerîatî), ji Dr. Beheştî Kur'anı Anlama Metodu (Metoda Fêmkirina Qur'anê), ji BabaTahirê Uryan Dubeytî, ji Elî Şerîatî jî Ayet Yorumları (Şîroveyên Ayetan), ji Omer Xeyyam jî Klasîkên Şerqê Rubaiyat Omer Xeyyam.

Sabah Kara di hejmar 2, 3, 4, 6, 7, 78, 79-80-81 (sê hejmar bi hev re hatine weşandin), 82an de ji bo zarokan hin tişt nivîsandiye. Piştî van nivîsan navê Sabah Kara di beşa zaroknameyê de derbas nabe.



### **2.1.11.1.3. Xelîl Amed (î)**

Xelîl Amed (î) di sala 1974an de li Erxaniya navçeya Diyarbekirê hatiye dinyayê. Dibistana seretayî li Erxaniyê, ya navîn û lîseyê jî li Diyarbekirê qedandiye. Li Zanîngeha Firatê Fakulteya Perwerde û Teknîkê beşa Sewîrandina Avahîdanîne mezun bûye. Di navbera salên 2000 û 2015an de li Rihayê û Stenbolê mamostetî kiriye. Ji sala 2015an vir ve di TRTê de dixebite. Zewiciye û bavê 4 zarokan e.

Xelîl Amed di kovara Nûbiharê de beşa Zaroknameyê amade kiriye. Ji bilî nivîsên wî di kovarê de xêz û karîkaturên wî jî hatine weşandin. Di kovarê de du zarokên leheng ên bi navê “Rengîn û Xemgîn” jî amade kiriye. Ev leheng wek Hecîvat û Karagozê tirkan her tim tînan li hemberî hev û diaxivin. Bi axaftina van herdu lehengan ve peyamên girîng ji zarokan re hatiye dayîn.

Xêncî van kesên ku beş amade kirine kesên wek Mehmêd Alî Sadîk, Murat Malpir, Zelal Hawar, Besra Pîranî, Melayê Xursî, Nûbar Asan, Azad, Ebdillahi Amed, Selman Dilovan jî bi fabl, çîrok, mamik, tiştanok û h.w.d. ve rûpelên kovarê xemilandine ne û beşa zarokan dewlemend kirine.

### **2.1.12. Girîngiya Ziman û Zimanê Zikmakî Di Kovarê De**

Ziman ew tişte ku dinyayê bi mirovan dide nasîn û di navbera dinyayê û mirovan de pireyekê ava dike. Ziman mifteya jiyanê ye û dayika hemû zanînan, pîşeyan û huneran e. Civak, netewe û dewletan li ser piyan digre û nahêle ku koka wan biqele. Nexwe ziman tiştêkî evqas girîng e û ji ber ku kovara Nûbiharê jî bi zimanekî ku bi sedsalan zêdetir hatiye qedexekirin ve hatiye weşandin, divê mirov behsa girîngiya zimanê zikmakî û tesîra wê ya li ser mirovan bike. Li şûna ku em rasterast dût û dirêj behsa girîngiya ziman bikin, emê rasterast ji nivîskarên kovarê hin nivîsên ji hev cudatir wek mînak nîşan bidin.

Ev nivîsên kovarê yê ku me niha mînak nîşan dan êşkere dikin ku zimanê zikmakî pir girîng e û divê kurd xwedî li zimanê xwe derkevin û bi zarokên xwe re kurdî biaxivin. Di kovarê de gelek çar behsa girîngiya ziman hatiye kirin. Di hejmarê 8emîn de berpirsîyarê nivîsan Süleyman Çevik di nivîsa xwe ya bi serenava “Roj Roja Zanebûn û Hînbûna Bi Zimanê Xwe Ye” de wiha dibêje:

“Rêya zanebûnê bi arîkariya ziman û bi xwendin û hînbûnê vedibe. Ziman tinebe, zanebûn ewqas bi hêsanî nayê meydanê. Nezan jî bi gelemperî, bi arîkariya xwendin û hînbûnê radibe. Mirov bi ziman; xwe, xelqê xwe û dinyayê nas dike. Bi ziman ve, mirov ji hevûdu fam dikin derd û kulen xwe, kêf û şahiyên xwe ji hevûdu re dibêjin. Bi vî awayî ziman wezîfeya xwe ya fêmkirinê dike...Zarokên Kurda ji tehsîla ilim mahrum man. Seydayên zana di nezera dewletê de bi carkî de nezan bûn. Bê diploma xwendegehên dewletê (Îmam-Xetîb) meletiya wan qebûl nebû. Nehîştin seyda, teleban bidin xwendin. Xortên ji îmam xetîban mezun bûn jî pîrrê wan bi ilme xwe yên nêvî meletî kirin. Nehîştin Kurd ne bi tenê bi tîpê Latînî ne jî bi tîpê Erebî zimanê xwe bixwînin û binîvîsin. Mecbûrê zimanê Tirkî bûn. Malûm e ku mirov bi zimanekî beyanî bixwîne, nikare pîrr pêş de here. Ev aqîbet îro hatiye sere Kurdan jî. Kurd tim ji dinyayê û li tiştên nû bêxeber man...”<sup>294</sup>

Wek ku tê zanîn zimanê kurdî li welêt bi dehan salan hatiye qedexekirin û kesên ku xwestine biaxivin jî bi cezayên giran ve hatine cezakirin û ketine hepsan. Dayik çûne li ber deriyên hepsan, stûyê xwe xwar kirine ku bi zarokên xwe re bi zimanê xwe bibêjin ew çawan in, baş in. Lê bêyî ku ew halê wan bipirsin veqeriyane hatine malên xwe. Heta wisa ku hin kesan ev ceza bi canê xwe ve dane. Nivîskarên kovarê ji ber ku xwedî hişmendiyeke kurdewar bûne her tim xwestine ku balê bîkşînin ser zimên û bikaranîna wê. Di hejmarê 9emîn a Nûbiharê de M. Îrşad Cûdî behsa qedexeya zimanê kurdî dike û hişyariyê dide malbatan ku ew bi zarokên xwe re kurdî biaxivin. Cûdî di nivîsa xwe ya bi serenava “Rewşa Kurmancî û Zarokên Kurd” de wiha dibêje:

“Komara Tirkiyê (T.C) di mektebên xwe yê li Kurdistanê de nahêle zarokê Kurdan bi kurdî bipeyîvin. Axaftina zarokan bi zimanê xwe yê zikmakî qedexe ye. Heta bajar û gundine Kurdistanê, di mektebe de mamosta ceza didin zarokê bi Kurdî dipeyîvin. Her dem zarok di bin taqîbê de ne...Ey Kurdê ku li nav Tirka (Anadolê) jîn dibin û roj bi roj xwe winda dikin! Çand, wêje û îmana we tê talankirin. Êdî şiyar bin bes, ji pişavtinê re bibêjin na! Bi zarokên xwe re bi kurdî bipeyîvin û hun jî Kurdî qedexe nekin! Ma dijmin ne bes in, veka hun jî dijminatîya xwe dikin? Dijminê xelqê din ji alîkî tîn, yên me ji her çar aliya vê hicûmî me dikin, seb ku em Kurd in û bi ser vê de em misilmanin, talûke li ser talûkê çêdibe. Kurdîtî û îslam li cem hev weke agir û benzîna e. Wêca wextê

<sup>294</sup> Süleyman Çevik, “Roj Roja Zanebûn û Hînbûna Bi Zimanê Xwe Ye”, *Nûbihar*, j. 8, Gulan 1993, r. 7

agir bi benzî dîkevê ziravê dijmin diqetîne. Birano! Zîncîrê koletiyê biqetînin û zîmanê xwe azad kin.<sup>295</sup>

Feqî Huseyn Sağniçê ku di nav kurdan de bi berhemên xwe ve bi nav û deng e û keda wî li ser zîmanê kurdî heye jî der barê girîngiya zîman de nivîsek nivîsandîye. Sağniç di hejmara 20emîn a Nûbiharê de dibêje ji bo ku zîman pêşve here û dewlemend bibe divê her tim bê axaftin. Feqî Huseyn Sağniç di nivîsa xwe ya bi navê “Bandûra Zîmên Li Ser Gel” zîman dişîbîne gîsin û dibêje çawa ku gîsin dema neyê xebitandin, jeng digire, pûç dibe û ji kar derdikeve, zîman jî dema neyê bikaranîn, pêşî peyv jê dikevin û wînda dibin. Paşî hêdî hêdî jar û qels dibe û ber bi windabûnê ve diçe.<sup>296</sup>

Zîmanê kurdî her çiqas li dibistanan, kolanan û her aliyê jîyanê hatibe qedexekirin û gelê kurd ji bo zîman zîlm û zordarî dîtibe jî dev ji axaftina zîmên nehatiye berdan. Di nav malê de malbatan bi zîmanê xwe xeber dane û nehîştine ku zîmanê kurdî bê jîbîrkirin. Ev li ber asîmilasyonê bûye tevgerek û astengiyek mezin. Helbet ji ber gundşewitandinan, ji ber rewşa derasayî, tirs û zorê koçên mezin ber bi bajarên rojavayê ve çêbûne. Malbatên ku koçî li bajarên mezin û metroplan kirine di nav demê de vê hesasiyete nîşan nedane. Çawa ku malbatên hewl dane zîman neyê jîbîrkirin gelek hebin jî, hin malbatan jî guh nedane vê û nîfşên nû zîman jîbîr kirine. Di hejmara 22emîn de Mihemed Diyaedîn Dağhan di nivîsa xwe ya bi navê “Jîyan û Tesîra Zîman” de tîne zîman ku li ser kurdî gelek zor û zorbetî hatiye kirin, lê dîsa jî kurdan zîmanê xwe ji bîr nekiriye. Dağhan wiha behsa zîmanê kurdî dike:

“...Her millet bi zîmanekî hatiye xuliqandin û naskirin. Mezintiya ti xelq û zîmanî ser ên din nîn e. Lêbelê hinek gel ser gelen din yekcaran hukim kirine. Di vê hengavê de jî ew gelen serwer zîlm û zordarî, nijadperestî û kedxwarî kirine. Biz îman û aboriya xwe miletin pêşde çûne, hin jê paşde mane. Li ser gele kurd ji sedsalan pirtir qewmên tirk, ereb û faris zordarî domandine. Xwestine kurdan nav xwe de wînda bikin û wan ji holê rakin. Lêbelê gele kurd xwe wînda nekiriye. Bo azadiya xwe serhildan çêkirine û bo çand û hunerên xwe peşkeş bikin kitêb û pirtûk nivîsandine û dane xwendin. Di qorziyên mizgeftan de weke Nûbihara Ehmedê Xanî û Mewlûda kurdî heta nuha jî tên

<sup>295</sup> M. Îrşad Cûdî, “Rewşa Kurmancî û Zarokên Kurd”, *Nûbihar*, j. 9, Hezîran 1993, r. 25

<sup>296</sup> Feqî Huseyn Sağniç, “Bandûra Zîmên Li Ser Gel”, *Nûbihar*, j. 20, Gulan 1994, r. 15

xwendin û feqî van pirtûkan jiber dikin. Bi vê sayetê zimanê kurdî her çiqas tade dîtibe û li paş ketibe jî, ti carî winda nebûye.”<sup>297</sup>

Mîrov çend zimanan bizanibe jî cihê zimanê zikmakî taybet e. Lewra beriya hemû zimanan însan zimanên xwe yên dayikê hîn dibin. Beriya hemû zimanan zimanê zikmakî tê bîhîstin, ji ber vê ye ku zêdetir tê hezkirin û qîmet lê tê nîşandan. Di hejmara 41/42emîn de Ferîd Îzol di nivîsa xwe ya biserenava “Zimanê Zikmakî” de destnîşan dike ku zimanê zikmakî gelekî girîng e û ji bo her gelî zimanê wî şerîn e.<sup>298</sup>

Nivîskarekî din Aqîl Muhacir jî di hejmara 21emîn a Nûbiharê de di nivîsa xwe ya bi navê “Di Sererastkirina Riya Mirovan De Rola Zimanê Zikmakî” de behsa zimanê zikmakî dike û dibêje zarokên kurdan heta dibin 7 salî bi zimanê xwe yê zikmakî dijîn, lê pişt re di dibistanan de ji vî zimanî bêpar dimînin. Mihacir wiha behsa girîngiya zimanê zikmakî dike:

“Di hundirê meriv da çî çêbe meriv wiya bi heqî baştir, encax bi zimanê xwe yî zikmakî û bi reng û boyaxa bav û kalan tîne zimên. Dê û bav bi vî zimanî û bi vî şiklî şîret û terbiyan li zarokan dikin; oldariyê, cangorîtiyê, dîgerxemiyê, xebat û xîretê bi zimanê mader li çêlan diemilînin. Niha di her lorikeke deyan de qehremaniyên Hz. Elî, di her straneke wan de dengê hezar hesp û Mamlan tîne bihîstin. Zarokên me di îdealên wan de “Mêrxasiyên Baz û Selahaddîn” li pêş çavên wan de ew dîmenên dîrokî, mezin dibin.”<sup>299</sup>

Ji bilî nivîsên nivîskaran di gelek hejmarên cuda ên di kovara Nûbiharê de hin hevokên kin wek sloganan li ser girîngî û parastina ziman hatine nivîsandin. Mînak di hejmara 21emîn de şîretek li xwendevanan hatiye kirin û wiha hatiye gotin: “Nîşan bide ku tu heyî! Nebe muqellîdê muqellîdan! Zimanê xwe qenc hîn bibe!”<sup>300</sup> Di hejmara 25emîn a di kovarê de jî ayeteke Qur’anê hatiye nivîsandin û ji xwendevanan re hatiye gotin ku li gor vê ayetê tevbigerin û zimanê xwe xwedî derkevin: “Hûn mîsteheq û laîqê çî bîn, Xwedê wê dîde. Nîşan bidin ku hûn layîqê

<sup>297</sup> Mihemed Diyaedîn Dağhan, “Jiyan û Tesîra Ziman”, *Nûbihar*, j. 22, Tîrmeh 1994, r. 14

<sup>298</sup> Ferîd Îzol, “Zimanê Zikmakî”, *Nûbihar*, j. 41/42, Sibat/Adar 1996, r. 26

<sup>299</sup> Aqîl Mihacir, “Di Sererastkirina Riya Mirovan De Rola Zimanê Zikmakî”, *Nûbihar*, j.21, Hezîran 1994, r. 28

<sup>300</sup> *Nûbihar*, j. 21, Hezîran 1994, r. 16

xwendîn û nivîsandîna bî zîmanê xwe ne. Kovar û kîtêbên bî zîmanê xwe, bixwînîn û bîdîn xwendîn.”<sup>301</sup>

Di hejmara 28emîn de gotineke pêşyan a navdar hatiye nivîsandin û pişt re jî ji xwendevanan re hatiye gotin ku divê ew xwedî li zîmanê xwe derkevin: “Kurmê darê ne ji darê be, zewalê darê nîne. Li hebûna xwe xwedî derkeve! Li zîmanê xwe xwedî derkeve! –Nûbihar-”<sup>302</sup>

Wek ku tê dîtîn kovarê qîmetek mezin nîşanî zîmanê kurdî daye. Piştî hejmarên salên ewil îxtimalek mezin e ku kovar di nav kurdan de hatiye hezkirin û xwendekar xwedî li Nûbiharê derketine, ji vir şûn da îfadeyên wek “zîmanê xwe xwedî derkeve” an “kovara xwe xwedî derkeve” di kovarê de êdî zêde nehatine weşandin. Di nivîs û helbestan de helbet girîngiya zîman bi salan dewam dike, lê wek îlan û reklamên biçûk ev îfade di kovarê de êdî wek berê zêde xuya nakin.<sup>303</sup> Di hejmara 56emîn<sup>304</sup> û di hejmara 58emîn de wiha hatiye nivîsandin: “Nûbihar bi zîmanê we derdikeve, li zîmanê xwe xwedî derkevin.”<sup>305</sup> Yanê heta hejmarên 50î jî ev îfade tên dîtîn.

### **2.1.13. Bihayê Kovarê û Abonetî**

Çawa ku bihayê her tiştî heye, ji bo kovaran jî bihayekî firotinê heye. Rayedarên kovaran li gor demê û mesrefên xwe bihayekî kifş dikin û vê bi xwendevanên xwe re eşkere dikin. Kovara Nûbiharê jî wek hemû kovarên din ji xwe re bihayek diyar kiriye û bihayê mehane û salane ya abonetiye di hejmarên xwe de rasterast nivîsandiye. Ji ber ku firotina kovaran ya li pirtûkfiroşan kêr e, Nûbiharê jî hewl daye ku bi rêya abonetiye ve (mehane û salane) kovar bê firotin. Ev rê û rêbaz ji hejmara yekem ve berdewam e.

Ji hejmara yekem heta hejmara çaremîn bihayê kovarê ya mehane 8.000 TL ye. Ji bo abonetiye jî piştî berga ewil a kovarê di rûpela yekem de agahî hatiye dayîn û wiha hatiye gotin; “Bedela abonetiya salanî (12 hejmar) li hundir 90.000 TL, li devre 40 DM”<sup>306</sup> Ev agahiya ku bihayê kovarê û abonetiya wê eşkere dike, di hemû

<sup>301</sup> *Nûbihar*, j.25, Çiriya Pêşîn 1994, r. 22

<sup>302</sup> *Nûbihar*, j. 28, Sibata 1995, r. 23

<sup>303</sup> *Nûbihar*, j. 21, Hezîran 1994, r. 9

<sup>304</sup> *Nûbihar*, j. 56, Gulana 1997, r.19

<sup>305</sup> *Nûbihar*, j. 58, Tîrmeh 1997, r. 5

<sup>306</sup> *Nûbihar*, j.1, Çiriya Pêşîn 1992, r. 1

hejmarên kovarê de hatiye nivîsandin. Hesabê bankaya Îşê ya li ser navê Süleyman Çevik jî ji bo pere bê razandin di kovarê de hatiye weşandin. Tiştê balkêş ev e ku bihayê kovarê di nav salên ewil de zû bi zû hatiye zêdekirin.

Di hejmara xwe ya çaremîn de kovarê him bihayê xwe û him jî bihayê abonetiye zêde kiriye. Yanî bihayê kovarê ya ku 8.000 TL bûye 10.000 TL. Bihayê abonetiya salane jî ji bo hundirê welêt 120.000 TL, ji bo derveyî welêt jî bûye 50 DM.<sup>307</sup>

Di sala xwe ya yekemîn û hejmara xwe ya 10emîn de kovarê dîsa bihayê xwe zêde kiriye û kovara ku 10.000 TLyan dihate firotan vê carê ji bo ku 15.000 TL bê firotan hatiye amadekirin. Kovarê çawa ku bihayê xwe ya mehane 5.000 TL zêde kiribe, bihayê abonetiya xwe ya salane jî zêde kiriye. Kovarê bihayê ji bo hundirê welêt 120.000 TLyan derxistiye 180.000 TLyan, ya ji bo derveyî welêt jî ji 50 DMan derxistiye 60 DMan.<sup>308</sup>

Kovar di sala xwe ya 2emîn de jî weşanên xwe didomîne. Nav û dengê kovarê li gor sala ewil zêdetir tê bihîstin û kurd eleqeyê nîşanî Nûbiharê didin. Kovara ku di hejmara xwe ya 10emîn de bihayê xwe zêde kiribû di hejmara 16emîn de car din bihayê xwe zêde dike. Vê carê bihayê 15.000 TLyan dike 20.000 TL, abonetiya ji bo hundirê welêt a 180.000 TLyan jî derdixe 240.000 TLyan. Abonetiya ji bo derveyî welêt ya 60 DMan naguhere û ev biha bi heman şiklî dewam dike.<sup>309</sup>

Di hejmara 19emîn a kovarê de cardin bihayê kovarê zêde bûye û ji 20.000 TLyan derketiye 30.000 TLyan. Abonetiya ji bo hundirê welêt a 240.000 TLyan jî bûye 360.000 TLyan. Abonetiya ji bo derveyî welêt a 60 DMan dîsa neguhariye.<sup>310</sup> Dema hejmarên lêkolinkirin xuya dike ku rêvebirên kovarê di nav 2 salan de bi giştî 5 caran bihayê kovarê zêde kirine. Ji bo ku weşana xwe berdewam bike û rêjeya firotinê zêde bike kovarê hin caran bi hevokên kin ve hişyarî daye xwendevanan û piştgirî ji wan xwestiye ku ew li kovarê xwedî derkevin. Mînak di hejmara 19emîn

<sup>307</sup> *Nûbihar*, j. 4, Çileyê Paşîn 1993, r. 1

<sup>308</sup> *Nûbihar*, j. 10, Tîrmeh, 1993, r. 1

<sup>309</sup> *Nûbihar*, j. 16, Çileyê Paşîn, 1994, r. 1

<sup>310</sup> *Nûbihar*, j. 19, Nîsan 1994, r. 1

de “Nûbihar hebûna we diparêze. Li hebûna xwe û kovar û kitêbên xwe xwedî derkevin!” hatiye gotin.<sup>311</sup>

Dîsa ji bo ku aboneyên kovarê zêde bibin di hejmara 19emîn de, di hin rûpelên kovarê de wiha hatiye gotin: “Nûbihar nexwendin kêmasiyek e!” û “Bibin abone û aboneyan ji Nûbiharê re peyda bikin!”<sup>312</sup> Di hejmara 21emîn de ji bo ku behsa girîngiya zimanê kurdî bê kirin wiha hatiye nivîsandin: “Zimanê te şêrîn e! Li zimanê xwe xwedî derkeve! Nûbihara xwe bixwîne û bide xwendin!”<sup>313</sup> Di hejmara 56emîn<sup>314</sup> û di hejmara 58emîn de wiha hatiye nivîsandin: “Nûbihar bi zimanê we derdikeve, li zimanê xwe xwedî derkevin.”<sup>315</sup>

Kovarê ji hêla aboriyê ve zehmetî kişandiye û di nav demê de bihayê xwe her tim zêde kiriye. Heta wisa ku hin caran ji ber sedemên aboriyê çend hejmar bi hev re hatine weşandin. Wek mînak hejmarên 79 û 80 û 81 bi hev re hatine weşandin. Bihayê kovarê li vir 750.000TL hatiye nivîsandin û destpêka kovarê de di nivîsa ku serenava wê “Ji Nûbiharê Bi Silavên Germ”, de jî wiha hatiye gotin:

“...Ji serî heta niha mixabin ji ber sebebên malûm, em kovarê dereng derdixin. Ji wan sebebên malûm, me ev hejmar hê derengtir derxist. Ev kovara ku di destê we de ye, me sê hejmar bi hev re derxistine. Lêbelê me rûpelên kovarê du qat zêde kirine û kiriye 64 rûpel. Eger Xwedê firsetê bide, Înşaallah emê bikaribin hejmarên din zûtir derxin.”<sup>316</sup>

Di hejmara 85an de bihayê kovarê bûye 1.250.000 TL û hejmara 85an jî bi vê bihayê hatiye firotin. Pişt re demeke dirêj a qasî du salan weşana kovarê hatiye rawestandin. Helbet piştî du salan wek ku gelek tişt di jiyanê de biguherin, bihayê kovarê jî car din guheriye. Li ser hejmara 87an a ku di sala 2002an de hatiye weşandin bihayê kovarê 4.000.000 TL hatiye nivîsandin. Tiştê balkêş a din jî ewe ku kovar êdî ne mehane, sê mehan carekê hatiye weşandin. Ji wir pê va heta îro jî 3 mehan carekê tê weşandin.

<sup>311</sup> *Nûbihar*, j. 19, Nîsan 1994, r. 22

<sup>312</sup> *Nûbihar*, j. 6, Adar 1993, r. 18-20

<sup>313</sup> *Nûbihar*, j. 21, Hezîran 1994, r. 9

<sup>314</sup> *Nûbihar*, j. 56, Gulan 1997, r. 19

<sup>315</sup> *Nûbihar*, j. 58, Tîrmeh 1997, r. 5

<sup>316</sup> “Ji Nûbiharê Bi Silavên Germ”, *Nûbihar*, j. 79-81, Çiriya Pêşîn-Çiriya Paşîn 1999, r. 1

Di hejmara 98an de bihayê kovarê car din diguhere, wek 4 YTL li ser kovarê tê nivîsandin. Dema hejmara 99an hatiye weşandin bihayê Nûbiharê vê carê bûye 5 YTL. Di hejmara 106an de jî bihayê kovarê dîsa heman biha yanî 5 lîre ye, lê wek 5 TL hatiye nivîsandin. Yanê pereyê nû yê Tirkiyeyê YTL vêga wek TL hatiye nivîsandin. Dema hejmara 122an tê weşandin bihayê kovarê wek 6 TL diguhere. Ji hejmara 135an pê ve jî bihayê Nûbiharê dibe 8TL.

Bi kurtasî ji van hemû agahiyan tê dîtî ku kovara Nûbiharê di nav rûpelên dîrokê de bi zû de cihê xwe girtiye û xebatên ku di sala 1992an de daye destpêkirin bi profesyonelî û hêztir dimeşîne. Ji ber vê jî wisa xuya dike ku me çawa ku ev kovar ji bo lêkolînê hilbijart, di pêşerojê de lêkolînêrên kurd ên din jî wê li ser vê kovarê bixebitin.

## **2.2. EDEBIYATA ZAROKAN DI KOVARA NÛBIHARÊ DE**

Hin nivîskar û rewşenbîrên kurd hewl dane ku ji bo zarokan tiştan binivîsin û xebatan bikin, yek jî xebatên wan jî kovar in. Kovara Nûbiharê rasterast ne kovareke zarokan e. Kovar her çiqas ji bo mezinan hatibe weşandin jî, rêvebirên Nûbiharê hin rûpelên kovarê ji bo zarokan veqetandine û di van rûpelan de ji bo zarokan nivîs û wêne weşandine. Di vê beşê de em ê li ser zaroknameya Nûbiharê bisekinin.

Heke mirov ji hêla edebiyata zarokan ve naveroka kovarê binihêre, tê dîtî ku di kovarê de ji bo zarokan çîrok, fabl, pêkenok, helbest, bîranîn, gotinên pêşiyar, karîkatur û h.w.d. gelek tişt ji bo zarokan hatine weşandin. Ji van cureyan hinek pir zêde û hinek jî kêr hatine weşandin. Lê dîsa jî, ji hêla naverokê ve dewlemendiyek balê dikşîne.

Armanca van nivîsan ew e ku him zarok bîr perwerdekirin û him jî dema wan xweş derbas be. Ji bo perwerdeyê di kovarê de gelemperî mijarên dînî, neteweyî û yê exlaqî hatine hilbijartin. Wek mînak jiyana pêxember û sehabeyan, navdarên kurd, gotinên pêşiyar û h.w.d. Ji bo ku kêfa wan bê û ew wextên xwe derbas bikin jî pêkenok, karîkatur, fabl û çîrok hatine weşandin.

Amadekarên beşa zarokan kedeke mezin dane ku zarokên kurd ji edebiyatê bêpar nemînin. Lê dema nivîs, mijarên hatine hilbijartin, wêneyên ku hatine xêzkirin yanê gelemperî beşa zarokan tê lêkolînkirin, tê dîtî ku nivîskarên kovarê zarok wek



mezinan hesibandine. Nivîskaran gelemperî zimanekî ji bo mezinan tê bikaranîn di nivîsên xwe de bikaranîne. Li gor kovarên ku zarokan ên ku di beşa yekemîn de me behsa wan kiribûn, nivîsên beşa Zaroknameyê ji bo zarokan hin caran giran in.

Navê beşa zarokan di nav demê de bi tevahî sê caran guheriye. Wek “Zarokname”, “Zarokistan” û “Nûbihara Biçûkan”. Ji hejmara yekem a ku di 1992an de hatiye weşandin, heta hejmara 78an navê beşê wek “Zarokname” hatiye nivîsandin. Lê di vê navberê de hin caran ev beş nehatiye amadekirin. Amadekarên beşa Zaroknameyê Sabah Kara û Xelîl Amed in. Xêynî hejmarên 5 û 12emîn, di hemû hejmaran de (10 hejmar) ew ji bo zarokan nivîsan diweşînin. Di sala duyemîn û sêyemîn ên hejmarên di navbera 13 û 33an de hatine weşandin de ji bo zarokan tu tişt nehatiye weşandin. Yanê di van hejmaran de Zarokname tunene.

Dema kovar digihêje hejmara xwe ya 34emîn beşa Zaroknameyê car din tê amadekirin. Ji vê hejmarê heta hejmara 48an bênavber derdikeve. Piştî hejmara 48an dîsa navberek tê dayîn û zarok ji Zaroknameyê bêpar dimînin. Di sala 1997an de ji bo zarokan ked tê dayîn û di hejmarên 53, 54, 55, 56an de beş car din tê amadekirin. Paşê dîsa navbereke dirêj çêdibe, heta hejmara 78an. Di hejmarên 79, 80, 81 ên ku sê hejmar bi hev re tên weşandin de vê carê navê beşê wek “Zarokistan” tê guherandin. Di van hejmaran de bi tenê Sabah Kara dinivîse û tišta balkêş jî ew e ku hemû nivîsên wî helbest in. Xêncî helbestan ji cureyên din tu tişt, ji bilî navê Sabah Kara jî tu nav xuya nake. Ji sala 1999an heta sala 2000an yanê heta hejmara 82an beşa “Zarokistan”ê dewam dike.

Piştî hejmara 82an car din navbereke dirêj a qasî 9 salan çêdibe. Heta hejmara 107an ji bo zarokan tu tişt nayê amadekirin. Di sala 2009an de yanê piştî 9 salan di hejmara 107an de dîsa navê beşê wek “Zarokname” tê nivîsandin û ji bo zarokan hin nivîs tên weşandin. Dema kovar di havîna 2009an de hejmara xwe ya 108emîn diweşîne, navê beşê vê carê jî wek “Nûbihara Biçûkan” tê guherandin û heta hejmara 112an ev nav tê bikaranîn. Ji xwe hejmara 112emîn (Havîn 2010) êdî ji bo zarokan dibe hejmara dawîn û dev ji beşa “Nûbihara Biçûkan” tê berdan. Nivîsên bi navê “Mol Axa”, “Pelda û Zehra” û “Nameya Tombîşê Ji Zehrayê re” nivîsên dawîn ên zarokan in.

Di beşên Zaroknameyê de sê nivîskar balê dikşînin ku ew Sabah Kara, Xelîl Amed û Rojbîn Özkan in. Sabah Kara çawa ku di gelemperiya kovarê de heta hejmara 71emîn ked daye, ji bo beşa zarokan jî kedeke mezin daye. Kara beşên Zaroknameyê yên ku di navbera 2 û 12an de hatine weşandin de û hejmarên ku di navbera 78-82an de hatine weşandin de çîrok, helbest û h.w.d. nivîsandiye. Pişt re Xelîl Amed(î) ev berpirsyarî hildaye ser milê xwe û demekê jî wî beşa Zaronameyê amade kiriye. Xelîl Amed an jî wek ku di hin hejmaran de wek Xelîl Amedî hatiye nivîsandin, ewil di hejmara 8an de û herî dawîn jî di hejmara 56an de nivîs weşandine. Piştî hejmara 56an Xelîl Amed dev ji vê berpirsariyê berdaye. Di hejmara 107an de vê carê Rojbîn Özkan beşa zarokan amade dike û navê beşê jî wek “Nûbihara Biçûkan” tê guherandin. Özkan jî ji hejmara 107an heta beşa 112an berpirsariyê hildide ser milê xwe û bê navber “Nûbihara Biçûkan” ji bo zarokên kurd amade dike.

Piştî hejmara 112an bêyî ku agahiyek bê dayîn, ji bo zarokan êdî nivîs nayên weşandin. Wek ku tê dîtin beşên Zaroknameyê bi awayekî rêk û pêk nehatine weşandin. Hin salan hema bibêje di hemû hejmaran de, hin salan yek an jî du nivîs hatine weşandin. Hin salan jî navbereke dirêj hatiye dayîn û tu tişt nehatiye nivîsandin.

Nivîsên ku di beşa Zaroknameyê de hatine çapkirin çiqas li gor zarokan in, serkeftî ne an na, kêmasî çî ne, rexneyên ku divê bînin kirin çî ne, em ê li ser van mijaran bisekinin. Lê divê bê gotin ku nivîskar û rêvebirên kovarê ji bo zarokan berpirsariyê hildane li ser milên xwe û kedeke girîng dane.

Piştî van gotinan mirov dikare behsa naveroka Zaroknameyê bike. Lê beriya wê divê wek agahiyek bê gotin ku nivîsên ku rasterast ji kovarê hatine girtin di kovarê de çawa hatibin weşandin, wek orjînalê wan hatin nivîsandin. Ji ber ku orjînalê nivîsan hat parastin, di hin nivîsan de şaşî û xeletiyên rêzimanê hene ku ev ne yên me ne, yên nivîsan bi xwe ne. Wek xaleke girîng a din jî ew e ku dema me nivîsên zaroknameyê nixand ango danasîna van nivîsan kir em li gorî rêza hejmaran neçûn. Me li gor mijaran nivîs dabeş kirin û wek rêbaz wisa ew nixandin.

## 2.2.1. NAVEROKA ZAROKNAMEYA KOVARA NÛBIHARÊ

### 2.2.1.1. Jiyana Pêxember û Gotinên Wî

Nûbihar kovareke edebî-îslamî ye. Ji ber vê jî çawa ku di rûpelên kovarê de ji bo mezinan behsa jiyana Hz. Mihemed û gotinên wî hatibe kirin, ji bo zarokan jî behsa vê mijarê hatiye kirin. Di hejmara yekem a kovarê de du qîseyên ji jiyana pêxember hatine nivîsandin.

#### 2.2.1.1.1. Du Qise Ji Jiyana Pêyamber ê Ekrem

Di hejmara yekem a Nûbiharê de nivîsa ewil a beşa Zaroknameyê nivîsa bi serenava “Du qise ji jiyana pêyamber ê Ekrem” e. Di vê nivîsê de pêxember wek pêyamber hatiye nivîsandin. Mijar tevgerên Hz. Mihemed û têkiliya wî ya bi mirovan re ye. Nivîskarê herdu nivîsan jî Azad e.

#### 2.2.1.1.2. Peyamber ê Ekrem û Du Helqe Civat

Di qîseyê ewil a bi navê “Peyamber ê Ekrem û du helqe civat” de nivîskar Azad behsa pêxember û du civatan dike. Di nivîsê de tê gotin ku Hz. Mihemed rojekê diçe Mizgefta Medîneyê. Li ser rê dibîne ku civatek rûniştiye. Ya ewil zikir û îbadetê dike, civata din jî telîm û dersan hîn dibe. Hz. Pêxember ji kesên ku li der û dora wî ne re dibêje: “Ev her du deste jî karên baş û xêrê dikin; karê wan xêr û bereket e. Lakîn ez ji bona talim û zanakirinê hatime.”<sup>317</sup> Pişt re diçe li cem civata duyem ên ku bi ders û talimê re eleqeder dibin rûdinê.

**Peyam:** Di vê qîseyê de ji zarokan re peyam ew e ku îbadet û zikir tişteki baş e, lê ilm û perwerde ji wê girîngtir e. Ji ber ku zanabûn tişteki biqîmet e, divê hewl bê dayîn û xebat ji bo vê bê kirin. Lewra Pêxemberê Xwedê jî ji bo ku girîngiya vê nîşan bide di nav civakan de hîlbijartinek kiriye û çûye li cem kesên ku bi ilmê re eleqedar dibin rûniştî ye.

---

<sup>317</sup> Azad, “Du Qise Ji Jiyana Pêyamber ê Ekrem”, *Nûbihar*, j. 1, Çiriya Pêşîn 1992, r. 30

### 2.2.1.1.3. Mirovê Ricaker

Di qiseya duyem a bi navê “Mirovê Ricaker” de jî mirovekî hal û wextê wî zêde nebaş diçe li cem Pêxember ku alîkariyê bixwaze. Dema niyet dike ku derdê xwe bibêje û alîkariyê bixwaze, Pêxember beriya ku ew alîkariyê bixwaze ji wî re wiha dibêje: “Kî ji me arîkarî bixwaze, em ê bidinê. Lê belê heger mirov ji hîç mexluqî parsê neke destê xwe li pêş tu kesî dirêj neke, Xwedê wê/wî muheqqeq ji mihtaciyê xelas bike.” Mêrik dema vê hevokê dibihîze vedigere mala xwe.

Ev mêrik du carên din jî dîsa ji ber feqiriyê li ber xwe nade diçe li cem Pêxember, lê herdu carên din de jî heman tiştê dibihîze. Paşê fêm dike ku mifta derdê wî di vê hevokê de ye. Vedigere mala xwe, dia dike û dest bi xebatê dike. Bivir û werîsekî li cem cinarê xwe tîne êzingan dibire, difroşe û dibe xwedî mal û hal. Dema rojek Hz. Pêxember rastî wî tê tebessum dike û dibêje: “Ma min negot? Kî ji me arîkarî bixwaze em ê bidinê. Lê belê heger mirov ji hîç mexluqî parsê neke destê xwe li pêş tu kesî dirêj neke, Xwedê wê/wî muheqqeq ji mihtaciyê xelas bike.”<sup>318</sup>

**Peyam:** Di vê qiseyê de jî nivîskar dixwaze ji zarokan re bibêje ku beriya hûn ji yekî alîkariyê bixwazin ewil xwe bi xwe bixebitin, hewl û kedê bidin. Wê demê hûnê bibînin ku hûn çiqas bi serkeftî ne û xwedî jiyaneke dewlemend in. Heke we ked da û hûn bi ser neketin paşê ji kesên din alîkariyê bixwazin. Lê zimanê ku di van qiseyan de hatiye bikaranîn ji bo zarokan ne hêsan û ne jî zelal e. Yanî mirov dikare bibêje ku ne li gor asta zarokan e. Wêneyê ku hatiye xêzkirin jî wêneyekî balkêş nîne. Nivîskar xwestiye perwerdeyeke dînî bide zarokan, ji ber vê ev mijar hîlbijartiyê.

### 2.2.1.2. Rûpelek Ji Exlaqê Pêxember

Di hejmara 9emîn a Nûbiharê de Ebdillah Amed bi serenava “Rûpelek Ji Exlaqê Pêxember” nivîsek ji bo zarokan nivîsandiye û tê de behsa exlaqê pêxember, tevger û gotinên wî kiriye. Di nivîsê de tê gotin ku kurê Hz. Elî, Hz. Hesen ji birayê xwe Hz. Huseyn dipirse ku ka Hz. Mihemed yekî çawa ye. Hz. Huseyn ji Hesen re

---

<sup>318</sup> H.g, r. 30-31

dibêje ku bavê wan Hz. Elî dema behsa Pêxember kiriye gotiye ku ew yekî rûken, xwîxweş, bişefqet bûye, her tim alîkariya mirovan kiriye û xeyba kesî jî nekiriye.

Ji bilî vê bîranîneke Hz. Eyşe (jina pêxember) û sehabeyek bi navê Bavê Talha ya der barê Hz. Mihemed de jî hatiye nivîsandin. Nivîsa ku ji yek û nîv rûpelan pêk tê bi awayekî hûrgilî li ser exlaq û kesayetiya Pêxember disekine. Di rûpela ewil de bi tîpên erebî xêzek hatiye xêzkirin ku ev xêz wek motîfeke dînî balê dikêşîne. Di nav xêzê de nivîsê ku bi erebî “Xwedê mihefeze bike” hatiye nivîsandin.<sup>319</sup>

**Peyam:** Li gor nivîsên din yê dînî zimanê vê nivîsê hêsantir e. Nivîskar ji bo ku zarok xwe aîdê dînê îslamê bibînin negotiye “Pêxember”, gotiye “Pêxemberê me”. Dema behsa Hz. Eyşe dike jî gotiye “jina Pêxemberê me”. Dîsa dema behsa van kesan dike di nav kevanekan de dibêje “Xwedê jê razî be”, “selam û rehmeta Xwedê li ser wî be” û h.w.d.. Ev tişt bi zanetî hatine bikaranîn ku bila zarok bizanibin dema behsa kesên wiha tê kirin, divê rêz û hezkirin bê nîşandan, yan jî dia ji Xwedê bê kirin ku Xwedê rehmê li wan kesan bike. Nivîsên bi vî rengî ve armanc ew e ku zarok dîn, Xwedê, Pêxember û sehabeyan nas bikin û wan hez bikin.

### 2.2.1.3. Pêxember û Lepên Şixulker

Di civakê de dema behsa pêxemberan tê kirin, hin kes wan zêde pîroz teswîr dikin ku tu yê bibêjî di navbera wan û civakê de sînorek hişk heye û gel nikare bi hêsanî bi wan re bikeve têkiliyê. Lê ev fikr di nivîseke Zaroknameyê de hatiye pûçkirin. Di hejmara 11emîn a kovarê de Xelîl Amedî bi serenava “Pêxember û Lepên Şixulker” nivîseke ku ji rûpelekê pêk tê nivîsandiye. Nivîs bi gotina “zarokên hêja” ve dest pê dike.

Di vê nivîsê de behsa heyama ku Pêxember di tê de jiyaye, behsa rewşa civaka wî û kesayetiya Pêxember hatiye kirin. Tê gotin cotkarekî ku ji ber xebatê destê wî qelîşîne û hişk in dema destê Pêxember digre û dihejîne, gelek şerm dike û aciz dibe. Wisa difikire ku destê wî destê pêxember êşandiye. Lê Pêxember aciz nabe û her çiqas destê wî êşiyabe jî, wî kesî nade şermê. Nivîs wiha diqede: “Ev lepanan, lepên

<sup>319</sup> Ebdillah Amed, “Rûpelek Ji Exlaqê Pêxember”, *Nûbihar*, j. 9, Hezîran 1993, r. 27-28

wisa ne ku hem Xwedê, hem jî Qaside Xwedê ji wan hezdirin. Destên ji xebatê wisa qelişî û perçê bûnin, gellek rûmetdar in. Xwedê, van destên şixulkerên rûmetdar, navêje agir û naşewitîne.”<sup>320</sup>

**Peyam:** Di vê nivîsê de hewl hatiye dayîn ku zarok Pêxember baş nas bikin. Bila kesayetîya wî, dîlnizmiya wî û tevgerên wî yên ku li hember mirovan bibînin. Ya din jî pesnê xebatê tê dayîn ku kar û xebat li ber çavê zarokan şêrîn be, ew teral nebin û her tim bixebitin. Bi vê nivîsê ve ji zarokan re perwerdeyeke olî û darsa exlaqê jî hatiye dayîn.

Di wêneyê nivîsê de du destên mezin ên bi kulfîlkan ve hatine xemilandin û mirovekî ku şewqe li serî ye wek kincekî digivişin xuya dike. Dema baş bê mêzekerin şewqeyê li serê mêrik alaya Amerîkayê ye. Ev kes jî wek sembola kapîtalîzm, emperyalîzm û Amerîkayê hatiye simbolîzekerin. Ev wêneyê li gor ast û nêrîna zarokan ne wêneyekî hêsan e, lê balê dikêşîne.<sup>321</sup>

**Tablo 1: Tabloya Nivîsên Der Barê Jiyana û Gotinên Pêxember De**

Jimar	Jiyana Pêxember û Gotinên Wî	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Du Qise Ji Jiyana Pêyamber ê Ekrem	Azad	1	30 31	Çiriya Pêşîn 1992
2	Rûpelek Ji Exlaqê Pêxember	Ebdillah Amed	9	27	Hezîran 1993
3	Pêxember û Lepên Şixulker	Xelîl Amedî	11	29	Tebax 1993

<sup>320</sup> Xelîl Amedî, “Pêxember û Lepên Şixulker”, *Nûbihar*, j. 11, Tebax 1993, r. 29

<sup>321</sup> H.r

### 2.2.2. Navdarên Kurd

Di civakekê de ji bo ku zarok der barê dîrok, çand û edebiyata xwe de agahdar bin, ji wan re behsa hin kesên navdar tê kirin. Çawa ku di nav hemû civakan de hin kesên navdar hene, di nav kurdan de jî navê hinekan zêdetir tê bihîstin. Helbet ev kes ji ber gotin, kirin û fikrên xwe navdar in û di nav kurdan de jî hestên neteweyî zindî digrin.

Di beşa Zaroknameyê de ji bo ku zarok bibin xwedî hestên neteweyî û hay ji dîrok û civaka xwe hebin, behsa hin navdarên kurd ên ku ji hêla gel ve tîr hezkirin û tesîrê li ser gelê kurd hiştine, hatiye kirin. Ev kesên ku hatine hilbijartin bi berhem, gotin, tevger û jiyane xwe ve li ber gel bûne rêber. Navê wan ji nifşekî derbasî nifşên din bûye. Nivîskar û rewşenbîrên kurd jî gelek çaran di axaftin û berhemên xwe de behsa wan dikin. Di beşa Zaroknameyê de behsa van kesan hatiye kirin; Seîdê Kurdî, Evdilmelîk Firat, Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî.

#### 2.2.2.1. Seîdê Kurdî

Amadekarê beşa Zaroknameyê Xelîl Amed di du beşên Zaroknameyê de xwestiye ku hin navdarên kurd li zarokên kurd bide nasîn ku yek Seîdê Kurdî û yê din jî Evdilmelîk Firat e. Amed dema behsa navdaran dike, du lehengên zarok yê bi navê Rengîn û Xemgîn (paşê dîr û dirêj wê behsa wan bê kirin) daye axaftin û bi diyaloga navbera wan de ev kes dane nasandin. Bi vê tevgerê ve hewl hatiye dayîn ku zarok bi hêsanî fêhm bikin ku ka ew kes kî ne.

Di hejmara 37emîn a kovarê de du lehengên zarok Rengîn û Xemgîn bi hev re diaxivin. Rengîn ji Xemgîn dipirse ku ew Seîdê Kurdî nas dike an na? Xemgîn dibêje ku ew Seîdê Kurdî nas dike û wî gelek hez jî dike. Rengîn ji Xemgîn re dibêje ku Seîdê Kurdî behsa 3 dijminan dike ku ew nahêlin kurd azad bibin û peş ve herin. Li ser vê gotinê Xemgîn dibêje ku ew ê here malê şûr û mertalên xwe, tîr û kevanê xwe bîne da ku van dijminan bikuje. Lê Rengîn nahêle ew here û wiha behsa van dijminan dike;

*“Rengîn: Na qurban, heyrana çavên te. Ev dijmin ne bi tîr û kevan, ne jî bi şûr û mertal tîne kuştin. Hetta evana bi kîmyasalên Seddame Zalim jî nayên kuştin.*

*Xemgîn: Wişşş! Ma tu dibêjî ev dijmin qey pola ne?*

*Rengîn:* Na birayê ezîz. De bisekin ezê ji te re bibêjim. Dijminên me; yek nezanî, yek xizanî (feqîrî) û yek jî perçebûyin e.

*Xemgîn:* Wax mala min, min çawa pê dernexist? Deka bêje birayê delal, emê bi çi awayî li hember van dijminan bisekinin.

*Rengîn:* Em encax dikarin bi xwendin, huner û yekîtiyê li hember van dijminen dijwar derkevin?

*Xemgîn:* Heyran! Tiştêkî din ji heye, wî jî bibêje bila zarokên hevalên me jî bizanibin.

*Rengîn:* Ew çi ye keko! Ma tiştêkî din jî heye?

*Xemgîn:* Belê, tiştêkî din jî heye. Seydayê Delal ji bo xelasbûna me kurdan tiştêkî din jî dibêje, ew jî; "xwendin, xwendin, xwendin. Desthevgirtin, desthevgirtin, desthevgirtin" e. Bes. Temam bû.

*Rengîn:* !!!!!!!?"<sup>322</sup>

**Peyam:** Nivîskar xwestiye ku zarokên kurd bila Seîdê Kurdî nas bikin û hay ji gotinên wî hebin. Ya duduyan jî wek ku Seîdê Kurdî gotiye divê kurd şer û cengê nekin, pir bixwînin û bi xwendinê xwe pêş ve bibin. Di vê axaftinê de tişteke balkêş a din jî ew e ku behsa navekî din hatiye kirin "Seddâmê Zalim". Seddâm Huseyîn di nav kurdan de bi zilmê, zalimiyê, kuştinê, qirkirinê ve tê nasîn. Lewra di 16ê adara 1988an de bi hezaran kurd li ser fermana wî li Helebceyê bi xaza kîmyewî ve hatin qirkirin.<sup>323</sup> Rengîn û Xemgîn dema behsa dijminan dikin navê Seddâm jî dibêjin ku bila zarokên kurd wî jî nas bikin. Komkujiya Helebceyê her çiqas di dîroka kurdan de wek bûyereke bi êş û keser cih bigre jî, bi vê nivîsê ve hatiye xwestin ku zarokên kurdan dîroka xwe bizanibin û vê bûyerê qet ji bîr nekin.

#### 2.2.2.2. Evdilmelîk Firat

Di nav kurdan de Seîdekî din jî heye ku ew jî Şêx Seîd e. Hemû kurd navê wî dizanin. Di hejmara 39emîn a kovarê de Xelîl Amed di beşa "Zarokname/5"an de vê carê behsa navdarekî kurd ê din dike. Ev kes Evdilmelîk Firatê neviyê Şêx Seîdê Kal e. Nivîskar dîsa bi axaftina navbera Rengîn û Xemgîn ve navdarekî din Evdilmelîk Firat jî bi zarokên kurdan dide nasîn. Heke nivîskar bi awayekî normal bibêje ku

<sup>322</sup> Xelîl Amed, "Rengîn û Xemgîn", *Nûbihar*, j. 37, Çiriya Pêşîn 1995, r. 23

<sup>323</sup> Süleyman Çevik, "Pênc Hezar Kulîlk", *Nûbihar*, j 7, Nîsan 1993, r. 10-11



Evdilmelîk Firat di filan demê de hatiye dinyayê, filan xebat kiriye, kesekî wiha ye filan û bêvan, dibe ev ku mijar zêde bala zarokan nekşîne. Lê dema bi saya van lehengên ku êdî bûne hevalên zarokan ve behsa navdarên kurd dike, ev tişt dibe ku bala zarokan zêdetir bikşîne.

Di hejmara 39emîn de Rengîn ji Xemgîn dipirse ku ew Evdilmelîk Firat nas dike an na? Xemgîn dibêje ew wî nas nake. Rengîn dibêje ku ev kes neviyê Şêx Seîd e. Dema ku ew dibêje neviyê Şêx Seîd e, Xemgîn wî nas dike. Ji ber ku kurdekî ku Şêx Seîd nas neke hema bibêje tune. Pişt re Rengîn behsa Evdilmelîk Firat ji Xemgîn re dike. Dibêje ew kesekî azadîxwaz, biratîxwaz, însanîxwaz e. Heq û hiqûqê, çand û hunera xwe dixwaze. Ji ber vê hatiye girtin. Xemgîn şaş û metel dimîne ku çawa ji ber van tiştan kesek tê girtin. Axaftina wan dewam dike û di dawiyê de wiha dibêjin;

“RENGÎN: Rabe keko, rabe, em biçin mizgeftê ji xwe re nimeja xwe bikin û destê xwe vekin, dibe ku Yezdanê dilovan li rûye me mêzeke û me ji vê bindestiyê xelas bike.

XEMGÎN: Belê keko, de ka em biçin feqet em bi hev re ji birayên xwe re tiştêkî bêjin û bila herkes bi me bihese. "Mîrinek bi şeref û mêranî tercîha jîyanek bîndestî û bêşereffî ye."

RENGÎN: Bila be keko.

XEMGÎN:.....

XEMGÎN û RENGÎN: Kalê me yî delal û hêja Ebdûlmelîk, tu vêya xweş bizanibe ku te wek kalê xwe yê şehîd di dile sîh mîlyon kurdan de cih girtiye, rêya ku tu heq dibînî tê de bimeşe, em li dû te ne û di şopa te de dimeşin. Bila serhildan û berxwedana te pîroz be û yezdanê dilovan ê mehrîban alîkarê te be.”<sup>324</sup>

**Peyam:** Bi vê axaftinê ve Nûbiharê xwestiye ku kesekî navdar ê din Evdilmelîk Firat zarokên kurdan bide nasîn. Rengîn û Xemgîn dema dibêjin “em hemû Evdilmelîk in hadê em herin mizgeftê nimêj bikin û li wir ji bo Kalê Evdilmelîk jî dia bikin” peyamek ji zarokên kurdan re hatiye dayîn ku bila ew navdarên xwe hez bikin û li ser şopa wan bimeşin. Tiştê din jî ew e ku dema zarok ji hev re dibêjin ku: “Hadê em herin mizgeftê nimêj bikin.” nivîskar xwestiye ku

<sup>324</sup> Xelîl Amed, “Rengîn û Xemgîn”, *Nûbihar*, j. 39, Çileyê Pêşîn 1995, r. 30

nimêjê bi zarokan bide hezkirin û perwerdeyeke olî jî bide wan. Di nivîsê de wêneyê Rengîn û Xemgîn ên ku cil û bergên kurdan li xwe kirine hatiye xêzkirin. Ji bilî wêneyên wan Evdilmelik Firat jî di nav kulflkekê de hatiye xêzkirin ku hezkirina herdu zarokan bi vî awayî bê nîşandan.

### 2.2.2.3. Ehmedê Xanî

Di hejmara 108emîn a ku navê beşa Zaroknameyê wek “Nûbihara Biçûkan” hatiye guhertin de navdarekî kurd ê din hatiye nasandin. Rojbîn Özkan di vê hejmarê de bi serenava “Bapîrê Me Ehmedê Xanî” behsa Ehmedê Xanî kiriye. Li aliyê rastê li jora nivîsê jî wêneyekî Xanî hatiye xêzkirin. Nivîs Ehmedê Xanî wiha dide nasandin:

“Rêber, wêjevan û ramanwerê kurd, Ehmedê Xanî, di sala 1651ê de li Colemêrgê gundê Xanî ji dayik bûye û di sala 1706ê de jî li Bazîdê çûye ber rehma Xwedê.

Zarokên delal û şêrîn!

Ehmedê Xanî gelek berhemên hêja bi zimanê kurdî nivîsandî ye. Berhema xwe ya girîng Nûbihar, ji bo we zarokên kurdan di 11ê Adara 1683an de di 23 saliya xwe de nivîsandîye. Mamostê nemir Xanî di vê berhema xwe a payebilind de xwestiye zarokên kurdan bê perwerde nemînin. Zarokên delal, seydayê nemir Ehmedê Xanî di vê berhema de gelek hinareyên girîng dane me. Divê hemû zarokên kurdan vê berhema hêja bixwînin.

Tirba seydayê Xanî li Bazîdê ye û bûye ziyaretgeha kurdan.”<sup>325</sup>

**Peyam:** Di vê nivîsa kurt de Özkanê hewl daye ku navdarekî kurd Ehmedê Xanî û berhama wî “Nûbihara Biçûkan” ya ku ji bo zarokan hatiye nivîsandin, zarokan bide nasîn û hezkirin.

### 2.2.2.4. Melayê Cizîrî

Di nav kurdan de helbestvanek heye ku gelek kurd wî nas dikin û helbestên wî jî ji ber dikin. Di beşa “Nûbihara Biçûkan” a hejmara 109emîn de Rojbîn Özkanê şairekî kurd Melayê Cizîrî daye nasandin. Di nivîsa ku serenava wê “Şexsiyetek Melayê Cizîrî” de Rojbîn Özkan bi gotina “Zarokên delal û xoşewist” bangî zarokan dike û dibêje ku ew ê di vê hejmarê de behsa Melayê Cizîrî bike. Özkan ewil bi kurtasî behsa jiyana Cizîrî dike û paşê bi vê helbesta Mela ve nivîsa xwe diqedîne:

<sup>325</sup> Rojbîn Özkan, “Bapîrê Me Ehmedê Xanî”, *Nûbihar*, j. 108, Havîn 2009, r. 92

“Aşiqê nazik û mehbûban im  
 Tu mebîn bê ser û bê saman im  
 Gulê baxê îremê botan im  
 Şeb çiraxê şebê Kurdistan im.”<sup>326</sup>

Bi saya vê nivîsê zarokên ku bixwazin kovarê bixwînin, wê bizanibin ku Melayê Cizîrî helbestvanekî navdar ê kurdan e û di nav kurdan de yekî bi nav û deng e.

**Tablo 2: Tabloya Navdarên Kurd**

Jimar	Navdarên Kurd	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Rengîn û Xemgîn (Seîdê Kurdî)	Xelîl Amed	37	23	Çiriya Pêşîn, 1995
2	Rengîn û Xemgîn (Evdilmelîk Firat)	Xelîl Amed	39	30	Çileyaya Pêşîn, 1995
3	Bapîrê Me Ehmedê Xanî	Rojbîn Özkan	108	92	Havîn, 2009
4	Melayê Cizîrî	Rojbîn Özkan	109	92	Payîz, 2009

### 2.2.3. Exlaq

Di gelek civakan de exlaq nixke taybet e û ferdên wê civakê jiyana xwe li gor rê û rêbazên exlaqê saz dikin. Tiştê heke di civakê de bê qebûlîkirin û bê hezkirin ew tişt ji hêla exlaqê ve baş e, heke neyê pejirandin jî ew tişt nebaş e û divê neyê kirin. Di ferhenga tirkî de exlaq wiha tê pênasekirin: “Di nav civakê de qayde û tevgerên

<sup>326</sup> Rojbîn Özkan, “Şexsiyetek Melayê Cizîrî”, *Nûbihar*, j.109, Payîz 2009, r. 92

ku mirov mecbûr in li gor wan qaydeyên ku hatine eşkerekirin tevdbigerin re tê gotin.”<sup>327</sup>

Ali Gurbetoğlu jî dema di kovarên tirkî yên zarokan de behsa exlaqê dike dibêje ku tişt û tevgerên zirarê didin kesan û civakê ji hêla exlaqê ve tevgerên nebaş tên hesibandin û wiha dibêje: “...Zarokên ku ji bo civakê hene û ji bo civakê têne perwerdekirin divê nixê erênî û tevgerên baş pêşkeşî civakê bikin, divê li ser civakê nebin bar. Ji ber vê, tevgerên ku divê neyên kirin yek bi yek ji zarokan re bînin gotin û ew bînin perwerdekirin. Ev jî xebata perwerdeyê ya exlaqê ye.”<sup>328</sup>

Rêvebir û nivîskarên kovara Nûbiharê jî ji ber ku girîngiyê didin dîn û exlaqê, di beşa zaroknameyê de ev mijar di çarçoveya dînê îslamê de derxistine pêş. Di gelek nivîsan de ev mijar rasterast nehatibe gotin jî, di hevokan de bi awayekî veşartî behsa başbûn û xirabiyê, sebirkirinê, durustbûnê, alîkariyê û h.w.d. hatiye kirin.

### 2.2.3.1. Rûpelek Ji Dîroka Îslamê

Mijareke ku behsa tevger û exlaqê Hz. Omer dike ji bo zarokan hatiye nivîsandin ku mirov dikare vê di bin beşa exlaqê de nîşan bide. Di hejmara 56emîn de ji bilî navê Xelîl Amed, Rojbîn Özkan û Sabah Kara yên ku me heta niha wek nivîskarên zaroknameyê behsa wan kiribû, navê kesekî din, navê Nûbar Asan balê dikşîne. Di vê hejmarê de nivîseke Nûbar Asan a ku behsa meseleyeke ji dewra Hz. Omer dike hatiye weşandin. Di nivîsa ku serenava wê “Rûpelek Ji Dîroka Îslamê” de tê gotin ku rojekê Hz. Omer derdikeve ser mînberê ku xutbê bide. Lê sehabeyek dibêje ku ew naxwaze wî guhdar bike. Sedema nexwestina xwe jî wiha eşkere dike:

“Hz. Omer:

- Hûn çima guhdariya min nakin?

Wî zîlamî awanî dest bi gotinên xwe kir:

- Lewra, pirtiyen (qumaş) ku di herbê de ji me re xenîmet mabûn, encax qasê kincekî te li me belav kir ji wî pirtiyî. Ji te re jî kincekî dirêj (fistanek) derketiye, xuyaye ku te ji xwe re zêde girtiye. Wê demê, lawê îmam Omer Ebdillah di nav civatê de rûniştibû.

Xelîfe Omer hemen bangê lawê xwe Ebdillah kir:

<sup>327</sup> *Türkçe Sözlük*, r. 54

<sup>328</sup> Gurbetoğlu, II. *Meşrutiyet Döneminde Yayımlanan Çocuk Dergilerinin Eğitim Açısından İncelenmesi* (1908-1918), r. 354

- Rabe lawê min, rastiye tu bibêje!

Ebdillah rabû û rastiya hedîsê got:

- Gelfî civatê! Min bi şexsê xwe pirtiyê ku li para min ketibû, da bavê xwe. Wî jî herdu perçe yek kir, û bihev ve dirût; loma ev kinca jê re derketiye.

Li ser ve şîrovê ew sehabeyê îfrazkar:

- Belê ey xelfeyê mislimanan! Madem hedîse bi rastî ev e, emê jî vê gavê guhdariya te bikin, dibêje û bi dilekî rehet li cihê xwe rûdine.”<sup>329</sup>

**Peyam:** Di vê nivîsa ku Nûbar Asan nivîsandiye de tê dîtin ku Hz. Omer mirovekî biexlaq e. Pozbilindiyê, quretiyê nake û nabêje “ez xelfe me tu mecburî guhdariya min bikî”. Bi sebr tevdigere û guh dide mêrik û li derdê wî godarî dike. Xala duyem jî ew e ku ew her çendî xelfe be jî, xwedî edaletê ye û qumaşê xenîmetê li gor edaletê wekhev parve kiriye. Tiştê girîng a din jî ev e ku; ew kesekî durûst e, lê dîsa jî dibe ku şik bikeve dilê mirovan. Ji ber vê yekê kurê xwe dide axaftin da ku mijar zelaltir bibe.

Wek ku tê dîtin, mijarên wek sebr, edalet, dilnîzmî û duristbûn yanê mijarên exlaqê bi mijareke jiyana sehabeyan ve ji bo zarokan hatiye vegotin. Li gor asta zarokan dibe ku nivîseke hêsantir bihata hilbijartin, lê dîsa jî mirov dikare bibêje ku nivîskar hewl daye haya zarokan ji exlaq û dîn hebe.

**Tablo 3: Tabloya Nivîsên Der barê Exlaqê de**

Jimar	Exlaq	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Rûpelek Ji Dîroka Îslamê	Nûbar Asan	56	29	Gulan 1997

#### 2.2.4. Perwerdeya Dînî

Di civaka kurdan de dîn û exlaq girîng in û kurdên bawermend dixwazin zarokên xwe li gor van nirxan mezin bikin. Kovara Nûbiharê ji ber ku bi armanc û nêrîneke îslamî dest bi weşanê kiriye, di beşa zaroknameyê de jî ev nêrîn gelek caran

<sup>329</sup> Nûbar Asan, “Rûpelek Ji Dîroka Îslamê”, *Nûbihar*, j. 56, Gulan 1997, r. 29

derdikeve pêş. Mijarên zaroknameyê, zimanê ku hatiye bikaranîn, peyamên ku hatine dayîn bi eşkere nîşan dide ku rêvebirên kovarê xwestine perwerdeyeke dînî bidin zarokan.

Ji bo vê jî di gelek nivîsan de mijarên hatine hilbijartin dînî ne. Di van nivîsan de behsa hebûna Xwedê, dînê îslamê, pêxamberan, meha remezanê û rojgirtinê, sehabeyan û h.w.d.. hatiye kirin.

#### **2.2.4.1. Pûtên Bêxêr û Bêkêr**

Xelîl Amed di hejmara 8emîn a Nûbiharê de bi serenava “Pûtên Bêxêr û Bêkêr” çîrokeke kin a ku ji rûpelekê pêk tê di beşa Zaroknameyê de nivîsandiye. Di nivîsê de behsa sehabe Eba Zer tê kirin. Tê gotin ku Eba Zer rojekê bi pûtperestan re diaxive û her kes bi dorê behsa pûtê xwe dike. Dema dor tê Eba Zer, dibêje ku rojekê wî tasek şîr biriyê daye li ber pûtê xwe, lê put şîr venexwariye. Paşê kûçikek hatiye wir, şîr vexwariye û dû re jî di ser serê pût de mîstiyê. Eba Zer ji cimaetê re dibêje dema ku wî dîtiye pût nikare tiştêkî bi kûçik bike, hema gihîştîye pûtê xwe perçe perçe kiriye. Pişt re jî dînê îslamê qebûl kiriye. Eba Zer paşê li cimaeta pûtperestan dizivire û dibêje “ew pûtê bêxêr û bêkêr çima nikare ku xwe biparêze?” Li ser vê pirsê û axaftinê hin pûtperest dev ji pûtperestiyê berdidin û dînê îslamê qebûl dikin.<sup>330</sup>

**Peyam:** Ev nivîs her çiqas bi hevoka “Zarokên delal” ve dest pê bike jî, ne li gor asta zarokane. Mijara ku hatiye hilbijartin, zimanê ku hatiye bikaranîn û wêneyê ku hatiye xêzkirin ve li gor asta zarokan nivîseke pir giran e. Armanc ew e ku zarok dînê îslamê hîn bibin û pûtperestiyê wek tiştêkî bêkêr qebûl bikin. Lê rê û rêbazeke din bihata bikaranîn û zimanekî hêsan ji bo zarokan bihata hilbijartin dibe ku zarokan rehetir mijar fêhm bikin.

#### **2.2.4.2. Meha Remezanê**

Di dînê îslamê de misilman salê sî rojan sibê heta êvarê tu tiştî naxwin û venaxwin. Li gor rojên din di kirin û axaftinên xwe de pir hesas tevdigerin û gelek qenciyan dikin. Ji vê mehê re dibêjin “meha remezanê”. Di hejmara 108emîn de

---

<sup>330</sup> Xelîl Amed, “Pûtên Bêxêr û Bêkêr”, *Nûbihar*, j. 8, Gulan 1993, r. 27

amadekara beşa “Nûbihara Biçûkan” Rojbîn Özkanê behsa meha remezanê kiriye. Di nivîsa ku serenava wê “Meha Remezanê” de Özkan ji zarokan re wiha dibêje:

“Zarokên delal!

Xwedê, her sal mehekê rojgirtin li me ferz kirîye. Ev meh, meha Remezanê ye. Xwedê te’ala weha emir dike: “Gelî bawermendan! Rojî li ser we bivênevê hatiye nivîsandin.” \*Rojî di wextê îmsaqê de destpêdike, dema roj biçê ava bi dawî dibe. Îmsaq destpêka berbangê ye. Di vê mabeynê de tu tişt ne tê xwarin û ne jî tê vexwarin. Heta ev meha bi dawî be ev rewş wisa dubare dibe. Di vê meha pîroz de, Xwedê mumînên rastîn dibexşîne û wan ji dojhê azad dike. Misilman di vê mehê de rojî digre û tu tengasiyekê nade kesî. Gotineke xirab ji kesî re nabêje û dawiyê Xwedê wî dibexşîne û wî bi evdên xwe ên baş re dike buhiştê.

Sûretê Beqere: 183<sup>331</sup>

Di binê vê nivîsê de wêneyeke biçûk a ku tê de mizgeftek û bi tîpên erebî ve nivîseke erebî hatiye nivîsandin heye. Di wêne de mizgefteke ku şeş mînareyên wê hene xuya dike. Îhtimaleke mezin ev mizgefta Siltan Ehmed a ku li Stenbolê ye. Ev nivîs rasterast nivîseke dînî ye û ji bo perwerdekirina dînî hatiye nivîsandin. Zimanê nivîsê zelal e û mijar bi kurtasî hatiye vegotin. Li gorî hevokên kin û şêwaza gotinê ve mirov dikare bibêje ku ev li gor asta zarokan e.

#### **2.2.4.3. Nûh Pêxember û Çiyayê Cûdî**

Di hejmara 110emîn a kovarê de Rojbîn Özkan behsa Nûh pêxember û Çiyayê Cûdî dike. Piştî nasandina çiyayê Cûdî, destnîşan dike ku keştiya Nûh pêxember li ser vî çiyayî sekiniye. Özkan ji zarokan re dibêje ku di Qur’anê de jî (Hûd/44) behsa çiyayê Cûdî tê kirin û wiha dewam dike:

“Gelo Nûh pêxember kî ye?

Nûh pêxember; ji hêla Xwedayê Teala ve ji bo ku qewmê xwe ji reşayîyê xelas bike hatiye wezîfedarkirin. Lê mixabin qewmê wî pê bawerî neaniye û dev ji pûtperestiya xwe bernedaye. Piştî ku qewmê Nûh pêxember guh neda peyama ku wî anîbû, wî jî Xwedayê mezin arîkarî xwest. Û wiha got: “Ya Rebbî! Bi rastî jî qewmê min ez

<sup>331</sup> Rojbîn Özkan, “Meha Remezanê”, *Nûbihar*, j. 108, Havîn 2009, r. 92

derewandim. Êdî hukmê di navbera min û wan de tu bide. Min û yên digel mîn xilas bike.” (Şû’era: 117-118)

Xwedayê Teala duayê Nûh (e.s.) qebûl kir û lê ferman kir ku keştiya azadiyê çêke.

Nûh (e.s) keştî çêkir. Piştî baraneke pir zêde bariya ku ew yek ‘elametê’ ezab bû.

Kesên ku bawerî bi Nûh pêxember anîn li keştiyê siwar bûn û gihîştin xelasiyê. Ên ku bawer nekirin û înkâr kirin jî di nav avê de xeniqîn.

Piştî ku qewmê zalim xeniqîn, av vekîşiya û keştiya Nûh pêxember li ser çiyayê Cûdî rawestiya. Ji ber vê bûyerê navê bajarê Şîrnexê wek “Şarênûh” tê bikaranîn.”<sup>332</sup>

**Peyam:** Wêneyê Çiyayê Cûdî jî li jora nivîsê hatiye weşandin. Li vir hezkirina pêxemberan û bawerkirina Xwedê derdikeve pêş. Rasterast şîret tê kirin ku divê mirov bi Xwedê bawer bike, heke mirov bawer neke, dibe zalim û cezayê xwe dikşîne.

**Tablo 4: Tabloya Nivîsên Der barê Perwerdeya Dînî de**

Jimar	Perwerdeya Dînî	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Pûtên Bêxêr û Bêkêr	Xelîl Amed	8	27	Gulan, 1993
2	Meha Remezanê	Rojbîn Özkan	108	92	Havîn, 2009
3	Nûh Pêxember û Çiyayê Cûdî	Rojbîn Özkan	110	91	Zivistan, 2010

### 2.2.5. Gotinên Pêşyan

Li cihanê di gelek civakan de hin gotin hene ku ew der barê çand, edet, dîn, dîrok û civakê de agahiyê di xwe de dihewînin. Ji ber ku mezinan li gor tecrubeyên xwe ev tişt gotine ji wan re dibêjin gotinên pêşyan. Gotinên pêşyan ji ber mijarên cuda hatine gotin û ji nîşekî derbasî yên din dibin. Mirov bi saya van gotinan kêr,

<sup>332</sup> Rojbîn Özkan, “Nûh Pêxember û Çiyayê Cûdî”, *Nûbihar*, j. 110, Zivistan 2010, r. 91



an jî zêde der barê wê civakê de dibe xwedî agahî. Ji ber vê jî gotinên pêşiyên gelekî girîng in.

Amed Tîgrîs dibêje ku ji bilî peyva gotinên pêşiyên, kurd ji gotinên pêşiyên re dibêjin “gotinên mezinan”, “peyvên pêşiyên”, “gotinên bav û kalan”, “metelokên kurdî,” û “pendên kurdî”. Tigrîs wiha behsa girîngiya gotinên pêşiyên dike:

“Ew berhemên kolektîv ên hezar salan in. Dîrok, felsefe û sosyolojiya civatê ne. Bi zanebûna gotinên pêşiyên mirov di derbareyê çanda xwe ya kevn de serwest û zane dibe. Di axaftinê de bikaranîna gotinên pêşiyên, axaftina mirov xurt dike, dixemilîne û tesirê li ser guhdaran dihêle. Herweha di nivîsaran de jî rola gotinên pêşiyên wek ya devkî girîng e. Caran gotineke pêşiyên ji hezar gotinên normal kurtir, hêjatir û berbiçavtir e.”<sup>333</sup>

Ji bo gotinên pêşiyên zazakî jî çend versiyonên bikaranîn. Hasan Çiftçi dema behsa gotinên pêşiyên dike wiha dibêje;

“Her çiqas zaza ji hêla nivîsê ve xwedî çandê xurt û bihêz nebin jî, ji bo gotinên pêşiyên têgehên cuda bi kar tînin. Yê ku der barê vê mijarê de maqale an jî pirtûkan dinivîsin gelemperî ji bo gotinên pêşiyên zazakî dibêjin pîltavik (gotinên mezinan). Ev peyv vatêpîlan: kurtkirina gotinên mezinan e û beropaş hatiye kirin ku li gor min peyveke çêkiriye û ez ne bawerim ku di nav gel de tê bikaranîn. Gotinên wek gîseyverênan (gotinên pêşiyên/mezinan), vatena verênan (gotinên pêşiyên/mezinan) tê bikaranîn.<sup>334</sup> Zazayên Dersimê *qese ve qesêvrênu*<sup>335</sup> (şiklê kitêbî *qesêverînân*: gotinên pêşiyên) bi kar tînin. Mela Mehmûdê Bazidî yê ku di salên 1850an de berhema ‘Âdât û Rusûmâtname-ê Ekrâdiyye’ nivîsandiye peyva meselê<sup>336</sup>, Abdurrahman Durre<sup>337</sup> û

<sup>333</sup> Amed Tîgrîs, *6762 Gotinên Pêşiyên*, Weşanên Rewşen, Gulan 2001, Stockholm, r. 1

<sup>334</sup> Roşan Hayig-Brigitte Werner, *Zazaca-Türkçe Sözlük-Türkçe-Zazaca Sözcük Listesi*, Tîj Yayıncılık, İstanbul 2012, r. 325, vgz. Hasan Çiftçi, Ortak Atasözlerinin Hikâyeleri: Farsî-Kurmancî-Zazakî 1, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, j. 3, Bingöl 2016, r. 11

<sup>335</sup> Zîlfî Selcan, *Qese u Qesê Vrênu Leksikon*, Tunceli Üniversitesi Yayını, Dersim, 2013, r. 3

<sup>336</sup> Peyva مەسلەکی him wek *meselekî* û him jî wek de *meselkî* dikare bê xwendin. Nivîskar li cihêkî wiha dibêje: “Lewrânî dî nivâ Ekrâdân ewê **meselekî/ meselkî** meşhur e kû *Şerê kopekân li ser dêlân in.*” Mela Mehmûdê Bâyezîdî, *‘Âdât û Rusûmâtname-ê Ekrâdiyye*, Jan Dost, Nûbihar Yayınları 2012, r. 13, vgz. Çiftçi, h.g, r.11

<sup>337</sup> Abdurrahman Durre, *Şerha Dîvana Ehmedê Xanî; Felsefe û Jiyana Wî*, Avesta, Stenbol 2002, r. 48, 263, 361. vgz. Çiftçi, h.g, r.11

kurdologên mezin yê wek Ordîxanê Celîl<sup>338</sup> jî peyvên mesel, meselok û metelokê bi kar anîne.”<sup>339</sup>

Kurd ji gotinên pêşiyên hez dikin û zimanê kurdî jî ji hêla gotinên pêşiyên ve gelekî dewlemend e. Lê dema em li zaroknameya Nûbiharê dinihêrin, tê dîtîn ku hejmara gotinên pêşiyên li gor cureyên din pir kêmtir in. Di beşa zaroknameyê ya hejmara 36emîn de sê gotinên pêşiyên bi hev re hatine weşandin. Ew gotinên ku ji hêla gelek kurdan ve tên zanîn wiha hatine rêzkirin;

“Şêr şêr e, çî jin e, çî mêr e.

Kurmê darê ne ji darê be dar narize.

Giya di bin kevir de namîne.”<sup>340</sup>

**Peyam û Şîrove:** Di gotina pêşiyên a ewil de tê gotin ku girîngî û qîmeta mirovan ne li gor zayenda wan, wek şêran li gor jîrbûn û çalakkîna wan e. Yanê qîmet ne mêrbûn an jî ne jinbûn e, tiştên din vê astê diyar dikin. Gotina pêşiyên a duyemîn ya ku dibêje “Kurmê darê ne ji darê be, dar narize.” di nav kurdan de pir navdar e. Di vê gotinê de agahiyek, tecrubeyek heye. Dema ku kurd hevdu rexne dikin, an jî ji hêla siyasî ve dixwazin hevra bûn û yêkîtiyek çêbibe vê gotinê dibêjin ku tesîrê li ser hevdu bikin. Yanê dibêje heke di hundir de qelsiyek, îxanetek, nebaşiyek çênebe, ji derva ve zû bi zû tu tiştêk zirarê nade mirov.

Di alemê de baş an jî xirab tu tişt weşartî namîne. Di gotina pêşiyên a dawîn de jî tê gotin ku tiştêk çiqas xurt û bihêz xuya bike jî, tiştêkî din an jî kesekî din ê ji wî xurttir nahêle ku ew tişt wisa di cihê xwe de bisekine û neyê bihîstin, rastiye derdixe holê. Gotinên pêşiyên ên ku di vê hejmarê de hatine hilbijartin li gor asta zarokan e û dikare bi rehetî tesîrê li ser wan bike. Zarokên ku van gotinan hîn bibin û di axaftina xwe de bi kar bin wê bibin xwedî zimanekî şêrîn û axaftina wan jî wê dewlemend bibe.

<sup>338</sup> Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl, *Zargotina K'urda*, Moskova 1978, II, r. 358, vgz. Çiftçi, h.g. r.12

<sup>339</sup> Hasan Çiftçi, Ortak Atasözlerinin Hikâyeleri: Farsî-Kurmancî-Zazakî 1, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, j. 3, Bingöl 2016, r. 9

<sup>340</sup> “Gotinên Pêşiyên”, *Nûbihar*, j. 36, Îlon 1995, r. 25

### 2.2.5.1. Şêr şêr e, çi jin e, çi mêr e

Gotina pêşiyana a “Şêr şêr e, çi jin e, çi mêr e” cara duyem di beşa zaroknameyê de derdikeve li hember zarokan. Vê carê di pêkenokeke Xoceyê navdar de derbas dibe. Di hejmarên 41 û 42emîn ên ku herdu bi hev re hatine weşandin de, Xelîl Amed pêkenokê bi serenava “Şêr şêr e, çi jin e, çi mêr e” nivîsandiye ku ev serenav rasterast gotineke pêşiyana a kurdan e.

Di vê pêkenokê de rojekê cîranekî Xoce jê dipirse ku duh êvarê qerebalixek ji mala Xoce hatiye, gelo mesele çi bûye? Xoce dibêje ku jina wî gotiye ka cubbê xwe derxe ku ew ê bişo, lê wî dernexistiye. Jina Xoce û Xoce hev birine û anîne, di dawiyê de jina Xoce ew avêtiye derve. Dema Xoce meseleyê wisa zelal dike, cîranê wî ji Xoce bawer nake û ji wî re wiha dibêje:

“Ma Xwedê ji te razî be xoce, tu zarokan dixapîni çi ye. Ma ev cube cubekî çawa ye ku ewqas deng jê dihat.

Xoce: Kuro dirêj meke, dema jina min cubê min avêt derve ez jî di nav de bûm.

Cîran: Heh, heh, heh, tu b'Xwedê, anîha jina te tu j'malê avêtî derve. Ez ditirsim li ser vê li te xistibe.

Xoce: Erê kuro erê, wellehî li ser de û min jî xist. Ez çi bikim. “Şêr şêr e çi jin çi mêr e.”<sup>341</sup>

**Peyam û Şîrove:** Ev pêkenoka ku serenava wê gotineke pêşiyana e, bi wêneyekî ve hatiye xemilandin. Di wêne de Xoce û cîranê wî li hember hev sekinîne û diaxivin. Kesê ku ev wêne xêz kiriye jî Xelîl Dost e. Dema zarok vê bixwînin him wê bikenin û him jî wê bikaribin gotineke pêşiyana a kurdan hîn bibin. Lê bi henek be jî ji ber ku behsa şêrê jin û mêran dike, dibe ku tesîreke neyînî li ser zarokan bike.

### 2.2.5.2. “Keda Helal Dibe Mû Naqete, Keda Heram Bibe Werîs Jî Diqete”

Di civaka kurdan de mirov dikare bibêje ku bi hezaran gotinên pêşiyana hene. Lê ji wan hinek li gor yên din zêdetir tên zanîn. Gotinên pêşiyana her yek xwedî meneyekê ye û ji ber sedemekî hatine vegotin. Ji wan hinek rasterast şîretan didin ku

<sup>341</sup> Xelîl Amed, “Şêr şêr e çi jin çi mêr e”, *Nûbihar*, j. 41/42, Sibat/Adar 1996, r. 30

yek ji wan jî di hejmara 110an de hatiye nivîsandin. Rojbîn Özkan bi serenava “Gotinek pêşiyar” de behsa gotina pêşiyar a “Keda helal dibe mû naqete, keda heram bibe werîs jî diqete” dike.

Özkan ewil dibêje ku gotinên pêşiyar serboriyên bav û kalan in, şîretan didin mirovan û pişt re vê gotinê ji zarokan re şîrove dike. Özkan balê dikêşe li ser rizqê helal û bereketa wê û dibêje rizqê heram çiqas zêde be jî, xilas dibe. Ji bo ku zarok der barê têgeha helal û heramê de bibin xwedî agahî paşê wiha behsa helal û heramiyê dike:

“Helal û heram çî ne? Helal ew tişt e ku dîne me di kirinê wî de tu mehzûrê nabîne û destûra wî dide ye. Lewra Xwedê di Qur’ana pîroz de wiha ferman dike: “Evdên min! Ji tiştên li ser erdê ên paqij û ên helal bixwin.” (Beqere:168)

Heram jî ew tişt e ku li dijî dîne me be; wek mînak dema ku em li hemberî dê û bavê xwe werin, an em zirarekê bidin malê yekê/î, an jî em xeybeta yekê/î bikin, an jî derewan bikin.

Ji boy çî em xwe ji heraman diparêzin? Xweda ji mirovan gelek hez dike û dixwaze em bextewar bijîn. Lewra bi qasîdiya pêxemberan, ji me re fermanên xwe ragîhandine. Û xwestiye em wan fermanan bi cih binin.

Tiştên ku Xwedê ji me re qedexe nekiriye tiştên rast û baş in. Ên qedexekirî tiştên nebaş û xirab in. Divê em jî di jiyana xwe de her tim bi keda helal debara xwe bikin û ji keda heram dûr bisekinin.<sup>342</sup>

**Peyam û Şîrove:** Nivîskarê him xwestiye ku zarok vê gotinê hîn bibin û him jî di vê nivîsê de rasterast perwerdeyeke dîni û şîret daye zarokan. Ji bo ku mijar zelal bê fêmkirin zimanek hêsan û hevokên kurt bi kar aniye ku ev jî ji bo asta zarokan pir muhîm e.

Em dikarin bibêjin ku di beşa zarokan de bi giştî 5 gotinên pêşiyar hatine nivîsandin. Ji van yek heman gotine (şêr şêr e, çî jin e çî mêr e) û du caran hatiye nivîsandin. Zimanê kurdî ji hêla gotinên pêşiyar ve her çiqas dewlemend be jî, kovar ji vê hêlê ve qels maye, ev kêmasiyek e. Zarok çiqas zêde gotinên pêşiyar hîn bibin,

---

<sup>342</sup> Rojbîn Özkan, “Gotinek Pêşiyar”, *Nûbihar*, j. 110, Zivistan 2010, r. 92

zimanê wan dewlemend dibe û ew der barê kelepura gel û civaka xwe de dibin xwedî agahî.

**Tablo 5: Tabloya Gotinên Pêşyan**

Jimar	Gotinên Pêşyan	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Şêr şêr e, çî jin e çî mêr e. Kurmê darê ne ji darê be dar narize. Giya di bin kevir de namîne.	-	36	2 5	Îlon, 1995
2	Şêr şêr e çî jin çî mêr e	Xelîl Amed	41 42	3 0	Sibat/Adar, 1996
3	Gotinek Pêşyan	Rojbîn Özkan	11 0	9 2	Zivistan, 2010

### 2.2.6. Gotinên Navdaran

Di her civakê de kesên bi nav û deng û rûspî hene. Civak qedrê van kesan digre, gotinên wan ji xwe re dike rê û rêbaz û guh dide şîretên wan. Ji gotinên wan re dibêjin “gotinên navdaran”. Li gor ferhenga tirkî pênaseya gotinên navdar wiha ye: “Gotina ku ji bo fikr, hest û an jî rêbazekê bi awayekî kin û eşkere bibêje ji hêla kesekî ve hatiye gotin û gelek caran tê zanîn ku ew ji hêla kî ve hatiye gotin. Wecîze, ulger, kelama kibar, aforîzm, motto.”<sup>343</sup>

Ev gotin dibe ku ji hêla helbestvanekî, nivîskarekî, pêxemberekî, fîlozofekî an jî rûspiyekî civakê ve hatibe gotin.

#### 2.2.6.1. Ew kesê ku tiştêkî ji bo xwe bixwaze, lê ji bo birayê xwe nexwaze, baweriya wî nîn e

Di hejmara 34 û 35an a ku du meh bi hev re hatine weşandin de, du gotinên navdaran hatine weşandin. Ji wan yek gotina Hz. Mihemed e. Di vê hejmarê de ev

<sup>343</sup> *Türkçe Sözlük*, r. 1866

gotin wiha hatiye nivîsandin: “Ew kesê ku tiştêkî ji bo xwe bixwaze, lê ji bo birayê xwe nexwaze, baweriya wî nîn e.”<sup>344</sup>

**Peyam:** Ev gotina Pêxember ji bo zarokan hatiye hilbijartin ku zarok hînê vê tiştê bibin; dema ew tiştêkî ji bo xwe bixwazin divê ew heman tiştê ji bo hevalên xwe jî bixwazin. Divê ew nebejin “ez”, “bi tenê ez”. Başiyê ji bo xwe jî bixwazin, ji bo kesên din jî.

### 2.2.6.2. Ez bê nan dikarim bijîm, lê ez nikarim bê azadî bijîm

Dîsa di hejmara 34 û 35an a ku du meh bi hev re hatine weşandin de, gotineke kesekî din hatiye weşandin ku ev gotineke Seîdê Kurdî ye. Seîdê Kurdî wiha dibêje: “Ez bê nan dikarim bijîm, lê ez nikarim bê azadî bijîm.”<sup>345</sup>

**Peyam:** Bi vê gotina Seîdê Kurdî ve girîngiya azadiyê hatiye destnîşankirin. Ji bo zarokan dibe ku peyva azadiyê û girîngiya wê hinekî ne hêsan be, lê amadekarên vê beşê ev gotin ji bo wan weşandine ku bila haya wan azadiyê hebe.

### 2.2.6.3. Xebat bikin roj û şev, şûr û qelem digel hev

Di hejmara 45an de jî gotineke helbestvanê kurd Cegerxwîn a ku dibêje;

“Xebat bikin roj û şev,

Şûr û qelem digel hev”<sup>346</sup> hatiye nivîsandin.

**Peyam:** Di vê hejmarê de gotina helbestvanekî navdar hatiye hilbijartin. Cegerxwîn di nav kurdan de baş tê nasîn û armanc ew e ku zarok him navê wî bizanibin û him jî gotina wî bikeve hişê zarokan. Vê gotinê ve ji zarokan re behsa girîngiya xebat û xwendinê hatiye kirin. Lê peyva “şûr û qelem” dibe ku ne li gor asta zarokan be.

<sup>344</sup> “Gotinên Navdaran”, *Nûbihar*, j. 34-35, Tîrmeh-Tebax 1995, r. 46

<sup>345</sup> H.r

<sup>346</sup> Cegerxwîn, “Xebat bikin roj û şev, şûr û qelem digel hev”, *Nûbihar*, j. 45, Hezîran 1996, r.

#### 2.2.6.4. Gotineke Xweş

Di hejmara 109an de Rojbîn Özkanê di bin banê “Nûbihara Biçûkan” de gotineke Hz. Elî nivîsandiye. Serenava gotinê wek “Gotineke Xweş” hatiye nivîsandin. Hz Elî wiha dibêje: “Zanîn însên dike xwedî şeref. Însanên zana meşale ne ku riya heqîqetê rohnî dikin. Nemiriya însên di zanînê de ye. Însan bimire jî, zanîn dê heta hetayê her bijî.”<sup>347</sup>

**Peyam:** Bi vê gotina Hz. Elî ve jî peyam ji zarokan re hatiye dayîn ku zanîn şeref e. Ji bo zanabûnê divê agahî û xebat hebe.

**Tablo 6: Tabloya Gotinên Navdaran**

Jimar	Gotinên Navdaran	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Hz. Mihemed, Seîdê Kurdî	-	34 35	46	Tîrmeh- Tebax, 1995
2	Cegerxwîn	-	45	30	Hezîran, 1996
3	Gotineke Xweş (Hz. Elî)	Rojbîn Özkan	109	92	Payîz, 2009

#### 2.2.7. Cihên Dîrokî

Hînbûna erdnîgariyê û cihên dîrokî ji bo zarokan girîng e. Divê der barê nexşe, bajar û navçe, cihên dîrokî û girîng de agahî ji biçûkan re bî dayîn. Di Nûbiharê de ji vê hêlê ve kêmasiyek mezin heye, lewra bi tenê du hejmaran de behsa cihên dîrokî hatiye kirin. Nivîskar û amadekarên beşê dikaribûn behsa deşt, zozan, çiya, gol, behr û bajarên kurdan û welatên din ên ku li cihanê navdar in bikirana. Beşa zarokan ji vê hêlê ve qels maye.

<sup>347</sup> Rojbîn Özkan, “Gotineke Xweş,” *Nûbihar*, j. 109, Payîz 2009, r. 92

### 2.2.7.1. Pira Malabadî

Behsa cihekî dîrokî yekem car di hejmara 107emîn de tê kirin. Rojbîn Özkanê bi serenava “Zarokno Hûn Bi Vêna Dizanin?” nivîseke kurt ji bo zarokan nivîsandiyê. Serenava nivîsê pirsek e. Ev ji bo ku balê bikêşîne metodeke baş e. Di nivîsê de behsa cihekî dîrokî tê kirin. Özkanê behsa Pireya Malabadî ya di navbera Farqîn û Batmanê de ye kiriye û wiha dibêje:

“Pira Malabadî pireke navdar û kevnar e. Ev pire di sala 1147an de hatiye çêkirin. Dirêjahiya wê 150m. Firehiya wê 7 m. û bilindahiya wê 19 m. ye. Pire bi kevirên rengîn hatiye hunandin û di dinê de di nav pirên ji kevirên birî de xwediyê kemberên herî fireh e. Di navbera herdu kelekên kemberê de du menze hene û ji 5 çaviyan pêk tê. Firehiya kembera pirê 10 m. û ji nivê kemberê bilindahî jî 20 m. ye. Bi van pîvanan, pire dikare qubbeya Ayasofyayê bi hêsanî di xwe de veşêre. Ev pira dîrokî di navbera Farqîn û Batmanê de ye.”<sup>348</sup>

Piştî van agahiyên di bin nivîsê de wêneyeke piyeyê ya biçûk jî hatiye weşandin ku zarok bibînin ka ev piyeyê çawa ye.

**Peyam:** Ji zarokan re behsa piyeyê dîrokî hatiye kirin ku bila haya wan ji hawîrdora wan hebe û ew bala xwe bidin rê, pire, avahî û cihên din ên dîrokî.

### 2.2.7.2. Medreseya Sor

Di hejmara 109emîn a Nûbiharê de Rojbîn Özkan dîsa di bin beşa “Nûbihara Biçûkan” de cihekî dîrokî ya din, bi zarokan daye nasîn. Ev cih medreseya ku Melayê Cizîrî ders daye Medreseya Sor e. Wêneyekî biçûk li kêleka çepê ya nivîsê hatiye weşandin. Özkan wiha behsa Medreseya Sor dike: “Di serdema Mîrîtiya Cizîrê de ji hêla Serefxanê II. Hatiye çêkirin. Agahiyeke diyar di der heqê tarîxa çêkirina wê de tune. Di nava vê medresê de camiyek jî heye. Alim û şairê mezin Mela Ehmedê Cizîrî li vê medreseyê ders daye.”<sup>349</sup>

**Peyam:** Bi nasandina Medreseya Sor ve hewl hatiye ku zarok him der barê navderekî kurd Melayê Cizîrî de, him der barê medreseyên kurdan de û him jî der barê cihên dîrokî de bibin xwedî agahî.

<sup>348</sup> Rojbîn Özkan, “Zarokno Hûn Bi Vêna Dizanin?”, *Nûbihar*, j. 107, Bihar 2009, r. 127

<sup>349</sup> Rojbîn Özkan, “Medreseya Sor”, *Nûbihar*, j. 109, Payîz 2009, r. 92



**Tablo 7: Tabloya Cihên Dîrokî**

Jimar	Cihên Dîrokî	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Zarokno hûn bi vêna dizanin? (Pira Malabadî)	Rojbîn Özkan	107	127	Bihar 2009
2	Medreseya Sor	Rojbîn Özkan	109	92	Payîz 2009

### 2.2.8. Ceribandin

Ji bo ku zarok di jîyanê de hêla zanist û perwerdeyê ve xwe pêşva bibin, hin çarçûn hewce dike ku ceribandinan bikin. Kovar û pirtûkên zarokan divê ji vê hêlê ve dewlemend bin, lê mixabin bi gelemperî di vê mijarê de qels in û cih nadin ceribandinan. Di kovara Nûbiharê de jî heman tişt bûye, amadekarên beşa zarokan girîngî nedane vê mijarê û bi tenê di hejmarekê de ceribandinek hatiye weşandin.

Di hejmara 108emîn de Rojbîn Özkanê bi serenava “Ceribandin” ji bo zarokan nivîseke kurt nivîsandiye. Di vê nivîsê de Özkan ji zarokan re behsa ceribandineke bi avaya germ, sar û şîrogerm dike. Paşê ji zarokan re dibêje ku bila ew vê tiştê biceribînin. Özkan wiha dibêje:

“Sê şerbikên wek hev yekê bi avaya sar, yekê bi avaya kel û yek jî avaya şîrogerm tijî kin. Eynî qasê de destekî xwe têxin nav avaya kel û destê din jî têxin nav avaya sar. Paşê herdu destên xwe bi hev re têxin nav avaya şîrogerm. Hûnê tiştêkî balkêş bibînin. Destê ku ji nav avaya sar derketiye wê kel be, Ê jî nava avaya kel derketiye wê sar be.”<sup>350</sup>

Ji bilî vê ceribandînê, di kovarê de ceribandin tunene.

<sup>350</sup> Rojbîn Özkan, “Ceribandin”, *Nûbihar*, j. 108, Havîn 2009, r. 92

**Tablo 8: Tabloya Nivîsên Der barê Ceribandinan de**

Jimar	Ceribandin	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Ceribandin	Rojbîn Özkan	108	92	Havîn 2009

## 2.2.9. Ji Hêla Cûreyên Edebî Ve Naveroka Zaroknameyê

### 2.2.9.1. Çîrok

Çîrok yek ji cûreyê edebiyatê ye û zarok gelek jê hez dikin. Di dîrokê de demeke taybet a ku mirov bibêje di filan demê de çîrokan dest pê kiriye ne diyar e. Lê tişta ku tê zanîn ew e ku ji bo geşedan û perwerdeya zarokan çîrok di nav cûreyên edebiyata zarokan de xwedî cihekî taybet in.

Li gor ferhenga Oxfordê çîrok pênaseya mirov û bûyerên ne rast in.<sup>351</sup> Di ferhenga tirkî de jî çîrok di çanda devkî de cûreyek edebiyatê ye ku tê de mirov, heywan, dêw, pîrebok, cin û bûyerên nerêzê ne derbas dibin.<sup>352</sup>

A. Ferhan Oğuzkan çîrokan wek serpehatiyên ne ji rêzê ne destnîşan dike û wiha terfîf dike: “Bi gelemperî hikayetên xiyalî yên ku tê de mirov, bûyer û serpehatiyên ne ji rêzê ne derbas dibin, mirovan devkî ji hev hildane û ji nifşekî derbasî nifşên din kirine re dibêjin çîrok.”<sup>353</sup>

Kenan Bozkurt dema behsa çîrokên kurdan dike tîne ziman ku di zaravayê kurmançî de ji bo çîrokan “xebrojîk” an jî “xevroşîk”, di zaravayê soranî de jî çîrok tê bikaranîn.<sup>354</sup>

<sup>351</sup> Miranda Steel, *Oxford Wordpower Dictionary For Learners of English*, Oxford University Press, 2000, New York, r. 651

<sup>352</sup> *Türkçe Sözlük*, r. 1630

<sup>353</sup> A. Ferhan Oğuzkan, *Çocuk Edebiyatı*, Anı Yayıncılık, 6. Baskı, Ankara, Ocak 2000, r. 17

<sup>354</sup> Kenan Bozkurt, *Kürt Masallarının Yapısal Özellikleri, Kimlik, Kültür ve Değişim Sürecinde Osmanlıdan Günümüze Kürtler Uluslararası Sempozyumu*, Bingöl Üniversitesi Yayınları, 2013, r. 819

Necdet Neydim dibêje ku heta sedsala 18emîn sedsala ku roşenî (ronahîbûn, hişyarbûn) û pîşesazîbûnê dest pê kir, çîrokên bingeha edebiyata devkî ava dikirin pir girîng bûn û wiha behsa çîrokan dike:

“Di civakên feodal û pêşveneçûyî de çîrok wek armanceke perwerdeyê ya girîng hatine bikaranîn. Di Heyama Navîn de zarok û mezinan heman lîstik dileyîstin, xwedî heman pêlîstokan bûn û heman çîrok guhdar dikirin. Lê bi heyama ronahîbûnê ve ev tişt ji hev veqetiyên. Ev jî bi saya îcatkirina matbaayê ve çêbû.”<sup>355</sup>

Zarokên ku temenê wan di navbera 3 û 9an de ne zêdetir ji çîrokan hez dikin. Lê, ji ber ku çîrok xwedî zimanekî cuda ne, bûyerên ecêb di çîrokan de diqewimin, mekanê ku bûyer lê derbas dibin mekanên ecêb û bi raz in û qehreman kesên cuda ne, qasî zarokan mezin jî ji çîrokan hez dikin.

Hasan Guleryuz destnîşan dike ku çîrok ji bo zarokên pêşdibistanê û yê ku diçin polên 1,2 û 3an girîng e û wiha dibêje: “Ya rastî mirov çiqas kal û pîr dibin bila bibin, çîrok aliyê mirovan a zarokatiyê temsîl dike. Ji ber vê gotinên wek “zarokê ku di hundirê me de”, “çîroka ku di hundirê me de” û “hespa zarokatiya me” ‘alema me ya hundirîn nişan dide.”<sup>356</sup>

### 2.2.9.2. Taybetmendiya Çîrokên Zarokan

Çîrokên ji bo zarokan tîn gotin helbet ji hêla mijar, ziman û cureyan ve yê mezinan cudatir in. Dema zarokek bi tena serê xwe ji xwe re çîrokekê bixwîne, an jî dê, bav, mezin û mamosteyên wan ji wan re çîrokekê bixwînin, divê baldar bin. Lewra her çîrok ji zarokan re nayê gotin û nayê xwendin. Divê ev çîrok xwedî hin taybetmendiyan bin. A. Ferhan Oğuzkan taybetmendiyan çîrokên zarokan wiha rêz dike;

a. Bûyerên ku di çîrokê de derbas dibin divê zindî û biherket bin.

b. Zimanê çîrokê divê sade û vegotina wê jî herikbar be.

c. Di çîrokê de beşa ku çîrok pêşve diçe û mirov bûyerê meraq dike, divê bi serkeftî bê hunandin, divê bûyer bi encameke ku mirov nebendê ye ve biqede.

<sup>355</sup> Necdet Neydim, *Çocuk ve Edebiyat, Çocukluğun Kısa Tanımı, Edebiyatta Çocuk Figürleri*, Bu Yayınları, İstanbul 1998, r. 17

<sup>356</sup> Hasan Güleriyüz, *Yaratıcı Çocuk Edebiyatı*, Pegem Akademi Yayıncılık, Ankara, 2002, r. 194

d. Teswîr, tevgerên lehengan û tiştên ku leheng jê hez dikin divê bibe alîkar ku di zarokan de hesta başiyê û rindbûnê pêşve here.

e. Tiştên ku di çîrokê de tînin gotin car caran divê zarokan kêfxweş bike, wan bide kenandin û wan şa bike.

f. Çîrok ji hêla mijar û lehengan ve divê zarokan netirsîne û wan xemgîn neke.

g. Di çîrokê de tiştên ku zarokan ber bi teralbûnê ve bibe, wan bi tiştên bêkêr û qederperestiyê bide bawerkirin divê tune bin.<sup>»357</sup>

Mustafa Ruhi Şirin destnîşan dike ku zarok çîrokan hez dikin û bi lehengên çîrokê ve derdikevin rêwîtiya xiyalan û girîngiya çîrokan wiha fîne ziman:

“Çima çîrok di edebiyata zarokan de evqas li pêş e? Lewra çîrok rêwîtiyeke xiyalî ye. Zarok di heyama xwe ya xamabûnê de xiyalan ava dike û dixwaze bi wî hevalê/a xwe ya ku di xiyala xwe de avakiriyê re rêwîtiyê bike. Ev serpêhatiya zarokan a ku bi edebiyatê ve tê pêkanîn, hêza edebiyatê derdixe holê.<sup>»358</sup>

### 2.2.9.3. Cureyên Çîrokan

#### 2.2.9.3.1. Çîrokên Gelêrî

Çîrokên gelêrî cureyek çîrokan e ku kî gotiye, dema wê kingê ye û cihê ku bûyer lê qewimiye nayê zanîn. Hin kesan ev çîrok gotine, yê ku guhdar kirine jî ji kesên din re gotine û hema bi vî awayî heta roja me hatine. Ji ber ku metnek li holê tune, hin caran tişt li ser hatine zêdekirin, hin caran tê de xeletî û ecemîti çêbûne. Paşê hin kes rabûne ev çîrok derbasî nivîsê kirine. Ji ber vê, di nav hemû welatan de hinek guherîn tê de çêbibin jî ev çîrok tînin gotin.

Yalçın û Aytaş wiha behsa van çîrokan dikin: “Çîrokên gelêrî ji hêla gel ve hatine çêkirin. Di nav demê de mirovan bi devkî gotine, ji hevdu hildane û ev çîrok heta sedsala 19emîn hatine. Gelemperî di vê heyamê de derbasî edebiyata nivîskî bûne. Mijarên çîrokên gelêrî gelemperî sade ne.<sup>»359</sup>

<sup>357</sup> Oğuzkan, *Çocuk Edebiyatı*, r. 26

<sup>358</sup> Şirin, *Çocuk Edebiyatı Kültürü Okuma Alışkanlığı ve Medya Sarmalı*, r. 71-72

<sup>359</sup> Yalçın- Aytaş, *Çocuk Edebiyatı*, r. 69

### 2.2.9.3.2. Çîrokên Edebî

Çîrokên edebî jî wek çîrokên gelerî yek ji cureya çîrokan e. Li gor çîrokên gelêrî ev çîrok xwedî hunerekê ne. Lewra nivîskarê van çîrokan armancekê dide ber xwe û şûna vegotîneke sade, hevok û gotinên ku bi hunerê ve hatine xemilandin di çîrokê de bi kar tîne. Li gor armanc û xiyala xwe lehengan ava dike, bûyeran çêdike. Bi teswîran, zimanekî balkêş û xweş ve çîrokê dihûne û di dawiyê de digihêje encamê. A. Ferhan Oğuzkan van çîrokan wiha terîf dike;

“Çîrokên ku nivîskarê/a wê li gor xiyala xwe ew nivîsandiye û dişibin çîrokên gelerî, lê li gor wan ji hêla hunerê ve bêtir biqîmet in re dibêjin “çîroka edebî”. Lehengên van çîrokan gelek caran perî ne. Mijar ne rast in û bûyer li cihên ji dûrî rastiye ne (li welatên xiyalan) derbas dibin. Leheng her tim rastî rewşên ecêb tîne. Ji bo ku bûyer biqewimin an jî çareser bibin, tesîra fêlan, kehanetan, sêran, hêzên xwedî raz û derasayî di van çîrokan de tîne.”<sup>360</sup>

Nivîskarên ku îro ji bo zarokan çîrokên dinivîsin jî, zarokên ku îro dema xwe li dibistanan, kuçeyan an jî malê derbas dikin jî, ne wek berê ne. Ji ber ku teknoloji û înternet gelek pêş ketiye zarok wek berê nezan û saf nînin. Ji ber wê jî bo zarokên îro çîrok nivîsandin ne hêsan e.

Di çîrokan de peyv û hevokên tîne bikaranîn, zugotinok, dia, nifir, peyvên ji hev cudatir yê ku tîne gotin, agahiyên der barê edet û kevneşopên civakê de yê ku tîne behskirin û h.w.d. zarokan pêş ve dibin. Çîrok zimanê wan dewlemend dike û ji bo geşedana wan a fikrî dibe alîkar. Lê di vê mijarê de xala herî girîng ew e ku divê nivîskar, derûnnas, pedagog, zimanzan, wênesaz, civaknas û kesên pispor wek lijneyekî bîne li cem hev û ji bo zarokan çîrokên binivîsin û xêz bikin. Lewra agahiyên şaş, wêneyên xirab, mijarên xetere yê ku zarokan bide tirsandin, peyv û gotinên xelet yê ku zimanê wan xirab bike divê di çîrokan de tune bin.

Piştî pênaseya çîrokê, mirov dikare di Kovara Nûbiharê de behsa çîrokên ku ji bo zarokan hatine nivîsandin bike. Lê, divê bê gotin ku çîrokên di bin beşa çîrokan de hatine komkirin, çîrokên dirêj nînin. Yanê ji bilî yek û duduyan di kovarê de li gor van agahiyên çîrokên me behsa wan kir tune.

<sup>360</sup> Oğuzkan, *Çocuk Edebiyatı*, r. 21

### 2.2.10.1. Ko Zivistan Çû, Bihar Tê

Hezkirina xwezayê û heywanan di zarokatiyê de dest pê dike. Divê ev perwerdeya girîng di dema zarokatiyê de bê dayîn. Di hin çîrokan de mijara hezkirina heywanan rasterast neyê gotin jî, bi mijara çîrokê û şêwaza gotinê ve derbas dibe. Di hejmara yekem a Nûbiharê de Sabah Kara ji Siyaweş Kîsrayî çîrokeke bi navê “Ko zivistan çû, bihar tê” wergerandiye kurdî.<sup>361</sup> Çîroka ku ji du rûpel û nîvan pêk tê bi du wêneyan ve hatiye xemilandin.

Di çîrokê de kalekî bi navê ‘Apê Nuroj’ ji zarokan re çîrokeke ku behsa zivistanê û derengmayina biharê dike, vedibêje. Apê Nuroj ji zarokan re dibêje ku demekê zivistan dirêj dikşîne û nahêle ku bihar bê. Şivanekî bi navê Umêd Elî ji her kesî zêdetir dixwaze ku bihar bê. Rojekê jina Umêd Elî êdî ji zivistanê aciz dibe, dikeve rê, diçe ku biharê bîne. Di rê de rastî ba tê û ji ba re dibêje ku here hecîreşka qasida biharê bibîne û jê re bibêje ku bila biharê bişîne. Piştî qederekî hin kes tîna mala Umêd Elî ji wî alîkariyê dixwazin. Lewra zarokê nesitirî û har bi tîrkevanê ve hecîreşka ku qasidê biharê birîndar kiriye. Ev kes dixwazin ku hecîreşkê derman bikin ku hecîreşk baş bibe. Umêd û yê din baskên hecîreşkê derman dikin û hecîreşk diçe biharê ji gund re tîne. Apê Nuroj vê çîrokê ji zarokan re bi awayekî hûrgilî û dirêj dibêje.

**Peyam û Şîrove:** Çîrok ne giran e, zarokan aciz nake. Zimanê çîrokê û wêneyên ku hatine xêzkirin hêsan e û li gor asta zarokan e. Lehengê çîrokê Apê Nuroj bi awayekî veşartî dixwaze zarokan der barê heqê heywanan de hişyar û perwerde bike.

Zarok dema ku çîrokekê guhdar bikin û yan jî bixwînin divê mirovan, heywanan, nebatan, hawîrdor û siruştê hez bikin. Divê hestên zarokan, kelecana wan bi çîrokan ve zindî bibe. Divê çîrok xweş û balkêş bibe ku zarok dawiya çîrokê meraq bikin. Di vê çîrokê de jî peyam ew e ku zarok der barê heywanan de hesas tevbigerin, zîrarê nedin heywanan, wan neêşînin û aciz nekin. Ji bilî vê behsa demsalan zivistan û biharê hatiye kirin. Behsa alîkariyê ya dermankirina heywanên birîndar jî ji zarokan re hatiye kirin.

<sup>361</sup> Sabah Kara, “Ko Zivistan Çû, Bihar Tê”, *Nûbihar*, j. 2, Çiriya Pêşîn 1992, r. 24

### 2.2.10.2. Qendîla Piçûk

Di çîrokan de bûyerên derasayî hene û tu carê nayê zanîn ku bûyer kengî û li ku derê derbas bûye. Ji ber ku di çîrokan de behsa qehremanan, heywanan, bûyerên fantastik, cihên xiyalî, dinyayeke ji dinyaya rastîn cudatir tê teswîrkirin, kêfa zarokan li çîrokan tê.

Di beşa Zaroknameyê de çîrokên ku li ser qral, wezîr û yê din hatine gotin hema bibêje tunene. Bi tenê çîroka “Qendîla Piçûk” heye. Ev çîrok di hejmara 7emîn a Nûbiharê de hatiye weşandin. Sabah Kara ev çîrok ji Xessan Kenfanî wergerandiye. Çîrok ji 4 rûpelan û ji 4 wêneyan pêk tê. Wênexêz jî wek Xessan Kenfanî xuya dike. Di çîrokê de tê gotin ku li bajarekî mîrekî qenc û xwedî edalet hebûye. Rojekê mîr dimre. Ji bilî qîzeke wî ya biçûk li dû wî tu kes tune ku bibe mîr. Mîr beriya ku bimre wesiyeta xwe amade dike û dibêje ji bo ku qîza wî bibe mîr şertekî wî heye. Ew şert jî ew e ku heke keçik bikaribe tavê bîne qesrê ew ê bikaribe bibe mîr. Heke nikaribe wê heta dawiya emrê xwe di nav sandoqeke textik ya servekirî de bijî. Çîrok li ser hewldanên keçikê ya ji bo tavê anîna qesrê û serpêhatiyên wê dewam dike. Di dawiyê de tê fêmkirin ku gotina mîr gotineke sembolîk e. Ew tava asîman nîn e. Yanê meneyek din di wesiyeta wî de heye.

Di çîrokê de keçik bi roj û şev difikire ku ewê tavê çawa bîne qesrê. Dîsa şevê dema li ber pacê li ser halê xwe de diponije, dibîne ku kalek di destê wî de qendîleke biçûk ve dixwaze bikeve qesrê, lê pasban nahêlin ew bikeve qesrê. Kalê ji wan re dibêje ku “ji mîrzaya me re bibêjin ku heke kalek nikaribe bikeve qesrê wê tavê çawa bikeve qesrê” û diçe. Ev gotin ji keçikê re dibe îşaretek. Keçik fermanê dide ku sibê her kesê ku li bajêr dijî di destê wan de bi qendîleke biçûk ve werin qesrê. Ew dixwaze ku bi vî awayî wî zîlamê kal bibîne. Ferman belav dibe û gel di destê wan de qendîlên biçûk ve tên qesrê. Lê ji ber ku derî biçûk e, ew nikarin bi hev re bikevin hundirê qesrê. Keçik ferman dide ku derî û dîwarên qesrê bîn xirabkirin ku gel bikaribe bi rehetî bikeve meydana qesrê. Piştî vê fermanê gel dikeve hundir û ji ber ronahiya qendîlan qesr wek ku tav lê heye ronî dibe. Şêwirmend û zanayê qesrê ji keçikê re dibêje ku kesek bi tenê nikare evqas qendîlan di destê xwe de bigre, yan

jî kesek bi tenê nikare tavê bigre. Keçik wesiyeta bavê xwe baş fêm dike. Mezinên qesrê tacê didin serê wê û ew dibe mîrzaya bajêr.<sup>362</sup>

**Peyam:** Di vê çîrokê de keçik lehengê çîrokê ye û guh dide gotina bavê xwe. Ji bo ku raza ku di wesiyeta bavê xwe de veşartiyê fêm bike, gelek hewl dide. Ji bo zarokan peyama ew e ku guh bidin gotinên mezinan, bav û dêyên xwe. Li ser gotinên wan bifikirin ku hûn fêm bikin ka ew dixwazin ji we re bibêjin çî. Peyama din jî ew e ku bi kesekî ve tişt naçin serî, divê yekîtî û hevrebûn hebe. Jiyan, kar û bar bi hevrebûnê xweş e. Çîrok li gor asta zarokan giran e. Lewra him peyvên ku hatine bikaranîn, him peyama ku hatiye dayîn, him jî şiklê gotin û nivîsandinê ve li gor zarokan zehmet e û bihêsanî nayê fêmkirin.

### 2.2.10.3. Viz Viz Ji We Hingiv Ji Min

Di hejmara 45emîn, di bin beşa Zarokname/8an de Xelîl Amed çîrokeke bi navê “Viz viz ji we, hingiv ji min” nivîsandiyê. Wêneyê çîrokê jî ji hêla Xelîl Dost ve hatiye xêzkirin. Li gor vê çîrokê li gundekî Bidlîsê mêrikekî diz ê bi navê Elo hebûye. Lê, taybetmendiya Elo ew bûye ku bi tenê hingiv didize. Gundî ji wî aciz dibin û rojekê diçin cem wî û ji wî re dibêjin ku bila ew hingivê wan nedize. Piştî ku gundî diçin Elo ji xwe re kewarekê çêdike û çend mozên keran dixê nav kewarê. Dixwaze ku dema dîsa dizî bike û heke gundî bèn cem wî, ew kewarê nîşanî wan bide ku kewara wî heye û ew diziya hingivê xelqê nake. Rojekê Elo sitar nabe û dîsa diziyê dike. Gundî dîsa tèn cem wî û hêrs dibin. Lê, Elo kewara xwe nîşanî wan dide û wiha dibêje:

“Welleh hunguvê min û mozên min li vir in. Ez hunguvê xwe ji mozên xwe distînim. Ma ne şerm e ez hîn rabim hunguve we bidizim.

Dûv va gotinen Elo, civat mêze dike ku rast e. Kewara wî û meşên wî jî hene. Dîsa di nav xwe peyivîn gotin rast e, Elo hunguvê me nadize. Dûv vêya çûn cem Elo ji Elo re gotin:

- Elo me neheqî li te kir. Me bibexşîne

Elo jî wiha got:

---

<sup>362</sup> Sabah Kara, “Qendîla Biçûk”, *Nûbihar*, j. 7, Nîsan 1993, r. 23-26



- Tişt nabe, min hûn bexşandin. Lebelê civatê nizanî bû ku Elo dîsa derew kiriye û ew xapandine.

Elo, dema civat dûr ket, çû cem kewarê xwar bû û bi dengêkî hedî got "Viz viz ji we, hunguv ji min."<sup>363</sup>

**Peyam û şîrove:** Di çîrokê de behsa xeysetekî nebaş, tevgerêke şaş, dizitiya tiştên xelqê tê kirin. Tê dîtin ku divê mirov zû bi zû ji dizekan bawer neke. Lewra ew ji wan re dibe xûy û xeysetek û çî dibe bila bibe ew bi hêsanî terka vê tevgera xwe ya nebaş nakin. Ziman herikbar e û çîrokek hêsan e. Lê ji ber ku ji zarokan re hatiye gotin, hewce dikir ku di dawiya çîrokê de Elo ji kirina xwe poşman bibe û careke din diziyê neke. Lewra ji zarokan re dema çîrokek tê gotin, divê yan wan kêfxweş bike, yan şîrotekê bide wan yan jî wan perwerde bike. Ji ber van sedeman çîrok ji ber ku li ser xeletiya Elo dewam dike, dibe ku tesîreke nebaş li ser zarokan bike.

#### 2.2.10.4. Noka Genî

Di beşa Zaroknameyê de navên ji bilî Xelîl Amed ên ku ji bo zarokan nivîsandine kêmin. Di nav van navan de jin pir kêmin, hema bibêje du an jî sê kes in. Ji van kesan yek jî Besra Pîranî ye. Besra Pîranî di hejmarê 47emîn de di bin beşa Zarokname/10an de bi navê "Noka genî" çîrokeke balkêş nivîsandiyê. Di çîrokê de tê gotin ku li gundekî keçikeke bedew hebûye. Kurê mîr dibe evîndarê keçikê û ji xwe re dixwaze. Di dawiyê de ew dizewicin. Piştî zewacê keçik di qesrê de dijî û hêdî hêdî rojên xwe yê berê ji bîr dike. Dibe yeka qure û pozbilind. Wek gotineke pêşiyar a ku dibêjin "Kûsî ji kalikê xwe derdikeve û tûyê qalikê xwe dike", ew jî malbata xwe û jiyana xwe ya berê naecibîne û ji wan şerm dike.

Piştî ku demek li ser zewaca wan re derbas dibe dayika keçikê hinek kereng dide bavê wê û jê re dişîne. Lê keçika me ya pozbilind û eslê xwe jibîrkirî ji bavê xwe re wiha dibêje:

"Ma bavo!

Kerengê tîn ji kaşan

---

<sup>363</sup> Xelîl Amed, "Viz viz ji we hingiv ji min", *Nûbihar*, j. 45, Hezîran 1996, r. 31

Xwarina ker û caşan

Kereng çî digerin li qonaxa mîr û paşan”

Li ser van gotinên qîza xwe, mêrik bi awayekî heyretmayî ji keçîka xwe re wiha dibêje:

"Wey keçî min a malmîrat

Noka geniya ji gund hat

Te xwe hilda li şekir

Bûy leblebiya pirfiyat”

Pîştî van gotinên xwe, bavê keçîkê carek din li rûye qîza xwe dinêre û bi dilekî şewat, lê bi helwest û serbilindî:

Vaye digrim tûre xwe

Ezê herim mala xwe

Emê bixwin kerengan

Ji mer' çî ker û caşan?”

dibêje û ji qonaxa qîza xwe ya ceşbûyî dûr dikeve.”<sup>364</sup>

**Peyam û şîrove:** Bavê keçîkê herçiqas dilê wî ji qîza wî mabe jî, derseke baş dide qîza xwe. Ev çîrok ji hêla gotin û mijarê ve cuda ye. Peyva “caş-çehş” li vir balê dikşîne ku meneyeke wê ya neyînî heye. Ev ji bo kesên ku eslê xwe, eşîra xwe, çand û malbata xwe ji bîr dikin, ji wan şerm dikin an jî îxanetê li wan dikin re hatiye gotin. Nivîskar xwestiye ku ji zarokan re bibêje quretî û pozbilindî tişteki ne xweş e, him mirovan bêqîmet dike û him jî dilê kesên din dihêle. Divê mirov bibin xwedî kesayetiye baş û qîmetê nîşanî xwe û yê din bidin.

#### 2.2.10.5. Mirî Çawa Tê Şuştin?

Di çîrokên kurdî de dema çîrok dest pê dikin gelek ji wan bi hevoka “Hebû tunebû, rehet li dê û bavê we bû” dest pê dikin. Di kovarê de çîrokên bi vê hevokê dest pê dikin yek an jî du hebin. Di hejmarê 47an de Melayê Xursî di beşa

<sup>364</sup> Besra Pîranî, “Noka Genî”, *Nûbihar*, j. 47, Tebax 1996, r. 30

Zaroknameyê ya ku wek “Zarokname/10” hatiye nivîsandin de ji zarokan re çîrokek ekebi navê “Mirî Çawa Tê Şuştin?” nivîsandiye. Ev çîrok ji çîrokên din cudatir bi hevoka “Hebû tunebû, rehmet li dê û bavê we bû” dest pê dike. Di çîrokê de behsa mêrikekî ku şuştina miriyan meraq dike tê kirin. Çîrok wiha hatiye nivîsandin:

“Dibêjin li gundekî merivek hebû, melê gund çawa mirî dîşuşt gelekî meraq dikir. Rojekê ji pîreka xwe re dibeje:

- "Keçê, ezê xwe li mirîfî deynim tu jî bike hewar û gazî bêje zilamê min mir. Wê demê mele wê min bişo û ev kesera pir giran wê ji dilê min derkeve." Jinik dibêje:

- "Madem tu dixwazî, xem nake ezê bêjim."

Rojekê ji rojan jinik derdikeve ber derî û dibêje:

- "Hewarê hewarê, gundîno malîno qey kes ji we tune mêre min mir," û li xwe dixwe.

Radibin mêrik tînin cem melayê gund ji bo wî bişo. Melayê gund radibe wî dişo dema wê qerqer (kefen) lêke, ê mirî radibe serxwe:

"Seyda ji min bibihure, min şuştîna te gellekî meraq dikir û ji ber vê mi xwe li mirîfî danî qusûra min efû bike."

Seyda hema dest dixwe qirika wî baş difetisîne û destê xwe ji qirike nake heyya ku erêê, ruh te de nema, radibe ji pist perdê derdikeve û dibeje:

"Gundîno carek dinê, heyya ku miriyen we baş ruhe xwe teslim nekin wan nînin cem min."<sup>365</sup>

**Peyam û şîrove:** Dema me behsa taybetmendiyên çîrokên zarokan kir di nav van taybetmendiyên de xalek hebû ku wiha digot: “Çîrokê ji hêla mijar û lehengan ve divê zarokan netirsîne û wan xemgîn neke.”<sup>366</sup> Helbet têgeha mirinê divê ji zarokan re bê gotin û haya wan ji mirinê çêbibe, lê ji bo vê jî rê û rêbazek nerm û cuda divê bê şopandin. Her çendî ev çîrok wek mîzahê hatibe vegotin, peyv û gotinên kurdî yê xweru di xwe de bihewîne jî, rasterast behsa kuştina kesekî dike û dibe ku zarokan xemgîn bike û wan bitirsîne. Ji ber vê mirov dikare bibêje ku ev çîrok ne li gor asta zarokan e.

<sup>365</sup> Melayê Xursî, “Mirî Çawa Tê Şuştin?”, *Nûbihar*, j. 47, Tebax 1996, r. 30

<sup>366</sup> Oğuzkan, *Çocuk Edebiyatı*, r. 26

### 2.2.10.6. Çîroka Newrozê

Di hejmeta 107emîn a Nûbiharê de, Rojbîn Özkanê di bin beşa “Nûbihara Biçûkan” de çîrokeke bi serenava “Çîroka Newrozê” ji bo zarokan weşandiye. Di vê çîrokê de behsa jineke çîrokbêj ya ku navê wê “Pîra Hizrê” ye hatiye kirin. Tê gotin ku ew jinika pîr her tim ji zarokan re çîrokan dibêje. Pişt re çîrokeke wê ya ku ji zarokan re behsa dîroka newrozê dike, hatiye nivîsandin.

Newroz ji bo gelê kurd cejneke girîng û neteweyî ye. Her sal di 21ê adarê de tê pîrozkirin. Ji ber ku him behsa rizgariyê û him jî destpêka biharê dike kurd qîmetê didin vê rojê. Cil û bergên xwe yên nû li xwe dikin, xwarinên herêmî çêdikin û derdikevin xwezayê û vê rojê pîroz dikin. Di vê çîrokê de jî wiha behsa dîroka Newrozê tê kirin:

“...Di demeke kevn de, li welatê bapîrê kurdan padîshahek hebû, navê wî dehhaq bû. Dehhaq padîshahekî pîr zalim bû. Wî welat wêran dikir. Mezin piçûk hemû dikir goriyê xwe, kesî newêribû li hember vê zilmê dengê xwe bilind bike. Lê li vî welatî mirovekî bi navê Kawayê hesinkar bê tirs hebû. Kawa rojekê heval û hogirên xwe yên pê bawer kom kir û behsa zilm û zordariya Dehhaq û behsa plana xwe ya kuştina Dehhaq kir. Hemû kesî planên Kawa pejirandin û li benda îşareta wî man. Kawa gotibû: “Gava ez Dehhaq bikujim, ezê herim li ser banê qesra wî agir dadim. Ku we agir dît, bizanibin ku min Dehhaq kuştîye.”

Kawa, bi heval û hogirên xwe re dest bi çêkirina çekan kir û bi dizî ew belav kirin. Ji xwe re jî çakûçekî mirov pê hesîndikute çêkir. Rojekê leşkerên Dehhaq xwestin ku kurê Kawa jî bibin ji Dehhaq re bikin gorî...<sup>367</sup>

**Peyam:** Nivîskar Özkanê xwestiye di beşa “Nûbihara Biçûkan” de behsa Newrozê ji zarokên kurdan re bike ku haya wan ji dîrok û neteweya wan hebe. Yanê hesteke netewebûnê bi saya vê çîrokê derdikeve pêş.

---

<sup>367</sup> Rojbîn Özkan, “Çîroka Newrozê”, *Nûbihar*, j. 107, Bihar 2009, r. 126

### 2.2.10.7. Pîrê û Rovî

Di hejmara 108emîn beşa “Nûbihara Biçûkan” de ji bilî Rojbîn Özkanê jineke din jî heye ku navê wê Zelal Hawar e. Zelal Hawarê çîrokeke gelêrî ya bi navê “Pîrê û Rovî” ji bo zarokan weşandiye. Ev çîrok di nav kurdan de gelekî navdar e.

Di çîrokê de leheng jinikeke pîr û roviyek e. Tê gotin ku pîrê weke her roj bizina xwe didoşe, êvarê jî şîrê xwe haveyn dike û radizê. Dema pîrê dikeve xewê, roviyek jî wek her şev tê şîrê ku pîrê haveyn kiriye vedixwe. Pîrê rojekê dîsa şîrê xwe haveyn dike, satorekî li ber derî bi cih dike û dikeve xewê. Rovî dema ku tê şîr vexwe, sator li ser boça wî de dikeve û boça wî qut dibe. Rovî ji ber tirsê, êşa xwe jibîr dike û direve diçe. Dema diçe li cem hevalên xwe, hevalên wî qirf û henekên xwe bi wî dikin û ji wî re dibêjin “Quto”. Rovî şerm dike û diçe li cem pîrê ku pîrê boçika wî bidê. Pîrê ji wî re dibêje “here şîrê mîn bîne, ez ê jî boça te bidim.”

Çîrok wisa dest pê dike û pişt re serpêhatiyên rovî ya ku ji bo boçika xwe ji pîrê bistine ve dewam dike. Di dawiyê de rovî şîrê pîrê dibe û pîrê jî boçika wî dixemilîne û paşve dide wî. Lê rovî ji ber ku ji hevalên xwe aciz bûye dixwaze dersekî bide wan û heyfa xwe ji wan hilde. Dema hevalên wî dibêjin boçika wî çawa wisa hatiye xemilandin, wiha dibêje:

“...Rovî xwe qure dike û bersiva wan dide: “Ez wê şevê çûm serê vî çiyayî. Min bi şevê boçika xwe xiste nava golê. Gava ez sibê şiyar bûm, boçika min xemilandî bû.” Li ser ve yekê hemî hevalên rovî diçin ser golê û heya sibê boçika wan di nav golê de disekinin. Gava dibe sibeh dengê guran tê. Ji tirsan, rovî hemû baz didin direvin. Lê ji ber ku gol heya sibê qeşa girtiye boçika hemû roviyan diqete û hemî bê boçik dimînin. Roviyê me yê fenek tê cem wan û dibêje: “Qoto moto dev piloto. Hûn ji ku ve hatin bi wir de herin...”<sup>368</sup>

**Peyam:** Çîrok ji ber ku behsa heywanekê û serpêhatiyên wî dike, dibe ku bala zarokan bikşîne. Zimanê çîrokê hêsan e û bûyer li ser bûyeran diqewimin û meraq di zarokan de çêdibe ku gelo dawiya çîrokê wê çawa be. Ji van hêlan ve li gor asta zarokan e. Dîsa rovî ji ber ku xeletiya xwe fêhm dike, lêborînê dixwaze û şîrê pîrê dibe, pîrê jî wî xelat dike û boçika wî dixemilîne, zarok dikarin ji vir jî dersekê

<sup>368</sup> Zelal Hawar, “Pîrê û Rovî”, *Nûbihar*, j. 108, Havîn 2009, r. 94

hildin. Heke ku xeletiyekê bikin, divê poşman bibin û ji bo sererastkirina wê bixebitin ku ew bên efûkirin. Ji bilî vê di çîrokê de rovî tola xwe hildide û hevalên xwe ceza dike. Tolhildan ji ber ku tişteki nebaş e, ji vê hêlê ve ne li gor zarokan e.

#### 2.2.10.8. Çîroka Kalo Heyvo

Di beşa zarokan de hin çîrokên ku ji zimanên din hatine wergerandin jî hene. Wek mînak, çîrokeke Siyawêş Kîsrayî ya “Ko zivistan çû, bihar tê”, çîrokeke Xessan Kenfanî ya bi navê “Qendîla Biçûk” ji hêla Sabah Kara ve hatine wergerandin. Di destpêka çîrokan de behsa van çîroka hat kirin. Yek ji çîrokên ku wergera wan hatine kirin jî “Çîroka Kalo Heyvo” ye. Di hejmara 111an de Rojbîn Özkan çîrokeke tirkî ya Sadîk Yalsîzuçanlar wergerandiye kurdî. Çîrok bi serboriyekê ve dest pê dike. Hemû serborî ji devê zarokê tê vegotin.

Zarokê ku ji me re çîrokê dibêje ewil behs dike ku ew, birayê wî yê mezin û bavê wî li ser xaniyekî ne. Şev e û stêrk hene. Wî beriya werdekan, berxan, kuçik hemû heywanan kiriye. Ji ber ku ew ê sibê herin çewlikê ew bi kelecane. Zarok pişt re behsa hîvê dike û dibêje ku hîv kalê çîrokan e û kesên ku çîrokan dibêjin hemû çîrokên xwe ji hîvê hîn dibin. Pişt re dest bi çîrokê dike. Zarok dibêje bavek û du kurên wî hebûne. Bavê wan bîst û çar zêran dide wan û dibêje “herin çewlikê, lê zêrên xwe baş xerc bikin ku bila têra we bike.” Yê mezin beriya ku bigihêje çewlikê hemû zêran xerc dike û di destê wî de zêr namîne ku bilêta xwe ya trêne bikire ku ew bi trêne here çewlikê. Yê biçûk zêrên xwe bi îdare xerc dike û trêne siwar dibe, diçe çewlikê. Birayê mezin wisa stûxwar li dû trêne dinihêre. Çîrok wiha bi dawî dibe:

“...Birayê din li pey wî stûyê xwe dixurîne.

Û ez şîşar dibim kekê min radizê. Bavê min hê li stêrkan temaşe dike. Ez ji nav nivînan radibim û diçim ba wî. Hay ji min nabe.

Dipirsim: “Bavo, ew bîst û çar zêr çi bû” dibêje: “Bîst û çar seet temenê rojekê ye kurê min”.

Kalo Heyvo hatiye ser gir. Ez li pêçiyên xwe mêze dikim, bi ronahiya Kalo  
Heyvo hatiye şuştin.<sup>369</sup>

**Peyam û şîrove:** Ev nivîs ji ber şêwaz û gotinê ve dişibe çîrokê, lê mirov rasterast nikare bibêje çîrok e jî. Ji ber ku bûyer, leheng û serpehatî tê de heye û nivîskar bi xwe jî ew wek çîrok bi nav kiriye, me jî di bin beşa çîrokan de nîşan da. Di çîrokê de şîretek li zarokan tê kirin ku ew pereyên xwe baş xerc bikin û destbelaşiyê nekin. Guh bidin gotinên mezinên xwe, ji ber ku tecrubeya wan heye, ew ji zarokan çêtir dizanin.

Dîsa hez kirina xwezayê, gund û heywanan jî di çîrokê de bi devê zarokekî hatiye vegotin. Herî dawî jî qîmeta zeman di vê çîrokê de wek zêran hatiye binavkirin. Ji zarokan re hatiye gotin ku wext bîst û çar saet e û wek zêran biqîmet e, wê baş xerc bikin. Gelemperî mirov dikare bibêje ku çîrok ji ber ku gelek agahî û şîretan dide zarokan û bi zimanekî normal ve hatiye gotin li gor asta zarokan e.

---

<sup>369</sup> Sadık Yalsızuçanlar, (Werger: Rojbîn Özkan), “Çîroka Kalo Heyvo”, *Nûbihar*, j. 111, Bihar 2010, r. 94

**Tablo 9: Tabloya Çîrokan**

Jimar	Çîrok	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Ko Zivistan Çû Bihar Tê	Sabah Kara	2	24	Çiriya Pêşîn, 1992
2	Qendîla Biçûk	Sabah Kara	7	23 26	Nîsan, 1993
3	Viz Viz Ji We Hingiv Ji Min	Xelîl Amed	45	31	Hezîran, 1996
4	Noka Genî	Besra Pîranî	47	30	Tebax, 1996
5	Mirî Çawa Tên Şuştin?	Melayê Xursî	47	30	Tebax, 1996
6	Çîroka Newrozê	Rojbîn Özkan	107	125 126	Bihar, 2009
7	Pîrê û Rovî	Zelal Hawar	108	94	Havîn, 2009
8	Çîroka Kalo Heyvo	Sadîk Yalsîzuçanlar (Rojbîn Özkan)	111	94	Bihar, 2010

### 2.2.11. Kurteçîrok

Di kovarê de hin kurteçîrok jî hatine amadekirin lê hejmara wan ne zêde ye. Yê ku hatine weşandin di bin vê sernavê de cih digrin.

#### 2.2.11.1. Ka Em Bavên Ber Aqila

Çîrok herçiqas gelemperî dirêj bin jî hin cureyên çîrokan kin in. Di kovarê de çend çîrokên kin yê ku mirov bîbêje kurteçîrok hatine nivîsandin. Yek ji wan di hejmara 46an de di beşa Zaroknameyê ya ku bi sernava “Zarokname/9” de hatiye



weşandin. Ji bilî navê Xelîl Amed, Sabah Kara û Rojbîn Özkanê navekî din balê dikşîne. Murat Malpir.

Murat Malpir bi navê “Ka em bavên ber aqila” kurteçîrokek nivîsandiye. Di kurteçîrokê de tê gotin ku li gundekî sê bira û du kerên wan hebûne. Rojek kerên wan winda dibe. Her sê bira digerin û nagerin kerên xwe nabînin. Dibêjin “ka em bavên ber aqila.” Ev gotin di zimanê kurdî de xwedî meneyekê ye ku mirov dikare bibêje wek gotina îngilîzî ya “brainstorming” e. Yanî her kes der barê heman mijarê de fikrên xwe dibêje û te dît ji nişkê ve fikreke nû derdikeve holê û her kes wê fikrê diecibîne. Li vir jî wisa dibe. Her sê bira der barê windabûna kerên xwe de diaxivin û dibêjin dibe ku hatibin dizîn. Li ser axaftin û nîqaşê texmîn dikin ku kî kerên wan diziye. Çîrok wiha dewam dike:

“Ê mezin got: Heger ez bim, ê ku kerê me biriyê yekî kinik e.

Ê dinê got: Ger kinik e, ji Xirbebelik e.

Ê biçûk got: Ger kinik e, û ji Xirbebelik e, sed ji sedî ew Elik e, Rabûn bere xwe dan gund Xirbebelik. Girtin ser mala Elik. Jê re gotin: Zû kanîn kerên me?

Elik got: Kerên we ne li cem min in.

Wan got: Me avêt ber aqila ker li cem te derket.

Elik got: Ger hûn bi aqile xwe bawer in, çi di bin lihêfa min de ye?

Ê mezin got: Ger ez, ez bim, tiştê di bin lihêfa te de ye tiştêkî girover e.

Ê din got: Ger girover e, ez dibêm xetek sor e, xetek zer e.

Ê biçûk jî got: Ger girover e û xetek sor û xetek zer e, sed jî sedî şemamoka nav bîstana ye.

Elik zer û şîn bû, destê wî di ber de ket û got: Kerên we wane di axur de nin.<sup>370</sup>

**Peyam:** Di vê çîrokê de peyv û gotinên kurdî yên resen hatine bikaranîn. Wek “ka em bavêjin ber aqilan”, “zer û şîn bûn”, “berê xwe dan gund”, “li ser malê de girtin” û h.w.d.. Zarok van gotinan dibe ku fêm nekin, lê heke ew ji zarokatiya xwe pê ve van gotinan bibîhîsin, îxtimale ku dema mezin bibin wê zimanê kurdî baş fêm bikin.

---

<sup>370</sup> Murat Malpir, “Ka Em Bavên Ber Aqilan”, *Nûbihar*, j. 46, Tîrmeh 1996, r. 31

### 2.2.11.2. Çîz -Mîz Nizanim

Xelîl Amed di hejmara 47an de di bin beşa “Zarokname/10”an de bi serenavê “Çîz mîz nizanim” kurteçîrokek nivîsandiye. Di nivîsê de tê gotin ku karkerek diçe bajêr ku ji xwe re karekî bibîne û bixebite. Ji ber ku kesî nas nake, wir de diçe, vir de diçe, lê karek nakeve destê wî. Dibe êvar û birçî dibe. Cihekî ku lê bimîne jî tune. Diçe ji xwe re di nav nan de kebabekî distîne û nêzîkî çemekî rûdinê. Hew dinêre ku kebaba wî ji nav nanê wî dişikite û dikeve avê. Destê xwe dixwe avê lê tiştêkî nerm tê destê wî. Karker hew zane ku ew kebab e, hema hildide dixwe nav nanê xwe. Dema ku nan gez dike tiştêk dibêje çîz. Mêrik fêhm dike ku ew ne kebab e. Dinêre ku wî beqek ji avê girtiye. Qet rehetiya xwe xera nake û ji beqê re dibêje: “Çîz mîz ez nizanim. Min perê xwe te daye.”<sup>371</sup> Di kurteçîrokê de wêneyê beqekî jî hatiye xêzkirin. Bêçaretiya karker, bêperebûna wî baş hatiye nîşandan.

**Peyam:** Di vê kurteçîrokê de herçiqas mîzah hebe jî, ji bo zarokan ji aliyê derûnî ve dibe ku hestek nexweş peyda bibe. Lewra mêrik dema ku kebaba ku kiriye dixwe avê û winda dike, şûna wê beqekî digre dixwe nav nanê xwe. Paşê dibêje ku ewê vê beqê bixwe. Xwarina beqê li ber çavê zarokan tiştêkî nexweş û ne paqij e, ewê ji vê aciz bibin. Ji vê hêlê va ev nivîs wek henekekê be jî, ne li gor asta zarokan e.

### 2.2.11.3. Çavê Neyartiyê Kor e

Xelîl Amed di hejmara 56an a Nûbiharê de kurteçîrokek a bi navê “Çavê neyartiyê kor e” nivîsandiye. Di kurteçîrokê de mêrikek rastî roviyekî tê ku halê roviyê belengaz ne tu hal e. Rovî di nav xwêdanê de maye û gelek perîşan xuya dike. Mêrik ji wî dipirse ku ka ew çima wisa şerpeze dixuyê. Rovî wiha dibêje:

“Hih hih... Lo mirovo qet nepirse. Min bihîstiyê ku padîşah ferman derxistiyê û ji leşkerên xwe re gotiyê; we li ku kû derê devlokek dît bigrin, bikujin û ji min re bînin. Ez jî ditirsim ku wê leşkerên padîşah bi min bigrin û wê min li ser navê devlokê bibin bikujin, heta ku ez ji wan re bibejim:

<sup>371</sup> Xelîl Amed, “Çîz-mîz nizanim”, *Nûbihar*, j. 47, Tebax 1996, r. 29

-Kurmo ma çave we kor e, hûn nabînin ku ez ne devlok im, ez rovî me rovî, wê postê min derxînin mezate. Lewra çavê neyartiyê kore!”<sup>372</sup>

**Peyam:** Hin caran heta ku rastî derkeve holê, dereng dibe û meneya rastiye namîne. Li vir jî rovî dixwaze bibêje dibe ku ji ber neyartiyê wî wek devlokekê (fil) bihesibînin û wî bikujin. Di kurteçîrokê tîrsa rovî ya ji mirovan baş hatiye teswîrkirin. Biwêjeke kurdan a “çavê neyartiyê kor e” di vê kurteçîrokê de bi vê mijarê ve serkeftî hatiye bi kar anîn.

#### 2.2.11.4. Şeltik Şültik

Kurteçîroka bi navê “Şeltik Şültik” di Zaroknameyê de pir balê dikşîne. Lewra di vê beşê de heta niha tu nivîseke bi zazakî nehatiye nivîsandin. Lê Mehmêd Alî Sadîk di hejmara 110emîn a Nûbiharê de di bin beşa “Nûbihara Biçûkan” de kurteçîrokeke bi zazakî nivîsandiye. Ji vê hêlê ve ev nivîseke balkêş e.

Di kurteçîrokê de tê gotin ku li gundekî Paloyê jineke bî û kurekî wê, yê êtîm dijîn. Kurik mezin dibe û diçe leşkeriyê. Ji ser re dem derbas dibe û kurikê ku diçe leşkeriyê wê bizivire. Dayika wî malê paqij dike, cih û nivînan, mînderan radixe û benda hatina wî dimîne. Kurteçîrok wiha dewam dike:

“Lacek esker ra yeno, maya ey zaf şa bena, kêfê ay yeno ca, sek dina ê ay bibo.

Lacek esker de çend qalê tirkî bander biyo. Dekewno wade û dormarê xo unêno û maya xora vano:

- Anê anê kaldir bu şeltik şultiklerî, ser yorgan doşeklerî.

Maya ey unêna halê lacê xo ra, qehrêna û vana:

- Wîî Eliyê mi! Kê mi torî veşo.

Şarê, zoê to ra girewto, zonê xo zî nêdawo to.”<sup>373</sup>

Kurik çûye leşkeriyê û çend gotinên tirkî di leşkeriyê de hîn bûye. Kurik dixwaze tirkiya xwe nîşanî dayika xwe bide. Ji ber vê ji dayika xwe re dibêje ku ‘van şeltik şültikan rake balîf û mînderan dayne.’ Lê wek ku di gotineke pêşiyar a kurdî

<sup>372</sup> Xelîl Amed, “Çavê Neyartiyê Kor e”, *Nûbihar*, j. 56, Gulan 1997, r. 29

<sup>373</sup> Mehmêd Alî Sadîk, “Şeltik Şültik”, *Nûbihar*, j. 110, Zivistan 2010, r. 92

de tê gotin “Kûsî ji qalîkê xwe derdikeve û tuyê qalîqê xwe dike”, ev kurik jî ji mala xwe, zimanê xwe yê zazakî şerm dike.

**Peyam:** Di vê nivîsê de tiştê herî balkêş ew e ku dayika wî dersekê dide kurê xwe û xwendekarên vê çîrokê. Di hevoka dawiyê ya ku dibêje “Şarê, zoê to ra girewto, zonê xo zî nêdawo to.” Dayik dixwaze her kesê ku zimanê xwe jibîr dike şermezar bike. Yanê dibêje ku zimanê we ji we hatiye dizîn, lê hûn zimanê wan jî baş nizanin. Di navbera zanebûn û nezaniyê de hûn ketine halekî nebaş. Ji hêla dersdayîne ve kurteçîrokeke hêsan e û ji zarokan re behsa girîngiya ziman dike. Zarok dikarin girîngiya zimanê zikmakî baş fêhm bikin.

**Tablo 10: Tabloya Kurteçîrokan**

Jîmar	Kurteçîrok	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Ka Em Bavên Ber Aqilan	Murat Malpir	46	31	Tîrmeh, 1996
2	Çîz-mîz Nizanim	Xelîl Amed	47	29	Tebax, 1996
3	Çavê Neyartiyê Kor e	Xelîl Amed	56	29	Gulan, 1997
4	Şeltik Şûltik	Mehmêd Alî Sadik	110	92	Zivistan, 2010

### 2.2.12. Helbest

Helbest cureyek edebiyatê ye ku zarok gelek caran li gor pexşanê zêdetir jê hezdikin. Lewra helbest ji hevokên kin, gotinên lihevhatî û xweş pêk tînin. Di helbestan de biwêj, gotinên pêşyan, şîret û peyvên xemilandî derbas dibin. Ji ber vê, ji hêla peyvnan ve helbest gelek dewlemend in. Ev dewlemendî zimanê zikmakîyê

pêşve dibe û zarok bi zimanekî têr û tije ve diaxivin û dinîvîsin. Zarok ji ber van sedeman helbestan bi hêsanî jiber dikan.

Li gor ferhenga tirkî helbest cureyek edebî ya menzûm e ku ji hêla sembolan ve dewlemend e û tê de gotinên biaheng derbas dibin.<sup>374</sup> Hin caran peyv û gotinên ku di helbestan de derbas dibin heke wek pexşan bên nivîsandin tu meneyeke wan çênabe. Lê wek ku di pênaseyê de tê gotin heke dema bi şêwaza menzûm bên nivîsandin, meneya peyvên xurt dibe û mirov bêtir dixwînin.

Helbestên zarokan du cure ne. Yek jê rasterast ji bo hest û fikrên zarokan, ji bo wan tînan nivîsandin, ya duyem jî zêdetir mijar zarok in û di helbestê de behsa zarokan tê kirin. Di edebiyatê de helbestên ku behsa zarokan dikan, zêdetir in. Yanê mezinan ne ji bo kêf û hestên zarokan, ji bo xwe nivîsandine, lê mijar zarok in. Helbet zarok jî hin helbestên ku ji bo mezinan hatine nivîsandin dikarin bixwînin. Heke li gor asta wan zêde giran nebe, dikarin jê hez bikin û tehmê jê hildin.

Alemdar Yalçın û Giyasettin Aytaş dema behsa taybetmendiya helbestên zarokan dikan dibêjin ku di helbestên zarokan de divê rîtm (aheng), qafiye (hev dengî), wezn hebe. Divê fikr sade bên vegotin û fikrên felsefî yê giran tunebin û risteyên wan jî kin bin.<sup>375</sup>

Helbestên ku ji bo zarokan tînan nivîsandin heke behsa hezkirina siruştê, welat, malbat, heval û dostan bike, mijar heywan, pirtûk, dayik, demsal, bajar, gund û h.w.d. be, sade hatibin nivîsandin, zêdetir balê dikşînin. Helbest divê zêde dirêj nebin, lewra piştî demekê zarok naxwazin bixwînin. Bixwazin jiber bikin jî, ji ber dirêjahiya wê nikarin jiber bikin.

Di zaroknameya Nûbiharê de bi giştî heft helbest hatine weşandin. Yek ji wan helbesta helbestvanê navdar ê kurd Cegerxwîn e, yê din hemû helbestên Sabah Kara ne. Ji bilî Kara tu kesî helbest nenivîsandiye. Helbesta Cegerxwîn a bi navê “Ji biçûkan re” weke fabl hatiye nivîsandin. Yê Sabah Kara jî gelemperî bi xitaba “zarokno” dest pê dikan. Lê ev helbest li gor asta zarokan ne hêsan in. Peyv û mijarên ku zarok nikaribin bi hêsanî fêhm bikin hatine bikaranîn. Xala duyem jî ew e ku ew bi

---

<sup>374</sup> *Türkçe Sözlük*, r. 2224

<sup>375</sup> Yalçın-Aytaş, *Çocuk Edebiyatı*, r. 210-211

zimanê zarokan û ji bo hest û fikrên wan nehatîne nivîsandin. Zêdetir li ser zarokan hatine nivîsandin, yanê mijar zarok in an jî peyva zarokan hatiye bikaranîn.

### 2.2. 12.1. Ji Biçûkan Re

Di hejmara 34 û 35emîn a ku du hejmar bi hev re hatine weşandin de helbesteke Cegerxwîn a bi navê “Ji biçûkan Re” wek fabl hatiye weşandin. Di vê helbestê de şêr û pilingek ji bo serî penêr hevdu nakin. Ji bo ku bibe hakem, diçin li cem rovî. Roviye ku di nav heywanan de wek qurnaz û fênek tê nasîn, şûna ku biadil tevbigere, wan dixapîne û penêr dixwe. Helbest wiha ye;

“Şêr û piling tev de çûn,

Rastî serîk penîr bûn.

Vî jê xwar û wî jê xwar

Her d’wa li hev dane dar.

Yekî ji ê di re got,

Herdu rabûn bûne cot.

Go em herin cem rovî,

Seydayê weş û kovî.

Ewê me l’hevdu bênî,

Çavê mêrik derênî.

Herdu çune cem rovî,

Bûne derwêş û sofî.

Doza xwe jê re gotin,

Dil û cergê wî sotin.

Rovî go de rabin zû,

Ji mi r’bînin terazû.

Wan terazû anî ber,

Rovî penîr danî ser.

Alîk pîr û yek hindik,  
Yek ma giran yek sivik.  
Lekmek ji ya giran bir,  
Ew ji a di bû siviktir.  
Geh ev xwar û geh ew xwar  
Heta ku ma ben û dar.”<sup>376</sup>

**Peyam:** Zarok heywanan hez dîkin. Ji ber vê fabl, gelek çîrok û helbest an bi devê heywanan an jî rasterast li ser heywanan tên gotin. Di vê helbesta ku wek fabl hatiye nivîsandin de jî behsa heywanan tê kirin. Ji ber ku helbest kin e û biqafiye hatiye nivîsandin mirov dikare bibêje ku ev li gor asta zarokan e.

#### 2.2.12.2. Kerek Hebû Zarokno

Di kovarê de navê beşa zarokan heta hejmara 78an her tim wek “Zarokname” hatiye nivîsandin. Lê di hejmara 78emîn de navê beşê wek “Zarokistan 1-2” hatiye nivîsandin. Ev nav heta hejmara 82an dewam dike. Tişteke din a balkêş jî ew e ku beşên Zaroknameyê her tim di rûpelên dawîn ên kovarê de hatine weşandin. Lê ji bilî hejmara 82an beşên “Zarokistan”ê di rûpelên ewil ên kovarê de hatine weşandin.

Beşa “Zarokistan”ê ji hêla Sabah Kara ve pênc hejmar hatiye amadekirin. Ji xêncî wî tu kesî di Zarokistanê de nenivîsandiye. Bi tenê Sabah Kara di vê beşê de nivîsandiye û hemû nivîs jî helbest in. Ji bilî helbestan di van hejmaran de tu tişt nehatiye nivîsandin. Di hejmara 78an de Sabah Kara bi navê “Kerek Hebû Zarokno” û “Riziyaye Zarokno” du helbest ji bo zarokan nivîsandine. Di binê helbestan de tarîxa sala 1998an û navê bajarê Stolbergê heye. Di helbesta ewil a bi navê “Kerek Hebû Zarokno” de Kara wiha dibêje:

“Kerek hebû zarokno  
Kerekî gir î şamî  
Karê wî kerîtî bû

<sup>376</sup> Cegerxwîn, “Ji Biçûkan Re”, *Nûbihar*, j. 34-35, Tîrmeh-Tebax 1995, r. 46

Şev û roj her hovîfî

Lotik, pihîn û zirîn

Dema j'yekî aciz bû

Kef bi devê wî diket

Dehşik didan dora xwe

Çavên xwe yên hov digirt

Digot “ Ma hun dizanin

Ey dehşikên çav xezal

Ku ew çi kes xebîs e

Karê wî her xayîntî

Pîs e û lawê pîs e

Sipî hemû reş kirin

Reng neman li dora wî

Jibil duyan, reş-spî

Spî ew bû û yên dî

Reş dibûn hêdî hêdî....<sup>»377</sup>

**Peyam:** Ev helbesta ku ji neh pêncîneyan/pênçlibî (pênc riste) pêk tê her çiqas bi peyva zarokno ve dest pê bike û bi peyva zarokno ve biqede jî, li gor asta zarokan helbestek giran e. Lewra zarok ji helbestên kin, yên bi zimanekî hêsan û biqafiye hatine nivîsandin hez dikin. Sabah Kara di vê helbestê de xwestiye ku zarokan der barê “xayîntî” û xirabiyê de perwerde bike û wan bide zanîn ku xayîntî tişteki gelek nebaş e.

---

<sup>377</sup> Sabah Kara, “Kerek hebû zarokno”, *Nûbihar*, j. 78, Îlon 1999, r. 4



### 2.2.12.3. Riziyaye Zarokno

Sabah Kara di helbesta xwe ya din a bi navê “Riziyaye zarokno” de jî, behsa guherîna dinyayê ya ku ber bi nebaşiyê ve diçe, dike. Kara ewil bi awayekî bedbînî dibêje ku jiyana, sazî, partî, komele, dadgeh, zeman, demsal her tişt riziyaye û xirab bûye. Paşê bi hêvî bangî zarokan dike û ji wan re dibêje ku bila rêzdar bin, bila hurmetkar û qedirnas bin. Helbesta xwe wiha diqedîne:

“Werin werin zarokno

Rêzdar bin hurmetkar bin

Hez bikin, evîndar bin

Qedirnas bin, heqnas bin

Vejin jiyana me

Zarokno hêviya min

Werin em wêneyekê

Çêkin hemû bi hev re

Bila rengîn be hemû

Ev dinya li dora me”<sup>378</sup>

### 2.2.12.4. Ronî Heye Zarokno

Hejmara 79, 80 û 81an ên kovarê sê hejmar bi hev re hatine weşandin. Sabah Kara di beşa “Zarokistan 3-4”an de dîsa du helbest bi hev re weşandine. Helbesta bi navê “Ronî Heye Zarokno” ji pênc şeşîneyan pêk tê. Helbesta din a bi navê “Maro” li gor vê helbestê kin e. Di vê rûpela ku helbest hatine weşandin de wêneyek jî heye. Di wêneyê de du zarokên biçûk hene. Ji cil û bergên zarokan û lingên wan ên pêxas diyar e ku ew feqîr in.

Kara di helbesta xwe ya bi navê “Ronî Heye Zarokno” de ji bo ku zarok helbestê bixwînin, jiber bikin an jî pê kêfxweş bibin nenivîsandiye. Rasterast li ser

<sup>378</sup> Sabah Kara, “Riziyaye Zarokno”, *Nûbihar*, j. 78, Îlon 1999, r. 4

rewşa zarokan ên ku bi xaza kîmyewî mirine nivîsandiye. Di helbestê de gotina “ewrên kîmyewî” metefora Helepçeyê ye ku bi hezaran zarok ji ber xaza kîmyewî mirin. Dîsa di helbestê de behsa guleyên ku tên avêtin û gundên ku tên şewîtandin jî tê kirin. Bi van gotinan ve jî, rewşa zarokên kurdan, gund û bajaran wan ên ku tên şewitandin û şerê ku dewam dike hatiye kirin. Kara wiha dibêje:

“Ronî heye zarokno  
Li pişt ewrên kîmyewî  
Yên ku we bêcan dikan  
Mîna pelên payîzê  
Ku ji daran dikevin  
Hun li erdê rêz dibin  
Ronî heye zarokno  
Li wî azmanê bilind  
Ê l’ser ziblên eskerî  
Ziblên ku hun li ser wan  
Parçên nanê efnikî  
Û konservan top dikan...”<sup>379</sup>

**Peyam û Şirove:** Ev helbest ne ji bo zarokan, li ser zarokan hatiye nivîsandin. Di helbestê de behsa rewşa wan a xirab hatiye kirin. Gotin û meteforên ku di helbestê de hatine bikaranîn, ne li gor asta zarokan e.

### 2.2.12.5. Maro

Beriya ku behsa helbesta Maro bê kirin divê agahiyek bê dayîn. Kovarê li vir agahiyek weşandiye û dibêje ku hejmerak berê di helbesta Sabah Kara ya bi navê “Kerek Heye Zarokno” de hin xeletiyên rêzimanê çêbûne. Ji ber van xelatiyan lêborîn ji Sabah Kara û xwendevanan hatiye xwestin.<sup>380</sup>

<sup>379</sup> Sabah Kara, “Ronî Heye Zarokno”, *Nûbihar*, j. 79-81, Çr. Pêşîn- Çl. Pêşîn 1999, r. 5  
<sup>380</sup> H.r

Di helbesta “Maro” de helbestvan bangî mar dike û dixwaze ew têkiliyê tu kesî nebe û mirov jî têkiliyê mar nebin. Di helbestê de metaforek hatiye bikaranîn û dijmin wek mar hatiye binavkirin.

“Ez naxwazim tu nebî

Tu nexwazî ez nebim

Maro

Ez jî hebim

Tu wek mar

Ez wek mirov

Maro

Welatê te ê te

Welatê min ê min

Dunya têra te jî heye

Têra min jî

Maro

Em ne wek hev in

Lêbelê

Tarîtî jî divê

Ronahî jî

Maro

Ez bi xwe bawer im

Ku tu hebî

Çi dibe

Maro

Lê tu wek mar

Ez wek mirov

Tu li cihê xwe

Ez li cihê xwe

Maro<sup>381</sup>

**Peyam:** Mirov gelemperî ji maran ditirsin. Ji ber ku ew mirovan jahrî dikin û dikujin. Zarok jî her çendî ji heywanan hez bikin jî, ji maran ditirsin. Lê Sabah Kara di beşa zarokan de ji bo zarokan helbesteke bi navê Maro nivîsandiye. Şêwaza helbestê, heywanê ku hatiye hilbijartin, mijar û metaforên ku hatine bikaranîn ve ev helbest ne li gor asta zarokan e. Lewra li vê derê mar ne ajalek e, dijmin e, neyar e.

#### 2.2.12.6. Dilek Hebû Zarokno

Sabah Kara di hejmara 82emîn a Nûbiharê de du helbest weşandine. Ji vana “Dilek Hebû Zarokno” helbestek kin e û li ser helbestê jî wêneyê dergûşekê heye. Kurikê ku di wêneyê de tê dîtin wekî yek salî ye û dikene.

“Dilek hebû zarokno

Weku çavên we zelal

Weku dilên we delal

Wek dilê şaîrekî

Aştî dixwest, azadî

Mihribanî, biratî

Sipehîfî, hevaltî

Wek dilê şaîrekî

---

<sup>381</sup> Sabah Kara, “Maro”, *Nûbihar*, j. 79-81, Çr. Pêşîn- Çl. Pêşîn 1999, r. 5

Zarokno hêviya min,  
Ma hun naxwazin ku hun  
Xwedyê dilkî weha bin  
Wek dilê şaîreki<sup>382</sup>

Di vê helbestê de jî Sabah Kara ji bo hest û fikrên zarokan yanê zarok helbestê bixwînin û rihê wan tehma helbestê hilde nenivîsandiye. Mijar zarok e û wî li ser zarokan nivîsandiye. Hêvî û daxwazên xwe yên dahatûyê yên wek aşî, azadî, biratiyê li ser zarokan aniye ziman. Lê dîsa jî mirov dikare bibêje ku helbest ne helbesteke giran e. Zarokên ku temenê wan li ser neh û dehan in dikarin vê helbestê fêhm bikin.

#### **2.2.12.7. Gulek Hebû Zarokno**

Di heman hejmarê de helbesteke din a Sabah Kara ya bi navê “Gulek Hebû Zarokno” jî hatiye weşandin. Di helbesta “Dilek Hebû Zarokno”de jî, di vê helbesta “Gulek Hebû Zarokno” de jî peyva “aşî”yê balê dikşîne.

“...Eger tarîfî nebe  
Tê çawa fêhim bikî  
Çi ye aşî, azadî  
Wekhevî çî, sezayî  
Çima me ronî divê...”<sup>383</sup>

---

<sup>382</sup> Sabah Kara, “Dilek Hebû Zarokno”, *Nûbihar*, j. 82, Çileya Paşîn 2000, r. 31  
<sup>383</sup> H.r.

**Tablo 11: Tabloya Helbestan**

Jimar	Helbest	Hejmar	Rûpel	Nivîskar	Sal
1	Ji Biçûkan Re	34 35	46	Cegerxwîn	Tîrmeh- Tebax, 1995
2	Kerek Hebû Zarokno	78	4	Sabah Kara	Îlon, 1999
3	Riziyaye Zarokno	78	4	Sabah Kara	Îlon, 1999
4	Ronî Heye Zarokno	79 81	5	Sabah Kara	Çr. Pêşîn- Çl. Pêşîn, 1999
5	Maro	79 81	5	Sabah Kara	Çr. Pêşîn- Çl. Pêşîn, 1999
6	Dilek Hebû Zarokno	82	31	Sabah Kara	Çileyay Paşîn, 2000
7	Gulek Hebû Zarokno	82	31	Sabah Kara	Çileyay Paşîn, 2000

### 2.2.13. Pêkenok

Ken di jiyana mirovan de tiştêkî xweş e. Bi saya ken û henekan mirov li hember êş û tedeyan gelek caran li ber xwe didin. Mehmet Kaya ji bo ken û mîzahê wiha dibêje: “Ken hewcedariyek e, çalakiyeke parastinê ye, li hember derketin e û tiştan parvekirin e. Bi tenê ji bo mirovan xususiyetek e. Mirov li hember bûyerekê, dîmenekê an jî axaftineke ku ji bo wan ecêb bê, bi ken ve bertekê nîşan didin.”<sup>384</sup> Çawa ku ji bo mezinan ken hewcedariyek be û di edebiyata mezinan de mijarek be,

<sup>384</sup> Mehmet Kaya, *Çocuk Edebiyatında Gülmece (Mizah) İlköğretim Çocuk Edebiyatı Kitap Kataloğu*, Eğitimciler Yayınları, Ç. 2yemîn, Nisan 2011, Ankara, r. 29

di edebiyata zarokan de jî ken û pêkenok her tim bûye mijar û di gelek nivîsan de derketine pêş.

Pêkenok cureyek edebiyatê ye, gelemperî ji bo mirovan bide kenandin, kêfa kesên ku guhdar dike bîne, tê nivîsandin an jî tê gotin. Di pêkenokan de henek û qirf heye, carinan jî ji bilî mîzah û henekê pêkenok rexne û şîretan jî di xwe de dihewîne. Dema kesek pêkenokekê guhdar bike ji bilî ken û kêfxweşiyê difikire jî. Dibêje gelo ew li ser çî, an jî ji ber kîjan sedemê hatiye vegotin. Lewra pêkenok gelek caran peyaman jî di xwe de dihewînin.

Li gor ferhenga tirkî pêkenok çîroka kin e, xwedî vegotîneke xas e û mirovan dide kenandin.<sup>385</sup> Di ferhenga Oxfordê de jî ji bo pênaseya pêkenokê tê gotin ku pêkenok tiştê ku dema kesek dibêje mirovan dide kenandin, wan kêfxweş dike û bi hevokên henek ve diqede re tê gotin.<sup>386</sup>

Di nav kurdan de gelek pêkenokên navdar hene. Lê dema ku mirov lê dinihêre di Zaroknameya Nûbiharê de ne pêkenokên kurdî, zêdetir pêkenokên Nasredîn Xoce hatine weşandin. Nasredîn Xoce di nav gel de wek Xoceyê Navdar an jî Xoceyê Meşhûr tê nasîn. Ew bi gotin, tevger, zîrebûn, aqilmendî û mîzaha xwe ve meşhur e. Di her yek pêkenokeke wî de peyamek, şîretek an jî rexneyek heye.

Mirov hin caran naxwazin rasterast tiştêkî ji kesekî re bibêjin, behsa pêkenokeke Xoce dikin. Kesê li hember jî fêhm dike ku ew pêkenok ji ber çî hatiye gotin û peyama veşartî fêhm dikin. Di beşa zarokan de nozdeh pêkenok hatine weşandin, lê ji bilî çend heban, yê din hemû pêkenokên Xoceyê Meşhûr in.

### **2.2.13.1. Pêkeniyek ji Xocê Meşhûr**

Xelîl Amed di hejmarê 10emîn a Nûbiharê de bi serenava “Pêkeniyek ji Xocê Meşhûr” pêkenokek ji bo zarokan weşandiye. Pêkenok ji du rûpelan pêk tê. Di vê pêkenokê de sê keşîşên misyoner tînan gundê Xoceyê Meşhûr. Keşîş dixwazin li gundê misilmanan xebatê bikin ku gundî dev ji dîne îslamê berdî û bibin xiristîyan. Ji gundiyan re dibêjin ku ew ê pirsan ji gundiyan bikin, heke gundî nizanibin ew ê bibin xiristîyan, lê heke bersivan bizanibin îja ew ê bi xwe bibin misilman. Gundî ditirsîn

<sup>385</sup> *Türkçe Sözlük*, r. 867

<sup>386</sup> <https://en.oxforddictionaries.com/definition/joke> 09.05.2016/11.15

ku ew bersiva van pirsan nizanibin, t k bi in   mecbur bim nin ku dev ji d n   slam  berdin. Ji ber v  bang  Xoce dikin ku ew b  al kariya wan bike. Ke i  dor bi dor pirsan dipirsin, Xoce hem yan j  dibersiv ne. Ke i  soza xwe t nin cih, dev ji xiristiyaniy  berdidin   dibin misilman.<sup>387</sup>

**Peyam    irove:** Di v  p kenok  de Xoce hem  bersivan li ser kera xwe dide, yan  ker  dike m nak   diaxive. M nak dema ke i  dipirsin navenda dinyay  li ku ye, Xoce dib je ku cih  ku kera w  niha piy  xwe daye navenda dinyay  ye, d sa dema ke i  dipirsin li ezman  end st rk hene ew dib je ku  end m  li ser pi ta kera w  hebe, li ezman j  ewqas st rk hene. Di pirsaw d w n de dema ke i  s yem dipirse ku  end ta li rih  w  heye, Xoce dib je  end m  li bo ika kera w  hebe, ewqas ta j  li ser rih  ke i  heye. Di dawiy  de ji Xoce henek  xwe bi wan dike.

Ev p kenok ji h la ziman  ku hatiye bikaran n ve h san e. Zarok dikarin bi rehet  f m bikin. Mijar li gor we ana kovar  yan  der bar   slam , misilmantiy  de hatiye hilibijartin. Li vir d n   slam  p roz t  n şandan. Armanc ew e ku zarok bizanibin d n   slam  p roz e, ba  e   d n  heq e. M syonertiya ke i san hatiye rexnekirin. D n ji ber ku mijareke hesas e, li ber d n n din dijm nat    b r z  tevgerak nexwe  e, div  ev hi mend  bi hen n  ji zarokan re b  day n. Lewra heke zarok li ser xwe b n    hesasiyet  mezin nebin, dibe ku di dahat y  de r z  n şan  kes n din nedin. Bi kurtas  dikare b  gotin ku p kenok li gor asta zarokan e   ew dikarin f m bikin.

### 2.2.13.2. M van   avpir 

S  p kenok n Xocey  navdar  n bi nav  “Rev na Xew ”, “Ker   Tir  ”   “M van   avpir ” di hejmara 34   35em n a ku du meh bi hev re hatine we andin de derdikeve li p  ber  zarokan. Di her s  p kenokan de mijar n cuda hatine vegotin. Amadekar  be a Zaroknamey  xwestiy  ku zarok bikenin   k fxwe  bibin. Ji wan p kenokan ya bi nav  “M van   avpir ” behsa Xoce   m vanek  ku hatiye mala Xoce dike.

Rojek  m vanek t  mala Xoce. Wexta xwarin  t , Xoce xwarin   vexwarin  dide w    zik  w  t r dike. Li mala Xoce  end bihok (ayva) heb ne    av  zilam heye

<sup>387</sup> Xelil Amed, “P keniyek ji Xoc  Me h r”, *N bihar*, j. 10, T rmeh 1993, r. 22-23



ku van bihokan jî bixwe. Ji ber vê dibêje ka “ez stranekê bibêjim ku Xoce min fêm bike û bihokan bide min” û stranekê dibêje. Pêkenok wiha dewam dike:

“Ax gelê me, wax gelê me! Wexta razanê bihok dide me!”

Xoce naz û tinaziyê mêvan fêm dike. Ew jî difikire, dibêje:

-Bisekine ezê li serê vî mêvanê çavac û genî, dafikekê vekim.Û Xoce jî dest bi stranekê dike û dibêje:

“Li cem me ev adet tu nîn in!

Da ku ji bo zivistanê hilfnin!”<sup>388</sup>

**Peyam:** Mêvan û mêvandarî di gelek civakan de heye û qedrê mevanan jî tê girtin. Bi taybetî di civaka kurdan de xwarina herî xweş, nivînên herî rehet û paqij, diyariyên herî biqîmet didin mêvanan. Di vê pêkenokê de jî wek ku tê gotin Xoce gelekî baş mazûwaniya mêvanê xwe dike. Lê zilam yekî çavbirçî ye û Xoce çiqas tişt dabe wî jî çavê wî têr nabe. Nasredîn Xoce jî xwestiyê tevgerê mêvanê xwe ya nebaş nîşanî wî bide. Ji ber wê di pêkenokê de wî jî bi stranê ve bersivêk daye mêvanê xwe. Çîrok kin e û ji ber ku bi zimanekî hêsan hatiye nivîsandin li gor asta zarokan e. Zarok dikarin ji vê pêkenokê derseke baş derxin. Dema yek alîkariya mirov bike û tiştêkî bide, divê mirov çavbirçî tevnegere û sînorê xwe bizanibe.

### 2.2.13.3. Ker û Tirşî

Her pêkenokeke Xoce ji ber ku him şîretê dide û him jî mirovan dikenîne, di nav gel de, gelek caran di kovar û weşanên din de behsa wan tê kirin. Dîsa di hejmara 34 û 35emîn a Nûbiharê de Xelîl Amed pêkekoneke Xoce ya bi navê Ker û Tirşî weşandiye.

Di pêkenokê de tê gotin ku rojekê Xoce tirşînê kera xwe bar dike, diçe bajêr ku bifroşe. Li bajêr bi dengê bilind dibêje “Tirşî! Tirşî heye, tirşîîîî!” Xoce dema ku dest bi gazîkirinê dike, kerê wî jî bi dengê bilind ve dizire: “Aî, Aî, Aî, aîîîî”. Yek û du caran ker hema wisa bi Xoce re dizire. Xoce aciz dibe û di dawiyê de wiha dibêje: “Subhanallah! Kuro li min mêze bike! Tu tirşiyê difroşî, yan ez?”<sup>389</sup>

<sup>388</sup> Xelîl Amed, “Mêvanê Çavbirçî”, *Nûbihar*, j. 34-35, Tîrmeh-Tebax 1995, r. 46

<sup>389</sup> H.r

**Peyam û şîrove:** Wek ku tê dîtî Xoce çiqas aciz bibe jî zîrarê nade heywanê û bi tenê hinekî hêrs dibe. Di rewşa tê de be çiqas wî aciz bike jî nuktedan tevdi gere. Ji bo zarokan pêkenokeke hêsan e. Zîrar nedana heywanan, bi sebr û teml tevgerîna û mîzahê zarok dikarin di vê nivîsê de bibînin.

#### 2.2.13.4. Revîna Xewê

Di heman hejmarê de (34-35) Xelîl Amed vê carê pêkenokeke bi navê “Revîna Xewê” ji bo beşê amade kiriye. Tê gotin ku rojekê xewa Xoce nayê. Xoce lempê vêdixê û derdikeve kuçe. Dema paswan (bekçî) wî dibîne, jê dipirse ku ka ew di vê saetê de li kuçe çî digere. Xoce jê re dibêje ku “Xewa min wenda bû, ez lê digirim.”<sup>390</sup>

**Peyam:** Ev pêkenok ji ber ku kin e û Xoce bihenek diaxive, zarok dikarin pê kêfxweş bibin û bi hêsanî fêhm bikin. Ji ber vê li gor asta zarokan e.

#### 2.2.13.5. Secdekirina Xanê

Di hejmarê 36emîn a Nûbiharê de di bin banê Zarokname/2an de du pêkenokên Xoceyê navdar hatine weşandin. Ji wan yek bi serenava “Secdekirina Xanê” û ya din jî bi serenava “Agir û Şeytan” hatine nivîsandin. Di pêkenoka “Secdekirina Xanê” de tê gotin ku rojekê Xoce dixwaze here gundekî. Xoce di rê de diweste û di xanekî de radizê. Lê ji ber ku xan pir kevn e û her tim dengê texteyan tê, nikare razê. Xoce diçe dibêje xwediyê xanê ku ew nikare ji ber dengê texteyên xanê razê. Xwediyê xanê wiha dibêje:

“...Xoce ma tu zanî her tişt bi zîmanê Xwedê zikir dike. Ji ber vê, xana me jî bi şev zikir dike.

Xoce bi ken dibêje: Kuro, ez ditirsim ewê gavek din xana te bi eşq û şewqê bîçe secde û emê jî di bin de bipelixin.”<sup>391</sup>

**Peyam û şîrove:** Wek ku di pêkenokê de jî tê dîtî Xoce kesekî nûktedan e, di bin gotina kesî de namîne û hema cewaba wan dide. Pêkenok zêde dirêj nîne, ji ber vê zarok dikarin bêacizbûnê bixwînin. Lê ji ber mijar û peyvên ku tê de derbas dibin,

<sup>390</sup> Xelîl Amed, “Revîna Xewê”, *Nûbihar*, j. 34-35, Tîrmeh-Tebax 1995, r. 47

<sup>391</sup> Xelîl Amed, “Secdekirina Xanê”, *Nûbihar*, j. 36, Îlon 1995, r. 23

dibe ku qasî mezinan baş fêm nekin û nekenin. Lê dîsa jî ji bo zarokan ji ber ku mîzahê di xwe de dihewîne, nivîseke xweş e.

#### 2.2.13.6. Agir û Şeytan

Dîsa di heman hejmarê de (36) bi serenava “Agir û Şeytan” pêkenokeke Xoce ya din hatiye weşandin. Di vê meselokê de du mirovên ku Xwedê bawer nakin diçin li cem Xoce û ji wî re dibêjin ku şeytan ji agir hatiye çêkirin û ji ber vê Xwedê wê çawa wî di agir de bişewitîne. Xoce kevirekî erdê hildide û diavêje serê wan. Serê wan dişkê û xwîn ji serê wan diherike. Diçin li cem Qadî şikatê xwe dikin û ji Xoce gilîdar dibin. Xoce hal û meseleyê ji Qadî re dibêje û paşê dizivire wan. Ji wan re dibêje ku mirov ji axê hatine çêkirin û çawa ku ax axê diêşîne, agir jî dikare agir bişewitîne. Du kes dixin axê dibêjin ku serê wan diêşe. Xoce dibêje naêşe û dixwaze ku ew kes êşê bi wî bidin nîşandan. Meselok wiha diqede;

“Xoce: “Çima tu dibêjî diêşe û tu nikarî êşê rayê min bidî.”

Mirov: “Êşa min heye, lê ez nikarim rayê te bidim.”

Xoce bi kêf dibêje: “Lo geniyo! Ez jî dibêjim, “Xwedê heye.” Lê ez nikarim rayê te bidim.”

Li ser vê bersivê, herdu mirov tobe dikin û dibin misilman. Qadî jî di heyretê de dimîne.”<sup>392</sup>

**Peyam:** Pêkenok li ser mijarek dînî ye û peyvên dînî tê de hene. Xoce li vir jî bi saya bûyerekê xwestiye dersekî bide kesên ku Xwedê bawer nakin.

#### 2.2.13.7. Ewê Biemiliya Birçîbûnê

Di hejmara 37emîn de bi navê Zarokname/3 du rûpel ji bo zarokan hatine veqetandin. Di vê beşê de bi navê “Ewê Biemiliya Birçîbûnê” û “Emê Weka Xwe Bikin” du pêkenokên Nasredîn Xoce hatine nivîsandin.

Nivîskar Xelîl Amed di çîroka “Ewê biemiliya birçîbûnê” de dibêje ku aboriya Xoce nebaş dibe. Xoce biryar dide ku ew ê êdî kêr bixwe û kêr xerc bike. Kereke Xoce heye. Xoce çawa ku kêr dixwe û kêr vedixwe, hema wisa em û avê jî kêr dide kera xwe. Roj derbas dibin û Xoce dinihêre ku kera wî zeyîf nabe û tu tişt bi

---

<sup>392</sup> H.j, r. 25

kerê nayê. Li ser vê êmê kerê her diçe kêmtir dike. Rojekê dema ku dikeve tewlê dinihêre ku kera wî miri ye. Dema Xoce dibîne ku kera wî miriye wiha dibêje: “Wax mala minê! Hê ewê biemiliya birçîbûnê, lê emrê wê têrê nekir!”<sup>393</sup> Ev pêkenok bi wêneyekî ve hatiye weşandin. Di wêne de kerê Xoce li erdê dirêjkiriye û Xoce jî wisa metel mayî kera xwe dinihêre.

**Peyam:** Ji ber ku ev pêkenok ji bo zarokan hatiye nivîsandin mirov dikare bibêje ku ev pêkenok ne li gor asta zarokan e. Lewra heywanek ji ber ku kêmxwarinê dimre û hê di ser de Xoce dibêje ew ê biemiliya birçîbûnê. Nivîs îxtimalek mezin e ku wê zarokan xemgîn û aciz bike. Lê nexwe hatiye nivîsandin zarok dibe ku ji vê nivîsê derseke wiha bikaribin derxin; divê mirov bi têra xwe xwarinê bide heywanan, eziyetê li wan neke û ev nebe mijara pêkenokê.

#### **2.2.13.8. Emê Weka Xwe Bikin**

Carînan dema mirov tişteki dikan, hin kes aqil didin wan û hewl didin ku tesîrê li ser tevgerên wan bikin. Dema mirov bêbiryar be û guh bide gotina van kesan, jiyana zehmet dibe. Ya rast ew e ku divê mirov guh bide fikrên xelqê, îstîşareyê bike, lê biryara xwe bi xwe bide. Ev nebe sedem ku her tim gotina xelqê bê kirin.

Dîsa di hejmarê 37an de pêkenokeke Nasredîn Xoce ya bi navê “Emê Weka Xwe Bikin” hatiye nivîsandin. Di vê pêkenokê de jî Xoce û kurê wî kera xwe hildidin dikevin rê ku herin bajêr. Xoce kurê xwe kerê siwar dike û hêdî hêdî diçin. Kesên ku wan dibînin ji kurik re dibêjin “bêşerm û bêwîdan, kalê bavê xwe pêya kiriye bi xwe kerê siwar bûye.” Kurik li ser vê gotinê peya dibe, îja Xoce li kerê siwar dibe û diçin. Hin rêwiyên din ên li ser rê vê carê ji Xoce re dibêjin “zilamê mezin xwe siwar bûye, kurê xwe yê biçûk peya kiriye”. Xoce dîsa aciz dibe û vê carê jî her du bi hev re kerê siwar dibin. Qederekê dîsa diçin û vê carê çend rêwiyên din rastî wan tên û dibêjin “Hela van bêwîdanan binihêrin, her du bi hev re hewyana reben sîwar bûne.” Xoce û kurê wî şaş dimînin ku çî bikin, îja kerê peya dibin, ker li cem wan bi hev re dimeşin. Dîsa hinekî diçin vê carê hin rêwiyên din di rê de rastî wan tên û ji wan re dibêjin ku “tu van bê hişan binihêre hela, ker vala diçe ew jî peya dimeşin.” Xoce êdî pir aciz dibe. Dema kurê wî dipirse ku ka divê ew çawa

<sup>393</sup> Xelîl Amed, “Ewê Biemiliya Birçîbûnê”, *Nûbihar*, j. 37, Çiriya Pêşîn 1995, r. 23

tevbigerin, Xoce ji kurê xwe re dibêje "...emê weka xwe bikin."<sup>394</sup> Pêkenok bi vê gotinê ve dawî dibe.

**Peyam:** Ji bo vê pêkenokê wêneyek şêrîn a li gor zarokan hatiye xêzkirin. Di wêne de Xoce, kurê wî û kera wan yên ku şaş û metel mane tê dîtin. Peyama vê pêkenokê ew e ku divê mirov carinan guh bide gotinên xelqê. Lê ji bo vê jî sînorek heye. Heke mirov her tim gotina xelqê bike, mirov şaş û metel dimîne, nizane ku ka divê çi bike, çi rast e an, çi xelet e. Yanê bi kurtasî tê gotin ku divê mirov guh bide gotinan, lê di dawiyê de li gor zanîna xwe tevbigere. Di vê meseleyê de jî Xoce xwestiye ku vê nêrînê bide zarokan.

### 2.2.13.9. Ji Te Re Çi?

Meraq di haveynê mirovan de heye û hesteke xwezayî ye. Heke meraq ji bo tiştên baş peyda bibe, encamên baş derdikevin holê. Lê heke mirov ji bo nebaşiyê, yan jî acizkirina mirovan vê hestê bi kar bîne, ew jî dibe sedema xirabiyên. Wek ku tê zanin di tebîeta zarokan de jî meraq zêde heye û ew her tiştî bi pirsan ve hîn dibin. Lê divê sînoreke vê jî hebe.

Di hejmarê 38an a Nûbiharê de amadekarê beşa Zaroknameyê Xelîl Amed du pêkenokên Nasreddîn Xoce nivîsandiye. 'Ji te re çi?' û 'Neûzubîllah'. Di pêkenoka 'Ji te re çi?' de zilamek ji Xoce re dibêje ku mêrikek di destê wî de bi sîniyek peqlewe ve li vî aliyê ve diçe. Xoce dibêje: "ji min re çi". Mêrik dema dibîne ku Xoce pê re eleqedar nabe, îja dibêje ew mêrik bi sîniya peqleweyê ve ber bi mala Xoce ve diçe. Li ser vê Xoce hinek aciz dibe û hinek jî kêfxweş dibe û dibêje: "ê wê çaxêji te re çi".<sup>395</sup>

**Peyam:** Wek ku tê zanin wêne ji nivîsan zêdetir bala mirovan dikşînin. Ji bo vê pêkenokê jî wêneyek hatiye xêzkirin. Di wêne de Xoce û ew mêrikê bimeraq li ber malekî sekinîne. Mirovê bimeraq bi pêçiya xwe ya îşaretê ve aliyekî nîşanî Xoce dide. Nivîs kin e, mîzah tê de heye û bi wêne ve hatiye xemilandin. Ji ber van sedeman li gor asta zarokan e. Di vê pêkenokê de bi kurtasî tê gotin ku meraq baş e,

<sup>394</sup> H.j, r. 24

<sup>395</sup> Xelîl Amed, "Ji Te Re Çi?", *Nûbihar*, j. 38, Çiriya Paşîn 1995, r. 29

lê sînora wê jî heye. Divê mirov tev li karên xelqê nebe, jiyana wan a taybet meraq neke û bi karên xwe ve mijûl bibe.

#### 2.2.13.10. Neûzubîllah

Di heman hejmarê de dîsa pêkenokeke Nasredîn Xoce ya bi navê “Neûzubîllah” hatiye nivîsandin û ji bo nivîsê wêneyek jî hatiye xêzkirin. Di vê pêkenokê de serdar Tîmûrleng dixwaze ku ji xwe re navekî nû bibîne. Ji ber vê diçe li cem Xoceyê Meşhûr ku ew ji wî re navekê bibine. Tîmûrleng ji Xoce re dibêje ku navên wek Ataullah, Nîmetullah, Muhîbullah xweşa wî diçe. Ji ber ku Xoce dizane Tîmûrleng kesekî zalim û zorbe ye û heyfa wan navan ku ew hilbijêre. Hema ji wî re dibêje bila navê te bibe: “TobeNeûzûbillah”. Tîmûrleng li ser vê gotina Xoce metel dimîne.<sup>396</sup>

**Peyam:** Axaftina Xoce û metelmayîna Tîmurleng di wêne de baş tê dîtîn. Di vê pêkenokê de behsa kesekî navdar ê ku di dîrokê gelek zilm û zor li mirovankiriye hatiye kirin ku bila zarok vî kesî nas bikin. Xala duyem jî ew e ku zanabûna Xoce û axaftina wî ya xweş kesên zulimkar jî metel dihêle.

#### 2.2.13.11. Rêya Axur

Di hejmara 39emîn de XelîlAmed di beşa Zarokname/5an de du pêkenokên Nasredîn Xoce bi hev re hatine nivîsandin. Yek “Rêya Axur” û ya din jî ‘Jixwe ez ê peyabama’. Di pêkenoka ewil a “Rêya Axur” de mêrikekî ku kera xwe ji duh ve windakiriye û lê negeriya ye tê li cem Xoce. Mêrik ji Xoce dipirse ku ew ê çawa kera xwe bibîne. Xoce metel dimîne ku kera wî duh winda bûye û ew çima niha lê digere. Mêrik ji ber ku hinek tevşomevşo diaxive Xoce ji wî aciz dibe û hema dixwaze dersekî bide wî. Ji mêrik re wiha dibêje:

“Kuro li min mêze bike, ez rêyekî na du rêyan didim ber te. Xweş guhdarî bike, ji vana yek here tîmarxaneyê. Rêya din jî ev e ku tu di vê rêyê de biçî baş e, ewjî axur e. Rêya axur bigre biçe hefsar têke stûyê xwe û cila kerê lixwe ke û kayê bixwe. Dibe ku gunehê kera te bi te were û were te bibîne, hal û xatirê te bipirse.”<sup>397</sup>

---

<sup>396</sup> H.j, r. 30

<sup>397</sup> Xelîl Amed, “Rêya Axur”, *Nûbihar*, j. 39, Çileyay Pêşîn 1995, r. 29

Xoce ji ber bêaqiliya wî bi vê gotinê ve ew xistiye şûna keran û xwestiye ku ew hinekî bîaqil tevbigere. Di rûpelê de wêneyê Xoce û zilamekî jî hatiye xêzkirin.

#### 2.2.13.12. “Ji Xwe Ezê Peyabama”

Di pêkenoka “Jixwe ezê peyabama” ya ku di heman hejmarê de hatiye weşandin de jî, Xoce kera xwe sîwar dibe. Xoce bi kerê ve hinekî rêwîtiyê dike. Pişt re dixwaze ku li ser kerê şipiya bisekine. Hema çawa diceribîne erdê dikeve û pişt wî diêşê. Zarokên li der û dor dema dibînîn ku ew li erdê ye lê dikenin. Xoce şerm dike, lê naxwaze ku zarok bizanibin wî şerm kiriye. Hema dibêje “jixwe ez ê peyabama”. Piştî ku zarok li der û dora wî belav dibin, ji kera xwe re dibêje: “Ay ay, of of, pişt min, pişt min, ma hey kera bêbext tu dixwazî min li cem zarokan rezil û şerpeze bikî. Malneket ay ay ay.”<sup>398</sup>

Ji bo vê pêkenokê jî wêneyek hatiye xêzkirin. Di wêne de Xoce li ber kerê erdê ketiye. Rûyê Xoce xemgîniyê dide der. Li hember Xoce jî du zarokên ku rûyê wan dikene û wî dinihêrin hene.

**Peyam:** Di jîyanê de kesekî ku li erdê neketiye hema bibêje tune. Wexta ku însan erdê dikevin şerm dikin, li dora xwe dinihêrin ku ka kesî wan dîtiye an na. Herî zêde jî zarok li erdê dikevin. Çaxê ku erdê dikevin jî hêrs dibin, aciz dibin, şerm dikin û tişt herî girîng jî cihekî wan êşiyabe tu kesî re nabêjin. Di vê pêkenokê de mirov dikare ji zarokan bide fêmkirin ku êş ji rezîlbûn û li ber çavên mirovan piçûkketî girîngtir e. Dema ku ew erdê bikevin divê bibêjin, şerm nekin.

#### 2.2.13.13. Zimanê Xerîb

Pêkenokên ku heta niha ji bo beşa Zaroknameyê hatine nivîsandin hemû der barê Nasredîn Xoce de ne. Lê di hejmarê 40emîn, di bin beşa Zarokname/6 emîn de pêkenokeke cuda hatiye weşandin. Xelîl Amed di vê pêkenoka ku navê wê “Zimanê Xerîb” de dibêje zarokê nû dest bi dibistanê kiriye. Zarok dema tê malê, bavê wî jê dipirse:

“Kurê min hûn li xwendegehê îro çi hîn bûn?”

Cêwrik: - Bavo, em îro zimanekî xerîb hîn bûn.

---

<sup>398</sup> H. r.

Bave wî cardin jê dipirse: Zimanekî çawa, deka hinekî bipeyive.

Cêwrik: Miyaw, miyaw, miyaw mirr, mirr.”<sup>399</sup>

**Peyam:** Di aliyê çepê nivîsê de wêneyê zarokê biçûk hatiye xêzkirin. Pêkenok kin e û mirov dikare bibêje ku li gor asta zarokan e. Lewra peyamên giran û kûr tê de tunene. Zarok dikarin bi hêsanî fêhm bikin.

#### 2.2.13.14. Ez Jî Nizanim

Dîsa di heman hejmarê de bi serenava “Ez jî nizanim” pêkenokek heye ku him mirov dide kenandin û him jî dibe sedema xemgîniyê. Di nivîsê de tê gotin ku di dewra Osmaniyan de li ser fermana padîshahekî cudahî dikeve di navbera kurdên misilman û yê fileh. Rojekê mêrikekî misilman şûrê xwe dikşîne û ji filehekî re dibêje ku “eşheda xwe bîne bibe misilman an ez ê te bikujim”. Zilamê fileh dibêje tamam ew ê bibe misilman, lê ew eşhedanînê nizane. Mêrikê misilman re dibêje “Erê heyran, ez xulam, deka ji min re bêje, ezê çawa bibim misliman.” Yê misilman carek û du carên din jî dibêje “de hadê bibe misilman”. Di wê demê de kesekî ku ji wir derbas dibe tê li cem wan û pirs dike ka mesele çî ye. Piştî ku meseleyê hîn dibe ji mêrikê misilman aciz dibe. Nivîs wiha dawî dibe: “Gundiye mîsliman, meselê fehm dike û diçe ber kurdê me û ji kurdê me re dibêje: Hey şivanê nezan! Lazim e tu pêşiyê bibî misliman. Dûv vê yekê, fileh dibe misliman û kurdê me jî diçe hîn dibe û ji nuh de dibe misliman.”<sup>400</sup>

Di rûpelê de ji hêla Xelîl Dost ve wêneyek jî hatiye xêzkirin. Di wêne de zilamek erdê ye û yê din pêsîra wî girtiye. Ji tevger û rûyê wî wisa xuya dike ku ew bi hêrs bûye.

**Peyam û şîrove:** Ji bo zarokan ev nivîs ne pir hêsan e, lê peyama ku ji wan re tê dayîn ev e ku, hin caran mirov tiştêkî nizanin, lê dîsa jî bi wê nezaniya xwe heqaretê kesên din dikin û heqê wan binpê dikin. Divê mirov ewil bi xwe tiştêkî bizanibe û paşê şîretan kesên din bike, an jî tiştêkî ji wan bixwaze.

<sup>399</sup> Xelîl Amed, “Zimanê Xerîb”, *Nûbihar*, j. 40, Çileyê Paşîn 1996, r.30

<sup>400</sup> Xelîl Amed, “Ez Jî Nizanim”, *Nûbihar*, j. 40, Çileyê Paşîn 1996, r. 30



### 2.2.13.15. Dêrdê Xoce

Di hejmara 41 û 42emîn ên ku du hejmar bi hev re hatine weşandin de dîsa pêkenokeke Xoceyê Meşhûr heye. Xelîl Amed di bin beşa Zarokname/7an de pêkenokeke Xoceyê navdar nivîsandiye. Xelîl Dost jî wêneyek ji bo vê nivîsê xêz kiriye.

Di pêkenokê de kera Xoce tê dizîn. Digere û nagere kera xwe nabîne. Di rê de rastî cimaetekî tê. Cimaet ji Xoce dipirse ka ew çi digere. Xoce meseleyê ji wan re dibêje. Her kes tiştêkî ji Xoce re dibêje. Hinek dibêjin çima haya wî pê çênebûye, hinek dibêjin wî çima derê xwe baş negirtiye filan û bêvan. Xoce aciz dibe û ji wan re wiha dibêje "Ma hey ehmeqên ehmeq. Agir bi malê neketîno! Ma hemû sûc sûce min e, tew sûce diz tineye."<sup>401</sup>

**Peyam:** Dema tiştêk nebaş tê serê yekî gelemperî însan li ser wê rewşê diaxivin û şîroveyan dikin. Hin caran jî ev şîroveyan wan dilê wî kesî rehet nake, heta wisa ku wî kesî zêdetir aciz dike. Di vê pêkenokê de jî ev rewş heye. Her kesek li ser dizîna kera Xoce de tiştêkî dibêje, li ber dilê wî ve nayên û wî zêdetir aciz dikin. Ji bo zarokan ne nivîseke pir giran e, lê rasterast ne li gor zarokane jî. Lê dema zarok bixwînin dibe ku der barê hestên kesekî de empatiyê hîn bibin, alîkariya wî kesî bikin an jî li ber dilê wî ve bîn.

### 2.2.13.16. Te Çend Qat Jimartiyî?

Hin kes xwe bîaqil dihesibînin û kesên din biçûk dibînin. Lê nizanin ku kesên bi wan xirabtir jî hene. Di hejmara 46emîn de Xelîl Amed di bin beşa Zarokname/9an de bi navê "Te çend qat jimartiyî?" pêkenokek nivîsandiye. Di pêkenokê de xortek ji Erxaniyê diçe Diyarbekirê. Dema dibîne ku gelek avahiyên bilind li bajarê heye, serê xwe radike û qatên avahiyan dijmire. Yekî bajarî –di kovarê de ev kes wek pêxwasekî Diyarbekirê hatiye binavkirin- dizane ku ew xerîb e, hema diçe li cem xort û jê re dibêje ku ew bîmaya ku wî jimartiyê ya wî ye. Paşê dibêje jimartina qatan bi pere ye û divê ew perê qatê ku jimartinê bide. Xort metel dimîne, lê 7 qurîşan dide mêrikê bajarî. Paşê diçe mala xwe. Rojekê ji hevalê xwe re behsa vê

<sup>401</sup> Xelîl Amed, "Dêrdê Xoce", *Nûbihar*, j. 41/42, Sibat/Adar 1996, r. 30

mijarê dike û dibêje wî 12 qat jimartiye, lê pereyê 7 qatan daye mêrik. Hevalê wî ji wî re wiha dibêje:

“Rast e rast e. Ez hîn nuh fam dikim ku kî ehmeq û dînê bêhiş e. Kuro dolê keran, ez her tim diçim Diyarbekire û ez hertim wê bînayê dijmerim. Dema yek tê dibêje te çend qat jimart? Ez dibêjim ku min sê qat jimartiye.

Xort: Lê tu dibêjî min çi kiriye?

Hevalê wî: Ne xeyde, feqet tu ji min ehmeqtirî ku te negotiye min du qat jimartiye.”<sup>402</sup>

**Peyam:** Di vê pêkenokê de peyam ew e ku hûn çiqas xwe bîaqil bihesibînin jî, yê ji we aqiltir hene û heta wisa ku carînan we dikin şûna exmeqan jî. Lê nivîs li gor sebra zarokan û asta wan hinekî dirêj e û ne pir hêsan e.

#### 2.2.13.17. Nimêjên Zêde

Pêkenokên ku di beşa zarokan de hatine nivîsandin ji bilî çend heban gelemperî dirêj in. Yê kin pir hindik in. Yek ji van jî di hejmara 107emîn de ji hêla Rojbîn Özkanê ve hatiye nivîsandin. Özkanê di bin beşa “Nûbihara Biçûkan” de bi navê “Nimêjên Zêde” pêkenokeke pir kurt nivîsandiye. Di vê pêkenokê de jineke pîr û kurê wê diaxivin. Pêkenok wiha ye: “Pîrê wê rojê ji her roj zêdetir nimêj dikir. Kurê wê pirsî: “Dayê tu çima îro evqas zêde nimêj dikî?” Pîrê bersiva kurê xwe da: “Ez ê sibê genim bişom, wextê min namîne, lewra ez nimêja sibê jî îro dikim.”<sup>403</sup>

**Peyam:** Di vê pêkenoka kin de peyameke taybet a ji bo zarokan tune. Ji ber ku pir kin e, ji bo zarokan hêsan e û li gor asta wan e. Lê mirov dikare bibêje ji ber ku behsa bawerî û jiyana kurdan (wek nimêjkirin, genimşûştin, têkiliya pîran û zarokên wan) dike, pêkenok agahiyan wiha kin dide zarokan.

#### 2.2.13.18. Derewîn

Di hejmara 108emîn de di bin beşa “Nûbihara Biçûkan” de Rojbîn Özkan bi serenava “Derewîn” pêkenokek nivîsandiye. Özkan di binê nivîsê de çavkanî diyar kiriye ku wê ev pêkenok û wêneyê pêkenokê ji malpera [www.dibistanakurdi.com](http://www.dibistanakurdi.com) wergirtiye. Di vê pêkenokê de du zilam bi hev re diaxivin û wiha dibêjin:

<sup>402</sup> Xelil Amed, “Te Çend Qat Jimartiyî?”, *Nûbihar*, j. 46, Tîrmeh 1996, r. 30-31

<sup>403</sup> Rojbîn Özkan, “Nimêjên Zêde”, *Nûbihar*, j. 107, Bihar 2009, r. 126

“- Te di wê bîrê de çi dikir?

- 30 sal ewil seeta bavê min ketibû vê bîrê, min jî îro derxist, tu tişteke pê nehatiye her wekî agir kar dike!

- Îcar ew çi ye! Ê min bavê min 30 sal berê ketibû vê bîrê, me derxist hê jî sax bû.

- Errik, çi derew!

- Na ne derew e. Çimkî bavê min di bîrê de seeta bavê te qurmîş dikir!”<sup>404</sup>

**Peyam:** Li aliyê rastê ya vê pêkenokê wêneyekî biçûk hatiye xêzkirin. Di wêne de bîrek û du mêrikên ku li ber bîrê bi hev re diaxivin hene. Nivîs zêde dirêj nîne, vê hêlê ve baş e. Ji bo ku ji zarokan re bê gotin derew tişteki nebaş e, ev pêkenok mîna keke baş e.

### 2.2.13.19. Tu Ji Bîr Neke

Di beşa “Nûbihara Biçûkan” a hejmara 111an de navê nivîskarekî cuda balê dikşîne. Lewra heta niha heman kesan pêkenok nivîsandine. Di vê beşê de pêkenokeke dirêj ji hêla M. Êhsan Hêvîdar ve hatiye nivîsandin. Di nivîsê de tê gotin ku çend parsek di navbera hev de diaxivin û behsa mêrikekî ku navê wî Mîrzo ye dikin. Parsek dibêjin ku Mîrzo yekî pir dewlemend e, lê ji ber ku gelek tima ye, tu tiştî nade parsekan. Parsekê ku navê wî Şêro ye dibêje ku ew ê here û miheqeq wê pereyan ji Mîrzo bistîne. Yê din dibêjin ku ev ne mumkun e, lê heke ew bikaribe pere ji Mîrzo bistîne ewê wek xelat ji Şêro re qate kinc û cotek sol bikirin. Pêkenok li ser vê mijarê dewam dike.

Şêro diçe mala Mîrzo, lê Mîrzo pereyan nadê wî. Şêro wisa zû dev jê bernade, meseleyê dirêj dike, li ber deriyê Mîrzo naçe û zêde diaxive. Piştî axaftina dirêj a Şêro, Mîrzo aciz dibe û jê re dibêje saleke din heke ku ew were, wê pereyan bide wî. Şêro li ser vê sozê diçe. Lê sibê tê li ber derê Mîrzo û jê re dibêje ku “...Mîrê min ez nehatime peran. Ez dixwazim têxim bîra te ku ji qewlê me re ma “sêsed û şêst û çar” roj. De êdî bi xatirê te.” Şêro diçe û roja din dîsa tê li ber deriyê Mîrzo û dibêje ku ma sêsed û şêst û sê roj. Dema Mîrzo ji wî dipirse ku ew ê her roj bê li ber derî, Şêro dibêje belê ew ê bê. Û pêkenok wiha diqede:

---

<sup>404</sup> Rojbîn Özkan, “Derewîn”, *Nûbihar*, j.108, Havîn 2009, r. 93

“...Bila şaş neyê famkirin Mîrê min, ez dizanim tu xwediyê soza xwe yî, bi tenê ez dixwazim têxim bîra te.

-Şêro! Ha ji te re vî pêncî banotî, lê ku ez rojêke din te li ber vî deriyî bibînim kes nikare te ji lepên min sax xelas bike.

-Spas dikim Mîrê min! Xwedê bike xêra miriyan û sedeqeya zindiyan!

Şêro bi dilşadiyek pir mezin tê ba hevalên xwe. Pereyê ku sitendiye –heke hindik be jî- ew berxwedan û têkoşîna wî, dibe sedem ji bo xelatgirtina wî.”<sup>405</sup>

**Peyam:** Di vê pêkenokê de her çiqas mîzah hebe jî, bal tê kişandin ku heke mirov di mijarekî de li ber xwe bide, tê bikoşe, sebir bike û her tim li dû tiştêkî here mirov miheqeq wê tiştê bi dest dixê. Yanê mirov divê zû dev ji tiştêkî bernede û têbikoşe. Heke mirov hewl bide di dawiyê de digihêje encamêkê. Ev pêkenok li gor pêkenokên Xoceyê navdar hinekî dirêj e û mirov nikare bibêje ku rasterast li gor asta zarokan e.

**Tablo 12: Tabloya Pêkenokan**

Jimar	Pêkenok	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Pêkeniyek ji Xocê Meşhûr	Xelîl Amed	10	22 23	Tîrmeh, 1993
2	Revîna Xewê	Xelîl Amed	34 35	47	Tîrmeh- Tebax, 1995
3	Ker û Tirşî	Xelîl Amed	34 35	47	Tîrmeh-Tebax 1995
4	Mêvanê Çavpîrsî	Xelîl Amed	34 35	47	Tîrmeh- Tebax, 1995

<sup>405</sup> M. Êhsan Hêvîdar, “Tu Ji Bîr Neke”, *Nûbihar*, j. 111, Bihar 2010, r. 91

5	Secdekirina Xanê	Xelîl Amed	36	23	Îlon, 1995
6	Agir û Şeytan	Xelîl Amed	36	23	Îlon, 1995
7	Ewê biemiliya birçîbûnê	Xelîl Amed	37	23	Çiriya Pêşîn, 1995
8	Emê weka xwe bikin	Xelîl Amed	37	23	Çiriya Pêşîn, 1995
9	Ji te re çî?	Xelîl Amed	38	29	Çiriya Paşîn, 1995
10	Neûzubîllah	Xelîl Amed	38	30	Çiriya Paşîn, 1995
11	Rêya Axur	Xelîl Amed	39	29	Çileyaya Pêşîn, 1995
12	Ji xwe ezê peyabama	Xelîl Amed	39	29	Çileyaya Pêşîn, 1995
13	Zimanê Xerîb	Xelîl Amed	40	30	Çileyaya Paşîn, 1996
14	Ez jî nizanim	Xelîl Amed	40	30	Çileyaya Paşîn, 1996
15	Derdê Xoce	Xelîl Amed	41 42	30	Sibat/Adar, 1996
16	Te çend qat jimartiyî?	Xelîl Amed	46	30 31	Tîrmeh, 1996
17	Nimêjên Zêde	Rojbîn Özkan	107	126	Bihar, 2009
18	Derewîn	Rojbîn Özkan	108	93	Havîn, 2009
19	Tu ji bîr neke	M.Êhsan Hêvîdar	111	91	Bihar, 2010

#### 2.2.14. Fabl

Dema mezin bixwazin tişteki hîni zarokan bikin, an şîretekê li wan bikin û yan jî peyamekê bidin wan, gelek rê û rêbazan didin ber xwe. Wek mînak bi wan re dileyîzin û bi rêya listikê ve perwerdeyê didin wan. An rasterast bi wan re diaxivin, an jî ji wan re çîrok û meseleyan dibêjin ku ew wê peyamê fêm bikin. Ji van rêyan yek jî fabl e. Fabl cureyekî nivîsê ye ku tê de heywan û însan hene, bi axaftin û tevgeran ve hewl didin ku tişteki hîni mirovan bikin.

Di ferhenga Oxfordê de tê gotin ku fabl çîroka kin e û gelemperî lehêngên wê heywan in û dersekî dide mirovan.<sup>406</sup> Li gor ferhenga tirkî jî fabl wiha tê pênasîn: “Çîrokên manzum yê ku lehêngên wan gelemperî ji heywanan hatine hilbijartin û di dawiyê de armanc ew e ku şîretekî û dersekî bide.”<sup>407</sup>

Wek ku tê fêmkirin, fabl çîrokên kin in û lehêngên sereke heywan in. Baş e ji bo zarokan çima fabl tên gotin? Ji bo bersiva vê pirsê mirov dikare bibêje ku zarok heywanan hez dikin, bi heywanan re dileyîzin û hevaltîyê dikin. Ji ber vê dema mezin ji wan re çîrokekê, yan jî fablekî bibêjin, zarok dikarin heywanan bînin pêş çavên xwe û heywanê teswîr bikin. Kesên wek Ezop, La Fontaine û Beydaba yê ku di cihanê de bi nivîsandina fablan ve tên nasîn, gelek fabl nivîsandine. Her çiqas hin kes bibêjin ev fabl ji bo zarokan nehatine nivîsandin jî, ew li cihanê di nav zarokan de belav bûne û hatine hezkirin. Helbet di nav civaka kurdan de jî ji van hinek tên zanîn. Di kovara Nûbiharê de jî hin fabl hatine nivîsandin. Ji wan hinek bi wêne, hinek jî rasterast bi nivîsê ve hatine amadekirin.

#### 14.1. Barana Şadî

Di hejmara 3yemîn a Nûbiharê de bi navê ‘Barana Şadî’ çîrokeke Hemîd Gorûgan û Sabah Kara hatiye weşandin. Ev fabl ji sê û niv rûpelan pêk tê. Ji bo tesîra çîrokê bêtir xurt bibe sê wêne jî hatine xêzkirin. Di vê fablê de filek, komek mêş û hirçek heye. Fileke jê re dibêjin “Axayê Fîl” gelekî dimeşe, lê ji ber ku zêde dimeşe diweste. Fîl dixwaze li bin darekê hinekî bêhna xwe bide. Dema li bin darê dikeve xewê nizane ku ew li ser kulîlkan û gulan razaye û ew pelçiqandine. Mêşên hingivê

<sup>406</sup> Miranda Steel, *Oxford Wordpower Dictionary For Learners of English*, r. 239

<sup>407</sup> *Türkçe Sözlük*, r. 845

dema wî li ser kulîlkan dibînin aciz dibin. Lewra kulîlkên ku ew jê nektarê dixwin û dimêjin di bin fil de hemû pelçiqîne. Dixwazin Axayê Fîl şiyar bikin ku ew li ser kulîlkan rabe. Çi dikin û nakin deng naçe fil û ew şiyar nabe. Paşê mêş biryar didin û ji wan yek çavê filê vedide. Fîl ji êşê aciz dibe û ji xewê şiyar dibe. Piştî şiyarbûna wî ew bi fil re diaxivin. Mêş fêm dikin ku ew ne yekî xirab e û bi nezaniya xwe wisa tevgeriya ye. Fîl û mêş dibin dostê hev.

Rojekê hirçek tê ku kewara mêşan xirab bike û hingivê wan bixwe. Fîl destûrê nadê û di wê navberê de ji paqa xwe birîndar dibe. Mêş li ber xwe dikevin, him ji bo ku çavê wî dabûn û ew êşandibûn û him jî ji ber birîna paqa wî. Lê ji nişkêve baranek dibare. Mêş kêfxweş dibin, lewra him kulîlkê ji nû ve hêşin bibin û him jî birîna paqa fil wê baş bibe. Fabl bi van hevokan diqede:

“Axayê fil jî rabibû ser du lingê xwe û dikeniya, çepik lê dida û vê stranê digot:

Tu ey Yezdan ê zana

Ey Xaliqê cîhana

Bêje barab bibare

Her cih bibe gulzare

Êdî ne xema me ye

Hemd û spas ya Te ye”<sup>408</sup>

**Peyam û Şîrove:** Wek ku di gelek fablan de şîretek tê dayîn, di vê çîrokê de jî hin şîret û ders hene. Ji wan yek ev e ku, hin caran mirov der barê yekî an jî tiştêkî de nebaş difikire, lê dema rastî derdikeve holê mirov dibîne ku rastî tiştêkî din e. Yanê dibe ku mirov xelet fikirîbe. Ji ber vê jî divê pêşdarizandin neyê kirin.

Ya duduyan jî piştî xeletiyên, pevçûnan divê mirov meseleyan zêde dirêj neke û li hev bê û bibe dost. Ya dawîn jî ew e ku di jîyanê de mirov nizane ji nişkêve çî dibe, suprîz her tim hene wek barana ku ji nişkêve barî û wê her tiştî diguherîne. Di dawiya çîrokê de strana ku fil dibêje û çepikan lê dide de jî mezinbûna Xwedê tê nîşandan. Yanê peyamek dînî ji bo zarokan hatiye dayîn.

---

<sup>408</sup> Hemîd Gorûgan/Sabah Kara, “Barana Şadî”, *Nûbihar*, j. 3, Berçile 1992, r. 24-27

## 14.2. Pîtros

Di kovarê de hin fabl werger in. Di hejmara 4emîn a Nûbiharê de Sabah Kara ji Serwer Pûrya fableke bi navê “Pîtros” wergerandiye. Ev fabl ji du rûpelan pêk tê û deh wêneyên biçûk ve hatiye xemilandin. Lê ji ber ku kovar spî û reş e, wêne zêde balê nakşînin. Di vê çîrokê de çivîkeke lîstikhez bi bayê biharê ve derdikeve derve û bi hevalên xwe re pîtrosê (veşartok) dilîze. Çivîk bi baskên xwe ve çavên xwe digre, meymûn, kûsî, jîjo, margîs, marmaroşk, beq û heywanên din xwe vedîşêrin. Çivîk çavên xwe vedike û ji bilî margîsê hemû heywanên ku xwe veşartine, yek bi yek li cihên ku wan xwe veşartine dibîne. Çîrok bi pirsekî ve dawî dibe. “Ma zarokno, gelo hûn dibêjin ku margîsê xwe li kû derê veşartibû?”<sup>409</sup>

**Peyam:** Li gor fablên din di vê çîrokê de peyameke taybet an jî şîretek ji zarokan re nehatiye dayîn. Lê bi tena serê xwe fableke xweş e. Lewra tê de lîstik û şahî heye. Heywanên cur be cur hene ku ev jî ji bo zarokan balkêş e. Di fablê de pirsek ji zarokan hatiye pirsîn ku ew mêjjiyên xwe bixebitînin û texmînan bikin. Bi bersiva texmînan ve hatiye xwestin ku zarok berfireh bifikirin û qabiliyeta wan a xiyalan û texmîne pêşve here.

## 14.3. Çîroka Ristî

Di hejmara 6emîn a Nûbiharê de bi navê “Çîroka Ristî” fablek hatiye weşandin. Wek nivîskar navê M.Azad û rêvebirê kovarê Sabah Kara tê dîtin. Li gor çîrokên din ev bi tîpên mezin hatiye nivîsandin, ji ber vê jî şeş 6 rûpel e. Çîrok bi çar 4 wêneyan ve hatiye xemilandin. Çivîkeke reng bi reng a ku li ser stûyê wî ristiyeke (gerdan) heye û ji ber vê navê wî Ristî ye lehengê fablê ye. Awaza Ristî xweş e û ew her tim dixwîne. Rojekê Ristî li erdê gwîzekî dibîne û dixwaze bixwe, lê bavê wî dikene û ji wî re dibeje ku gwîz nayê xwarin. Bavê wî wiha dewam dike:

“Canê bavê xwe  
Gwîzkê distînin  
Dendik diçînin  
Lê avdan dikin  
Wextê ku şîn bû

<sup>409</sup> Serwer Pûrya- Sabah Kara, “Pîtros”, *Nûbihar*, j. 4, Çileyê Paşîn 1993, r. 28-29



Kafî mezin bû  
Gwîzkan dide.  
Nuha Ristîcan  
Raje gwîzkê  
Bibe nava gund  
Û bide Kîrman  
Da nex birêse  
Wan nexan bîgir  
Û bide Cûmker  
Da caw çêbike  
Cawê xwe bigir  
Û bide Rengrêj  
Da rengî bike  
Dûre jî bibe  
Û bide Terzî  
Da Mîrza Terzî  
Destan pê bike  
Ji bona îdê  
Cil ji te re çêke”<sup>410</sup>

Ristiyê biçûk gotina bavê xwe dike. Çawa ku bavê wî rê daye li ber wî, yek bi yek diçe li cem wan kesan ku di dawiyê de bibe xwedî cilekî (kincekî). Ristî bi dorê diçe li cem kîrman, cûmker, rengrêj û terzî. Di dawiyê de kinca ku ji bo wî hatiye çêkirin hildide û roja eydê li xwe dike. Dema diçe li cem zarokan zarok pê kêfxweş dibin û çîrok wiha diqede:

“Çivikê me  
Çivikê jêhatî û zereng  
Teyrê teyran  
Roja îde  
Kinc li xwe kir  
Hat nav zarokan

---

<sup>410</sup> M. Azad-Sabah Kara, “Çîroka Ristî”, *Nûbihar*, j. 6, Adar 1993, r. 24-29

Zarok lê mêzandin

Û hemû bi hev re

Lê kirin navî:

-Ristî!

Ristî!

Ristî!

Han Ristiyê me

Ji vê bûyerê

Vî navê delal

Li xwe hilanî.<sup>»411</sup>

**Peyam:** Di vê çîrokê de çivîkê leheng gotina bavê xwe dike. Ji vê hêlê ve ji bo zarokan dibe mîna keke baş. Lewra mezin dixwazin ku zarok guh bidin gotinên wan û tiştên nebaş nekin. Di vê fablê de jî tiştên ku derdikeve li pêş ev e, bi wesîleya heywanekî ji zarokan re peyam tînin dayîn. Ya din jî kincek çawa tê çêkirin, kî ji bo çêkirina kincan dixebite ev gav bi gav hatiye vegotin. Yanî ewil ta, paşê ta dibe caw yanî perçeyek qumaş, paşê reng lê tê kirin û paşê terzî wê didirûn û kinc derdikeve holê. Ji bo agahî dayînê jî ev fabl ji bo zarokan bifeyde ye.

#### 14.4. Çirçirik û Morî

Çîroka La Fontaine ya navdar “Çirçirik û Morî” ya ku çirçirika teral naxebite, lê morî xwedî xîret e her tim dixebite, hewl dide û zivistanê baş derbas dike li cihanê belav bûye. Ji bo ku zarokên kurd jî vê çîrokê bizanibin ev fabl di hejmarê 9emîn a kovarê de ji hêla Îrşad Seyda ve hatiye wergerandin.

“Çirçirik ta havînê

Xilas be distirîne

Wextê dibê zivistan

Li wê dibê taristan

Kurm û mêşa nabîne

---

<sup>411</sup> H. r.

Gelek pusman dimîne  
Ew diçe mala mêtû  
Dibê "Birçîme îrû  
Hinek xwarin dixwazim  
Ko bû havîn dibazim  
Cehdê tînim bi fayîz  
Nahêlim bighê payîz  
Ger ne ez nebim kêzik  
Bêjin tu çiqa hîzik"  
Merû çendî xweşmêr e  
Le çavteng e newêr e  
Dibê "Qusûre nenêr  
Havîn demik wekî zêr  
Gelo te çi dikira  
Evqa der û devera"  
Go: "Mi her dem distirand  
Çirçirîkim dilorand  
Ma ne delal e ev hal?"  
Meruwî go "Ey heval  
Heger ev karek rind bê  
"Niha bigre govendê"<sup>412</sup>

**Peyam:** Morî heywanên jîr û jêhatîne. Her tim an bi tena serê, xwe an jî bi komî dixebitin, Ji bo zivistanê ji xwe re xwarinê berhev dikin ku di wê demsala sar de bi rehetî bijîn. Lê Çirçirik ji li hember moriyan heywanên bêxem in, îro hebe dixwin, sibê nafikirin ku ka ew ê çi bikin. Di vê çîrokê de herdu heywan, tevger û jiyana wan hatine muqayesekirin. Ji zarokan re dersek hatiye dayîn ku dibêje çi dibe

---

<sup>412</sup> Îrşad Seyda, "Çirçirîk û Mêtû", *Nûbihar*, j. 9, Hezîran 1993, r. 28

bila bibe divê mirov bixebite û mihtacê kesî nebe. Zimanê xelqê li ser xwe nede dirêjkirin û nebe pêkenokê mirovan.

#### 14.5. Pêşbaziya Kerguh û Kosî

Di kovara Nûbiharê hejmara 34 û 35emîn a du hejmar bi hev re hatine çapkirin de jî fableke Ezop (Aesop)<sup>413</sup> ya bi navê “The Tortoise and the Hare” (Pêşbaziya Kerguh û Kosî) hatiye weşandin. Wek ku tê zanîn kerguh heywanekî ku dikare bi lez û bez bireve û zû bimeşe, kusî jî wek heywanekî dereng dimeşe û temendirêjiya xwe tê nasîn.

Di vê çîrokê de kusî û kêvroşkek dikevin pêşbaziye ku bigihêjin serê girekî. Kerguh di destpêkê de direve diçe û dinihêre ku kusî gelek li paş wî maye. Dibêje çawa bibe kusî nikare bigihêje wî û li bin darekê radizê. Kusî tê wî derbas dibe û digihêje serê gir. Dema kerguh radibe û dibîne ku kusî ji wî derbas bûye, pir aciz dibe. Ji wê şermê êdî qet behsa lez û bezê nake. Ev ji wî re dibe derseke baş.

Xelîl Amedê amadekarê beşa Zaroknameyê dema çîrok diqede, bangî zarokên kurd dike û wiha dibêje: “Birak û zarokên delal! Em zarokên kurd, emê ne wekî kerguh bin. Emê wek kerguh ranezên. Emê bixwînin, binîvîsin, xebatê bikin, da ku em ji vê xewa tarî, xewa bindestiyê xelas bibin.”<sup>414</sup>

**Peyam:** Wek ku tê dîtin Amed bi rêya vê fablê xwestiye ku ji zarokên kurd re bibêje wek kerguh nebin. Piştî baweriyeke pûç û vala nekevin xewê. Wek kusî bi xwe bawer bin, bixebitin, giran, lê baş bimeşin da ku hûn bigihêjin armanca xwe. Lê hevoka dawiyê ya ku dibêje “...da ku em ji vê xewa tarî, xewa bindestiyê xelas bibin.” rewşa kurdan a bindestiyê û ya bin zilmê nîşan dide ku ev peyam ji bo zarokan hinekî giran e ku bê fêmkirin.

#### 14.6. Mêraniya Gêrik

Di hejmara 36emîn a kovarê de di beşa Zarokname/2an de fableke bi navê “Şêr û Kergu” ya Beydaba û fableke bi navê “Mêraniya Gêrik” du fabl hatine nivîsandin. Di fabla “Mêraniya Gêrik” de bûyer di nav du heywanên ji hev cuda devlok (fil) û gêrik (morî) de derbas dibe. Wek ku tê zanîn fil heywanekî qirase, mezin; gêrik jî

<sup>413</sup> [https://en.wikipedia.org/wiki/The\\_Tortoise\\_and\\_the\\_Hare](https://en.wikipedia.org/wiki/The_Tortoise_and_the_Hare) 07.04.2016/ 18.19

<sup>414</sup> Xelîl Amed, “Pêşbaziya Kerguh û Kosî”, *Nûbihar*, j. 34-35, Tîrmeh-Tebax 1995, r. 46

berevajî vê heywanekî biçûk e. Herdu heywan dibin heval û rojekê ji xwe re dimeşîn. Morî lê dinihêre ku hema hindik maye fil pêl li ser wî bike û wî bipelçiqîne. Ji hevalê xwe re dibêje ku hinek baldar be ku wî nepelçiqîne. Lê fil pozbilindiyê û quretiyê dike, hema pêlî li ser morî dike. Morî dikeve li bin kevirekî û xwe ji pelçiqandinê xilas dike. Lê ji bo tolhildanê pozê fil gez dike. Xwîn ji pozê fil diherike û ambulans tê filê dibin nexweşxaneyê. Îjar morî poşman dibe û dide li dû ambulansê ku xwe bigîhîne nexweşxaneyê. Yên ku wî dibînin, ji morî re dibêjin ka îca ew çî dixwaze, ma ne bes e ev tevgera wî. Morî ji wan re dibêje ku ew ditirse fila hevalê wî bimre û wiha dibêje: “Ez dibêm belkî ji hevalê min re xwîn lazim bibe. Ji bo ku nemre, ez ê xwîna xwe bidimê.”<sup>415</sup>

**Peyam:** Di vê fablê de ji zarokan re hin ders hatine dayîn. Yek ji wan ew e ku divê mirov pozbilind û qure nebe, kesên biçûk, lawaz an jî hêza wan kêm re neheqiyê neke. Ya duduyan dema yek neheqiyê bike, şer û pevçûn çêbibe jî divê mirov zalim nebe, sînora vê dijminatîyê jî divê hebe. Divê mirov piştî xeletiyekê poşman bibe û hewl bide ku ew xeletî ji holê rabe. Ya sisêyan jî her çiqas hinek tişt li ber çavên mirov xelet xuya bikin jî divê pêşdarizandin neyê kirin, lewra mirov niyetê nizane. Wek mînak di fablê de dema morî li dû ambulansê diçe û yê din wisa zen dîkin ku ew ê tiştekî xirab bike, an dibe ku filê bikuje, lê niyeta wî alîkarî ye. Divê mirov ecele neke tiştekî nebêje, lewra dibe ku li pişt perdê niyetek din hebe.

#### 14.7. Şêr û Kerguh

Di fabla bi navê “Şêr û Kerguh” de behsa şêrekî zalim ê ku zor û zextiyê li ser heywanan dike û kêvroşkekî ku dixwaze serî li ber wî hilde, hemû heywanên di daristanê de dijîn ji zilma şêr xilas bike, hatiye kirin. Di çîrokê de tê gotin ku şêr her roj heywanekî dixwe û hindik dimîne ku koka heywanan biqele. Kêvroşkê ku ji vê rewşê aciz dibe, jibo şêr dek û dolabekê amade dike. Kêvroşk ji wî re dibêje ku şêrekî din jî li daristanê dijî û dibêje şahê vê daristanê ne ew e, “ez im”. Şêrê zilimkar ji vê meydaxwendinê aciz dibe, lewra dibêje şahê vê daristanê ew e. Kêvroşk ji wî re dibêje ku “were ez te bibim li cem wî şêrî” û şêr tîne li ber bîrekî. Dema şêr li ser bîrê re xwar dibe û di siya avê de şêrekî dibîne wisa zen dike ku ev şêr şêrekî din e.

<sup>415</sup> Xelîl Amed, “Mêraniya Gêrik”, *Nûbihar*, j. 36, Îlon 1995, r. 23

Şêr xwe diavêje bîrê û dixeniqe. Kêvroşk bi vê dafikê ve heyfa hevalên xwe hildide û hemû heywan di nav bextewariyê de dijîn.<sup>416</sup>

**Peyam:** Di vir de her çiqas di dawiya çîrokê de şêr miribe û peyva mirinê hatibe bikarnanîn jî, Beydaba xwestiye bibêje ku kî zilmê û nebaşiyê bike, dawiya emrê wî nebaş dibe û ew tu caran xêrê li xwe nabîne. Peyama duduyan jî ew e ku, kesek çiqas zorbe û zilimkar dibe bila bibe, miheqeq kesekî ku li hember wî/wê dikare li ber xwe bide, heye. Ev kes dibe sedema têkçûna wî/wê. Ji ber vê divê kes heqê kesî nexwe û zilmê li yên din neke.

#### 14.8. Şêr û mişk

Quretî û pozbilindî tevgereke nebaş e û xêra wê ji tu kesî re tune. Ji ber ku zarok wisa tevnegerin fableke din a ku vê tevgerê rexne dike jî di hejmarê 47an de ji hêla Xelîl Amed ve hatiye nivîsandin. Di bin beşa Zarokname/10an de bi navê “Şêr û Mişk” fableke ku wêneyê wê jî heye, hatiye amadekirin.

Di fablê de tê gotin ku şêrekî pozbilind û mexrûr hebûye. Şêr rojekê radizê, mişkek derdikeve li ser piştê wî û ew ji xewê hişyar dibe û gelekî jî aciz dibe. Şêr mişko digre. Mişk ditirse û lêborînê jê dixwaze û dibêje ku heke ew bê azadkirin, ew ê vê qenciya şêr jibîr neke. Mişk dibêje ku heke rojekê hewcedariya şêr alîkariyê çêbibe, ew ê alîkariya şêr bike. Şêr bi tevgereke pozbilind dikene û henekan pê dike. Dibêje ku mişkekî evqas biçûk wê çawa alîkariya wî bike. Pişt re dev ji mişk berdide û wî serbest dihêle. Çend roj derbas dibin û şêr rojekê dikeve dafika nêçîrvanekî. Ka em binihêrin fablê çawa diqede:

“Şer bi wîyalî û viyalî xwe vedigevizîne nikane ji torê xelas bibe. Çima wê çaxê mişkê piçûk di wê derê re derbas nabe! Mêze dike şêrê ku qencî li wî kiribû di torê de ye. Dibêje, dem ev dem e, bi zûkahî diçe cem şêr û ji şêr re dibêje:

- "Hey hevalê şer, min ji te renegotibû ku ezê jî rojekê qencyekê bi te bikim, aha ew dem ev dem e."

Dûv gotinê mişkê me ye jîr bi didane xwe benê torê dikurisîne heta ku şêr jê derdikeve û xelas dibe. Şer pir sipasan ji mişk re dike û nema wek berê bi pozbilindî li kesî dinihêre.”<sup>417</sup>

<sup>416</sup> Xelîl Amed, “Şêr û Kerguh”, *Nûbihar*, j. 36, Îlon 1995, r. 24

**Peyam:** Wek ku tê dîtin dinya ne bi zorê, bi dorê ye. Dewran diguhere û şêrê pozbilind û bihêz muhtacê mişkekî dibe. Ji zarokan re tê gotin ku çi dibe, bila bibe mezin neaxivin, quretiyê nekin ku dema rewşa we xirab bû û hûn ketin halekî nebaş, bila hûn şermî nebin. Ya din jî qenciyan ji bîr nekin, her tim alîkariyê bikin.

#### 14.9. Çîroka Dîko û Kîso

Di fablan de gelek heywan henin, lê zêdetir navê rovî, kîvroşk, pisîk û kusiyan derbas dibin. Di hejmara 108êmin de Rojbîn Özkan di bin banê “Nûbihara Biçûkan” de fableke bi serenava “Çîroka Dîko û Kîso” nivîsandiye. Li vir jî kusiyeke heye. Di nivîsê de kîsoyê û dîkek jî hatine xêzkirin ku ev fabl zêdetir bala zarokan bikişîne.

Çîrok wek ku ji seronavê xuya dike, di navbera kusiyeke û dîkekê de derbas dibe. Herdu heval biryar didin ku bibin şîrêkê hevdu yê cotkariyê û amadehiya xwe bikin. Herdu leheng tovê cotkariyê berhev dikin û benda salê dimînin. Lê dîk rehet nasekine, hema her roj hinekî tovê ku hatiye berhevkirin dixwe. Dema kusî pê dihesa ku dîko tov xwariye û hindik maye nîvî bibe, hêrs dibe û li dîk dixwe. Dîk jî bi nikulê xwe ve çavê kusî kor dike. Doza wan safî nabe û diçin li ba şerîata bumî û meseleyê ji wî re dibêjin. Bum yek bi yek hevokên wan şîrove dike û di dawiyê de wiha dibêje: “bi eniya xwe ya pam kim, min ya xwe got; dîk û kîso nabin şîrêkên hev ên cot. Çîroka min li diyaran rehme li dê û bavê guhdaran, ji bilî fesadên ber dîwaran.”<sup>418</sup>

**Peyam û şîrove:** Şîrîkatî gelek caran çawa ku di navbera mirovan de dibe pirsgirêk, di navbera heywanan de jî dibe sedema lihevexistinê û şer. Di vê çîrokê de ev baş hatiye gotin. Hevaltî cuda, şîrîkatî jî cuda ye. Çîrok ji hêla gotin û nivîsê ve li gor zarokan zêde giran nîne, yanê ew dikarin bi rehetî bixwînin. Lê ji ber ku ji zarokan re hatiye gotin, di dawiyê de nivîskarê dikaribû bi çend hevpekan re bigota ku pevçûn û şer tişteke nebaş e û bala zarokan li ser vê bikişanda. Ya din jî dema behsa şêrê herdu heywanan tê kirin tê gotin ku “dîk bi nikulê xwe ve çavê kusî kor dike”. Ev gotin dibe ku zarokan bitirsine û xemgîn bike. Şûna vê gotinek veşartî yanê wek “herdu hevalan li hev nekirin û şer kirin” bihata gotin ji hêla pedagojiyê ve wê baştir bûbûya.

---

<sup>417</sup> Xelil Amed, “Şêr û Mişk”, *Nûbihar*, j. 47, Tebax 1996, r. 29

<sup>418</sup> Rojbîn Özkan, “Çîroka Dîko û Kîso”, *Nûbihar*, j. 108, Havîn 2009, r. 93

#### 14.10. Kûsî û Şêr

Dîsa fableke ku lehengê wê kûsî ye balê dikşîne. Vê carê nivîskarekî cuda ev fabl nivîsandiye ku navê wî Şivan Ar e. Ar di hejmara 110emîn a kovarê di beşa “Nûbihara Biçûkan” de fableke bi navê “Kûsî û Şêr” ji bo zarokan amade kiriye. Di fablê de tê gotin ku şêrekî birîndar dixê axê ax û nale nal. Kûsiyek diçe li cem şêr û dibêje ku ka ew çima dinale. Şêr wiha dibêje:

“Welle ez birîndar im...

Kûsî: Apê şêr! Zaroyê me derketibûn nêçîrê, gelo ewana çu gûyekî welê belav nekiribin?

Şêr jî wisa li kûsî mêze dike: “Laa hewlewelaaaa...”

Û Piştê jî dibêje: “Ez namirim bi vê derbê, ezê bimirim ji vê kerbê.”

Ango kûsî jî sola xwe xistiye nav solên mêran.”<sup>419</sup>

**Peyam:** Wek ku tê zanîn şêr di nav heywanan de yekî xwedî hêz û xurt e. Zû bi zû heywan bela xwe li wî nadin, heta wisa ku gelek ji wî ditirsin. Lê li vir kûsiyek yanî heywanekî li gor şêr hêza wî hema bibêje tune ye xwe dixê hevalê şêr û ji wî re dibêje “dibe ku zarokên wê şêr birîndar kiribin.” Yanê xwe mezin dihesibîne, di asta şêr de dibîne. Di vê fablê de biwêjeke resen a kurdî ya ku dibêje “Solê xwe xistiye nav solên mêran” hatiye bikaranîn ku ew jî tê meneya xwe tiştê hesibandin. Li vir ji bo zarokan dersek heye ku dibêje mirov divê li gor hêza xwe tevbigere û biaxive. Divê mirov gotinên ji xwe mezintir nebêje. Lewra mirov dikeve nav rewşeke komîk û nebaş.

#### 14.11. Îcar Ev Rast e

Wek kûsî kêvroşk jî gelek caran di fablan de dibin lehengên sereke û mijar li ser wan tê gotin. Di Nûbiharê hejmara 111emîn de jî dîsa fableke kêvroşkan balê dikşîne. S. Dilovan di beşa “Nûbihara Biçûkan” de fableke serenava wê “Îcar Ev Rast e” nivîsandiye. Di fablê de behsa kêvroşkekê û çêlikên wê tê kirin. Di nivîsê de wêneyê kêvroşkeke xweşik jî heye ku balê dikşîne. Di nivîsê de tê gotin ku kêvroşkek û çêlikên wê di nav zeviyekê de dijîn û fabl wiha dewam dike:

<sup>419</sup> Şivan Ar, “Kûsî û Şêr”, *Nûbihar*, j. 110, Zivistan 2010, r. 92



“Bû havîn zad çêbû. Xwediyê zevî hat got: “Ez sibêhê te bi nivî bidirûm û êvarê jî xilas bikim.”

Çêlikên kîvroşkê gotin: “Dayê em herin, xilas bikin!”

Kîvroşkê got, “Na lawo, ev ne rast e.”

Pale zevî xilas nekir, roja din hat eynî tişt got, kîvroşkê jî eynî bersiv ji çêlikên xwe re got.

Piştî çend rojan pale aciz bûbû êdî.

Got: “Ez dibêmez agirekî berdim vî zeviyê û xwe jê xilas bikim.”

Kîvroşkê got: “Lawo, îcar ev rast e.”<sup>420</sup>

**Peyam:** Di vê çîroka kurt de dersek ew e ku zarok ji ber ku temenê wan biçûk in, li gor mezinan her tiştî zû bawer dikin. Mezin xwedî tecrube ne û ji zarokan bêtir dizanin. Divê mirov ji her gotinê bawer neke. Ya din jî dayik bêtir zana ne û divê mirov gotina dayikan bike û guh bide tecrubeyên wan.

**Tablo 13: Tabloya Fablan**

Jimar	Nivîskar	Fabl	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Hemîd Gorûgan-Sabah Kara	Barana Şadî	3	24 25	Berçile, 1992
2	Sabah Kara	Pîtros	4	28 29	Çileya Paşîn, 1993
3	M.Azad-Sabah Kara	Çîroka Ristî	6	24 29	Adar, 1993
4	Îrşad Seyda	Çirçirîk û Mêrû	9	28	Hezîran, 1993

<sup>420</sup> S. Dilovan, “Îcar Ev Rast e”, *Nûbihar*, j. 111, Bihar 2010, r. 93

5	Xelîl Amed	Pêşbaziya Kerguh û Kosî	34 35	46	Tîrmeh- Tebax, 1995
6	Xelîl Amed	Mêraniya Gêrik	36	25	Îlon, 1995
7	Xelîl Amed	Şêr û Kergu	36	25	Îlon, 1995
8	Xelîl Amed	Şêr û Mişk	47	29	Tebax, 1996
9	Rojbîn Özkan	Çîroka Dîko û Kîso	108	93	Havîn, 2009
10	Şivan Ar	Kûsî û Şêr	110	92	Zivistan, 2010
11	S. Dilovan	Îcar ev rast e	111	93	Bihar, 2010

## 2.2.15. Ji Hêla Kêfanînê (Mîzah) Ve Naveroka Zaroknameyê

### 2.2.15.1. Karîkatur

Zarok çawa ku xwendinê û guhdarkirinê hez dikin, qasî wê wêne û xêzan jî hez dikin. Heta wisa ku wêne û xêzên rengîn gelek caran ji nivîsan zêdetir bala wan dikşîne. Karîkatur jî cureyek mîzahê ye û zarok pê kêfxweş dibin. Karikatur wêneyên ecêb û komîk in, mirovan didin kenandin. Lê di heman demê de peyamên taybet didin û rexneyan dikin. Li gor nivîsan zêdetir balê dikşînin, di hişê mirovan de zûtir cih digrin, rêya mîzah û rexneyê li ber însanan vedikin. Li gor Saziya Ziman a Tirkan karikatur; wêneyê ku hemû mijarên der barê mirov û civakê de bi awayekî mubalaxa dide, him mirovan dikenîne û him jî dibe sedema fikirandinê.<sup>421</sup> Heke di mijarekê de rexneyên tûj bînin kirin, dibe ku ev rexne muxatabê xwe biêşîne û hêrs bike. Lê dema bi karîkaturê ve ev rexne bê kirin mirov nermtir tevdişêrin û zêde li ber xwe nakevin.

<sup>421</sup>[http://www.tdk.gov.tr/index.php?option=com\\_gts&kelime=KAR%C4%B0KAT%C3%9CR](http://www.tdk.gov.tr/index.php?option=com_gts&kelime=KAR%C4%B0KAT%C3%9CR)  
12.05.2016/15.14

Karîkatur ji bo perwerdeyê jî rêbazeke baş e ku Prof. Dr. Atila Özer der barê vê de wiha dibêje: “Li gor min heke bê xwestin, karîkatur dikare perwerde û hînîkirinê balkêştir bike. Karîkatur dîtbarî ye (xîtabê çav dike), şêrîn e, balkêş e, tiştêkî wisa ye ku derfeta nîqaşîkirinê dide mirov.”<sup>422</sup> Bihêle ji bo perwerdeyê, ji bo kêf û henekê jî di edebiyata zarokan a kurdî de karîkatur pir kêr in. Ev kêmasî di Zaroknameyê de jî tê dîtin. Dema beşên Zaroknameyan bînin lêkolînkirin, wê bê dîtin ku beş ji hêla karîkaturan ve pir çêdibe. Lewra di hemû beşên Zaroknameyê de heta niha bi tenê karîkaturek hatiye xêzkirin. Ji bilî vê tu karîkatur tune. Yanê ji bilî wêne û xêzên ku di nivîsan de hatine xêzkirin, wek karîkatur bi tena serê xwe karîkaturek heye.

Di hejmara 36emîn de bi navê “Dilocan” karîkaturek di beşa Zaroknameyê de hatiye xêzkirin. Di vê karîkaturê de zarokêkî ku cil û bergên kurdî li xwe kiriye û piştêk li piştê xwe alandiye heye. Cil û bergên wî qilêr in. Ji çavên wî û nêrînên wî jî wisa xuya dike ku wî tiştêkî nebaş kiriye. Di karîkaturê de dayika wî jê re dibêje ku ji ber ku wî cil û bergên xwe pîs kiriye, ewê xwarinê nede wî. Dema ku Dilocan vê cezayê dibîhîze, şûna ku li ber xwe bikeve û xemgîn bibe ji dayika xwe re dibêje: “Bila be Yadê! Hûnê jî xwarinê nexwin. Ji berku min gişt qedand!”<sup>423</sup>

**Tablo 14: Tabloya Karîkaturê**

Jimar	Karîkatur	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Dilocan	Xelîl Dost	36	25	Îlon 1995

### 2.2.16. Nasandina Berheman

Ji bo zarokan xwendin tiştêkî girîng e, lewra tehmê dide jiyana wan û deriyê cîhaneke din ji wan re vedike. Hezkirina xwendinê jî bi berhemen xweş, biqîmet û hêja ve çêdibe. Ji ber vê mezin gelek caran rê nîşanî zarokan didin û ji wan re

<sup>422</sup> Atila Özer, “Karikatür ve Eğitim”, *Millî Eğitim Bakanlığı Eğitim Dergisi*, Sayı: 84, Şubat 2007, Ankara, r. 21

<sup>423</sup> Xelîl Dost, “Dilocan”, *Nûbihar*, j. 36, Îlon 1995, r. 25

rêberiyê dikin ku ew berhem û pirtûkên baş hilbijêrin ku paşê poşman nebin û xwendinê hez bikin. Ji zarokan re pêşniyazkirina berheman mijareke hesas e û divê mezin him berhemên ku li cîhanê û him jî berhemên ku li civaka ku zarok lê dijî, pêşniyazê zarokan bikin.

Di beşên Zaroknameyê de nasandina berheman hema bibêje qet tune. Bi tenê di hejmara 109emîn a kovarê de amadekara beşa “Nûbihara Biçûkan” Rojbîn Özkan xwestiyê zarok ji edebiyatê bê par nemînin. Ji ber vê bi serenava “Berhemek” behsa ferhenga Ehmedê Xanî ya ku ji bo zarokan nivîsandiye dike û wiha dibêje:

“Ehmedê Xanî ferhenda xwe ya bi navê Nûbihara Biçûkan di sala 1683’yan de, anga 11 sal beriya temamkirina “Mem û Zînê” nivîsandiye. Ferheng ji destpêkek, 13 beşan û 954 bêjeyan pêk tê. Xanî di malikeke destpêkê de bi zelalî diyar dike ku wî ev ferhenga han ji bo zarokên kurdan amade kiriye. Malik ev e:

Ne ji bo sahib rewacan

Belkî ji bo biçûkekî kurmancan

Ji malika jî tê fêmkirin ku wî xwestiyê piştî xilaskirina Qur’anê ev ferheng wek kitêba dersê bê xwendin. Xanî di vê malikê de jî wiha dibêje:

Wekî ji Qur’anê xilas bin

Lazim e li sewadê çavnas bin”<sup>424</sup>

Li ser vê nivîsê wêneyê berhema Ehmedê Xanî ya bi navê “Nûbihara Biçûkan” jî hatiye weşandin.

**Peyam û Şîrove:** Li vir behsa pirtûkeke Ehmedê Xanî yê ku di nav kurdan de pir navdar e hatiye kirin. Ji bo ku haya zarokan koka wan, çand û huneran wan hebe nasandina vê berhemê ji bo wan baş e. Zimanekî hêsan hatiye bikaranîn. Gelemperî mirov dikare bibêje ku di beşê de heke behsa hin pirtûk, ferheng û berhemên kurdî an biyanî bihatana kirin wê ji bo zarokan baştir bûbûya. Lewra zarok gelek caran li gor pêşniyazan pirtûkan dixwînin û ev jî dibe sedem ku fikr û hestên wan dewlemend bibe. Lê beş ji vê hêlê ve jî gelekî qels maye.

---

<sup>424</sup> Rojbîn Özkan, “Berhemek”, *Nûbihar*, j. 109, Payîz 2009, r. 92

**Tablo 15: Tabloya Nasandina Berheman**

Jimar	Berhem	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Berhemek (Nûbihara Biçûkan Ehmedê Xanî)	Rojbîn Özkan	109	92	Payîz 2009

### 2.2.17. Nameyên Zarokan

Di kovaran de dema ku xwendevan bi nameyan fikrên xwe yê der barê weşan û nivîskaran de dibêjin, berpirsyar û nivîskarên kovaran kêfxweş dibin. Lewra ev pêşniyaz, rexne û şîrove wan pêşve dibe û li gor van fikran nivîsên baştir tên weşandin. Lê dema ku Zarokname hat lêkolînkirin, hat dîtin ku kovar ji vê hêlê ve ne dewlemend e.

Di hemû hejmaran de bi tenê du nameyên zarokan hatine weşandin bes hew. Di hejmara 108emîn de di bin beşa “Nûbihara Biçûkan” de Rojbîn Özkanê ji zarokan xwestiye ku ew ji Nûbiharê re nameyan bişînin. Lê ev banga wê jî nebûye sedem ku zarok ji kovarê re nameyan bişînin. Ji bo ku zarok nameyan bişînin Özkanê wiha gotiye:

“Tika: Zarokên hêja! Em dixwazin hûn jî di van rûpelên Nûbihara Biçûkan de raman û daxwazên xwe bînin ziman. Navnîşana me ev e: zarokname@gmail.com.”<sup>425</sup>

#### 2.2.17.1. Name: Nûdem Elçî

Di gelemperî beşa Zarokname û Nûbihara Biçûkan de wek ku hat gotin nameyên zarokan zêde tunene. Di hejmara 111an de nameyeke zarokekê ya bi navê Nûdem Elçî hatiye weşandin. Nameya Nûdemê bi silavê ve dest pê dika û ew hestên xwe tîne ziman. Nûdem Elçiyê wiha nivîsandiye:

<sup>425</sup> Rojbîn Özkan, “Tika”, *Nûbihar*, j. 108, Havîn 2009, r. 92

“Beriya her tiştî ez gelek spas dikim ji we re. We rûpelek hûlê ji me e veqetandiye. Ez dixwazim perwerdehiya zimanê kurdî hebe. Gelo kî divê kurdî biemile? Xwezî herî zêde kurdên kurdî nizanin biemiliyana kurdî. Bixebitiyana û pirtûk bixwendana. Û tiştên weke van bikiriyana. Min pir diviya we tişteke hûlê bikirîa mesela. Ji dêwla rûpelekê we kovarek çêkîra. Nivîskar hemû zarok bûna. Lê zor e. Gelek zarok kurdî nizanin. Lê însaallah bi xêra yên weke we ew ê jî çêbibe. Ya rast min gelek divê. Ez bi xwe ewle dibim. Ez dikarim bibim nivîskareke kovara zarokan. Kurdî binivîsim. Hem jî bi xwe gelek ewle dibim. Jixwe ezê ji bo vê gelek bixebitim. Lewra ezê kovareke zarokan derxim. Ev xeyala min e. Lewma jî ezê bixebitim û kovarekê derxim. Bila nivîskar hemû zarok bin. Min gîlek divê bibim nivîskar. Lewra nivîskarî tişteki gelek xweş e, gelekî bi qîmet e. Însaallah ezê bibim nivîskar. Min ev gelek divê. Derxistina kovarekê û nivîskarî gelek xweş e. Ez dixwazim vê xeyalê bikim rastî Însaallah wê bibe rastîn. Însaallah ev rûpela dê bibe kovarek...ez jî biim nivîskar...qewet be ji we re.

Ferhengok: min divê: ez dixwazim / hûlê: wiha

Biemilim: hîn bibim/ bivê: bixwaze”<sup>426</sup>

**Peyam:** Di nameyê de Nûdem Elçî spasiya rayedarên kovarê dike û dibêje xwezî şûna rûpelek a ku ji bo zarokan hatiye veqetandin, kovarek rasterast ji bo zarokan bihata weşandin û nivîskarên wê jî zarok bûbûna. Nûdem xeyala xwe ya nivîskariyê nivîsandiye û gotiye ku ew ê ji bo vê xeyala xwe bixebite. Bi rastî wek daxwaza Nûdemê me jî dixwest ku Nûbiharê rasterast kovarek ji bo zarokan biweşanda ku me jî li ser wê lêkolîn bikira.

### 2.2.17.2. Nameya Tombîşê Ji Zehrayê re

Di hejmarê 112emîn de Selman Dilovan bi navê “Nameya Tombîşê Ji Zehrayê re” di beşa Nûbihara Biçûkan de nameyek weşandiye. Ev ne nameye ku ji hêla zarokekî ve ji Nûbiharê re hatiye şandin. Name ji devê pêlîstokekê, ji zarokekê re hatiye nivîsandin. Lê ji ber ku name ye me di bin vê beşê de behsa vê nameyê kir.

Tombîş pêlîstokeke hirç e û yanê navê pêlîstoka Zehrayê ye. Li gor vê nameyê Tombîş çûye gerê û ji wir nameyekê ji hevala xwe Zehrayê re şandiye. Ew di

---

<sup>426</sup> “Name: Nûdem Elçî”, *Nûbihar*, j. 111, Bihar 2010, r. 93

nameyê de dibêje ku wî pir bîriya Zehrayê kiriye û behsa gera xwe dike. Tombîş wiha dibêje:

“Ev der pir xweş in. Ez çûm çarşiyê û hebekî geriyam. Paşê çûm tevî zarokan listim. Zarokan bi Almankî qise dikirin. Min jî hebekî dizanî çimkî te Almankî rayî min dabû. Du zarokan jî bi hev re Kurdî qise dikirin. Paşê min jî bi wan re Kurdî qise kir. Navê yekê Zelal bû, navê yê din jî Azad bû. Zelal ji min re got: “Tu hem Kurdî jî dizanî hem jî Almankî. Tu pir zimanan dizanî.” Kefa min pir hat. Tu zanî min ji wan re çi got? Min got: “Hevala min heye, navê wê Zehra ye. Çar salî ye diçe kîndergartînê. Ew hem Kurdî dizane, hem almankî dizane, hem jî Tirkî dizane. Hem jî dizane Ingîzîkî bijmêre jî!” We çaxê pir kêfa wan hat, gotin Maşellah Zehra pir jêhatiye.”<sup>427</sup>

Name dewam dike û di dawiyê de Tombîş dibêje ku ew li Diyarbekirê ye û wê di demek kin de vegere. Daxwazeke Tombîşê ji Zehrayê heye ku dema ew vegeheriya bila Zehra jê re strana “Diyarbekir warê min e” bibêje.

**Tablo 16: Tabloya Nameyên Zarokan**

Jimar	Name	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Name: Nûdem Elçî	Nûdem Elçî	111	93	Bihar 2010
2	Nameya Tombîşê Ji Zehrayê re	Selman Dilovan	112	94	Havîn 2010

### 2.2.18. Nasandina Zarokan

Di kovarên zarokan, an jî kovarên mezinan ên ku çend rûpelên wan ji bo zarokan hatine amadekirin de, carna wêneyên zarokan tên weşandin. Di bin van wêneyan de der barê wan zarokan de hin agahî tînin dayîn. Wek mînak ew çend salî ne, kî ne, çi hez dikin û h.w.d.. Di beşên Zaroknameyê de beşeke wiha nehatiye amadekirin. Bi tenê di hejmara 112emîn a ku hejmara dawîn a beşa Zaroknameyê de

<sup>427</sup> Selman Dilovan, “Nameya Tombîşê Ji Zehrayê re”, *Nûbihar*, j. 112, Havîn 2010, r. 94

behsa du zarokan hatiye kirin bes hew. Ew jî rastarest zêdetir behsa axaftin û tevgerên wan dike.

### 2.2.18.1. Pelda û Zehra

Selman Dilovan di hejmara 112emîn de di beşa “Nûbihara Biçûkan” de behsa du keçikên biçûk ên ku keçxaltiyên hev in dike. Li gor gotina wî Pelda heft 7 salî, Zehra jî sê salî ye û lê li gor temenên xwe ew du zarokên zana û jêhatî ne. Selman Dilovan behsa axaftinên herdu keçikan ên bi dayik û xaltiyên wan re û serpihatiyên wan dike.

Pelda her çiqas heft salî be jî di sê saliya xwe de li gor temenê xwe zana û wek mezinan diaxive. Wek mînak di nivîsa bi serenava “Ez baş im loma” de Pelda bi dayika xwe re wiha diaxive;

“Diya Pelda jê dipirse:

-Tu ji min hez dikî?

- Eee ez ji te hez dikim.

-Çima ji min hez dikî?

-Ez baş im loma!”<sup>428</sup>

Dîsa serpêhatiyeke Peldayê ya ku bi xwîşka wê re jî di bin serenava “Ez naxwazim şer bikim” de wiha hatiye behskirin;

“Xwîşka Peldayê Sumeyyeya jêhatî ku 12 salî ye, digot listokeke wê naxuyê. Diya wê jî got, berî niha bi demekê di destê Peldayê de bû. Pelda jî got: Na, min ranehîştîye tiştên wê. Sumeyye jî got, çima te tiştên min girtine. Yek ji vê, yek ji wê dest bi munaqeseyê kirim, lê Pelda hêrs bû û got: Hema abla, ez naxwazim bi te re şer bikim!”<sup>429</sup>

Piştî behskirina Peldayê, Selman Dilovan îja behsa Zehrayê û hin axaftinên wî dike. Ji ber ku temenê wê biçûk e, hin axaftinên wê wek zimanê zarokan hatiye nivîsandin. Zehra sê salî ye lê li gor temenê xwe gotinên mezin dike û bi awayekî

<sup>428</sup> Selman Dilovan, “Pelda û Zehra”, *Nûbihar*, j.112, Havîn 2010, r. 92

<sup>429</sup> H.r



zana diaxive. Bo nimûne di bin serenava “Zehra porên xwe boyax dike” de wiha hatiye nivîsandin;

“Hîn du salên xwe tamam nekiribûn:

Zehra û diya xwe rûniştibûn, Zehrayê got:

- Mamî, ez tişteki te le bêzim, lê hêls zî nebe, melak zî neke, tamam?

- Temam hêrs nabim.

- Kengê ez mezin bûm, ez polê xwe pembe dikim. Temam?”

Di bin serenava “Hema ev der sî ye” de jî Dilovan der barê Zehrayê de wiha nivîsandiye;

“Zehra li ber dîwar şeker da diya xwe. Diya wê got:

- Ez bi rojî me, naxwim.

- Rojî kingê xilas dibe.

- Kengî tav çû xilas dibe.

- Hema ev der sî ye!”<sup>430</sup>

Di herdu rûpêlên Nibûhara Biçûkan de wêneyek Peldayê û sê wêneyên Zehra yê hene. Pelda sergirtiye û di destê wê de pêlîstokeke wê heye. Zehra jî di herdu wêneyan de bi rûyekî şên û ken xuya dike.

**Tablo 17: Tabloya Nasandina Zarokan**

Jimar	Nasandina Zarokan	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Pelda û Zehra	Selman Dilovan	112	92-93-94	Havîn 2010

<sup>430</sup> Dilovan, “Pelda û Zehra”, r. 93

### 2.2.19. Nasandina Heywanan

Heywanhezî di zarokatiyê de dest pê dike. Jiyanê modern a li bajarên derfetê nade zarokan ku ew heywanên cuda nas bikin û bi wan re eleqedar bibin. Zarok ji ber ku nikarin ji nêz ve heywanan nas bikin, ancax bi saya kovaran, pirtûkan, televîzyon û internetê dikarin der barê heywanan de bibin xwedî agahî. Ji ber van sedeman mezin der barê heywanên cuda de divê agahiyan bidin zarokan. Heke derfet hebe, divê zarokan bibin gundan, xwezayê û baxçeyên heywanan û li wir heywanan nîşanî zarokan bidin.

Divê di kovarên zarokan de xêzkirina wêneyên heywanan û der barê wan de agahî dayîn hebin. Kovarên zarokan ên kurdî yê ku me di bin beşa yekem de behsa wan kiribû de gelek heywan hatine nasandin. Lê beşên Zaroknameyê di vî warî de qels e. Lewra bi tenê di hejmarekê de heywanek hatiye nasandin. Ew jî hejmara 109emîn e. Di bin beşa “Nûbihara Biçûkan” de Rojbîn Özkanê heywanek bi zarokan daye nasandin ku ev heywan kêvroşk e. Özkan dibêje zarokên delal û wiha behsa kêvroşkê dike;

“Kîvroşk, xêncî antartîka hema bêje li hemû cîhanê dijîn.

Ên kovî li çiya û baniyan ên kedî jî di malan de dijîn.

Hinekên wan di sertabên ku dikolin de dijîn hinek jî tu car sertabê nakolin di banegehan de dijîn. Taybetmendiyan kêvroşkan çavên wan gir û şeqên wan ên para ji ên pêşî hinekî dirêjtir in. Dûvê wan kin guh û simbêlên wan dirêj in. Kîvroşk, ajalên giyaxwur û bi guhan in. Kîvroşk 5-12 salan dijîn. Ji ber ku didanên wan gelek tuj in jî di nav ajalên kotînger de cih digrin.”<sup>431</sup>

Di çîrok û fablên ku di beşên Zaroknameyê de hatine nivîsandin de heywan derbas dibin, lê ji bilî vê hejmarê rasterast behsa wan nayê kirin û ew nayên nasandin. Ev ji bo zarokan kêmasiyek e.

---

<sup>431</sup> Rojbîn Özkan, “Kîvroşk”, *Nûbihar*, j.109, Payîz 2009, r. 93

**Tablo 18: Tabloya Nasandina Heywanan**

Jimar	Nasandina Heywanan	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Kîvroşk	Rojbîn Özkan	109	93	Payîz 2009

### 2.2.20. Bîranîn

Bîranîn ji serpêhatî û tecrubeyan pêk tê. Ew ji serê mirov derbas dibin û piştî demekî mirov wan bibîr tîne û kesên din re dibêje. Ev dibe ku der barê kesekî de, dibe ku der barê cihekî de, an jî dibe ku der barê bûyerekê de be. Gelek tişt ji serê mirovan derbas dibin, lê mirov ancax ên ku zêde tesîrê li ser mirov kirine, bi bîr tînin. Ji van hinek bîranînên baş in û hinek jî yên nebaş in. Alemdar Yalçın û Gıyasettin Aytaş der barê bîranînê de wiha dibêjin: “Tişt, çavdêrî û tecrubeyên ku mirov der barê jiyana xwe de bi bîr tîne û van rasterast dibêje ne.”<sup>432</sup>

Bîranîn ne tiştên nesnel û yên bi belgeyan ve tînin piştraskirin in, li gor tecrube û çavdêriyan tînin nivîsandin. Ji ber wê jî zimanê bîranînan zelal û sade ye, bi hesteke dilsozî tînin nivîsandin û tê de agahî derbas dibin. Bîranînên hin navdaran gelek caran ji ber ku agahiyên girîng, dîrok, felsefe û çandê di xwe de dihewînin girîng in. Divê kovaran de him bîranînên kesên navdar û him jî bîranînên zarokan bînin weşandin ku zarok jê îstifade bikin. Di beşên Zaroknameyê de ji vê hêlê ve jî kêmasî heye. Bi tenê du bîranîn hatine weşandin û herdu jî ji hêla Rojbîn Özkanê ve hatine nivîsandin.

#### 2.2.20. 1. Mirîşka Kurtê

Di hejmara 109emîn de Rojbîn Özkan di bin beşa “Nûbihara Biçûkan” de bi serenava “Mirîşka kurtê” ji devê zarokê behsa bîranînekê dike. Di nivîsê de tê gotin ku mirîşkeke bi navê Cinco heye ku ketiye kurkê û çêlikên wê çêbûne. Nivîs wiha ye:

<sup>432</sup> Yalçın-Aytaş, *Çocuk Edebiyatı*, r. 182

“Cinco navê mirîşka min a ku min herroj êm û av didayê û min gelek jê hezdikir bû. Lê ew çend roj bû ku Cinco ne êm dixwar û ne jî li cihê xwe dilivîya. Min tu me’ne nedida vê tevgera Cinco. Rojekê diya min ji min re got:

“Tu dizanî mirîşka te kurt e.”

Paşê diya min, hinek ka xiste nava selikekê û neh deh hêk danî ser kayê, me strana mirîşka kurtê got: Cû cû cû cû mirîşka kurtê de tu kerem ke were ser hêkê. Û me mirîşk danî ser hêkan.

Dema diya min mirîşk danî ser hêkan ji min re got: “Piştî bîst û yek rojên din wê çêlik ji hêkan derên.”

Ez gelek bi kelecana bûm. Û piştî bîst û yek rojên din dema ez çûm ku êm bidim mirîşkê, mîn dît mirîşka min ji ser hêkan rabûye û çendîn çêlikên rindik, ên zer, reş û sor serên xwe ji nav hêkan derxistine. Ez gelek şabûm. Piştî wê rojê min herroj êm û av dida çêlikan. Çêliket ji makên xwe venediqetiyay; maka wan jî baskên xwe vedikirin û hemû çêlikên xwe di binê baskên xwe de vedişartin. Min gelek dixwest ku çêlikan bigrim destên xwe, lê mixabin Cinco nedihîşt ez nêzî çêlikan bibim. Lê min dîsa jî, dev ji hezkirina çêlikan bernedida.”<sup>433</sup>

**Peyam:** Di vê bîranînê de him behsa heywanheziyê tê kirin û him jî der barê çêbûna çêlikên mirîşkan de agahî ji bo zarokan tê dayîn. Zimanekî hêsan û zelal hatiye bikaranîn. Zarokên ku meraq bikin ka gelo cûcîkên mirîşkan çawa çêdibin, bi saya vê bîranînê wê bikaribin bibin xwedî agahî.

### 2.2.20.2. Mol Axa

Di bîranîna navê “Mol Axa” de jî zarokek behsa bîranîneke xwe ya der barê daxwaza wê ya çûyîna zozanan dike. Di nivîsê de navê ku derbas dibin “Seyran”, “Mol Axa”, “Xezal” û “Dayik” in. Di hejmarê 112emîn de Rojbîn Özkan ji devê zarokekî behsa bîranîneke dike. Di nivîsê de tê gotin ku her sal gundî diçin zozanan. Lê ji ber ku di nav du eşîran de şerek çêbûye, gundî wê salê naçin zozanan. Ji ber wê zarok xemgîn dibin. Zaroka ku behsa bîranînê dike dibêje navê hevala wê Seyran e, ew û Seyran hevdu pir hez dikin. Eta Seyranê ya ku navê wê Xezal e jî yeka baş e û ew hevdu hez dikin. Zarok dibêje rojekê eta Seyranê Xezal gazî zarokan dike û

<sup>433</sup> Rojbîn Özkan, “Mirîşka Kurtê”, *Nûbihar*, j. 109, Payîz 2009, r. 93

dibêje ku xemgîn nebin, ew ê îsal herin zozanên Mol Axa. Keçika biçûk a ku ji me re bîranînê dibêje, diçe ji dayika xwe re dibêje ku bila jê re fistaneke rind bidirû ku ew ê herin zozanên Mol Axa. Dayika wê dikene û dibêje tamam. Hefteyek derbas dibe û roja ku divê ew herin zozanan tê. Keçik diçe mala hevala xwe Seyranê û ji eta wê Xezalê dipirse ku ka ew ê kingê herin zozanan. Bîranîn wiha dewam dike:

“ - Tu dizanî ji xwe Mol Axa jî hatiye pey me.

- Çima Mol Axa bi xwe hatiye pey me! Ma nikaribû xulamekî. (li vir nivîs nivîco maye)

- Ka em biçin jê bipirsin.

Xezalê destê min girt û ez birim ser sergo.

Waye ji te re Mol Axa! De bipirse.

Min li der û dorê xwe nihêrî tu kes tunebû. Min careke din bi baldarî nihêrî, tenê kûçikê malê Molo li wir bû. Min serê xwe rakir, li rûyê Xezalê mêze kir, Xezalê li min nihêrî û bi dengê bilind kenîya.

Te ez xapandim. Ez bi hêrs ji wir bi dûr ketim.

Xezalê wê rojê rûmeta min şikênandî bû. Ez gelek xemgîn bûm lê min sond xwaribû kunez tola xwe ji Xezalê hilînim.”<sup>434</sup>

Piştî tevgera Xezalê keçika ku bîranînê ji me re dibêje behsa tolhildana xwe dike. Dibêje ew jî rojekê diçe mala Xezalê û ji Xezalê re dibêje ku ew ê herin seyranê û dayika wê gazî Xezalê dike ku ew jî bila bi wan re were seyranê. Xezalê şa dibe û diçe mala wan. Lê dibîne ku ew naçin seyranê. Xezalê bi dayika wê re heta êvarê cilan dişo. Piştî vê tolhildanê Xezalê êdî keçikê naxapîne. Di bîranînê de wek ku tê dîtîn mezineke zarokekê dixapîne û henekan li wê dike. Zaroka ku bîranînê dibêje behsa dil şikestina xwe, pûçbûna xeyala xwe ya çûyîne zozanê û hêrsa xwe dike. Mezin dema ku hin caran dixwazin henekên xwe li zarokan bikin, divê bibaldar tevbigerin ku dilê zarokan bi wan henekan neşkê. Divê rûmeta wan nekeve li bin piyan, ew hêrs û xemgîn nebin. Di vê bîranînê de ev hest û raman bi awayekî baş hatiye vegotin. Zimanê nivîsê hêsan e û mirov dikare bibêje ku li gor asta zarokan e.

---

<sup>434</sup> Rojbîn Özkan, “Mol Axa”, *Nûbihar*, j. 112, Havîn 2010, r. 91

**Tablo 19: Tabloya Bîranînan**

Jimar	Bîranîn	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Mirîşka Kurtê	Rojbîn Özkan	109	93	Payîz 2009
2	Mol Axa	Rojbîn Özkan	112	91	Havîn 2010

### 2.2.21. Meselok

Di beşên Zaroknameyan de hejmarên meselokan jî li gor çîrok, fabl an helbestan kêr in. Bi tenê di hejmara 111emîn de meselokek hatiye weşandin. Nivîskar Rêbaz Şoreş dibêje ku di nav civaka wan de meselok gelek in, ew ê niha behsa yekê bike û dest pê dike meselokê dibêje. Ji bilî vê tu meselok tunene.

#### 2.2.21.1. Bêjinê Bila Karikê Bişîne

Di hejmara 111an de Rêbaz Şoreş di beşa “Nûbihara Biçûkan” de behsa zilamekî ku navê wî Apê Hecî Selîm e dike. Şoreş dibêje ku di nav malbata wî de meselokên Apê Hecî Selîm gelek in, lê ew ê bi tenê behsa yeke balkêş û manedar bike. Rêbaz Şoreş ewil behsa şêxan û tevgerên wan ên di nav civatê dike. Dibêje ku dema şêx dia dikirin diayê wan dihat qebûlkin. Gundiyên feqîr jî li ser vê, tiştên xwe yên biqîmet yên wek dims, bastîq, tirî, fêkî, kavir, berx û h.w.d. didan şêxan. Şoreş pişt re dibêje ku rojekê keça zilamekî yê bi navê Apê Hecî Selîm nexweş dikeve. Ew keçikê dibin doxtor, lê dîsa jî keçik baş nabe. Apê Hecî Selîm li ser vê keça xwe dibe li cem şêx û jê re meseleyê dibêje. Şêx jî dibêje ku ew ê dia bike ku keçik baş bibe, lê heke keça wî baş bibe divê ew jî karika xwe bide şêx. Hecî Selîm vê şertê qebûl dike. Şêx jî diayan dike û demek dirêj şûn de keçika wî baş dibe. Şoreş meselokê wiha diqedîne:

“...çî ji ber dermanê doxtor be, çî ji ber borîna demê be keça Hecî Selîm bi ser ve xwe ve tê. Li gor peymanê, divabû ku Hecî Selîm karik ji şêx efendî re bibira. Lê Hecî Selîmê me xwe kerr dike û hew diçe cem şêx. Dibên carekê hinek gundî diçin ziyareta şêx efendî û pirsra Hecî Selîm ji wan dike, dibêje ka çima nayê gelo?

Feqîrê gundiyan haya wan ji tiştêkî tuneye, loma nizanin çi bêjin. Lê mesela karikê hişê şêx neçûye. Ji gundiyan re dibêje: “Bêjinê, bila zenn neke ku min karik ji bîr kiriye! Bila wê karikê bişîne.”<sup>435</sup>

Di binê nivîsê de li milê çepê wêneyê karikê hatiye weşandin. Her çiqas tê de hinek rastî û hinek jî mîzah hebe û behsa mijareke civaka kurdan (şêx û tevgerên wan) bike jî, ev meselok ne li gor asta zarokan e.

**Tablo 20: Tabloya Meselokan**

Jimar	Meselok	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Bêjinê bila karikê bişîne	Rêbaz Şoreş	111	92	Bihar 2010

### 2.2.22. Lîstik

Peyva lîstikê dema tê bikaranîn zarok tên bîra mirov. Lewra zarok û lîstik du peyvên ku gelek lihev tên û bêyî hevdu nabin. Zarok bi saya lîstikê kêfxweş dibin, tiştan hîn dibin, dema xwe xweş derbas dikin û bişahî mezin dibin. Kîjan zarok dibe bila bibe, temenê wan çi dibe bila bibe, ew bê lîstik nasekinin. Dibe ku lîstik li gor asta wan hinek biguherin, lê ew gelek caran eleqeyê nîşanî lîstikan didin û dixwazin ku heta aciz bibin bilîzin.

Ayşe Belgin Aksoy û Hale Dere Çiftçiyên ku li ser lîstika zarokan û tesîra wê ya li ser zarokan xebat kirine, lîstikê wiha didin pênasîn: “Bi pênaseyê gelemperî lîstik; rehetî û bêhnaxwe derxistin, enerjîya zêde ya hundir avêtin, tethîqkirin, daxwazan bicîhanîn, zewq hildan û cureyek fêrbûnê ye.”<sup>436</sup>

Li gor Saziya Ziman a Tirkan jî lîstik amûreke kêfê ye ku hin qayde û rêbazên wê hene, qabiliyetê û jîriyê pêşve dibe û dibe sedem ku wext baş derbas be.<sup>437</sup>

<sup>435</sup> Rêbaz Şoreş, “Bêjinê Bila Karikê Bişîne”, *Nûbihar*, j. 111, Bihar 2010, r. 92

<sup>436</sup> Ayşe Belgin Aksoy- Hale Dere Çiftçi, *Erken Çocukluk Döneminde Oyun Duyu-Motor Oyundan Kurallı Oyuna*, Pegem Akademi, Eylül 2014, Ankara, r. 2

<sup>437</sup> [http://tdk.gov.tr/index.php?option=com\\_gts&arama=gts&guid=TDK.GTS.5877f8d446afe5.66145063](http://tdk.gov.tr/index.php?option=com_gts&arama=gts&guid=TDK.GTS.5877f8d446afe5.66145063) 24.05.2016/ 21.01

Wek ku di van pênaseyan de jî tê dîtin lîstik li ser zarokan tesîreke baş dîke, him jî hêla fîzîkî û him jî hêla derûnî û hiş ve wan pêşve dibe. Ji ber vê di berhem û kovarên zarokan de divê lîstikên cur be cur, yê ku bi peyvên, bi tevgeran, bi alav û amûran ve tînin lîstin bînin weşandin û behsa wan bê kirin. Di civaka kurdan de heta salên dawîn jî ber ku pêlîstokên modern kêmbûn, înternet û telefonên bîrîkan li gor rojavayê dereng ketin malên kurdan, zarokên kurd gelek lîstikên resen dizanibûn û bi hev re dilîstin. Lê piştî demekê wan jî dev ji gelek lîstikan berda. Ji hêla lîstikan ve kurd dewlemend in, lê di Nûbiharê de ev dewlemendî nehatiye nîşandan. Kêmasiyeke mezin e ku li ser lîstikan bi tenê nivîsek hatiye weşandin.

### 2.2.22.1. Lîstika Qanqolê

Di hejmara 109emîn de Rojbîn Özkanê di bin beşa “Nûbihara Biçûkan” de lîstikek ji bo zarokan nivîsandîye. Navê nivîsê “Lîstika Qandolê” ye. Özkan wiha bangî zarokan dîke:

“Zarokên şêrin!

Lîstika qanqolê yek ji lîstikên zarokan e ku li Kurdistanê jî hêla zarokan ve tê lîstin.

Fermo em fêrî listika qanqolê bibin.

Hêlek qanqola dara beruyê têtê qulkirin.

Di vê qulika fireh de hundirê qanqolê tê valakirin.

Paşê di hêla qanqolê ya fireh bi pelege tenik tê girtin.

Gava ku zarok pîfî qulika piçûk ya qanqolê dîkin,

Mîna neya rastî dengê xweş jê dertê.

Lîstikvan bi vê qanqolê li gora xwe megaman pêk tînin.”<sup>438</sup>

Di dawîya nivîsê de hatiye gotin ku ev nivîs ji pirtûka H. Çinar a bi navê “Lîstikên Zarokên Kurd” hatiye girtin.

---

<sup>438</sup> Rojbîn Özkan, “Lîstika Qanqolê”, *Nûbihar*, j.109, Payîz 2009, r. 93



**Tablo 21: Tabloya Lîstikan**

Jimar	Lîstik	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Lîstika Qanqolê	Rojbîn Özkan	109	93	Payîz 2009

### 2.2.23. Mamik

Mamik berhemên gelêrî yên devkî ne ku nayê zanîn kî, kingê gotiye. Ev cureya edebî li ser mirov, nebat, heywan, xweza, bûyer, alav, amûr, cil û berg, fêkî, sebze û tiştên din hatine gotin. Raz, veşartin, meraq, kêf, hişyarî, lîstik, fikirandin û zanîne di xwe de dihevin. Ji bo pênaseya mamikan İlhan Başgöz wiha dibêje: “Mamik amûreke kêfê ye ku xisûsî di şevên dirêj ên zivistanê de zêdetir zarok, keç û jin pê dema xwe dibuhurînin.”<sup>439</sup>

Friedreich Starr jî destnîşan dike ku mamik tişteki ku nayê zanîn bi awayekî nerasterast pirskirine û wiha dibêje: “Yê ku mamikê guhdar dike, an jî dixwîne di hişê xwe de hewl dide ku mamikê pê derxe.”<sup>440</sup>

Mustafa Gazî di pirtûka “Gurzek Ji Zargotina Zarokan; Dîsko Dîsko Danîno” de dema mamikan rêz dike, beriya mamikan ku lîsteyê binîvîse wek jêrenot wiha dibêje: “Her weha li hin deveran jî jê re dibêjin tiştanok, tiştik, têderxistinok, qinik, kelemamik.”<sup>441</sup> Wek Gazî jî destnîşan dike di kurdî de ji bo mamikan peyvên wek pêderxistinok, têderxistinok, metel, tiştanok, mamik, hetele, tiştonek, çistan, qinîk, tiştik, apik, çistan, meyl û şertik tên bikaranîn.

<sup>439</sup> Kenan Subaşî, *Ji Bo Zarokan Di Fêrkirina Kurdî De Rola Mamikan (Vekolîn-Senîfandin)*, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardin Artuklu Enstituya Zimanên Zindî, Mardin, 2014, r.28, Vgz. İlhan Başgöz, “*Türk Bilmecelelerinin Fonksiyonları*”, *Folklor Doğru*, j. 37, İstanbul, 1974, r. 29

<sup>440</sup> Friedreich Starr, *A Little Book Of Philippine Riddles; Yonkers*, New York, World Book Co., 1909, r. 6

<sup>441</sup> Mustafa Gazî, *Gurzek Ji Zargotina Zarokan; Dîsko Dîsko Danîno*, Enstîtûya Kelepura Kurdî, Weşanxaneya Aras, Silêmanî, 2006, r. 11

Peyv, gotin û pirs di mamikan de derdikevin pêş. Ji ber vê jî zarok mamikan hez dikin. Mirov dikare bibêje ku feydeya mamikan ji bo geşedana zarokan a fikrî û derûnî heye. Ji van feydeyan hinek ev in;

- Mamik ji ber ku li ser pirsan û bersivan dimeşe, mêjîyê zarokan dide xebitandin

- Wextê zarokan xweş derbas dibe û ew kêfxweş dibin

- Ew bi pirskirina mamikan zanîna kesên ku li hember xwe diceribînin

- Bi saya mamikan zarok dikarin bi hêsanî zimanê xwe yê dayîkê hîn bibin

- Peyvên ku zarok ji bo axaftina rojane bi kar tînin bi saya mamikan dewlemend dibe

- Hesta meraq û kelecane peyda dibe ku ev jî ji bo geşedana zarokan girîng e

Zargotin û çanda kurdî herçiqas ji hêla mamikan ve dewlemend be jî ev dewlemendî bi têra xwe di beşên Zaroknameyê de nayê dîtin. Lewra di kovarê de hejmara mamikan pir kêr e, bi tenê du hejmaran de çend mamik hatine nivîsandin. Di hejmara 34 û 35an ên ku du meh bi hev re hatine weşandin de pênc mamik bi serenava “Derxistinok” hatine nivîsandin û ew wiha hatine rêzkerin;

“1- Humhuma li ber çema; ne dengê gur e, ne diz. (Aş)

2- Hilindir, bilindir, law ji bav bilintir. (Agir û dûman)

3- Ho dibêjim, tefşo dibêjim; bi nav dikim, lê nabêjim. (Tefşo)

4- Sibehê bikire û bixwe, nîvro bide hevalê xwe, êvarê bide neyarê xwe. (Pîvaz)

5- Qesra spî, lê bê derî. (Hêk)”<sup>442</sup>

#### **2.2.24. Leheng**

Di hejmara 55an a Nûbiharê de Xelîl Amed di bin serenava “Rengîn û Xemgîn” du lehengên zarok dide axaftin. Di beşa Zaroknameyê de herdu heval bi hev re diaxivin û pirsan ji hevdu dikin. Ev pirs wek mamikan in û ew hewl didin ku bersivên van pirsan bidin. Bi rastî ev rasterast ne mamik in, lê ji ber ku pirsin û kesê

<sup>442</sup> “Derxistinok”, *Nûbihar*, j. 34-35, Tîrmeh-Tebax 1995, r. 47

li hemberî van pirsan hewl dide ku bersiva wan bide mirov dikare bibêje cureyek mamik in. Axaftina Rengîn û Xemgîn wiha ye;

“**Rengîn:** Hey lo Xemgîno lo!

**Xemgîn:** Fermo Rengîno!

R: Xorte delal roja te bi xêr be lo!

X: Roja te jî bi xêr be heval.

R: Xemgîn

X: Ha, kerem ke xorto.

R: Kekê ezê ji te dusê tiştan bipirsim?

X: Kerem ke bipirse.

R: Keko kaxizê ji penûse re çi gotiye?

X: Gotiye: Hevalê penûs, ez dixurim ji kerema xwe tu min dixurînî?

R: Rast e wer gotiye. Lê xezalê ji zurefayê re çi gotiye?

X: Wê jî gotiye: Ya hevalê zurefa rica min ji te, xêra xwe li ser serê min re li min mêze neke. Hustiye min wê biqerime.

R: Ev jî rast, herbijî. Le mişk di zikê mar de çi gotiye?

X: Himm, Ha wi jî gotiye ku, Ez di re-kek gellek dirêj û teng de me. Xwedê alîkarê min be û rêya min vekirî ke.

R: Eferîn xorto. Ma tu zarokekî çi zanayî de îjar ji min re bêje, kefçî ji istikana re çi gotiye?

X: Bese lo! Tu ji bo çi ewqas dirêj dikî. Bise îjar ezê ji te pirsan bipirsim. Tu hazirî?

R; Nexeyide heval, bes ku tu bipirse pirsên xwe.

X: Yaaa. Pirs min a yekî. A ji te re!?!?

R: Ayyyy!

X: Kuro ma tu ji bo çi "ayyyy" dibejî?

R: Te li min xist, ji bo wê.

X: Yaaa, A ji te re pirs min a diduyan.

R: Wayyy mala min agir pêket, ev çiyê!

X: Îjar çibû lo, ay û waya te ye?

R: Kuro ma wê ji bo çi be. Tu şîrpaxa li min dixî gopên min dêşin ji bo we ay û waya min e.

X: Heh heh heh çawaye xorto? Ha ji min re bêje ecêb min ji bo çi li te xist?

R: Ji bo çi?

X: Lawo tu çi xortekî nezan î. Ma wê ji bo çi be. Dilê min wer xwest ji bo wê.

R: Ha keko bi serê keko, rica min ji te ev e ku, bila dile" te êdî tiştê wanî nexwaze. Wellehî tobe edî dilê min jî naxwaze ji te pirsan bike."<sup>443</sup>

Wek ku tê dîtin herdu zarok ji hev tiştan dipirsin û hewl didin ku pê derxin û henekan hevdu dikin. Di heyama zarokatiyê de pirs tiştêkî pir girîng e, lewra meraqê dide der û xwediyê pirsê heke bersiva xwe hilde der barê wê tiştê ku pirsîye de jî dibe xwedî agahî. Ji vê hêlê va di kovarê de heke zêdetir pirs hebûna wê meraqa zarokan zindî bima û kovarê dewlementtir xuya bikira.

**Tablo 22: Tabloya Mamikan**

Jimar	Mamik	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	-	-	34-35	47	Tîrmeh-Tebax 1995
2	Rengîn û Xemgîn	Xelîl Amed	55	30	Nîsan 1997

#### 2.2.24.1. Rengîn û Xemgîn

Di edebiyata zarokan de leheng ji wan kesan re tê gotin ku mijar der barê wan de tê plankirin û dimeşe. Leheng bi tevger û axaftinên xwe ve xwedî rola sereke ne û tesîrê li ser zarokan dikin. Çawa ku însanek dikare bibe leheng, hin caran heywanek, nebatek an jî amûrên cuda jî dikarin bibin leheng. Di berhemên ji bo zarokan hatine

<sup>443</sup> Xelîl Amed, "Rengîn û Xemgîn", *Nûbihar*, j. 55, Nîsan 1997, r. 30

nivîsandin, an jî xêzkirin de leheng ji ber ku tesîrê li ser zarokan dikin pir girîng in û divê xwedî hin taybetmendiyan bin. Mirov dikare van taybetmendiyan bi çend xalan rêz bike;

- Leheng bi tenê ji kur an jî keçan pêk neyê, divê xwedî zayendên cuda bin
- Divê leheng bêqisûr û pir îdeal nebin
- Leheng divê zêde fantastîk, bi mubalaxa û li dijî rastiye nebin
- Divê temenê lehengan û taybetmendiyan wan li gor asta zarokan be

Zarok lehengên ku ji bo wan hatine nivîsandin an jî xêzkirin hez dikin, wan ji xwe re dikin mînak û rêber, gelek caran jî hewl didin ku wek wan tevbigerin. Heke leheng zêde baş û bêqisûr bin, zarok jî hewl didin ku wisa tevbigerin. Lê dema heval û kesên der û dora wan ne li gor vê taybetmendiye be, aciz dibin û dilê wan dişkê. Berevajî vê heke leheng zêde nebaş be, tund û hov tevbigere, zarok vê carê jî çav didin wan û îja nebaş tevdigerin. Yanê divê leheng ne zêde bêqisûr û ne jî zêde hov û fantastîk bin. Ev mîzan divê ji hêla nivîskar û wênexêzan ve baş bê zanîn û leheng wisa bên xêzkirin, an jî nivîsandin.

Di beşa Zaroknameyê de jî du lehengên zarok ên bi navê Rengîn û Xemgîn ji hêla Xelîl Amed ve hatine xêzkirin. Ev leheng yekem car di hejmara 34 û 35an ên ku du hejmar bi hev re hatine weşandin de tên dîtin. Piştî vê hejmarê êdî di hejmarên din de jî derdikevin li pêşberî zarokan. Taybetmendiya van lehengan ew in;

1. Herdu leheng jî kur (mêr) in.
2. Bi hev re kurdî (zaravayê kurmancî) diaxivin.
3. Cil û bergên kurdî yên ku jê re dibêjin şal û şepik li xwe dikin.
4. Ji hela kesayetiyê ve Xemgîn yekî ecêb e, gelek caran tiştên li serî wî. Rengîn berevajî wî, yekî rûken, xweşbêj û zana ye.

Dema ev taybetmendî bên şîrovekirin zayenda lehengan balkêş e. Çima herdu jî kur in? Ma gelo di nav xwendevanan de keçik jî tunene? Divê bi nêrîneke fireh ve zarok bihatana xêzkirin û ji lehengan yek keç bûbûya. Lewra edebiyata zarokan bi tenê ne ji bo kuran e, qîz jî hene. Xala duyem jî dema zarok kurdî diaxivin ev li ber

zarokên kurdî wê bibe mîna keke baş. Ji ber ku zarok lehengan ji xwe re dikin mînak ew ê çav bidin wan û wê zimanên xwe yê zikmakiyê bi axivîn ku ev tiştekî girîng e.

Amadekarê van lehengan xwestiye zarokên kurd cil û bergên kurdî nas bikin, ji ber vê kincên kurdan li zarokan kiriye. Rengîn û Xemgîn hin caran tiştekî nadin serê xwe, lê gelek caran şaşkek li serê wan heye û şal û şepik li xwe kirine. Ev jî xalek muhîm e, lewra miletek bi çand û hunera xwe, xwarin û vexwarina xwe, cil û bergên xwe ve ji civakên din tîn veqetandin û taybetmendiya xwe didin nîşandan. Lixwekirina şal û şepikan dide nîşandan ku Rengîn û Xemgîn zarokên kurdan in.

Herî dawîn jî dema du leheng tîn amadekirin hin caran yek ji wan jîr û zana û yê din jî hinek saf û nezan tê xêzkirin an jî nivîsandin. Lewra di jiyanê de jî gelek caran mirov wiha ne, wekhev nînin. Tiştan hînî hev dikin, ji hev dişewirin, henekan bi hev dikin. Minak Hacıwat û Karagoza tirkên jî wisa ye. Li vir jî Rengîn jêhatî û zana, Xemgîn li gor wî hinekî kêmezana ye.

#### **2.2.24.2. Rengîn û Xemgîn**

Di hejmara 34 û 35an ên ku du meh bi hev re hatine weşandin de Rengîn û Xemgîn rastî hev tîn, silavê didin hev. Rengîn dibîne ku rewşa Xemgîn nebaş e, ji wî dipirse ku ka ew çima ketiye vî halî. Xemgîn behsa serpêhatiya xwe dike û dibêje ku bavê wî ji wî re gotiye “vî barî bibe bajêr” û dema wî bar li ser piştê ker bicih kiriye, kerê bar li ser piştê xwe avêtiye û zirtikek jî avêtiye Xemgîn. Paşê wiha behsa bûyerê dike;

“Xemgîn: Ma hey malmîrato! Te wiha nekira, ma tu yê bimira!

Min hew çarkê mêze kir, kerê me dest bi qisê kir û peyîvî:

De wê de here lo! Dibêjî qey ez kerê bavê te me. Dûv vêya ser de tîzezek xweş li min xist û got:

Eywallah.

Ji ber wî ez ketim vî halî.

Rengîn:!!!?”<sup>444</sup>

---

<sup>444</sup> Xelîl Amed, “Rengîn û Xemgîn”, *Nûbihar*, j. 34-35, Tîrmeh-Tebax 1995, r. 47

Wek ku tê dîtin herdu leheng bûyera ku hatiye serê Xemgîn diaxivin. Piştî vê hejmarê herdu leheng dibin hevalê zarokan û her tim di navbera hev de li ser mijarên din diaxivin, nîqaş û henekan dikin.

### 2.2.24.3. Rengîn û Xemgîn

Di hejmara 36emîn de “Rengîn” û “Xemgîn” dîsa dibin mêvanê zarokan. Di vê beşê de wêneyê wan tune. Bi tenê axaftina di navbera wan herduyan hatiye nivîsandin. Rengîn ji Xemgîn dipirse ka çima madê wî tune ye û ew nebaş xuya dike. Xemgîn dibêje ku dema wî xwestiye bi çakuç ve bizmarekî di dîwêr de bikute, çakuç li destê wî ketiye. Dema wî xwestiye bavê wî bizmar bigre û ew jî bi çakuç ve li bizmarê bixe, vê carê jî wî bi çakuç ve destê bavê xwe xistiye û ew êşandiye.<sup>445</sup>

Li vir jî dîsa tiştek tê serê Xemgîn û ew pê diêşe. Yanê Xemgîn yekî nesitirî û tim bipirsgirêk e.

### 2.2.24.4. Rengîn û Xemgîn

Di hejmara 38an de Rengîn û Xemgîn behsa dirankişandina Xemgîn dikin. Xemgîn silavê dide Rengîn, lê wisa bi kêf û coş e ku Rengîn metel dimîne û sedema vê kêfxweşiyê jê dipirse. Xemgîn behsa sedema kêfxweşiya xwe dike û dibêje ku şev diranê wî diêşe. Bavê wî dixwaze ku wî bibe nexweşxaneyê, lê ew ji tirsan çûyîna doxtor qebûl nake. Diranê wî zêde wî aciz dike û divê çareyekê bibine. Hema derziyekê dixê li bin diranê xwe, sere derziyê bi bendekê û bend jî bi derî ve girê dide. Dema ku dê û bavên wî derî vedikin diranê wî ji cih derdikeve û Xemgîn dibêje ku ew heta sibê birehet radizê.<sup>446</sup>

**Peyam û şîrove:** Divê axaftinê de her çiqas Xemgîn bi kêf be û ji êşa diranê xwe xilas bibe jî, ev tişt ku kiriye û behsa wê dike tiştekî şaş e. Dema ev nivîs ji zarokan re bê xwendin, dibe ku hin zarok tişt ku Xemgîn kiriye biceribînin û zirarê bidin dev û diranên xwe. Ji vê hêla ve divê nivîs û wêneyên ji bo zarokan tîn amadekirin, divê bi hesas bîn amadekirin.

<sup>445</sup> Xelil Amed, “Rengîn û Xemgîn”, *Nûbihar*, j. 36, Îlon 1995, r. 23

<sup>446</sup> Xelil Amedî, “Rengîn û Xemgîn”, *Nûbihar*, j. 38, Çiriya Paşîn 1995, r. 29-30

### 2.2.24.5. Rengîn û Xemgîn

Di serî de çaxê ku me behsa Rengîn û Xemgîn kir me got ku Xemgîn yekî nesitirî û saf e, hema gelek caran tiştên serê wî. Çawa ku diranê wî eşiyaye, niha jî pisîka malê pozê wî gez kiriye. Di hejmara 40an de di beşa Zarokname /6an de herdu leheng dîsa tînen bal hev. Lê Rengîn dibîne ku pozê Xemgîn soromoro bûye. Meraq dîke û jê dipirse ku ka çi bi pozê wî hatiye û çima wisa sor bûye.

“Rengîn: Way, way, way! Hela lê mêz kin birano, hela lê mêze kin. Bavê merxasan, qehremanê me Xemgîn êlek û salware xwe li xwe kiriye û wek egîta bi rê de tê. Feqet ew çiyê? Pozê wî sor û mor bûye.

Xemgîn: Ay, ay, roja te bixêr, kekê Rengîn, ay, ay pozê min pozê min dêşe.

Rengîn: Roja te jî bixêr kekê. Dîsa çi qewimîye li serê te?

Xemgîn: Ay, ay nepirse, keko nepirse. Pisîka me pozê min gez kir û ez kirim vî halî.

Rengîn: Hah, hah, hah. Nexeyde feqet ez bama, minê guhê te jî gez bikiraya.

Xemgîn: Çima keko, çima? Ma şeytanê nerind ket nav min û te?

Rengîn: Na, Xwedê neke şeytanê kortêkeve navbera min û te, feqet...

Xemgîn: Eee, feqet?

Rengîn: Feqet tu hinekî li cîhe xwe nasekinî, yanê tu pozê xwe dikî her tiştî.

Xemgîn: Çima keko? Ma min pozê xwe kiriye çi û ez li cîhe xwe nasekinîme û min çi nerindî kiriye.

Rengîn: Ez dibêjim belkî te pozê xwe kiriye tasa pisikê ya şîr, wê jî gotiye "kuro pozê xwe neke tasa min, ya na ezê jî pozê te gez bikim. Te jî gotiye, "Na ji ter çi ez pozê xwe dikimê" Pisika we jî qehiriye û gotiye "A ji te re" û pozê te gez kiriye.

Xemgîn: Wey, kurro meriv dibêje qey te her tişt bi çavê xwe dîtiye. Nerindî ne ji min, ji pisikê derket.

Rengîn: Çawa?

Xemgîn: Kurro tu çima min diqehrinî û cima min fehm nakî. Dayika min jî bo ez vexum tasek şîr anî danî ber min. Min jî bi dilê xwe şîre xwe vexwar û dilê xwe lê rehet kir. Dawiye min xwe dirêj kir. Min hew carê mêze kir pisika min derketiye ser min û pozê min didalêse. Min jî dusê caran pê dada ku ji ser min biçê. Ev jî pê zor tê û



wê jî hat pozê min gez kir. Tu nabejî, dema min şîr vexwaribû, pozê min ketibû şîr û hinek şîr bi pozê min ve mabû. Pisikejî xwestibû ku vî şîrî bialêse.

Rengîn: Hiii!<sup>447</sup>

**Peyam:** Di axaftina lehengan de peyvên resen ên kurdî hatine bikaranîn. Axaftina wan zelal û rewan e. Têkiliya Xemgîn û heywanekê, tiştê ku hatiye serê wî hatiye behskirin. Li vir ji zarokan re tê gotin ku heywan hevalên baş in, lê divê mirov baldar tevbigere.

#### 2.2.24.6. Rengîn û Xemgîn

Di hejmarên 41 û 42emîn ên ku herdu bi hev re hatine weşandin de Xelîl Amed di bin beşa Zarokname/7an de dîsa herdu lehengên biçûk Rengîn û Xemgîn daye axaftin. Vê carê ew li ser cejna kurdan a neteweyî, li ser newrozê diaxivin. Rengîn dibêje ‘çû çû çû, ew jî çû’ û hema bi dehan caran peyva çûyînê ji devê wî derdikeve. Rengîn meroq dike ku çî çû, kî çû û jê dipirse. Li ser vê Rengîn dibêje dewletê cejna newrozê ji destê kurdan hildaye û wiha dibêje:

“RENGÎN: Eh, dût vêya, rabûn pihînek jî li KAWAye me xistin, gotin îdî ciyî wî sergo ye, bila ERGENEKONA me were. Dibêjin, dema em ji ERGENEKONê derketin, me dest bi pîrozkirina vê cejna Nevrozê kiriye.

XEMGÎN: Pek, pek. Ev ji k’ûr derket? Ma agir bi canê wa keve, we hir tiştê me ji destê me girt û em çilûz kirin berdan. Ma hûn hîna çiji me kurdên belengaz dixwazin?

RENGÎN: Ez zanim ew çî jî me dixwazin. Ewê niha vana bêjin cejna Boraqê (Qurbanê) jî a me ye. Dema MANAS em xelas kirin, me wê çaxê ji bo vê azadiyê ev cejna pîroz kiriye.

XEMGÎN: Heh, heh, hî, hî. Ê keko ewê ji bo cejna Remezanê çî bêjin?

RENGÎN: Ma keko vir û derewên vana pirr iin. Ewê derewekê bavên û bêjin ji felan tiştî ev cejna Remezanê jî a me ye.

XEMGÎN: Hah,hah, ho, ho, ho... Bes e edî min nekenîne. Keko bila Newroz jî awa be, Bila Nûroja me her tim sax be.

RENGÎN: Wellehî keko, ez ditirsim ewê Nûroja me jî ji destê me bibin.

---

<sup>447</sup> Xelîl Amedî, “Rengîn û Xemgîn”, *Nûbihar*, j. 40, Çileyê Paşîn 1996, r. 29

XEMGÎN: Bila be keko, jixwe em rût û repal mane.

Hah, hah, hoh, hî, hî, hî.”<sup>448</sup>

**Peyam û şîrove:** Li vir zarok tevgera dewletê ya ku dibêje “newroz ya tirkan e” rexne dikin û dibêjin çawa ku gelek tişt ji destê kurdan hatiye hildan ev cejn jî ji kurdan hatiye dizîn. Bi van gotinên lehengan ve amadekarên beşê xwestine ku hestên netewebûnê di zarokan de xurt bibe. Zarok di vê beşê de jî bi cil û bergên xwe yê kurdî ve hatine xêzkin.

#### 2.2.24.7. Rengîn û Xemgîn

Di beşa Zarokname/8an a ku di hejmara 45an de hatiye weşandin de Xelîl Amed Rengîn û Xemgîn vê carê li ser mijareke din daye axaftin. Rengîn dibêje kurd ‘çawa di vê dinyayê de bûne xax.’ Peyva xaxê peyveke herêmî ye û bi vê peyvê ve hatiye xwestin ku bibêje kurd rezîl û şerpeze bûne, halê wan nebaş e. Xemgîn dibêje ku çima kurd bûne xax û axaftina wan wiha dewam dike:

“RENGÎN: Ax keko ax! Ez nizanim çawa bêjim, rojek tune ku em bê def û kul bin. Heroj şer, heroj xwin, heroj, heroj heroj û pen noj em dibin xax.

XEMGÎN: Belê werêye feqet em çibikin. Ji bo sekina viya çî ji destê me tê? Em hîn zarok in, zarokên do ne, kî me guhdarî dike?

RENGÎN: Çima keko çima, em îroj piçûk in lê dê sibehê emê jî mezin bin. Belkî em îro nikanin tişteki bikin, feqet sibehê dema em mezin bûn, wê çaxê ewê ji destê me pir tişt bîn. Ma eceb piçûkiya me ji bo me şerm û qebebet e ku ewê kes me guhdarî neke.

XEMGÎN: Welleh keko em lazim e vêya xweş bizanibin. Li cem Xwedê ferqa piçûkî û mezinatiye tune. Feqet li cem însanên ku mezinatiye dixwazin, însanên ku dixwazin miletê xwe fedaya xwe bike, însanên ku naxwaze bila milete wî azad û serkeftî be, ferqîtiya zarotî û mezinatiyê heye.

RENGÎN: Yanê keko tu dibêjî em piçûk in ji bo vêya ew mezinên me guh nedin me?

XEMGÎN: Belê keko belê.

RENGÎN: Birayê min ê delal ew mezinên me, herçiqas guh nedin me jî ez dixwazim hindêk tiştan bêjim. Çunkî ev heqê min e û heqê hemû zarokên kurd e. Xwestin û gotina

<sup>448</sup> Xelîl Amed, “Rengîn û Xemgîn”, *Nûbihar*, j. 41/42, Sibar/Adar 1996, r. 29

min ev e: Edî bes e! Ji bo Xwedêdestên xwe ji qirikên hev û çekên xwe, ji sînga hevûdin bikşînin. Hûn bi can û malên hev ketinin. Xwîna hevûdin dirijînin, zalimên zordest jî li we mezê dikin. Li ser laş û xwîna we kêf û seyranê dikin. Ma hûn tu fedî nakin. Ma hûn çawa law û neviyên Mele Mistefa û Oazi Mihemed in. Ma ne şerm û fedî ye, ev şerê ku hûn li hember hev didomînin jibo çiyê? Bila baweriya we hebe ku emê sibehê li cem Yezdanê Dilovan heqê xwe ji we bixwazin. Em zarokên kurden belengaz li hember vî şerê we fedî dikin. Bi dijminî û cudatiye, em ti tiştêkî qenc nakin. Li hember vêya ji bo xwastinen we yen pîs em jî bindest dibin. Em yekîtiyê û biratiya gelê Kurd dixwazin. Bihevketin û xwînrijandiyê naxwazin. Li ber vêya "Yekîtiya me kurda ji bo me tilsima felatê ye."<sup>449</sup>

**Peyam û şîrove:** Rengîn û Xemgînên ku şal û şepik li xwe kirine di vê axaftina xwe de li ser navê zarokên kurd diaxivin. Vê axaftinê de mezinan rexne dikin û dibêjin ku ji ber berjewendiyên xwe kurd ketine singa hev û bi hevdu re şer dikin, xwîna hevdu dirijînin. Piştî vê tespît û rexneyê ew bangî mezinan dikin û dibêjin ku bila kurd hevdu re şer nekin. Li vir jî peyameke neteweyî û dînî bi hev re hatiye dayîn. Ya neteweyî ew e ku xwestine yekîtiya kurdan pêk bê. Ya dînî jî ew e ku baweriya wan bi Xwedê heye û dibêjin heke şer dewam bike ew ê sibê li ber Yezdanê dilovan heqê xwe bixwazin ku ev jî baweriya heq û ya axiretê ye.

#### 2.2.24.8. Rengîn û Xemgîn

Di hejmara 46emîn di beşa Zarokname /9an de XelîlAmed vê carê Rengîn û Xemgîn li ser hînkirina zimanê kurdî dide axaftin. Rengîn dema diçe li cem Xemgîn dibîne ku Xemgîn bi awayekî henek û stranbêjiyê peyvên kurdî fêrî biraziyê xwe dike. Dema Rengîn dipirse ku ew çî dike, Xemgîn dibêje ku biraziyê wî li bajêr mezin bûye û bavê wî poşman e ku kurdî hînê kurê xwe nekiriye. Ji bo ku ew kurdî hîn bibe ew dersê dide biraziyê xwe.

“... XEMGÎN: He he he! Were keko were, tu jî li cem birarziye min ê piçûk rûne. Ezê îjar behsa fekiyan bikim. Ê te bila şorik ji devê te biherike, feqet bila biraziyâ min jî zimanê xwe hîn bibe. Mala wan libajâr e. Bave wî, poşman e ku ew Kurdî hîn nekiriye. Wezîfa hînkirine daye min ku ez wî Kurdî hîn bikim. Hadê Xemgîn xwe amade bike

<sup>449</sup> Xelîl Amed, “Rengîn û Xemgîn”, *Nûbihar*, j. 45, Hezîran 1996, r. 30

dor dora fekiya ye. Hade Bismîllah: "Elma" Sêv e, "Üzüm" Tirî? lo lo! "Armût" Hermê, "İncir" Hejîr lo lo!

"Gelgel" Were "Gitgit" here lo lo.

RENGÎN: Nesequine keko, nesequine! De hadê dewam bike, hindik ma ezê têr bibim. Oxxx! Ekla wan xweş e. Sêv, hejîr, tirî oy oy oy!<sup>450</sup>

**Peyam:** Di axaftina herdu zarokan de bal li ser malbatên ku li bajaran dijîn û zimanê kurdî hînî zarokên xwe nakin, hatiye kişandin. Tê gotin ku ev malbat piştî demekê ji ber vê poşman dibin û şerm dikin. Li vir peyam zarokan zêdetir ji mezinan re hatiye dayîn ku ew zarokên xwe hînî kurdî bikin. Di vê rûpelê de Rengîn, Xemgîn û zarokek (biraziyê Xemgîn) hatine xêzkirin. Lê bi tenê serê wan hatiye xêzkirin, bedena wan tune. Li vir jî dîsa şaşik serê lehengan e.

#### 2.2.24.9. Rengîn û Xemgîn

Rengîn û Xemgînên ku şal û şepik li xwe kirine di hejmara 48emîn de dîsa derdikevin li pêşberî zarokan. Xelîl Amed di beşa Zarokname/11an de dîsa herdu zarokan dide axaftin. Pexşan bi axaftina Rengîn dest pê dike. Rengîn dibêje ax wax, Xemgîn jî dike ax ax. Ewil Rengîn hew dizane ku Xemgîn henekan bi wî dike. Paşê ji hev dipirsin ku ka çi bûye. Rengîn dibêje Beran li wî xistiye. Xemgîn jî dibêje Birûskê li wî xistiye. Herdu jî hew zanin ku bi rastî jî Beran û Birûsk li wan xistiye. Paşê dema diaxivin fêhm dikin ku rastî ev e;

“...XEMGÎN: Te got beran li min qelibiyê, ma min ji te re got ku tu derewan dikî û ka min ji te re got madem beran li te xistiye, cihê qiloçê beran nîşanî min bide?

RENGÎN: Heh, heh, heh...Na. Te ez fam nekirim. Ne ku beranê heywan yê bi qiloç, hevalê min yê bi navê Beran li min qelibiyê. Feqet ê te heger birûsk li tebiqelibiya wê dereke te bişewitiya. Ma ka ez dinêrim ku dereke te neşewitiye.

XEMGÎN: Kuro wele tu jî wek min korfam î! Ma min jî negot ku brûska ezman li min ketiye.

RENGÎN: Êê...

XEMGÎN: Hevalê me yên bi Birûsk, Birûskê apê Zilfo li min qelibiyê.

---

<sup>450</sup> Xelîl Amed, “Rengîn û Xemgîn”, *Nûbihar*, j. 46, Tîrmeh 1996, r. 30

RENGÎN: Ay, ay li min.

XEMGÎN: Wax, wax li min!<sup>451</sup>

Diyare ku ne birûsk û ne jî beran li wan xistiye. Yanî hevalên wan ên bi navê Beran û Birûsk li wan xistine û ew êşandine. Li vir jî tê dîtin ku hin caran zarok hevdu dixin û hevdu diêşînin. Ya din jî dema Xemgîn dibêje birûskê li wî xistiye, Rengîn wî bawer nake û dibêje derewan neke. Ji bo ku ji zarokan re bê gotin ku derew tiştekî nebaş e di nav axaftina Xemgîn de ev gotin derbas dibe “Rengîno, ma tu nizanî derew guneh e? Madem guneh e, ezê çawa derewan bikim”. Bi vê hevokê ve nivîskar xwestiye ku zarokan re bibêje çî dibe bila bibe derew guneh e û divê neyê gotin. Peyva “guneh” jî balê dikşîne li ser perwerdeya olî.

#### **2.2.24.10. Rengîn û Xemgîn**

Heta hejmara 48an Zarokname bi hejmaran ve hatine eşkerekirin, wek Zarokname/1, Zarokname/2, heta Zarokname11an wiha dewam dike. Ji hejmara 48an pê ve navberek hatiye dayîn û qasî 4 hejmaran ji bo zarokan tiştek nehatiye weşandin. Di hejmarên 53/54 ên ku du hejmar bi hev re hatine weşandin de dîsa beşa Zaroknameyê tê dîtin. Lê vê carê hin cudahî balê dikşînin. Ji van yek ew e ku, li vir navê beşê (Zarokname) bi tîpên mezin ên puntoyeke cuda ve hatiye nivîsandin. Li kêleka nivîsê hejmar tune ye. Yanî heke li gor rêzê here divê Zarokname/12 bihata nivîsandin, lê bi tenê wek ZAROK-NAME hatiye nivîsandin.

Ya duduyan jî li cem serenava Zaroknameyê li hêla rastê wêneyek hatiye xêzkirin. Di wêne de zarokê (wek keçikan xuya dike) a ku li ser destê wê yê rastê çivîkek heye, tê dîtin. Tişta ku di vê wêneyê de balê dikşîne ew e ku ji keçik, cil û bergên wê û heta ku avahiyê li pişt wê hemû bi şiklên geometrîk ve hatine xêzkirin. Ya sisêyan jî navê lehengan her tim wek Rengîn û Xemgîn hatiye nivîsandin. Lê di vê hejmarê de ewil Xemgîn û paşê jî Rengîn hatiye nivîsandin. Yanê wek Xemgîn û Rengîn.

---

<sup>451</sup> Xelîl Amed, “Rengîn û Xemgîn”, *Nûbihar*, j. 48, Îlon 1996, r. 25

Di hejmara 53/54an ên ku du hejmar bi hev re hatine weşandin de herdu zarok halê hev dipirsin, lê Rengîn dibêje ku ew nebaşê. Axaftina herduyan wiha dewam dike:

“Rengîn: Na, na ez wê qest nakim, golik.

Xemgîn: Ê tu wê çaxe çi qest dikî bencik?

Rengîn: Ez îro ranebûm nimeja sibehê, ji bo wê ez nebaş im. Feqet sibehê min însanekî feqîr û bezar dît û min derxist perê ku bavê min dabû min, min jî da wî însane feqîr, ji ber viya ez baş im. Yane kef-şahiya kumin ji wê alîkariyê girtiye ez pê baş im.

Xemgîn: Himm, ecêb!

Rengîn: Xer e lo çima ecêb?

Xemgîn: E welleh qasê ku te halêxwe anî ziman. Gor gotinên te, ez jî nivî baş im, nivî nebaş im.

Rengîn: De were millet seyranê! We tinê min dîsa biteqînî.

Xemgîn: Na na, ne bila millet bê seyranê ne jî tu biteqe. Golikê rindik. Min jî îroj nimêja sibehê kir ji ber viya ez baş im. Lêbelê feqîrekî bêhal û bêmedal jî hate ber deriyême, feqet min jî ew dest vala veğerand, ji ber viya ji ez nebaş im.

Rengîn: Hevalê delal, ê wê çaxê tu wer bizanibe ku qedera min û qedera te wek hev e, nivî başî nivî nebaşî. E ev jî nabe, lazim e em tim baş û başiye bixwazin

Xemgîn: Raste feqet emê çi û çawa bikin?

Rengîn: Rehet e keko. Ma emê çibikin. Emê Jivir şûnve daxwaziyê yezdan bînin cîh û emê alîkarê însana bin.

Xemgîn: Ewqas!?

Rengîn: Mane bes e!?

Xemgîn: Bes e feqet tu zanî Xwedayê berz duayên zarokê bêguneh bêbersiv nahêle, ji ber viya ez jî dixwazim duakeke bikim.

Rengîn: Hele bike em te bibînin.

Xemgîn: Ya Reb ji rehmeta xwe, û ji bo pêxemberê me, me kurdan û hemû insanên bindest, feqîr, bêzar û bêmedal perîşan û mihtacê dîgeran neke. Hişekî bide milletê me û milletê me ji ve feqîrî, nezanî û bindestiyê xelas bike.

Rengîn: Amîn, amîn. Ho xwendevanno denge we nayet min. de hade hûn jî bi dilekî pak bibejin "amîn."<sup>452</sup>

**Peyam:** Di vê pexşanê de jî bi eşkere perwerdeyeke olî li ser van lehengan hatiye dayîn. Yanê rabûna nimêja sibê, sedeqe dayîna feqîran, diakirin, behsa navê Xwedê kirin hemû tiştên dînî û exlaqî ne. Ya din jî hesteke neteweyî di axaftina herdu lehengan de heye ku ew jî dema dia dikin ji bo qewmê xwe yanî ji bo gelê kurd diayan dikin. Di diaya wan de jî rewşa kurdan bi gotinên wek “feqîr”, “nezan” û “bindest” hatiye terîfkirin.

#### 2.2.24.11. Rengîn û Xemgîn

Di hejmara 56emîn de dîsa bi tenê navê Zaroknameyê hatiye bikaranîn û li du peyva Zaroknameyê tu hejmar nehatiye nivîsandin. Di vê hejmarê de Rengîn û Xemgîn ji bo dora hêlekanê diaxivin. Rengîn hêlekanê siwar bûye û demeke dirêj e peya nabe, li ser vê Xemgîn hêrs dibe.

“Rengîn: Heyyy! Xemgîno lo tu bi xer hatî hevalo?”

Xemgîn: Niç.

R: Hiii. Niç çiye lo?

X: Niç, niç e.

R: Min tiştêk fam nekir.

X: Of, of, of... Hema tu fam nakî neke, ji min re çi.

R: Xemgîn!

X: Dîsa çi ye?

R: Ma îro kêfa te di cihde ye, wer ne?

X: Niç.

R: Hella hella, lo ma tu ji ber çi min tetirxanî dikî?

X: Ma ez ji te re nabejim tetirxanî bibe, tu bi xwe xwe, tetirxanî dikî.

R: Na welle tu min tetirxanî dikî.

---

<sup>452</sup> Xelîl Amed, “Xemgîn û Rengîn”, *Nûbihar*, j. 53/54, Sibat/Adar 1997, r. 30

X: Rast e ez te tetirxanî dikim.

R: Ji ber çi?

X: Hîna ji min dipirse dibeje ji bo çi. Lo ma wê ji bo çi be, ev du saet e tu li hêlekane siwar bûyî nahelî ez jî lê siwar bim, ezê çawa tetirxanî nebim û te tetirxanî nekim.

R: Xemgîn!

X: Îjar çi heye?

R: Ma me ji hevûdu re negoti bu ku ji me kî li hêlkane siwar be wê dest bi kilamekê bike. Kilama ke qedya wê li hêlekane siwar be û îjar ewê din vwê lê siwar be, ne were ye?

X: Belâ were ye.

R: E wê çaxâ te li ser hêlkane kilama xwe neqedand û tu daneketî?

X: Belê kilama min qedya û ez daketim.

R: Eee wê çaxe çi derdê te heye lo Xemgînê rindik.

X: Hella hella! Lo ma ev du saet e tu ji hêlkane daneketiye ku ez jî lê siwar bim û du saet e tu dibejî "ay ay li min, ay ay li min ay."

R: Heh heh heh, Ma kekê min ez hîn kilama xwe dibêjim:

X: Hiii! Tu hîn kilama xwe dibejî. Lawo ev du saet e "ay ay li min...." kilama te ye?

R: Belê ev kilama min e.

X: Li qusûra min mezê neke, ma wê kînga ev kilama te diqede.

R: Oooo, ma hîn min "ay ay li min ay ay" neqedandiye, hîn "way way li min" a vêyamaye

X: Yaaa, e wê çaxê ez sibêwerim li hêlkane siwar bim!

R: Welleh, ez wê nizamim feqet wiha xuya dike ku kînga rûye te sipî ye, wê çaxe were, feqet ez dibejim wê çaxe jî tuyê fedî bikî li hêlkanê siwar nebî. Ji ber vêtû tew neyê, wê baştir be!

X: !!!???

**Peyam:** Wek ku tê dîtî Rengîn li gor Xemgîn zarokê serwaxt û jîr e, hevalê xwe dixapîne ku zêdetir li hêlekanê siwar bibe. Ev tevger gelek caran di nav zarokan de tê dîtî. Hinek li gor yên din zêdetir jêhatî tevdigerin û heqê yên din dixwin. Ev

<sup>453</sup> Xelîl Amed, "Xemgîn û Rengîn", *Nûbihar*, j. 56, Gulan 1997, r. 28



pexşan ji hêla mijarê ve li gor zarokan e. Lê di dawiyê de heke dersek ji bo zarokan bihata dayîn û bihata gotin ku divê tu kes heqê kesî nexwe, wê ji bo zaroka bûbûya peyamake girîng û balkêş.

Di nivîsê de wêneyê herdu zarokan heye û ji wan yekî destê xwe bihêrs rakiriye. Di nav axaftina wan de peyva “tetirxanî” çend caran derbas dibe ku ev peyv li gor “hêrsbûn”, “qehirandin” û “acizbûn”ê peyveke devokî ye. Ji bo hêrsê hatiye bikaranîn.

**Tablo 23: Tabloya Lehengan- Diyalogan**

Jimar	Leheng- Diyalog	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Rengîn û Xemgîn	Xelîl Amed	34-35	47	Tîrmeh-Tebax 1995
2	Rengîn û Xemgîn	Xelîl Amed	36	23	Îlon 1995
3	Rengîn û Xemgîn	Xelîl Amed	38	29 30	Çiriya Paşîn 1995
4	Rengîn û Xemgîn	Xelîl Amed	40	29	Çileyê Paşîn 1996
5	Rengîn û Xemgîn	Xelîl Amed	41 42	29	Sibat/Adar 1996
6	Rengîn û Xemgîn	Xelîl Amed	45	30	Hezîran 1996
7	Rengîn û Xemgîn	Xelîl Amed	46	30	Tîrmeh 1996
8	Rengîn û Xemgîn	Xelîl Amed	48	25	Îlon 1996
9	Rengîn û Xemgîn	Xelîl Amed	53 54	30	Sibat/Adar 1997
10	Rengîn û Xemgîn	Xelîl Amed	56	28	Gulan 1997

## ENCAM

Me di ve xebata xwe de hewl da ku em di Kovara Nûbiharê de nivîs, xêz û wêneyên ji bo zarokên kurd hatine weşandin yek bi yek tespît bikin ku, bi vê xebatê ve di qada edebiyata zarokan de gaveke girîng bê avêtin. Lewra wek ku di destpêkê de jî hat gotin di kurdî de xebatên rêk û pêk, akademîk û profesyonel li ser edebiyata zarokan a kurdî nehatine kirin. Me gavek avêt û em hêvî dikin ku nişên li dû me zêdetir xebatan derxin holê.

Di vê têzê de me ji destpêka weşana Nûbiharê (1992) heta sala 2010an yanê sala dawîn a ku ji bo zarokan beşek hatiye amadekirin bi giştî li ser hejmarên 19 salan lêkolîn kir. Ji bo vê xebatê 112 hejmarên Nûbiharê yên ku di nav 19 salan de hatine weşandin (ji van hejmaran hinek sê mehan carekê, hinek çend hejmar bi hev re hatine weşandin) yek bi yek hatin lêkolîn kirin. Hat tespît kirin ku bi tenê di nav salên 1992-1993-1995-1996-1997-1999-2000-2009 û 2010an de (9 sal) ji bo zarokan beş hatiye amadekirin. Di nav 9 salên ku beşa zarokan heye û bi giştî 112 hejmar hatine weşandin de jî hin hejmaran de beşa zarokan tune. Di pêvekan de sal bi sal, hejmar bi hejmar, mijar bi mijar listeya van bi hûrgilî hatiye dayîn.

Dema xebata me qediya der barê Zaroknameya Nûbiharê de em gihîştin hin encaman. Ev encam li jêr wiha hatin rêzkirin:

1. Dema kovarek dest bi weşanê dike, di hejmara xwe ya ewil de behsa weşan û armanca xwe, karên ku wê di pêşerojê de bimeşîne dike. Nûbiharê ev armanc ji bo mezinan di hejmara xwe ya ewil de kifş kiriye û ji xwendevanan re gotiye. Lê ji bo beşa Zaroknameyê rêvebiran ji zarokan re behsa tiştê nekiriye. Hema bi du qisseyên der barê jiyana Pêxember de dest bi hejmara ewil a Zaroknameyê kirine. Yanê armanc û hedefa vê beşê û nivîsan ji zarokan re nehatiye gotin.

2. Beşa Zaroknameyê bi awayekî rêk û pêk ango bi planeke têkûz nehatiye amadekirin. Ji hêla pedagojîyê, cureyên nivîsan, metod û pergale ve gelek kêmasî hene. Lewra ekîbeke di qada edebiyata zarokan de perwerdekirî di nav nivîskarên kovarê de tunebûye. Amadekarên vê beşê bi xîreta xwe û fedekariyeke mezin çî ji destê wan hatiye kirine û ev beş wisa amade kirine. Edîtorên kovarê jî bêyî ku

naverokê, ziman binirxînin û şîrove bikin ev nivîs û wêne weşandine. Ji ber vê berdewamî û planek di vê beşê de çênebûye.

3. Heke her çar salên ewil ên Nûbiharê ji hêla nivîsên Zaroknameyê ve bê nirxandin mirov dikare bibêje ku di sala yekem (çiriya pêşîn 1992- îlon 1993) de di hejmarên 1, 2, 3, 4, 6, 7, 8, 9, 10 û 11emîn de ji bo zarokan nivîs hatine weşandin. Bi tenê di hejmarên 5 û 12emîn de ji bo zarokan tiştê nehatiye nivîsandin. Di sala duyemîn de (cotmeh 1993- çiriya paşîn 1993) de yanê hejmarên di navbera 13 û 24an de (13, 14, 15, 16, 17, 18, 19, 20, 21, 22, 23, 24) ji bo zarokan tu tişt nehatiye nivîsandin. Di sala sêyemîn (çiriya pêşîn 1994-îlon 1995) ya hejmarên di navbera 25-36an hatine weşandin de, bi tenê di hejmarên 34-35an yên ku du hejmar bi hev re (tîrmeh û tebax) derketine û hejmara 36emîn de nivîs hene. Di hejmarên din de ji bo zarokan tiştê nehatiye weşandin. Di sala çaremîn de (çiriya pêşîn 1995-cotmeh 1996) di hejmarên navbera 37-49an de ji bilî hejmarên 43 û 44 ên ku herdu hejmar bi hev re hatine weşandin û hejmara 49an, di hemû hejmaran de ji bo zarokan gelek tiştên ji hev cudatir hatine nivîsandin.

4. Nivîskarên beşa Zaroknameyê pir kêr in heta mirov dikare bibêje ku sê kesan (Sabah Kara, Xelîl Amedî û Rojbîn Özkan) beş amade kirine. Ji ber vê jî beş li gor kovareke zarokan zêde dewlemend nîne.

5. Nivîsên ku di beşa Zaroknameyê de hatine weşandin jê hinek herçiqas li gor asta zarokan bin jî, gelemperî ji hêla naverok, pedagojî û zimanê ku hatiye bikaranîn ve rasterast ne li gor asta zarokan in, ji bo wan giran in. Lewra ev beş bi rêkûpêk nemeşiyaye û weke qadên din ên kovarê bi baldarî û bi îhtimam nehatiye birêvebirin.

6. Nûbiharê xwestiye ku zarok zimanê xwe yê dayikê hîn bibin. Kovarê bi beşa zarokan ve hewl daye ku xwendina wan pêş ve here, ew ji çand û civaka xwe dûr nemînin û haya wan ji nixê neteweyî û yê cihanê hebe.

7. Di Zaroknameyê de 19 pêkenok, 11 fabl, 10 nivîsên diyaloga di navbera du lehengan, 8 çîrok, 7 helbest, 4 kurteçîrok, 4 nivîsên der barê navdarên kurdan de, 3 nivîsên der barê jîyan û gotinên Pêxember de, 3 nivîsên der barê perwerdeya

dînî de, 3 gotinên navdaran, 2 gotinên pêşiyar, 2 nivîsên der barê cihên dîrokî de, 2 nameyên zarokan, 2 bîranîn, 2 mamik ceribandînek, karîkaturek, nivîseke nasandina berhemana, nivîseke nasandina zarokan, nivîseke nasandina heywanan, nivîseke der barê exlaqê de, meselokek û lîstikek heye.

8. Di berhemên zarokan de wêne, xêz û karîkatur li gor nivîsan zêdetir bala zarokan dikşînin, lê di Zaroknameyê de hejmara wêne, xêz û karîkaturan gelek kêman, beş ji vê hêlê ve pir qels maye.

9. Di kovarê de hin nivîsên ku zarokan bitirsînin hene, mînak çîroka “Mirî çawa tîn şuştin?” ji hêla naverokê ve qet ne li gor asta zarokan e. Zarokan li aliyekî bihêle mezinan jî ditirsîne, lê dîsa jî nivîsên bi vî rengî di kovarê de hatine weşandin.

10. Di kovarê de du lehengên bi navê “Rengîn û Xemgîn” hatine xêzkirin, herdu heval her tim li ser mijarekê bi hev re diaxivin. Ji ber ku hatine xêzkirin, axaftina wan wek diyalogê li hember hevdu ye û hin caran henekan bi hevdu dikin ku ev jî ji bo zarokan baş e. Lê tiştên ku balê dikşîne herdu jî kur in, yanê ji heman zayendê ne, zarokan jê yek ne keçik e.

11. Di beşên Zaroknameyan de gotinên kurdî, peyvên resen ên kurdî gelek caran derdikeve li pêş zarokan ku ev ji hêla ziman û çandê ve dewlemendiyek e.

12. Dema çîrokên Zaroknameyê bîst xwendin tê dîtin ku peyv û gotinên hatine bikaranîn, mijarên ku hatine hilbijartin li gor çand û edetên civaka kurdî hatine nivîsandin.

13. Zimanê kurdî ji hêla biwêjan ve zimanekî dewlemend e. Ji bo fikr, nêrîn û zimanê zarokan pêşva here, ew edebiyatê û axaftinê hez bikin biwêj girîng in. Lê di Zaroknameyê de biwêjên kurdî pir kêman in, yê heya jî di nav metnan de derbas dibin.

14. Hejmara nameyên zarokan di kovarê de kêman in, bi tene du name hatine nivîsandin.

15. Di Zaroknameyê de hejmara gotinên pêşiyar pir kêman in.

16. Di kovarê de hewl hatiye dayîn ku zarok çand û edetên kurdan, exlaqê Îslamê, hestên neteweyî hîn bibin.

17. Beşa zaroknameyê de bi tenê fêrkirin û şîretdayîn tunene. Nivîskaran çîrokên wek Xoceyê navdar hîlbijartine ku zarok bikenin û kêfxweş bibin.

18. Çîrok û nivîsên beşa Zaroknameyê jê hinek dirêj in û ne li gor asta zarokên ku temenê wan di navbera 8 û 9 salî de ne. Mînak çîroka bi navê “Ko Zivistan Çû Bihar tê” ya ku di hejmara 2yemîn de hatiye weşandin, çîroka bi navê “Qendîla Biçûk” ya ku di hejmara 7emîn de hatiye weşandin, çîroka bi navê “Kalo Heyvo” ya ku di hejmara 111emîn de hatiye weşandin. Her çiqas ev çîrok ji hêla zarokan ve neyê xwendin jî, dema mezinên wan ji zarokan re vê çîrok bixwînin îhtimaleke mezin e ku zarok hînî guhdarkirinê bibin. Ji vê hêlê ve mirov dikare bibêje ku hin çîrokên beşa Zaroknameyê dirêj in.

19. Dema ku Rojbîn Özkan beşa zarokan a kovara Nûbiharê amade dike (Hejmarên 107-108-109-110-111-112) tê dîtin ku beş bêtir dewlemend dibe. Lewra wek hejmarên berê ne bi tenê çîrok û fabl, gelek nivîs û wêneyên ji hev cudatir jî di beşê de cih digrin. Wek dîrok, kesên navdar ên kurdan, lîstik, gotinên xweş û h.w.d.

20. Nivîsên ku di zaroknameyê de hatine çapkirin agahiyên ku zarok nizanin, yê nû dane zarokan.

21. Ji bo zarokan wêne tiştekî girîng e, lewra zarok bi weneyan ve mijarê baştir û hêsantir fêm dikin. Lê pîraniya hejmaran de wêneyên çîrokan, helbestan an fablan nehatiye xêzkirin ku ev jî kêmasiyek mezin e.

22. Di nivîsên Zaroknameyê de mezinahiya tîpên nivîsan gelemperî ne li gor asta zarokan e. Lewra zarok nivîsên ku bi tîpên biçûk ve hatine nivîsandin nikarin rehet bixwînin û zû ji nivîsê aciz dibin. Lê dema ku mirov gelemperî nivîsan dinihêre dibîne ku nivîs bi tîpên biçûk hatine nivîsandin.

23. Di kovarê de karîkatur hema bibêje tunene lewra di nav hemû hejmarên Zaroknameyê de bi tenê hejmara 36an de karikaturek bi navê “Dilocan” hatiye xêzkirin.

24. Zarok herçiqas lîstikê hez bikin jî, kovar ji vê hêlê ve qels maye. Lewra di kovarê de ji bo zarokan bi tenê lîstikek hatiye weşandin, bes hew.

Piştî vê encama ku em gihîştî heke çend pêşniyaz an jî şîrove der barê Zaroknameyê de bîn kirin mirov dikare bibêje;

- Divê beşa Zaroknameyê ji hêla xêz, karîkatur û wêneyan ve dewlemend bûbûya.
- Heke rûpelên ji bo zarokan hatine amadekirin rengîn bûbûya, wê zêdetir bala zarokan bikişanda.
- Ev beş heke ji hêla çîrok, fabl, helbest, gotinên pêşiyên, mamik, heyranok, nasandina heywanan, nasandina ezayên mirovan, nasandina cih û deverên kurdan, nasandina cih navdar ên dinyayê ve têr û tije bûbûya wê baştir bûbûya.
- Divê kovarê de hînkirina reqeman, tîpên alfabe-yê, rojên heftayê, meh, reng û h.w.d. tiştên ku hişê zarokan pêşve dibin hebûna. Ji bo geşedana mêjiyê zarokan wê baştir bûbûya.
- Ji ber ku zarok lîstikan û ceribandinan hez dikin divê hejmara van zêdetir hebûya.
- Zimanê kurdî dewlemend e û dibe ku di hin hemaran de hînkirina zaravayên kurdî yê wek zazakî û soranî û hînkirina zimanê îngilizî ya ku li hemû deverên dinyayê tê axaftin jî hebûya. Wê zêdetir bal bikişanda.
- Heke ji zarokan re hin tişt bihata pirsîn û bersiva wê pirsê di hejmareke din de bihata dayîn, paşê bi rêya nameyan ve kîjan zarok bersiva rastîn dabe, xelat ji bo wê zarokê bihata şandin, dibe ku vê pêşbirkê bala zarokan bikişanda.
- Zarok di nav gelek cureyên edebiyatê de zêdetir ji çîrokan hez dikin. Dema mirov nivîsekê û çîrokekê yê ku dirêjahiya wan wek hev ji bo xwendinê bide zarokan, kêfa zarokan bêtir ji çîrokê re tê. Lewra di çîrokan de behsa qehremanan, heywanan, bûyerên fantastik, cihên xiyalî, dinyayeke ji dinyaya rastîn cudatir tê teswîrkirin. Ji ber vê yekê, zarok bi dil û can çîrokê dixwînin. Tiştên din jî çîrok hestên zarokan xurt dike, xiyalên wan fireh dike, ew kelecandî dibin, zimanê wan dewlemend dibe, hîni guhdarîkirinê dibin û ji xwendinê hez dikin. Ji ber van hemû sedeman heke di Zaroknameyê de hejmara çîrokan zêdetir bûbûya wê bala zarokan bikişanda.
- Herî dawîn divê bê gotin ku weşanxaneyê Nûbiharê îro di civaka kurdî de bi nav û deng e. Çawa ku îro kovareke akademîk a bi navê Nûbihar Akademî diweşîne, dikare kovareke zarokan a xweser ya ku ji hêla pisporan ve bi rêk û pêk û dewlemend hatibe

amadekirin biweşîne. An jî weşanxane dikare bi her hejmara kovara Nûbiharê re çawa ku berê çend rûpel ji bo zarokan amade kiribû, dikare dîsa wisa ji bo zarokan rûpelan veqetîne. Lê ne wek hejmarên ku me lêkolîn li ser kirin, vê carê rûpelên tîr û tije, rengîn, bi wêne û xêzan ve hatine xemilandin yanê beşeke profesyonel dikare amade bike.



## ÇAVKANÎ

### PIRTÛK

Aksoy, Ayşe Belgin & Dere Çiftçi, Hale, *Erken Çocukluk Döneminde Oyun Duyu-Motor Oyundan Kurallı Oyuna*, Pegem Akademi, Ankara, 2014.

Ariès, Philippe, *Centuries of Childhood-A Social History of Family Life*, Çev. Robert Baldick, New York: Alfred A. Knopf, 1962.

Ayyıldız, Mustafa & Birgören, Hamdi, *Edebiyat Bilgi ve Teorileri*, Akçağ Yayınları, Ankara, 2005.

Beşikçi, İsmail, *Rejimin Niteliği ve Kürtler*, İsmail Beşikçi Vakfı, Mayıs 2013, İstanbul.

Bingöl, Abdulkadir, *Gotinên Peşyan û Biwêj Deyimler ve Atasözleri*, Weşanên Na, Çapa Nû, İzmir, Gulan 2014.

Bois, Thomas, *The Kurds*, Translated from the French by Professor M.W.M. Welland, Khayat Book & Publishing Company S.A.L, Beirut, 1966.

Boyik, Eskerê, *Nura Elegezê Çend Dîdem Ji Edebyeta Kurdên Ermenistanê*, Weşangeha Dengê Êzîdiyan, Oldenburg, Nîsan 2004.

Bozkurt, Kenan, *Kürt Masallarının Yapısal Özellikleri*, Kimlik, Kültür ve Değişim Sürecinde Osmanlıdan Günümüze Kürtler Uluslararası Sempozyumu, Bingöl Üniversitesi Yayınları, 2013.

Çakmak Güleç, Havise & Geçgel, Hulusi, *Çocuk Edebiyatı, Okul Öncesinde Edebiyat ve Kitap*, Kriter Yayınevi, İstanbul, Şubat 2012.

Cegerxwîn, *Cîm û Gulperî*, Institut Kurd de Paris, Berlîn, Çileya Pêşîn, 1978

Cewerî, Firat: *Kultur Huner û Edebiyat*, Weşanên Nûdem, Stockholm, 1997.

Cibran, Halil, *Ermiş*, Kaknüs Yayınları, İstanbul, 2008.

Çiçek, Cuma, *Zimanek Çima Tê Qedexekirin? Polîtîkayên Zimanî û Rewşa Kurdî li Tirkiyeyê Ji Înkarê Ber Bi Nasîné*, Weşanên Peywend, Payîz 2013, Stenbol.

*Dîwana Osman Sebrî*, Weşanên Perî, Stenbol, Çirya Pêşîn, 2004.



Dost, Jan, *Melâ Mehmûdê Bâyezîdî, 'Âdât û Rusûmâtnâme-â Ekrâdiyye*, Nûbihar Yayınları 2012.

....., *ed-Durru's- Semîn Fî Şerhî Mem û Zîn*, Erbil, 2006.

Durre, Abdurrahman, *Şerha Dîvana Ehmedê Xanî; Felsefe û Jiyana Wî*, Avesta, Stenbol 2002.

Ehmed, Newzad Elî, *Yekemîn Govarî Nihênî Bo Mindalanê Kurd*, Çapxaneyê Şehîd Azad Hewramî, Kerkûk, 2008.

Eller, Jack David, *From Culture to Ethnicity to Conflict An Anthropological Perspective On International Ethnic Conflict*, The University Of Michigan Press, United States of America, 1999.

Enginün, İnci, “Çocuk Edebiyatına Toplu Bakış Çocuk Edebiyatı Yıllığı”, Gökyüzü Yayınları, İstanbul, 1987.

Gazî, Mustafa, *Gurzek Ji Zargotina Zarokan; Dîsko Dîsko Danîno*, Enstîtûya Kelepora Kurdî, Weşanxaneya Aras, Silêmanî, 2006.

Güleryüz, Hasan, *Yaratıcı Çocuk Edebiyatı*, Pegem Akademi Yayıncılık, Ankara 2002.

Hayıg, Roşan & Werner, Brigitte, *Zazaca-Türkçe Sözlük-Türkçe-Zazaca Sözcük Listesi*, Tîj Yayıncılık, İstanbul 2012.

Houdé, Olivier, *Çocuk Psikolojisi*, Dost Kitabevi, Ankara, Mayıs 2006.

İnal, Kemal, *Çocuk ve Demokrasi*, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2014.

Karaköse, Şaban, *Konularına Göre Derlenmiş Mevlana'dan Düşündüren Sözler*, Yakamoz Yayıncılık, İstanbul 2007.

Kavcar, Cahit, *Edebiyat ve Eğitim*, Engin Yayınevi, Ankara, 1999.

Kaya, Mehmet, *Çocuk Edebiyatında Gülmece (Mizah), İlköğretim Çocuk Edebiyatı Kitap Kataloğu*, Eğitimden Yayınları, (Çapa Duyem), Ankara, Nisan 2011.

